

AXWEND MIHEMED SALIH  
ZENGENE BELUÇ



# KURDGALNAMEK [KURDBÊJNAME]



GENCÎNE Ü ŞAHKAREKE HÊJA  
YA DÎROKA KEVN A KURD Ü BELUÇAN



Cild: I



Wergêrê wê yê Soranî: Hîwa Mihemed Zendî  
Kurmanciya Wê: Ziya Avci



**KURDGALNAMEK [KURDBÊJNAME]**  
**Gencîne û Şahkareke Hêja Ya Dîroka Kevn a Kurd û Beluçan**  
**Cild: I**

**Nivîskar**  
Axwend Mihemed Salih Zengene Beluç

**Wergêrê wê yê Soranî**  
Hîwa Mihemed Zendî

**Kurmanciya Wê**  
Ziya Avci

**Dîrok: 05 / 12**

**Gerînendeya Weşanê**  
Eslîxan Yıldırım

**Sererastkirin**  
Serwet Deniz

**Berg û Rûpelsazî**  
J&J

**Çapa Yekemîn**  
Weşanên Azad, 2019

**Çapxane**  
Berdan Matbaası Davutpaşa Caddesi  
Güven İş Merkezi C . Blok No:215/216 Topkapı/İstanbul  
Sertifika No:12491

**ISBN:** 978-605-81463-1-0  
**Sertîfika No:** 40407

**Navnîşan**  
AZAD YAYINEVÎ  
Viranşehir Mah.  
34330. Sk. No: 15 A/4  
**Mezitli / Mersin**

**Web:** [www.wesanxaneyaazad.com](http://www.wesanxaneyaazad.com)  
**E-mail:** [info@wesanxaneyaazad.com](mailto:info@wesanxaneyaazad.com)

© *Mafê wê parastî ye.*  
© *Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.*

AXWEND MIHEMED SALIH  
ZENGENE BELUÇ,



KURDGALNAMEK  
[KURDBÊJNAME]



GENCÎNE Ü ŞAHKAREKE HÊJA  
YA DÎROKA KEVN A KURD Ü BELUÇAN



Cild: I



Wergêrê wê yê Soranî: Hîwa Mihemed Zendî  
Kurmanciya Wê: Ziya Avci





Pêşkêş e ji

“Ayrîn” re ku çaverêya çavhildanê ye...



## **NAVEROK**

Pêşgotina Wergêr .....	17
Kurtiya Gotara Seydayê Cemal Nebez Li Ser Kurdgalnamekê.....	23
Kurtiya Pêşgotina Birêz Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç Ji Bo Kurdgalnamekê.....	25
Pêşgotina Nadir Qemberanî Ji Bo Kurdgalnamekê .....	31
Pêşgotina Kurmanciya Wê .....	35

## **BEŞA YEKEM**

Destpêk.....	41
Behsa Xwendegehên Îslamê.....	44
Behsa Kurdên Zengene .....	46
Behsa Kurdên Biraxoyî.....	49
Bingeja Kurdên Biraxoyî Bi Vî Awayê Xwarê ye .....	49

## **DEWLETA MADÊ**

Şerê Di Navbera Mad û Tûranê De.....	53
Serekêñ Hevçerx ên Tîreyên Kurdên Biraxoyî û Paşayêñ Madê..	54
Têkçûna Fermanrewatiya Malbata Kurdên Madê.....	56
Malbata Hexamenşyan.....	56
Şela Hexamenşyan Bi Kurdên Madê Re.....	57
Serekêñ Hevçerx ên Tîreyên Kurdên Biraxoyî û Paşayêñ Hexamenşî.....	58
Têkçûna Fermanrewatiya Hexamenşyan .....	59
Hatina Îskenderê Makedonî .....	60
Parçebûna Selteneta Îskender .....	61

## BEŞA DUYEM

MÎRNIŞÎNA KURDÊN BIRAXOYÎ LI TÛRANÊ (Dewreya Yekem) .....	63
1- Mîrêmîran Mîr Kîkan .....	64
Dîwana Bulikê .....	64
Alîkariya Keyqubad Paşa .....	64
Çakkirina Keleha Kîkan û Misatinkê .....	65
2- Mîrêmîran Mîr Zûrak.....	65
Parvekirina Herêmên Tûranê.....	65
Koça Dawiyê ya Keyqubadê Paşayê Mad û Parsê .....	66
Êrîşen Fermanrewayê Sindanê Li Ser Tûranê û Şikestina Wan.	66
Behsa Rostemê Pehlewan.....	66
Êrîşa Mîrê Sindanê ya Cara Duyem .....	67
Koça Dawiyê ya Mîr Zûrak.....	67
3- Mîrêmîran Mîr Üştab .....	67
4- Mîrêmîran Mîr Zigrîn .....	68
Êrîşa Dadpirsiya Sindan Li Ser Tûranê.....	68
Koça Dawiyê ya Mîr Zigrîn .....	70
5- Mîrêmîran Mîr Zîbar .....	70
Koça Dawiyê ya Tûsê (Keyxusrew-Keyxesro) Paşayê Madê.....	70
Çêkirina Perestgeha Zorak Li Kîkanê .....	70
Koça Dawiyê ya Mîr Zîbar.....	71
6- Mîrêmîran Mîr Biraxim .....	71
Avakirina Perestgeha Helwanê Li Xuzdarê.....	71
Kuştina Ferîbûrz Paşayê Madê Li Bajarê Aşûrê .....	71
Mafpêdana Beşdariya Kurdêن Biraxoyî û Edreganiyan Di Şerê Neteweyî De .....	72
Paşabûna Keyaksar .....	72
Tolewergirtina Keyaksar Ji Aşûriyan.....	72
Êrîşa Sîtan Li Ser Erdê Madê .....	72
Koça Dawiyê ya Mîr Biraxim .....	73
7- Mîrêmîran Mîr Goran .....	73
Paşabûna Azdiyak.....	73
Daxistina Azdiyak Ji Paşatiyê .....	74
Şerê Azdiyek Bi Kuriş Re .....	74
Hereketê Kuriş Bi Kurdêن Mayî Re .....	74
Koça Dawiyê ya Mîr Goran .....	75
Tîreyêن Parsê .....	75
Desteya Hexamensiyan .....	76

## BESA SÊYEM

MÎRNIŞÎNA KURDÊN BIRAXOYÎ LI TÛRANÊ (Dewreya Duyem) .....	79
8- Mîrêmîran Mîr Zirşan .....	79
Çêkirina Bendên Avê.....	79
Êrîşen Fermanrewayê Sindanê .....	80
Koça Dawiyê ya Kurişê Mezin.....	80
Paşabûna Kambûciyê Hexamenşî.....	80
Xwekuştina Kambûc.....	81
Koça Dawiyê ya Mîr Zirşan .....	81
9- Mîrêmîran Mîr Zûrakê Duyem .....	81
Belavkirina Adetê "Heşer"ê.....	81
Şiroveya Adetê Heşerê.....	81
Paşabûna Darayê Yekem ê Hexamenşî.....	82
Koça Dawiyê ya Mîr Zûrak.....	82
10- Mîrêmîran Mîr Ercan .....	82
Damezirandina Leşkerê Dîdevaniyê .....	82
Paşabûna Xışayarşayê Hexamenşî .....	83
Dagirkirina Misrê û Babîlê .....	83
Êrîşa [Xışayarşa] ya Ser Yûnanê.....	83
Kuştina Pindranê Birayê Mîr Ercan .....	83
Kuştina Xışayarşayı Hexamenşî .....	84
Koça Dawiyê ya Mîr Ercan .....	84
11- Mîrêmîran Mîr Şamûz.....	84
Paşabûna Erdeşîrê Yekem ê Hexamenşî .....	85
Êrîşa Mîrê Sindanê a Ser Tengava Mîlayê.....	85
Koça Dawiyê ya Erdeşîrê Yekem .....	86
Koça Dawiyê ya Mîr Şamûz.....	87
12- Mîrêmîran Mîr Biraxmê Duyem.....	87
Kolana Karêzan .....	87
Parvekirina Destkeftiyêن Şer .....	87
Paşabûn û Kuştina Xışayarşayê Duyem .....	87
Paşabûna Darayê Duyem ê Hexamenşî .....	88
Koça Dawiyê ya Mîr Biraxmê Duyem.....	88
Koça Dawiyê ya Darayê Duyem.....	88
13- Mîrêmîran Mîr Sabûl.....	88
Koça Dawiyê ya Mîr Sabûl.....	89
Paşabûna Erdeşîrê Duyem .....	89
14- Mîrêmîran Mîr Nûrgan .....	89
Avakirina Keleha Nûrganê.....	90
Koça Dawiyê ya Erdeşîrê Duyem .....	90
Paşabûna Erdeşîrê Sêyem.....	90
Koça Dawiyê ya Mîr Nûrgan .....	91

15- Mîrêmîran Mîr Kiyanûş .....	91
Kuştina Erdeşêrê Sêyem.....	91
Koça Dawiyê ya Kiyanûş.....	91
16- Mîrêmîran Mîr Kîkanê Duyem .....	92
Paşabûna Darayê Sêyem .....	92

## **BEŞA ÇAREM**

KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA YÛNANÎ Û HINDIYAN DE	93
Êrişa Yûnaniyan a Ser Erdê Mad û Parsê.....	93
Destpêkirina Şer.....	93
Hatina Îskender a Hindê .....	94
Vegera Îskenderê Makedonî .....	94
Şerê Kurdên Tûran û Mekranê Bi Leşkerê Îskender Re .....	95
Danîna Nexşeya Şer .....	95
Şer û Derketina Kurdên Beluçî Ji Tengava Mîlayê.....	96
Hatina Îskender a Nav Erdê Tûranê û Dagirkirina Ermabîlê.....	96
Şer Li Tengava Hullînê .....	97
Şerê Galgalanê Li Navçeya Raskîcanê .....	97
Karbidestên Îskenderê Makedonî Li Tûran û Mekranê .....	98
Destbikarkirina Kisandus Wekî Fermanrewayê Tûran û Mekranê .....	98
Şert û Mercen Neguncayî yên Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê.....	98
Êrişa Sîlukus (Selefkos) a Ser Welatê Hindê.....	99
Kurdên Beluçî Di Bin Desthilata Welatê Hindê de.....	99
Hatina Tîreyên Hindî ya Navçeya Tûran û Mekranê .....	100
Sebebê Alîkariya Kurdên Zabilistanê .....	100
Şerê Giran ê Suhrabadanê.....	100
Girêdana Navçeya Kîkanê Bi Mîrnişîna Zabilistanê Ve.....	101

## **BEŞA PÊNCEM**

ŞARISTANIYETA KURDÊN BELUÇÎ .....	103
Dînê Kurdên Beluçî .....	103
Awayê Avakirina Avahiya Arînê (Perestgehê).....	104
Ûrf û Adetên Kurdên Beluçî.....	104
Ziraeta Kurdên Beluçî .....	106
Zimanê Kurdên Beluçî .....	107
Nûnertiya Artêşa Kurdên Beluçî.....	108
Sîstema Medenî/Sîvîl a Kurdên Beluçî .....	109
Mezra, Gund û Bajarêñ Kurdan .....	109

## **BESA ŞESEM**

ESLÊ KURDÊN BELUÇÎ .....	111
Eslê Kurdên Biraxoyî yên Beluçî .....	111
Paşatiya Malbata Pîsdadiyan .....	114
Eslê Kurdên Beluçiyê Edreganî, Mamilî û Kirmanî .....	118
Peywendiyê Di Navbera Kurdên Tûran û Mekranê De .....	122

## **BESA HEFTEM**

KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA PAŞAYÊN SILUKIYÊ (SELEFKOS) YÛNANÎ DE .....	123
Pîsdadî .....	123
Tîreyê Sindanê .....	124
Serkeftina Cidgalan Li Ser Tûran û Mekranê .....	125
Fermanrewatiya Paşayê Silukiyê Yûnanî Li Mad û Parsê .....	126
Mîrê Wilayeta Zabilistanê Mîr Birsan Zengene .....	127
Şorişa Hakimên Bi Nijad Yûnanî Li Mad û Parsê .....	128
Sistema Nû ya Tîreyê Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê....	129

## **BESA HESTEM**

KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA EŞKANIYAN DE .....	131
Eşkanî .....	131
Peywendiyê Di Navbera Kurdên Beluçî û Paşayê Eşkanî de ..	132
Êrişê Antîyakûsê Sêyem ên Ser Selteneta Eşkanî .....	133
Kurdên Beluçî û Alîkariya Paşayê Eşkanî .....	133
Koça Dawiyê ya Erdeganê Yekem .....	134
Paşabûna Pirpatyûsê Eşkanî .....	134
Paşabûna Ferhadê Yekem ê Eşkanî .....	134
Paşabûna Mihirdadê Yekem ê Eşkanî .....	134
Hatina Kurdên Beluçî ya Nav Erdê Tûran û Mekranê .....	135
Şer Li Suhrabadanê .....	135
Şer Li Kuhyarê .....	136
Eslê Tîreyê Kurdên Beluçî yên Ji Welat Dûr .....	136

## **FERMANREWAYÊN KURDÊN BELUÇÎ LI TÛRAN Û**

MEKRANÊ (Dewreya Sêyem) .....	139
Mîrêmîran Mîr Behram Biraxoyî .....	139
Koça Dawiyê ya Mihirdadê Yekem .....	140
Êrişa Hozê Sakayê ya Ser Kewşenê Madê .....	140
Paşabûna Ferhadê Duyem .....	140

Kuştina Ferhed Bi Destê Sakayan .....	141
Paşabûna Erdewanê Duyem .....	142
Koça Dawiyê ya Mîr Behramê Biraxoyî .....	142
Mîrêmîran Mîr Şahdad Biraxoyî .....	142
Paşabûna Mihirdadê Duyem .....	143
Şerê Kurdên Beluçî Bi Sakayiyan Re .....	143
Mîrêmîran Mîr Feyrûz Biraxoyî .....	143
Li Geliyê Misatnicê Bi Sakayiyan Re Şer .....	144
Paşabûn û Kuştina Guhderzê Yekem .....	144
Paşabûn û Kuştina Ewrûdê Yekem .....	144
Paşabûna Sena Turk .....	144
Mîrêmîran Mîr Mihirdadê Biraxoyî .....	145
Paşabûna Ferhadê Sêyem .....	146
Kuştina Ferhadê Sêyem .....	146
Hozêñ Saka .....	146
Damezirandina Mîrnişîna Sakayiyan .....	147
Mayîsesê Mîrê Sakayiyan .....	147
Yekgirtina Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê Bi Sakayiyêñ Zabilistanê Re .....	148
Mîr Îzses Saka .....	148
Paşabûn û Kuştina Mihirdadê Sêyem .....	149
Mîrêmîran Mîr Behmen Biraxoyî .....	149
Îzsesê Duyem ê Mîrê Sakayiyan .....	150
Mîrêmîran Mîr Besam Biraxoyî .....	150
Paşabûn û Goşenîşînya Ewrûdê Duyem .....	150
Gundus Fasanê Mîrê Sakanê .....	151
Paşabûna Ferhadê Çarem .....	151
Paşabûna Tîrdadê Duyem .....	151
Kuştina Ferhadê Çarem .....	152
Mîr Gûdayê Mîrê Sakayiyan .....	152
Hatina Dinyayê ya Peyamber İsa (Silav Lê Bin) .....	152
Mîr Feyrûzê Mîrê Sakayiyan û Têkçûna Mîrnişîna wî .....	153
Mîrêmîran Xefî Biraxoyî .....	153
Xweyîkirina Selgur û Sagdî .....	153
Paşabûn û Kuştina Ferhadê Pêncem .....	154
Hoza Koşaniyan .....	154
Paşabûn û Kuştina Ewrûdê Sêyem .....	155
Paşabûna Enuşê Yekem û Dûrxistina Wî Ji Text .....	155
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Erdewanê Sêyem .....	156
Kucele Kile Kedfîzsê Mîrê Koşanê .....	156
Mîrêmîran Şawiş Biraxoyî .....	157
Paşabûna Guhderzê Duyem û Rakirina Wî Ji Ser Text .....	157
Paşabûn û Kuştina Wardanê Yekem .....	158
Paşabûna Cara Duyem a Guhderz û Koça Wî ya Dawiyê .....	158

Paşabûn û Koça Dawiyê ya Enuşê Duyem .....	159
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Yekem .....	159
Mîrêmîran Mîr Miradan Biraxoyî .....	160
Êrîşa Mîrê Sindanê ya Ser Tûranê.....	160
Wîman Kile Kedfîzsê Mîrê Koşanê.....	161
Mîrêmîran Mîr Şahbûz Biraxoyî.....	162
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Feyrûzê Duyem .....	162
Paşabûna Erdewanê Çarem û Rakirina Wî Ji Ser Text.....	163
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Xesro .....	163
Mîrêmîran Mîr Sergêj Biraxoyî.....	163
Kenşikînê/Kenişkîn Mîrê Koşanê .....	164
Mîrêmîran Mîr Şahmîr Biraxoyî.....	165
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Duyem.....	166
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Mihirdadê Çarem.....	166
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Sêyem .....	167
Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Çarem.....	167
Hûşan Üşka Mîrê Koşanê.....	168
Mîrêmîran Mîr Beyx Biraxoyî.....	168
Paşabûna Erdewanê Pêncem Li Parsê û Bilaşê Pêncem Li Babîlê.....	169
Mîrêmîran Mîr Şahrûz Biraxoyî .....	169
Kuştina Erdewanê Pêncem ê Dawîn Paşayê Eşkanî .....	170

## BEŞA NEHEM

KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA SASANIYAN DE.....	171
Sasanî.....	171
Paşabûna Erdeşêr .....	171
Mîrêmîran Mîr Bûrak Biraxoyî .....	172
Êrîşa Erdeşêr Li Ser Erdê Hindê .....	173
Paşabûna Şahpûrê Yekem .....	173
Manî û Dînê Wî.....	174
Mîrêmîran Mîr Mihran Biraxoyî .....	174
Paşabûna Hurmuzê Yekem .....	175
Hatina Şîretkerên Manî Li Sîkistan, Tûran û Mekranê .....	175
Mîrêmîran Mîr Şadan Biraxoyî.....	176
Paşabûna Behramê Yekem .....	176
Kuştina Manî .....	176
Paşabûna Behramê Duyem.....	177
Îtaetkirina Hozêن Sakayı û Kurdên Beluçî .....	178
Hatina Zawik a Ser Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	178
Paşabûna Behramê Sêyem .....	178
Paşabûna Narses.....	179

Şer Bi Romayıyan Re .....	179
Paşabûna Hurmuzê Duyem.....	179
Hatina Erşem Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	180
Bingeħa Eslē Sakayiyēn Sikistanê.....	180
Paşabûna Şahpûrê Duyem .....	180
Hatina Menûçehr Ji Bo Dagirkirina Tûran û Mekranê.....	181
Paşabûna Erdeşerê Duyem .....	182
Hatina Erbed Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê.....	182
Paşabûna Şahpûr (Seyem) .....	182
Paşabûna Behramê Çarem.....	182
Paşabûna Yezgurdê Yekem.....	182
Hatina Mîr Keysûn Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	183
Paşabûna Behramê Pêncem.....	183
Şer Bi Selteneta Romayê Re .....	184
Hatina Mîr Xeyzûn Ji Bo Dagirkirina Tûran û Mekranê.....	184
Hatina Xwarê ya Hoza Hîtalî .....	184
Şerê Hîtalan Bi Behramê Pêncem Re .....	184
Paşabûna Yezdgurdê Duyem .....	185
Hatina Mîr Kirahûn Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	185
Paşabûna Feyrûz .....	186
Hatina Kirkûyî Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	186
Paşabûna Bilaş .....	186
Hatina Mîr Kiyarş Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	187
Paşabûna Kubadê Yekem .....	187
Bêdengkirina Hozên Hezerê.....	187
Hatina Îmam Mezdek.....	187
Guftûgoyêñ Mezdek Bi Pêşewayêñ Zerdeştiyan Re.....	188
Paşabûna Tehmasp.....	188
Paşabûna Kubad Cara Duyem.....	189
Hatina Mîr Gistim Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê.....	189
Paşabûna Enuşêrwan.....	189
Qetlîama Mezdek û Mezdekiyan .....	190
Hatina Mîr Yezen Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	190
Şahiya Zêde ya Ji Bo Hatina Dinyayê ya Hz. Mihemed Mistefa (Silav Lê Bin) .....	190
Paşabûna Hurmuzê Çarem .....	191
Hatina Mîr Erşib Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê .....	192
Rizgakirina Wilayetên Tûran û Mekranê Ji Waliyê Sindanê .....	192
Paşabûna Xesro Perwîz .....	192
Şerê Xesro Perwîz Bi Romayıyan Re .....	193
Nameya Hz. Mihemed Mistefa Ji Xesro Perwîz Re .....	193
Paşabûna Kubadê Duyem .....	193
Misilmanbûna Xelkê Yemenê.....	193
Li Ser Erdê Sindanê.....	194

Risal Dîwanç .....	194
Parastina Teqlîdkerên Mezdek .....	195
Rasil Siharis.....	195
Dagirkirina Wilayetên Tûran û Mekranê .....	195
Tayîna Mîr Li Tûran û Mekranê.....	195
Sîwa Semerayê Mîrê Tûran û Mekranê .....	196
Beşdariya Kurdên Beluçî ya Nav Hêzên Eskerî.....	197
Rasil Sihas .....	197
Sîwa Cunîn Mîrê Tûran û Mekranê.....	197
Rasil Siharisê Duyem.....	197
Paşabûna Pûran Duxt.....	198
Koça Hz. Mihemed Mistefayê Peyamberê Îslamê û Malavahiya Wî .....	198
Paşabûna Arzim Duxt .....	199
Risal Sihasê Duyem .....	199
Sîwa Esyarê Mîrê Tûran û Mekranê.....	199

## BEŞA DEHEM

KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA ÎSLAMIYETÊ DE .....	201
Xilafeta Mîrê Misilmanan Ebûbekir .....	201
Xilafeta Mîrê Misilmanan Omerê Kurê Xetab .....	201
Paşabûna Yezdgurdê Sêyem.....	203
Rasil Çeçê Kurê Sîlaiyîc .....	204
Şer Bi Ranûn Mihirtûn Re .....	204
Sîwa Mayînê Mîrê Tûran û Mekranê .....	204
Êrişa Leşkerê Îslamê Li Ser Secistan û Mekranê .....	205
Îtaeta Kurdên Beluçî a ji Mîrê Misilmanan Hz. Omerê Kurê Xetab Re.....	205
Xilafeta Mîrê Misilmanan Osmanê kurê ‘Efan.....	206
Şorişa Xelkê Kabilistan û Zabilistanê .....	207
Hatina Ebdurehmanê Kurê Semere a Mekranê .....	207
Hatina Ubeydullayê Kurê Mu’emer a Mekranê.....	208
Xilafeta Mîrê Misilmanan Eliyê Kurê Ebî Talib .....	208
Sîwa Zûrakê Mîrê Tûranê.....	208
Hatina Saxirê Kurê Ze’er a Mekranê .....	209
Benî Umeye.....	209
Rûniştina Mu’awiye ya Li Ser Textê Xelîfetiyê.....	210
Hatina Ebdula Siwar El’ebdî ya Mekranê .....	210
Êrişa Ser Tûranê .....	211
Hatina Senanê kurê Seleme ya Tûranê .....	212
Hatina Raşidê Kurê Omer a Mekranê .....	212
Careke Din Hatina Senanê kurê Seleme ya Mekranê.....	212

Rasil Çenderê Birayê Çeç.....	213
Hatina Menzerê kurê Carûd Bişir a Mekranê .....	214
Hatina Hekemê Kurê Menzer a Mekranê .....	214
Hatina Ebdulmulikê Kurê Merwan a Ser Textê Xelîfetiyê .....	214
Hatina Seîdê Kurê Eslem Kulab a Mekranê.....	215
Mixalefeta [Seîd] Bi 'Elafîyan Re.....	215
Hatina Meca'eyê Kurê Si'erê Kurê Yezîdê Kurê Hezîfe ya Mekranê.....	215
Xelîfebûna Welîdê Kurê Ebdulmelikê Kurê Merwan .....	216
Hatina Mihemedê Kurê Harûn a Mekranê.....	216
<b>HIN WÊNE.....</b>	<b>217</b>
Wêneyên Mîrên Mîrnişîna Kurdên Beluçî yên Beluçîstanê Û Wêneyên Kulturî.....	217

هەوا ئامادى كىتىپ

## PÊŞGOTINA WERGÊR

### Kurdgalnamek | Gencîneya Dîroka Kurd û Beluçan

Ji bo berbipêşveçûn û duristkirina dahatûya neteweyekê, dîrok xwediyê peywendiyeke misogerî ye ku bi bibîranîna bû-yer, nişûv, hevraz, serkevtin û hilweşîna borî, hest û coşa neteweyê diliwîne û ji bo hewldana jînê şîyanê veşartî bi teyîsok û taybetmendiyan tîr dike.<sup>1</sup>

Dîroka balkêş a Kurdan di Kurdistana niha û Kurdistana kevn(Medya) de diçe digihê bi çendîn hezar sal beriya niha. Di piraniya serdemên pênc hezar salên borî de, bi gelempêri di piraniya navçeyên Kurdistanê û bi taybetî Kurdistana niha de, şaristaniya neteweya Kurd di warê siyasî, civakî, çandî, urf û adet û dînî de, serektirîn an yek ji serektirîn danerên bingeha dîroka vê rîveberiyê bûye. Nimûneyên balkêş ên vê şaristaniya kevn ên wekî Gûtiyan, Loloziyan, Elamiyan, Hûriyan, Madan, Eşkaniyan, Sasaniyan, Şedadiyan, Eyûbiyan, Zendan, Biraxoyiyan û mîrnişînên sedsalên dawiyê belgenexwestiyêñ vê rastiyê ne.

Şaristaniyêñ kevn tesîra bi vî awayî bêguman divê kelepûr/bermayî, mîratêñ siyasî, coxrafî, çandî, civakî, zanistî, edebî û urf û adetî bi cih hiştibin ku neviyêñ piştî wan jê sûdmend bin û pê şanaziyê bikin.

---

<sup>1</sup> Mîr Gulxan Nesîr, Mêjûy Beluçîstan, cilda yekem û duyem, çapa Qelat Peylîşerzê, Kwête, 1993, pêşgotin Xews Bexş Bizinco, rûp: 1.

Dîrok li vir, bi taybetî dîroka nivîskî, yek ji wasiteya sereke ya qeydkirina kelepûrên şaristaniyê ye. Kelepûrên şaristaniya Kurdan jî bêguman divê bi vê perspektîvê ve cihê pençeyê wê bixuyê.

Di warê qeydên nivîskî yên dîrok û şaristaniya neteweya Kurd de em dikarin behsa navê komek kelepûrên balkêş bikin. Awesta û Dînkurd du kitêbên giranbuha yên dînî yên bi Kurdî hatine nasîn in. Teng Gilo yê bi navê Şingulê hatiye nasîn, di sala 700‘ê beriya zayînê de bi Kurdî kitêbek li ser dîn û stêrnasiyê nivîsiye. Aryate bizişkekî Kurd ê bi nav û deng bûye di sala 668‘ê beriya zayînê de li ser zanista bizişkiyê bi rênivîsa Kurdî nivîsiye. Ev kitêb tenê beriya hatina dinyayê ya Mesîh û Îslamê hatine nivîsandin, em dikarin behsa navê Awesta, Dînkurd, Bendhisen, Datistan Dînîk, Artay Wêrafname, Karnameya Erdeşêrê Babekan, Padkar (Yadgarê Zerîran), Dastan Rîdk, Xesro Giwatan û Xutayê Name bikin.<sup>2</sup> Cihê ecêbiyê ye ji bilî tek tûkan, ev û kelepûlên nivîskî yên kevn bi giştî ji nav çûne yan ne li ber dest in.

Ji ber wê, di vê girêdanê de, peydakirina kitêba “Kurdgalnamek”ê ku di sala 1659‘ê zayînî de ji aliyê Kurdekî Zengene yê Beluçî ve hatiye nivîsandin, xezîne û şahkareke dîrokî ya bi qîmet û mezin e ku (valatiya) dîroka Kurd û Beluçan tijî dike.

### Girîngiya Kurdgalnamekê

Kurdgalnamek ji bilî tîşk kiriye ser peydabûna neteweya Kurd li Kurdistanê û avabûna dewleta Medyayê, bi dirêjî behsa Beluçîyan dike ku bi eslê xwe Kurd in û bingeha wan diçe ser Kurdên Madê û piştre çawan ji Kurdên Madê hatine qutkirin.

Kurdgalnamek behs dike dema ku Keyqubadê paşayê mezin ê Kurdê Madan di sala 853‘yê beriya zayînê de bingeha dewleta Kurdan a Madî danî û piştre bi Efrasiyabê paşayê Tûranê re dest bi şer kir, Kurdên Beluçî bi piştgiriya

---

<sup>2</sup> Ferhenga Baban, Şukrulayê Baban, 1361‘ê koçî, rûp: 7-8.

Keyqubad li dijî Efrasiyab şer kirin. Piştî şikandina Efrasiyab û dagirkirina navçeyên selteneta Tûranê, Keyqubad Kurdên Beluçî li navçeyên hatine dagirkirin, yanî Beluçistana vê serdemê ku dikeve rojhilate selteneta Madê bi cih kirin.

Kurdên Beluçî ku destpêkê wek Kurdên Madê û li gel şertên serdemê bi navê Beluç û Birahuyî (Biraxoyî) hatin nasîn, venegeriyan ser erdê bav û bapîrên xwe Kurdistana kevn (Medya) û li navçeyên Beluçistana vê serdemê bi cih bûn.

Kurdgalnamek bi dirêjî tîşk dike ser bingeha Kurdên Beluçî û li nişîngeha wan a nû behsa dîroka siyasî, civakî, ziman, dîn, urf û adet, rêexistina leşkerî, awayê hozî (eşiretî) û pîseya wan dike. Behsa peywendî û helwêsta Kurdên Beluçî bi fermanrewayên serdemên cihê cihê yên Madan, Hexameniyan, Yûnaniyan, Aşkaniyan, Sasaniyan, Hindîyan û İslamiyan dike.

Her çend hevnijadên Kurd û Beluçî di çavkaniyên kevn ên gerokên İslâmê yên sedsala 10 û 11'an ên zayînî de işaret pê kirine û di sedsala 19 û 20'emin de komek lêkolînerên biyanî û xwemalî yên Beluç di perav û lêkolînên xwe de işaret bi hevnijadiya Kurd û Beluçan kirine lê Kurdgalnamek yekem çavkaniya bawerpêkirî ya dîrokî ye ku bi awayekî têr û tijî li ser vê babeta dîrokî sekiniye û awayê qutbûna Kurdên Beluçî ji Kurdên Madan ronî dike.

Di warê Kurdnasiyê de ev behs û xeberên dîrokî nediyar bûn û di nivîsên dîrokî yên Kurdî de işaret bi wê nehatibû kirin, ji ber wê em spasdarên Şerefşanê Bedlîsî ne ji bo nivîsandina Şerefnameyê û parastina dîroka neteweya Kurd; bi eynî awayî divê em spasdarê Axwend Mihemed Salih bin ji bo nivîsandina Kurd Gelnamekê û parastina dîroka Kurd û Beluçîyan.

### **Peydakirina Kurdgalnamekê**

Kitêba Kurd Gelnamekê piştî wê dête berhem, di nav Beluçîyan de pişt bi pişt hatiye parastin. Dîroknivîsê Beluç

seyda Mîr Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç, di sala 1943'yan de, dema ku li ser pileya mîrî ya cihgirê bacgir di hikûmeta Qelatê ya Beluçistanê de li bajarokê Sorabê kar dikir, li ba Qazî Ebdulhemîd ê bi navê Qazî Xews Bexş cara yekê destnivîsa Kurd Galekê dîtiye. Ji ber girîngiya destnivîse Mîr Nesîrxan ji Qazî dixwaze ku destnivîse bide wî. Lê bêfeyde dibe û wê wextê makîneya fotokopiyê tune bûye, ji ber wê ji neçarî destnivîseke din ji ber dinivîse.

Mîr Nesîrxan piştre li ser Kurdgalnamekê lêkolîn kiriye û netîceya lêkolîna xwe di pêveka kitêba bi qîmet a dîroka heşt cild a bi navê "Dîroka Beluç û Beluçîstan"ê de diweşîne. Yekem cilda vê kitêbê di sala 1988'an de li Kiwêteya paytexta Beluçîstana Pakistanê tê weşandin. Min jî ev ji cilda yekem a vê kitêbê wergerandiye Kurdî û bi kurtelêkolîneke xwe ya li ser hevnijada Kurd û Beluçan di sala 2005'an de, bi rêya dezgeha Çap û Weşanên Arasê li Hewlîrê weşandiye.

Mîr Nesîrxan piştre teksta Farisi ya Kurdgalnamekê cara yekem di sala 1991'an de bi alîkariya "Beluçî Akademî"yê (Akademiya Beluçî) li Kiwêtê weşandiye. Piştî weşandina Kurdgalnamekê, Prof. Ebdula Can Cemaledîn û Prof. Nadir Kemberanî Kurdgalnamek wergerandin ser zimanê Urdûyî û di sala 1994'an de ji aliyê Beluç Akademiyê ve hat weşandin.

### **Nivîskarê Kurdgalnamekê Axwend Mihemed Salih Zengene**

Axwend Mihemed Salih Zengene, kitêba Kurdgalnamekê di sala 1070'yê k./1659-1660'ê zayînî de nivîsiye. Her wekî Axwend di destpêka kitêbê de di behsa Xwendegehêن Îslamê de işaretê pê dike, kitêba Kurd Galname bi alîkariya çendîn çavkaniyêن dîrokî nivîsandiye ku kitêbên kitêbxaneya xwendegehêن Îslamê eslê wan li Zerenca paytexta Zabilistanê (Sîstan) hatibûn parastin û ji birîn û talana Teymûrê Leng hatibûn rizgarkirin. Teymûrê Leng di sala 1383'yê zayînî de êrîş biribû ser Zerencê û ew dagir kiribû.

Axwend di sala 1659<sup>ê</sup> z. de di der barê Mîrnişîna Biraxoyî de li Qelata paytexta Beluçistanê ya di serdema fermanrewatiya Altazê Duyem de wekî karbidestê mîr dest bi kar dike. Piştre ji bo meqamê wezîrê mezin tê bilindkirin û li ser vî meqamî ji pênc fermanrewayên Beluçê re kar dike.

Axwend kesekî bi helwest, kirdar û dilsoz bûye û fermanrewayên Beluçê rêzeke mezin lê girtine. Tê gotin di serdema fermanrewaya Qelatê de, du birayên ji desthilatdariya Kelhûriyên Sindê ji aliyê Semender Birohî ve tên girtin û Semender Birohî fermaña kuştina wan dide. Wê wextê Axwendê wezîrê Semender Birohî destara (cemedanî, mêzer) serê xwe tîne xwarê û datîne serê herdu birayên girtî da ku Semender Birohî wan efû bike. Di eynî wextê de Axwend ji Semender Birohî re dibêje, kuştina girtiyan ji bo paşa ne baş e, eger tu vî cezayî bidî wan lekeyeke nehez dikeve ser hikûmeta Beluçian. Semender Birohî jî ku rêzeke mezin ji Axwend re hebûye, bi gotina wî dike û fermaña kuştina wan paşve dikêşe.<sup>3</sup>

Axwend kesekî bêtirs û mîrxas bûye û li ba fermanrewayên Beluçian xwediyyê cihê baweriyeke zêde bûye. Tê gotin di şerê Xanpûrê yê Ebdula Xanê mîrê Qelata Beluçistanê yê li hemberî Kelhûriyan de, ji ber kîmbûna leşkerên xwe li hemberî leşkerên dijmin xwe destgirêdayî dibîne û di serkevtinê de dudil dibe. Wê wextê Axwend Mihemed Salih pê re ye, jê re dibêje ku kurê wî yê biçûk bi xwe re bibe û wî biparêze ku hakim û fermanrewatiya Beluçian dom bike û welatê wan ji destê wan dernekeve. Lê Axwend bersiva wî dide û jê re dibêje, min di hevkarîkirina mezinê xwe Ebdula Xan de canê xwe fedâ kiriye, ez naçim. Lê wê wextê Ebdula Xan û serdarên din jê re dibêjin, eger ew Mihemed Xanê kurê Ebdula Xan nebe û neke hakim, desthilat di destê Beluçian de namîne. Axwend neçar dibe kur dibe û datîne ser textê Qelatê. Ebdula Xan jî di

---

<sup>3</sup> Tarîx Sinde, cilda şeşem, serdema Kelhûre, beşa duyem, Xulam Resûl “Mehr” bordî edeba Sindehî, çapa yekem, 1958, rûp: 260-263.

wî şerî de şehîd dibe.<sup>4</sup>

Di dawiyê de, ez hêvîdar im wergera Kurdgalnamekê bibe sebebê lêkolînan û di pêdeçûna zêdetir li ser peywendiya hevnijadên Kurd û Beluç û hişyariya neteweyî û dîroka zêdetir di navbera Kurd û Beluciyân de.

Li vir pêwîst e ez spasê şair û seydayê Afxanî birêz Nesîbê Ekrem bikim ku ji bo ronîkirina çendîn bêjeyên nav teksta Farisî ya Kurdgalnamekê alîkariya min kir. Her wiha spas û pêzanîna birêz kak Bedran Ehmed Hebîb jî dikim, ku bi germî bi dengê min ve hat û Kurdgalnamek weşand. Ez niha di Zanîngeha Kwinzelandê de mijûlî xwendina masterê ya hiqûqê me.

*Hîwa Mihemed Zendî*

*Birizbin, Avûstiralya -1/7/2011*

---

<sup>4</sup> Tarîx Sinde, cilda şeşem, serdema Kelhûre, beşa duyem, Xulam Resûl “Mehr”, bordî edeba Sindehî, Keraçî, çapa yekem, 1958, rûp: 395-396.

## **KURTIYA GOTARA SEYDAYÊ CEMAL NEBEZ LI SER KURDGALNAMEKÊ**

### **Kurdgelnamek | Dîtina Destnivîsa Çavkaniyeke Gelek Girîng Ji Bo Dîroka Kurd û Beluçîyan**

Çar sed sal beriya niha Şeref Xanê Bedlîsî nivîsandina Şerefnameyê temam kiriye, bi wê berhemeke girîng li ser dîroka neteweya Kurd pêşkêşî cîhanê kiriye. Vêca eger Şerefname wek çavkaniyeke gelek girîng a dîrokê hatiye nasîn, bêguman girîngiya Kurd Gelnamekê ji Şerefnameyê ne kêmter e. Destnivîsa Kurdgalnamekê di van salên dawiyê de li Beluçistana Pakistanê hatiye dîtin. Venivîsa Axwend Mihemed Salih Zengenevê Kurdê Beluç bûye, di sala 1070'yê k./1659-1660'ê z. de hatiye nivîsandin.

Li gor vî dîroknivîsî, bingeh û eslê Beluçîyan Kurd e. Nivîskar behsa pismamtiya xwe bi Hoza Biraxoyî re dike û Hoza Zengene jî beşek ji Hoza Bûdî hesêb dike. Herdu hozan jî neviyên du kurên Bûd [Biraxom] û Zengan dinivîse û dibêje, Bûd heftemîn kurê mîrê Madê Kurd bûye.

Axwend Mihemed Salih Zengene dûr û dirêj behsa hozên Kurd ên Belucistanê dike û dibêje, Beluçî Kurd bûn û ji Kurdistanê çûne Beluçistana kevn ku wê wextê navê wê Tûran û Mekran bûye û li wir bi cih bûne. Ev jî di sala 853'yê beriya zayînê de bûye. Her wiha dibêje: Dema ku serokê Kurdên Mad Keyqubad împaratoriya xwe li welatê Medyayê û Parsê damezirand û li ser Afrasiyayê paşayê dewleta Tûranê hakim bû, vêca Keyqubad êrîşî Belxê kiriye û Kurdên Biraxoyî û Edre-

ganê yên herêma Tûran û Mekranyayê girtine. Piştre navê van herêman bûye Beluçistan û navê xelkê wê jî Beluç.

Axa Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç, kevnnewezîrê hikûme-ta Beluçistana Pakistanê, di van dawîyan de ji bo vê berhemâ hêja pêşgotinek nivîsandiye û behsa wê yekê kiriye ku Kurd-galnamek ronahiyeke bi hêz arasteyî dîroka Beluçistanê kiriye û bûye sebebê hildana wan tem û mijên li ser dîroka Biraxoyê û Beluçistanê yên ji aliyê Denys Brayê rojhilatnasê Brîtanyayê ve hatine weşandin. Nesîrxan seydayê ziman û çanda Beluçistanê di Zanîngeha Beluçistana Pakistanê de ye. Hêjayî gotinê ye ku eynî vî nivîskarî, Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç, kitêbeke bi qîmet bi navê Dîroka Beluç û Beluçistanê bi zimanê Urdûyî nivîsiye û li ber ronahiya Kurd Galnameyê û Dîroka Kurd û Kurdistanê ya seydayê Merdoxî Kurdistanî behsa Beluç û welatê Beluçistanê kiriye. Xwendekarekî Kurd ê xwendegeha navendî ya Rewelpendê ya Pakistanê ku navê wî Hîva Mihemed Zend e ev kitêb kiriye Kurdiyeke gelek spehî û rewan. Birêz Hîwa Zendî wergera xwe ji bo lénêrînê ji min re şandiye, ku bi rastî ne pêwîstî destlêdanê ye. Min jî di dema konferansa li ser Şerefnameyê ya di 1-2/5/1998'an de li Berlinê hat çêkirin de, behsa wê wergerê û Kurd Gelnameyê kir... Her wiha ez ji bo wê xizmeta mezin a ku kiriye spasê Hîwa Mihemed Zend dikim, hêviya min ew e hewl û têkoşîna rewşenbîrî ya Kurdan a di rêya xizmeta dîrok û çanda neteweya Kurd de serkeftî be.

Cemal Nebez  
Mehnameya Seko  
Hejmar 20, Hezîran 1998

## KURTIYA PÊŞGOTINA BIRÊZ NESÎRXAN EHMED ZEYÎ BELUÇ JI BO KURDGALNAMEKÊ

Kurdgalname kitêbeke dîrokê ye ku Axwend Mihemed Salih Kurdî Zengene yê Beluç bi Farisî di sala 1070‘yê k./1659‘ê z. de nivîsiye. Kesê ku navê wî derbas dibe di beşa yekem a kitêbê de behsa eslê xwe dike ku ji hoza Kurd a Zengene ye û Zengene jî ji tîreke hoza Bûdî ye. Her wiha pismamtiya xwe bi Kurdên Biraxoyî re nîşan daye ku ev herdu tîre neviyên du kurên Bûd, Biraxom û Zengan in. Bûd bi xwe heftemîn kurê Mîr Mad Kurd e.

Ev kitêb behsa dîroka Beluçîyan dike ku di hêla nijad de Kurd in, lê di dawiyê de, ji ber sebebêni nîşana eskerî ku “taca dîkê” bû û di zimanê Farisiya kevn û Kurdî de jê re “Beluç” tê gotin, bi navê “Beluç” hatin nasîn.

Li gor Kurdgalnamekê, Kurdên Beluçî di sala 853‘yê berriya zayînê de hatine nav erdê Beluçistana kevn, Tûran û Mekranê. Ew jî di wextekî de bûye ku Keyqubad mîrê Madê ye, Kurdan li Mad û Farsê bingeha selteneta xwe damezirandin û Efrasya û paşayê selteneta Tûranê şikandin.

Selteneta Tûranê ji van pênc navçeyan pêk hatiye: Suxdistan (erdê naverasta Asyayê: Ozbekistan, Tacikistan, Kirgizistan û Turkmenistan), Kabilistan, Zabilistan (Afganîstana niha) û Tûran û Mekran (Beluçistana niha).

Dema ku Keyqubad Paşa ji bakur ve êrîşî ser Beluçê kir, paytexta seltenetê Tûranê, eskerên Kurdên Beluçên Biraxoyî û Edreganî di bin ferманa wî de êrîşî ser Tûranê (bilindahiyê Qelatê) û Mekranê kirin û ev navçe dagir kir. Piştî dagirkiri-

na navçeyênen selteneta Tûranê, Keyqubad Paşa yê Kurdê Madê navçeyênen awa awa yên dagirkirî di navbera deste û hozan de parve kir. Bi vî awayî, navçeya Tûranê (bilindahiyênen Qelatê) li ber Kurdê Biraxoyî ket û navçeya Mekranê jî li ber Kurdê Edreganiyê ket. Ev desteyênen hozan li navçeyênen ji wan re hatin bexişandin bi awayekî timî bi cih bûn û wê wextê Kurdê Zengene jî Zabilistan (Afganîstana niha) dagir kirin û ew kirin niştegeha xwe ya heta bi hetayî.

Bapîrênen nivîskarê Kurgalnamekê fermanrewayênen Zabilistanê bûne û piştî derketina İslamiyetê bapîrekî şikurdarî di serdema desthilatdariya xelîfeyênen benî Ebas de li Zerenca paytexta Zabilstanê xwendegeheke dînî damezirandiye. Ev xwendegeh piştî hilweşîna serdema fermanrewatiya xelîfeyênen benî Ebas û bi geşbûna hêzên Moxoliyan bi taybetî di şerê dagirkeriya Mîr Teymûr Gurganî yê di sala 1383'ye zayînî de hat wêrankirin. Di netîceya vê karesatê de, her çend malbatâ nivîskar ji desthilatê ket, lê endamên malbatê dest ji pîşeya zanistiyê bernedan. Ji ber wê nivîskar bi çend xwendekarênen hevalên xwe re bi mebesta bidestxistina xwendina bilind diçe Şîrazê û piştî temamkirina xwendina xwe vedigerin Zabilê niştegeha bapîrênen xwe.

Di wê serdemê de, tîreya Mîrwanî ya Beluçî li navçeya Tûranê (bilindahiyênen Qelatê) di sala 1410'ê zayînî de di bin serekatiya Mîr Mîro Mîrwanê mîrê mezin ê Kurdê Beluçî de fermanrewatiya çarem a Beluçîyan ava kiribû. Di dema nivîsandina kitêba Axwend Mihemed Salih de, ev hikûmeta Beluç bi rêberiya Mîr Ehmedê Mezin (1666-1695) ku pazdehem cihnişînê Mîr Mîro Mîrwanî bû, gihîştibû kopa serkeftina xwe.

Axwend Mihemed Salih Kurdê Beluçî bû û her ji ber vê yekê jî hat keleha paytexta Beluçistanê û di sala 1659'ê zayînî de li ser kelehê rûnişt û bû karmendê Mîr Eltaziyê Duyem ê bavê Ehmedê Mezin. Axwend Mihemed Salih ku ji bili zanayekî payebilind bû, xwediyê kesayetiyelekî hûrgilî ya mezin, bi tedbîr û siyasetmedar bû. Piştî çend salan karkirinê, Ehmedê Mezin li ser meqamê wezîrtiya bilind dan rûniştandin û

rawêjkariya pênc fermanrewayê Kurdên Biraxoyî yên Beluçî kir ku navê wan bi vî awayî bû: Ehmedê Mezin, Mihrab Sermiçar, Semender Sexî, Ehmed Parsa û Ebdula Weqab Kuhî. Axwend Mihemed Salih piştre bê kur koça dawîn kir, ji ber wê kurê mamê wî, Axwend Mihemed Heyatê kurê Axwend Şahdad bû cihnişinê wî.

Axwend Mihemed Salih serpêhatiya dîroka girîng û cihê rîzê ya Kurdên Beluçî yên Beluçistana kevn kir ber behsê ku di der barê wê de heta niha kesek agahdar nebû û di tariya dîrokê de wenda bûbû.

Ji ber wê, di dinyaya dîrokê de dîtina destnivîsa Kurdgâl-namekê di rastiyê de xwediyyê qîmeteke taybet e.

Eger destnivîsa kitêbê nehatibûya dîtin, piraniya rastiyê dîroka Beluçistanê veşartî diman. Gelek bûyerên dîrokî ku Axwend Mihemed Salih di kitêbê de behs kiriye, gelek balkêş in û piştî wî lêkolînerên dîroka cîhana nû ew piştrast kirine. Nimûneyên vê piştrastkirinê wekî xalên jêrê ne:

**Yekem:** Axwend bi dirêjî behsa bûyerên şerê Beluçîyan bi eskerên Îskenderê Mezin re dike ku dema ber bi welatê xwe ve vedigeriyan û di xwarê Beluçistanê re derbas dibûn. Dema ku Îngilîzan Beluçistan dagir kirin, efserên siyâsi li ser parêz-gehêن Belucistanê ferhengoka coxrafayayê nivîsandin. Di vê navê re nivîskarê ferhengoka coxrafayayê Lesibêle A. R. Heyes Buler İ. S. C., di beşa dîrokê de babeta Axwend Mihemed Salih a di warê şerê Beluçîyan ê bi Îskenderê Mezin re piştrast dike.

Dirêjiya behsa ferhengoka coxrafayayê bi vî awayî ye: “Nerçis eskerên xwe li vir bi cih kirin û di vê beşa welat de Lewnatus karibû Orîtiyan û hevkarên wan di şerekî mezin de bişikîne ku tê de şes hezar kes ji hozan hatin kuştin. Piştî vê serkeftinê, Îskenderê Mezin li vir urf û adetê taca zérîn ê danîna serê Lewnatus meşand.”<sup>5</sup> Herdu neqilker tenê li ser xalekê li hev nakin ku ew jî hejmara kuştiyên hozan ên di meydana şer de ne. Li gor Axwend Mihemed Salih di vî şerî de deh hezar

<sup>5</sup> Ferhengoka Coxrafayayê ya Lesibêle, rûp: 219

şervanêñ Kurdêñ Beluç têñ kuştin, lê dîroknivîsêñ Îskender hejmara kuştiyêñ hozêñ Ortiyan wek şeş hezar neqil dikan.

**Duyem:** Di destnivîsa dîrokê ya Axwend Mihemed Salih de behsa bingeha mîrêñ van heyşt tîreyêñ Kurd ên Biraxoyêñ Beluçî kiriye: Kîkanî, Goranî, Sarûnî, Xuzdarî, Mişkanî, Ermîlî, Bolanî û Girîşkanî. Di navçeya Tûranê (bilindahiyêñ Qelatê) de niha jî çiya, gir, gelî, rûbar, gund û bajarêñ wisan hene ku her bi wan navan têñ nasîn ku di bingeha mîran de behs hatiye kirin. Her bi vî awayî, di navçeya Mekranê de jî çiya, gir, gelî, rûbar, gund û bajarêñ wisan hene ku heta niha jî bi wan navan têñ nasîn ku di bingeha mîrêñ Kurdêñ Beluçî yên hozêñ Edrekanî, Mamilî û Kirmanî de behsa wan hatiye kirin. Beriya dîtina Kurdgalnameyê ew nav ji me re çîrok bûn, ji ber wê em spasdarê Axwend Mihemed Salih in ku ev mesele ji me re ronî kiriye.

**Sêyem:** Kurdgalname ronahiya zêde kiriye ser peywendiyêñ civakî, siyasî û aborî yên di navbera rûniştiyêñ Beluçistanê û Sindê de ku di vî warî de zana bi giştî bêagah bûn. Axwend bi dirêjahî behsa van sê deste hozêñ Sindê dike: Binyan, Takîn û Mûmîdanê. Ew zanyariyêñ Axwend behs kirine di warê dîrokî de bi radeyeke zêde rast in û durist in. Ji ber wê, hemû dîroknivîsêñ serdema dawîn ên Sindê, ji wan Elî Kufiyê nivîskarê Çeçnameyê, Mîr Me'sûmê nivîskarê Mêjûy/Dîroka Me'sûmî û Mîr Şêr Qani'ê Tehtehoyiyê nivîskarê Tohfetul-Keram di perawêñ dîrokê de van sê deste hozêñ Sindê rûniştiyêñ eslî yên Sindê dane nasîn.

**Çarem:** Li Beluçistanê karmendekî siyasî yê Îngilîz Denys Bray ku di midetê karê xwe de çar salan li Beluçistanê maye û bi çavdêriyeke serbestane lêkolîn li ser zimanê Birahuyî (Biraxoyî) kiriye. Ew di pêşgotina kitêba xwe de wiha dibêje: Pê-nase, rêziman û hevoksaziya zimanê Birahuyî... Birahuyî kî ne û kengî hatine Beluçistanê, ev ew awa pirs in ku em heta niha çaverêya bersiva wan in. Di rastiyê de dûrkirina ji ber bi şaşiyê

ve çûna Denys Bray li ser bingeha nijada hozên Birahuyan û zimanê wan vedigere li karnameya bilind a nivîskarê Dîroka Merdox a Şêx Mihemed Merdox Kurdistanî û nivîskarê Kurdgalnameyê Axwend Mihemed Salih ê Kurdê Beluçî Zengene.

... Ji ber wê em ji radeyê der spasdarên Şêx Mihemed Merdox Kurdistanî yê nivîskarê Dîroka Merdox û Axwend Mihemed Salih ê nivîskarê Kurtdgalnameyê ne ku perdeya tarî ji ser vê astenga dîrokê ya girîng hildan ku lêkolînerên dîrokê ji ber wê perîşan bûn.

Ji ber wê bi hebûna van herdu belgeyên dîrokî em di qonaxekê de ne ku bi rastî bizanin hozên Biraxoyî (Birahwî) kî ne û ji ku hatine ser erdê Beluçistana niha û bi çi awayî ev desteya mezin a nijada Beluç di vê dema dûr û dirêj de bi navê Biraxoyî Beluç hatine naskirin û hatine meydanê.

Li gor vî nivîskarî, Kurdên Biraxoyê Beluçî ku navçeya Tûranê, selteneta Tûranê dagir kirin, li vê navçeyê ji serdema destpêkê ya damezirandina selteneta Tûraniyan ve 22 hozên Tirk li wê navçeyê bi cih bûn û serî li ber mîrên Biraxoyî yê Beluçiyê biserketî dananîn.

Bi vî awayî, Kurdên Biraxoyî yê Beluçî û hozên Tirk tevlihev bûn û ji ber wê ji zimanê tirkî di netîceya tesîra zimanê Beluçî de awayê îro yê zimanê Birahuyî derket.

Ev xal dîroka girîng a destnivîsa Kurtdgalnameyê ye ku em bi mebesta bala xwendevanan bikêşin behs dikan.

*Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç  
18 Şeqamê Serbab, Kiwête.*

*Tarîx 27/8/1991*



## PÊŞGOTINA NADIR QEMBERANÎ JI BO KURDGALNAMEKÊ<sup>6</sup>

### Dîtina Dîrokeke Nû

Kurdgalname her çend nêzikî 400 sal beriya niha hatiye nivîsandin, van demên dawîn hatiye dîtin û dîtina vê çavkaniyê ji bo Beluçistanê û neteweya Beluçî ji gencîneyeke giranbuha ne kêmîtir e.

Vê kitêba li ser dîroka neteweya Beluç deriyekî nû ji bo hûrbûn û bîrlêkirina li pêşıya lêkolînerên xwendekarên dîrokê vekiriye. Heta niha dîrokñas û lêkolîneran dîroka Beluçistanê

---

<sup>6</sup> Piştî teksta Kurdgalmameyê ya Farisî li bajarê Kiwêta Beluçistana Pakistanê hat çapkîrin, Prof. Ebdula Cemaledîn erka wergera li ser zimanê Urdûyî girt ser milê xwe. Ji ber ku Beluçiyêن Pakistanê bi giştî bi Farisî nizanîn ku bikaribin vê kitêba héja bixwînin û dîrok û boriya neteweya xwe fehm bikin. Mixabin di esnayê wergerandinê de nexwêş dikeve û daxwaz ji Prof. Nadir Qemberiyanî dike ku karê wergera kitêbê temam bike. Ev babeta jorê kurtiya wê pêşgotina seydayê Nadir Qemberiyanî ye ku ji bo çapa Urdûyî ya Kurdgalmameyê nivîsandibû. Ez xwedîyê wê xwesbextiyê bûm ku di sala 1996'an de, di esnayê sefera xwe ya Kiwêtê ya ji bo dîtina seydayê Mîr Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç ê nivîskarê Dîroka Beluç û Beluçistanê de, ji nêzik ve bibînim. Hêjayî gotinê ye seydayê Nadir kesekî gelek rûgeş û dilsoz e. Wê wextê li Zanîngeha Beluçistanê li Kiwêtê serekê beşa zimanê Farisî bû û ders dida xwendekarên masterê yên zimanê Farisî. Ji bilî vana, seydayê Nadir kesekî xebatker jî bû û gelek caran li ser xebata azadîxwazîn Beluçî hatibû zindankîrin û demekê jî dûr xistibûn û şandibûn Afganistanê. Li gor wî ew ji hoza Kemberanî (Qemberanî) ye, ew jî ji neviyêن Kurdêñ Biraxoyî ne (wergerê).

û neteweya Beluçistanê bi neteweyên çarçoveya wan biçûk ve girêdane ku ev jî bi serê xwe hewl û xebateke bê ber û bê netice bûye. Lê vê kitêbê arasteya lêgerîna dîroka Beluçistanê û neteweya Beluçî ber bi naverasta Asyayê û neteweyên Îranê ve vegerandiye ku bêguman rê û arasteyeke rast û durist e. Ji ber peywendiya Beluç û Kurdan bi yek nijadê ve heye û di serdemekê de ji hev hatine qutkirin û yek jê li rojhilat û ya din jî li rojavayê, heta li bakurê rojavayê ava bûne. Ev herdu netewe ji nijada Arî ne, lê li gor neteweyên Arî yên din nêzikahiya di navbera wan de gelek zêdetir e.

Neteweya Beluç li navçeya rojhilate yanî Sîstan, Zabil û Beluçistana niha ku ji Kirmanê heta kenarên rojavayê rûbarê Sindê digire belav bûye û ji ber kewşenê siyasî yê coxrafya Pakistan, Îran û Afganîstanê ji hev cihê cihê dijîn. Ev jî di demekê de ku di warê dîrok, ziman û çandê de ji yek neteweyê ne. Her bi vî awayî neteweya Kurd jî li rojavayê Asyayê li Sûriye, Îraq, Îran û Tirkiyeyê ji ber sînorên siyasî û coxrafayê ji hev cihê cihê dijîn û perş û belav bûne.

Li gor Kurdgalnameyê Belucî jî beşek ji neteweya mezin a Kurd in, ji ber ew hozên di nav Beluçîyan de hene bi heman awayî di nav Kurdan de jî bi heman navî hene û heta di nav Beluçiyêniha de hozeke mezin heye navê wê “Kurd” e. Her çend Axwend Mihemed Salih 400 sal beriya niha ev kitêb nivîsiye jî, hemû ew karesat û bûyerên dîroka Asyaya Navîn û Îranê wekî eslê wan nivîsiye û tu cihêtiyek tê de nayê dîtin.

Kurdgalname ji aliyê Axa Mîr Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç ve nû hatiye dîtin û akademîsyenên Beluçî tekstên wê yên Farisi weşandine.

Cihê balkêşiyê ye ku li ser dîroka neteweya Beluç heta niha gelek kitêb hatine weşandin, lê hemû bi piranî yên heyî û pîvan in. Dîroknivîsên me jî bi piranî berhemên dîroknivîsên rojavayê bi bawerpêkirî lê nêrîne û kirine bingeha lêkolînên xwe. Heta niha her çend dîroka li ser neteweya Beluçî

hatibe nivîsandin, li ser çavge û çavkanîgirtina Beluçan hîç zanyariyeke bi vî awayî bi dest neketiye ku têhniya xwendevan û xwendekarêن dîrokê bişikîne. Helbet, dîtina Kurdgalnameyê arasteyeke nû ya lêkolînê anije meydanê. Îdî dîroknivîs û xwendekarêن dîrokê dikarin bingeh û xîmê dîroka kevn a Asyaya Navîn û Îranê û di warê neteweya Beluç de rastiyêن bawerpêkirî zêdetir bi dest bixin.

*Nadir Qemberanî*

*Zanîngeha Beluçistanê, Kiwête*

*6 Oktobra 1993*



## PÊŞGOTINA KURMANCIYA WÊ

Gelek dîrokzan û dîroknas bi van çend gotinan dirokê tarîf dikan: “Dîrok, şehê maziyê û eynika pêşerojê ye.” Belê tarîf û ïzaheke kurt lê tijî, dagirtî, rast û di cihê xwe de.

Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî bê şik di xebata dîroka Kurd û Kurdistanê de xwediyyê cihekî girîng e û em bi saya wê ji demeke dîroka xwe agahdar dibin.

Piştî wê xebata Mela Mehmûdê Bazîdî ya bi navê “Dîroka Kurdistanê” tê. Lê mixabin tenê pêşgotina jê re hatiye nivîsandin di destê me de heye. Kitêb heta niha jî hê wenda ye, em hêvî dikan ku rojekê bê dîtin û nehatibe îmhakirin. Qasî em ji wê pêşgotinê fehm dikan, wî jî xebata xwe ya ji bo dîroka Kurd û Kurdistanê ji wî cihê Şerefxan hiştiye (1597) dest pê kiriye û heta nîvê salên sedsala 19'ê (1850) aniye.

Xebateke din a gelek hêja û gelek bi qîmet, ev kitêba di destê we de ya bi navê “Kurdgalnamek” a dîroka kevn a Kurd û Beluçan e. Ev kitêb di sala 1659'an de ji aliyê dîroknivîsê Beluçî Axwend Mihemed Salih Zengene Beluç ve hatiye nivîsandin. Qasî em ji cilda yekem a kitêbê derdixin, ku ev kitêba di destê we de ye, wî ev xebata xwe ya li ser dîroka Kurd û Kurdistanê û Beluçîyan ji Medan dest pê kiriye û heta dewra çar xelîfeyên Îslamê aniye. Mixabin ji bo ku cilda duduyan a kitêbê di destê me de tune, em tiştekî di derbarê wê de nizanin. Lê mirov dikare texmîn bike ku ew ji piştî dewra çar xelîfeyên Îslamê heta sala nivîsandina vê kitêbê ya 1659'an e.

Belê, bi ser hemû van îmha, încar û xêyreta daxwaza bi temamî jiholêmalîna Kurdan ji aliyê dijminên wê yên kolonî-

liyalîst ve, em dibînin her roj li ser dîroka Kurdistanê çavkanîyên nû têr dîtin. Yek ji van çavkaniyan, wekî li jorê navê wê derbas bû, ev kitêba di destê we de ya bi navê “KURDGAL-NAMEK”ê ye. Wekî ez bawer im piştî xwendina wê hûn dê vê raya min parve bikin ku ev kitêb ji bo dîroka Kurd û Beluçîyan xezîneyeke bêemsal e.

Nivîskarê Kurdgalmamekê Axwend Mihemed Salih Zengene Beluç, eslê Beluçan digihîne Kurdan û li ser dewra dîroka Kurdên Beluçî yên dema Medî, Axamenşî, Yûnanî, Eşkanî, Sasanî û İslâmî disekine.

Di sala 1943'yan de yek ji rewşenbîrê Beluçî yê bi navê Mîr Nesirxan Ehmed Zeyî, ji bo berhevkirina bacê li ser navê hikûmetê diçe qezaya Sorabê ya Beluçistanê. Li wir di mala Qazî Ebdulhemîd de yê bi navê Qazî Xewsbexş jî tê nasîn, kitêba Kurdgalmamekê ya bi destxet dibîne. Kitêbê jê dixwaze lê ew nadê. Ew jî nusxeyekê li ber dinivîse û di sala 1988'an de li Quettaya paytexta Beluçistanê ya Pakistanê, ji herdu cildan cildeke wê bi navê “Dîroka Beluç û Beluçistanê” diweşîne. Di sala 1991'an de jî bi alîkariya Akademîsyenê Beluçî li paytexta Beluçistanê Quettayê Farisiya wê diweşîne. Di sala 1994'an de jî bi zimanê Urdûyî tê weşandin.

Piştire wergera Kurdiya Kurmanciya Xwarê/Soranî ya vê berhema hêja û bi qîmet di sala 2012'an de ji aliyê Hêwa Mihemed Zendî ve tê amadekirin û ji aliyê Weşanxaneya Arasê ve li Hewlêrê tê weşandin. Ev berhema niha ya bi Kurdiya Kurmanciya Jorê ya di destê we de min li ber vê wergera Kurdiya Kurmanciya Xwarê amade kiriye. Ez hêvîdar im wergera cilda duyem jî di demeke kurt de bê kirin û em wê jî bigihînin ber destê kesên di xema zanîna dîroka xwe de ne.

Ev cilda Kurdgalmamekê ji deh beşan pêk hatiye:

Beşa yekem: Ji destpêkê û Dewleta Medan, têkçûna wê, malbata Hexamenşîyan, danûstendina wan bi Medan re, têkçûna Hexamenşîyan, hatina Îskenderê Makedonî û perçebûna

desthilatdariya Îskender... pêk hatiye.

Beşa duyem: Li ser Mîrnişîna Kurdên Biraxoyî Li Tûranê ya Dewra Yekem e. Yanî ji demên Mîrêmîran Mîr Kîkan, Mîrêmîran Mîr Zurak, Mîrê Mîran Mîr Üştab, Mîrê Mîran Mîr Zigrîn, Mîrê Mîran Mîr Zîbar, Mîrê Mîran Mîr Biraxem, Mîrê Mîran Mîr Goran, Tîreyê Parsê û ji desteya Hexamenşîyan pêk tê.

Beşa sêyem: Li ser Mîrnişîna Kurdên Biraxoyî Li Tûranê ya Dewreya Duyem e. Ji dewreya Mîrêmîran Mîr Zırşan, Mîrê Mîran Mîr Zurakê Duyem, Mîrê Mîran Mîr Ercan, Mîrê Mîran Mîr Şamûz, Mîrê Mîran Biraxmê Duyem, Mîrê Mîran Mîr Sabûl, Mîrê Mîran Mîr Nûrgan, Mîrê Mîran Mîr Kiyanûş û Mîrê Mîran Mîr Kîkanê Duyem... pêk hatiye.

Beşa çarem: Sernav, Kurdên Beluçî Di Serdema Yûnanî û Hindîyan De ye. Ev jî ji êrişên Yûnaniyan li ser erdê Mad û Farsê, hatina Îskender li Hindê... girêdana navçeya Kîkanê bi Mîrnişîna Zabilistanê pêk tê.

Beşa pêncem: Di derqeşê Şaristaniyeta Kurdên Beluçî de ye. Ev jî ji dînêne Kurdên Beluçî, awayê avakirina perestgeha Arînê, urf û adetê Kurdên Beluçî, ziraet li ba Kurdên Beluçî, zimanê Kurdên Beluçî, sistema artêşa Kurdên Beluçî, sistema medenî/sîvîl a Kurdên Beluçî û mezra, gund û bajarêne Kurdan pêk tê.

Beşa şeşem: Eslê Kurdên Beluçî. Eslê Kurdên Biraxoyî yên Beluçî, paşatiya malbata Pîşdadiyan... peywendiyêni di navbera Kurdên Tûranê û Mekranê de... tê vegotin.

Beşa heftem: Kurdên Beluçî Di Serdema Paşayê Silukiyê Yûnanî De. Ev jî ji Pîşdadî, tîreyê Sindanê... Fermanrewa-yiya paşayê Silukiyê Yûnanî li Mad û Parsê... Sistema nû ya tîreyêne Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê... pêk tê.

Beşa heyştem: Kurdên Beluçî Di Serdema Eşkaniyan De. Eşkanî, peywendiyêni di navbera Kurdên Beluçî û paşayê

Eşkanî de, êrîşên Antiyakusê Sêyem li ser selteneta Eşkanî... Hatina Kurdên Beluçî ya nav erdê Tûran û Mekranê... Eslê tîreyên Kurdên Beluçî yên ji welat dûr... Fermanrewayên Kur-dên Beluçî li Tûran û Mekranê ya Dewreya Sêyem tê vegotin.

Beşa nehem: Kurdên Beluçî Di Serdema Sasaniyan De. Ev jî ji vegoinêñ di derheqê Sasanî... Manî û dînê Wî... Kuştina Manî... Şer bi Romayıyan re... Bingeha eslê Sakayiyêñ Sikistanê... Hatina Îmam Mezdek, guftûgoyêñ Mezdek bi pêşewayêñ Zerdeştiyan re... Qetlîama Mezdekiyan û Mezdek... Îşgalkirina welatê Tûran û Mekranê... Koça dawiyê ya Hz. Mihemedê peyamberê İslâmê û malavahiya Wî... pêk tê.

Beşa dehem: Kurdên Beluçî Di Serdema İslamiyetê De. Xîlafeta mîrê Misilmanan Ebûbekir, xîlafeta mîrê Misilmanan Omerê kurê Xetab... Êrîşa leşkerê İslâmê ya li ser Secistan û Mekranê... Xîlafeta mîrê Misilmanan Osmanê kurê 'Efan, şo-rişa xelkê Kabilistan û Zabilistanê... Xîlafeta mîrê Misilmanan Eliyê kurê ebî Talib... tê vegotin.

Di dawiya kitêbê de, wêneyêñ mîrên Mîrnişîna Kurdên Beluçî li Beluçîstanê û wêneyêñ kulturî hatine danîn.

Bi kurtî ew mijarêñ di Kurtdgalnamekê de li ser hatine sekinîn û nivîsandin ev in. Bi amadekirina vê berhema hêja ya bi Kurdiya Kurmanciya Jorê ez dilşad im û bi hêviya bibe alîkarî ji bo kesên li ser dîroka Kurd û Kurdistanê xebat dîkin û perspektîva me ya li ser dîroka me fireh bike.

Zîya Avci  
Stockholm 2018

# KURDGALNAMEK [KURDBÊJNAME]

❖❖

AXWEND MIHEMED SALIH ZENGENE BELUÇ



## **BEŞA YEKEM**

### **Destpêk**

Ez Axwend Salihê kurê Axwend Silêmanê kurê Axwend Mehmûdê kurê Axwend Mûsayê kurê Axwend Mubarekê kurê Axwend Ehmedê kurê Mistefayê kurê Leysê kurê Hebîbê kurê Xelefê kurê Qeyserê kurê Osmanê kurê Îlyasê kurê Omerê kurê Ye'qûbê kurê Îsayê kurê Sencerê kurê Behaurê kurê Şahbêgê kurê Melikê kurê Behmenê kurê Eybekê kurê Pûy Begê kurê Ehmedê kurê Senanê kurê Parisê kurê Sîracê kurê Birsanê kurê Cabirê kurê Mu'înê kurê Medanê kurê Hekemê kurê Başarê kurê Ehmedê kurê Abanê kurê Tûrabê kurê 'Ubeydê kurê Îsayê kurê Seîdê kurê Bekirê kurê Xelefê kurê Sewîdê kurê Ewramê kurê Tîrdadê kurê Beykerê kurê Şaganê kurê Seranê kurê Selemê kurê Girşabê kurê Kubadê kurê Resanê kurê Guderzê kurê Tîrdadê kurê Rostemê kurê Mihirdadê kurê Bûrakê kurê Şîrbozê kurê Behramê kurê Yezburkê kurê Rewanşêrê kurê Merdanê kurê Bedlisê kurê Mehranê kurê Bîsûtê kurê Şahmîrê kurê Nûzerê kurê Wendanê kurê Siyawuşê kurê Ferhadê kurê Bîdarê kurê Siyamekê kurê Nocehanê kurê Mehranê kurê Bûrganê kurê Kurengê kurê Îspîbûdê kurê Feyrûzê kurê Bersanê kurê Patakê kurê Bakîlê kurê Merzekê kurê Ferkê kurê Kazanê kurê Şiwankê kurê Zirkanê kurê Dîzeyê kurê Xanê kurê Bacelê kurê Manûyê kurê Hurmuzê kurê Sabûlê kurê Nedranê kurê Sewîdê kurê Ramînê kurê Rişwanê kurê Zaxuyê kurê Şûhanê kurê Zeynalê kurê Yazuyê kurê Kusadê kurê Gîlê kurê Rasînê kurê Başmanê kurê Arînê kurê Dilfanê kurê Seldûzê kurê Kulkê kurê Şibanê kurê Ezîzê kurê Tûrê kurê Zengeneyê kurê Bûdê kurê Madê kurê Cîgeyê kurê Agazê kurê Mengurê kurê

Kawirê kurê Kadê kurê Pazoyê kurê Sûbarê kurê Mîranê kurê Wanê kurê Gurekê kurê Şûhanê kurê Şikakê kurê Sencarê kurê Sasunê kurê Zaranê kurê Xoşnawê kurê Hekarê kurê Diracê kurê Zenganê kurê Rasinê kurê Çerkeşê kurê Madê Mezinê kurê Xuranê kurê Şûdê kurê Têrxanê kurê Pişderê kurê Bulgarê kurê Dexûyê kurê Sûrê kurê Rûdînê kurê Gîwerê kurê Arînê kurê Mîtanê kurê Buxazê kurê Kardakê kurê Xezerê kurê Turkê kurê Kumerê Kurdiyê Yafesê kurê Nûh silav lê bin, ji hoza Kurdên Zengeneyê me ku tîreyeke hoza “Bûdî” ye û di warê nijad de jî nêzikî Kurdên Biraxoyî me. Bapîrên mezin ên van herdu tîreyan “Bûd” e û hoza Bûdî jî yek ji wan heft tîreyêne hoza Madê ye. Du kurên Bûd ên navêne wan Biraxim û Zengan hebûn. Di destpêkê de neviyêne van herdu kurên Bûd bi navê tîreya Bûdî hatin naskirin lê piştre ji ber firehbûna berreyan tîreya Bûdê bi ser du tîreyêne mezin Biraxoyî û Zengeneyê ve hatin parvekirin.

Bêjerên<sup>7</sup> Kurd neqil dikin ku “Kurd” xelkek in di destpêkê de çend hezar sal beriya zayîna Mesîh, hatine wê navçeya ku ketiye xwarê “Ermenistan”ê û niha bi navê “Azerbaycan”ê tê nasîn. Ev navçe ji ber niştecihbûna wan di wê serdemê de bi navê “Mad” hat nasîn û nav û deng da. Piştre Kurd ji vir ber bi navçeyêne rojhilate, rojavayê û xwarê ve belav bûne û nişîngeha wan a niha ku ketiye xwarê Azerbaycanê bi navê “Kurdistan”ê tê nasîn. Bêjer li ser van nêrînan hevbîr in ku nişîngeha destpêkê ya Kurdan Asyaya Navîn bûye û ji wir hatine qeraxêne başûrê Deryaya Hezerê. Piştre ji wir jî hêdî hêdî bi rewşa serdemê re ber bi aliyê zincîra Çiyayêne Zagrosê ku ketiye xwarê Madê û ji aliyê rojhilate ve li navçeya Dîcleyê belav bûne û niştecih bûne.

Di destpêkê de peywendiyêne Kurdan beriya desthilatdariya Keyqubad û avabûna dewleta Madê, bi desthilatdariya

---

<sup>7</sup> Di teksta Farisî de “rawî” hatiye nivîsandin.

Sumer, Akad, Kilde, Asûr, Elamê û piştî vana jî bi Pîşdadiyan re çêbûye. Kurdên Mad piştî ji rojhilatê ber bi bakurê rojavayê Îranê ve koç kirin û li wan cihan bi cih bûn, ji sedsala 30'ê ya beriya zayînê heta der û dora sedsala 21'ê ya pêş zayînê, bi awayê deste deste jiyana xwe domandin. Her desteyek xwediye serekê xwe yê taybet bûye û bi giştî di şert û mercên nateba û paşvemayî de bûne. Her hozek li cihekî niştecih bûye û di bin desthilatdariya fermanrewayekî de jiyana xwe domandiye.

Dema ku malbata Pîşdadî li Madê û Parsê desthilata xwe pêk anî, peywendiyêñ Madên Kurd bi malbata wan re hebû û di bin desthilatdariya fermanrewayêñ wan de jiyana xwe didomandin. Lê di sedsala 9'ê ya beriya zayînê de, dema ku dawîn paşayê malbata Pîşdarî, Girşaspê kurê Üştabê kurê Tehmas-bê kurê Menûçehrê kurê Îrecê kurê Ferîdûnê kurê Epteyanê kurê Cemşîd koça dawiyê kir, êrîş û pêlên paşayêñ Asûrî li ser Madê û Parsê dest pê kirin. Desteyêñ Kurdên Mad li hemberî dewleta destdirêjker û şidetê ya Asûrî, neçar bûn ji bo parastina welatê xwe, selteneteke serbixwe damezirînin. Ji bo vê mebestê, serek û serdarêñ Mada Mezin û Mada Biçûk û Kurdên Parsê, Gilê, Dewlemê û Hezerê bi giştî di rûniştekê de berhev bûn û piştî rawêjkariya dirêj, gihîştin wê netîceyê ku Keyqubadê Kurd ku serekê yek ji wan hozêñ Madê bû û di warê erd, zanist, dadperwerî û karzaniyê de bêemsal û bi nav û deng bû, bikin fermanrewayê selteneta xwe.

Efrasyabê paşayê Tûranê ji ber nêzikî û xizmatiya bi Pîşdadiyan re, xwe fermanrewa û mîratgirê eslî yê selteneta Mad û Parsê dizanî. Ev jî ji ber wê bû ku di warê eslî de ji bereya Tûrê bû û zincîra eslê Tûraniyan jî digihê Pîşdadiyan. Ji ber vê sebebê, Efrasiyab paşatiya Keyqubad qebûl nekir û dest bi dijîtiyê kir. Di netîceyê de, şer di navbera Tûran, Mad û Parsê de dest pê kir. Keyqubad karîbû hêzên Efrasiyab bişikîne û welatê Tûranê dagir bike. Selteneta Tûranê ji navçeyêñ: Suxdistan, Kabilistan, Zabilistan, Tûran û Mekranê pêk hatibû. Keyqubad piştî dagirkirin û serkeftinê, hozêñ Kurd li wan navçeyan

bi cih kir. Di vê navê re, di Zabilistanê de Kurdên Zengane, di Tûranê de Kurdên Biraxoyî, di Mekranê de jî Kurdên Ed-reganê Mamilî û Kirmanî, bi mebesta parêzgarî û çavdêriya sînorêن rojhilatê selteneta Madê bikin û di dema pêwîst, şoriş û serhildanêن cîhanî de bibin rîgir û mertal rê li dijmin bigrin, bi cih kirin. Ev hoz, di vê navçeyê de heta bi hetayê bi cih bûn û mijûlî parêzgeriya sînorêن selteneta Madê bûn.

### **Behsa Xwendegehêن Îslamê**

Di serdema kevn de, Zerenc paytexta Zabilistanê bû û niştecihêن Zabilistanê piştî hatina Îslamê, dînê pîroz ê Îslamê hilbijartin. Di serdema xelîfetiya Hz. Omer de, Zerenc bi destê ‘Asimê kurê ‘Omer ku ji aliyê Hz. Omer ve ji bo dagirkirina Secistanê hatibû tayînkirin, hat dagirkirin. Di vê girêdanê de, Mîr Ewram serdarê hoza Kurdên Zengenîyan ku piştî 49’emîn bapîrê mezin ê bingeha nivîskarê vê kitêbê ye, piştî dînê Îslamê qebûl kir, dest bi propaganda û belavkirina dînê Îslamê kir.

Di serdema desthilatdariya Mîr Mehmûd Xaziyê kurê Se-buktegîn, mîrê Xezneyê di sala 399’ê koçî de/1008-9’ê z. de, welatê xwe firehtir kir û Zabilistan kir bin rikêfa desthilatdariya xwe. Wê wextê, serekê Kurdên Zengene Mîr Sîrac ku bi piştê 33’yemîn bapîrê min e, li Zerencê bi mebesta xelkê bi rîbaza Îslamê agahdar bike û wan ji diyardeya bêdîniyê biparêze, ku di serdema desthilata Ebasiyan de li hemû cihî serî hildabû, bingeha xwendegeheke Îslamî danî. Xwendegeh di bin rîveberiya sereke Kurdên Zengeneyê de di belavkirina rîbaza Îslamê de, nav û dengekî zêde peyda kir û xwendekarêن derçûyî piştî temamkirina zanista Îslamê, tîşk û perwerdeya Îslamê li hemû der û doran belav kirin. Zincîra dersgotina hînkirina xwendekaran heta dema Mîr Teymûrê Gurganî berdewam bû, ku di sala 785’ê k./1383’yê z. de ji nişka ve ji Maweraunehrê êrîşî ser Zabilistanê kir ku bi rewşa serdemê re bi navê Sîstanê hat nasîn.

Li Zerenca paytexta Sîstanê di navbera Mîr Teymûr û desthilatdarên Zabilistanê Mîr Qutbedîn de şerekî giran rû da. Mîr Teymûr Zerenc dorpêç kir û piştî şerekî giran sîstanî şikestin û der û dora wî dest bi qetlîama xelkê bajêr kir, bapîrê min ê mezin Mîr Qeyser Zengene jî di vî şerî de hat kuştin.

Avahiya xwendegehê ku di nav bajêr de bû talan û wêran kirin. Piraniya besa kitêbxaneyê jî zerar dît û zincîra dersgotin û perwerdeyê dawî lê hat. Piştî nemana şer, kuştin û kuştarî, Mîr Xelefê kurê Mîr Qeyser bi pismam û kes û nasêñ xwe re çû bajarê Zabilê û bi temamî li wir bi cih bû. Li vir jî xwendegeheke biçûk vekir û daxilî dersgotina İslâmî bû. Hinek kitêbên dînî û belgenameyên dîrokî ku ji dizî, talan û şewata serbazên Teymûr mabûn, bi xwe re anîbûn.

Zincîra dersgotinê û perwerdeya di vê xwendegehê de heta serdemâ desthilatdariya malbata Sefewiyan dewam kir û piştre dawî lê hat. Ev jî ji ber navçeya Qendeharê bû ku timî çavkaniya şer, qirêñ û tevliheviya di navbera selteneta Îranê û welatê Moxolêñ Hindistanê de bû.

Di sala 1050'yê k./1640'ê z. de, di navbera Şah Ebasê Duyem ê Sefewî yê fermanrewayê Îranê û Şah Cîhanê paşayê Moxoliyên Hindistanê de şer û problemên dûr û dirêj rû dan û di netîceyê de Şah Ebas bi ser ket û Şah Cîhan nikaribû navçeya Qendeharê careke din têke bin desthilata xwe. Bi vî awayî, herêma Qendeharê duçarî tevliheviyê bû û aştî û ewlekariya bajêr û bajarokên derûdorê jî ket nav tirsê. Ev bi giştî bûn sebebê jihevdu ketina zincîra dersgotinê û perwerdeya xwendegehêñ Zabilê.

Piştî sekna dersan û xwendinê di xwendegehêñ Zabilê de, ew firset ji min re li hev hat ku qeleva cewherdar bixim ger û destana kevn û dîroka dêrînî ya Kurdên Beluçiyêñ Zabilê, Tûran û Mekranê, ku di çavkaniyêñ dîrokî de hatibûn qeydkirin û bi sîdwergirtina ji wan çend çavkaniyêñ ku ji êrîş û tevliheviyêñ Teymûrê Gurganî ji navçûnê rizgar bûbûn, careke din

bi awayê nivîskî derbixim. Vê jî ji bo ez bikaribim evîndarî û dilgiriya xwe li hemberî serek û mîrên Kurdên Beluçî nîşan bidim û wekî stêrkên gerdûnê ronahiya her timî bi kirin û çakekariya xwe bi serbaz û navdarên Kurdên Beluçiyê Zabilê, Tûranê û Mekranê bidim nasîn, min kir. Ji bo ku exlaqê wan ê şayanê pesnê, xizmeta wan a rojane ya mezin û kirinê wan di xaneya feremoşkirinê de nemîne. Ji bo vê mebestê jî, li gor şîyanê ez ewqas jê agahdar bûme û min zaniye, di tarîxa 11'ê rebîulsaniya sala 1070'yê [26'ê kanûna paşîn-december 1659'ê z.] de, min nivîsandin temam kir. Min navê vê kitêbê jî danî "Kurdgalnamek", ji bo ku naveroka kitêbê ji destpêkê heta dawiyê behsa dîroka wê desteya Kurdên Madê dike ku nêzikî 850 sal beriya zayînê, piştî avabûna desthilata Madê, hatine vê navçeyê û tê de bi cih bûne. Ev desteya Kurdên Madê ji tîreyên Zengene, Biraxoyî, Mamilî, Edreganî û Kirmanî pêk hatibûn û cara yekê bi alîkariya paşayê Madê Keyqubadê kurê Mad hatine navçeya Zerengê (Zerenc), Tûranê û Mekranê.

### **Behsa Kurdên Zengene**

Kurdên Zengene ji beşa wan Kurdan in ku wek Kurdên Rojhilate tên nasîn û bi vê nav û dengê wan derketiye. Kurdên rojhilate jî ew desteya Kurdan in ku ji rojhilate hatine Madê û ji vir ber bi başûr û rojavayê koç kirine û li navçeya vê serdemê ku bi navê Kurdistanê tê nasîn bi cih bûne. Li gor dîroka kevn, desteya rojhilatî ku bi navê Mad tê nasîn ji heft tîran pêk hatine: Partasnî, Bûz, Estrûşat, Arîzant, Bûdî, Maj û Dilmanê. Tîreya Bûdî bi rewşa serdemê re bi ser du tîreyan, Zengene û Biraxoyî ve parve bû ku ew jî ji Zengan û Biraxim ê kurên Bûd çavkaniya xwe girtine û ji bo wê neviyê wan bi navê Zengene û Biraxoyî nav û deng dane.

Eslê Zengene bi vî awayî dest pê dike: Hz. Nûh, silav lê bin, Bafsi, Kumer, Turk, Xezer, Kardak, Buxaz, Mîtan, Arîn, Gîwer, Rûdîn, Sûr, Dexû, Bulgar, Pişder, Têrxan, Şûd, Xuran,

Mada Mezin, Çerkeş, Rasin, Zengan, Dirac, Hekar, [Xoşnaw, Zaran, Sasan, Sencar, Şikak, Şûhan], Gurek, Wan, Mîran, Sûpar, Pazû, Kad, Gawr, Mengur, Tagaz, Cîg, Mada Biçûk.

Heft kurên Mada Biçûk hebûne û navê wan ev bûne: Partasin, Estrûsan, Arîzanit, Bûz, Maj, Bûd û Dilman. Du kurên Bûd hebûne: Zengan û Biraxmî. Bingeha Zengan ku piştre bi navê Tîra Zengene hatin nasîn, bi vî awayî ye: Mada Biçûk, Bûd, Zengan, Tûr, Xidîr, Şeban, Kulk, Seldûz, Dilfan, Arîn, Başman, Rasin, Gil, Kusad, Pazû, Zînil/Zeynil, Şûhan, Zaxu, Rişwan, Ramîn, Sewîd, Nedran, Sabûl, Hurmuz, Bacel, Xanî, Dîze, Zirkan, Şiwank, Kazan, Firkî, Merzek, Bakîl, Padak, Birsan, Feyrûz, Îspîbûd, Kuring, Bûrgan, Mihran, Nûcehan, Siyamek, Bîdar/Bêydar, Ferhad, Siyawiş, Wendan, Nûzer, Şahmîr, Bîsûd/Beysûd, Mihran, Bedlîs, Merdan, Riwanşîr, Îzbûk, Behram, Şîrburz, Bûrak, Mihran, Rostem, Tîrdad, Guderz, Resan, Kubad, Girşasp, Selem, Seran, Şagan, Beyker, Tîrdad, Ewram, Sewîd, Xelef, Bekir, Se'îd, 'Îsa, 'Ubeyd, Tûran, Aban, Ehmed, Başar, Hekem, Mihran, Mu'în, Cabir, Birsan, Sîrac, Haris, Senan, Ehmed, Pûlbîg, Eybeg, Behmen, Melik, Şahbîg, Behadur, Sencer, 'Îsa, Ye'qûb, 'Umran, 'Osman, Qeyser, Xelef, Hebîb, Leys, Mistefa, Ehmed, Mubarek, Mûsa, Meh-mûd, Dawid, Silêman, Salih.

Dema ku Keyqubad fermanrewayê Madê û Farsê bû, mîrnişîna Zabilistanê da kurên Zengenîyan, Mîr Sewîd ser-ekê tîreya Zengeneyê bû û malbata wî heta serdema Îskender Paşayê welatê Makedonyaya Yûnanê li Zabilistanê fermanrewatî kirine. Piştî Mîr Sewîd, kurê Nedran, kurê Sabûl, kurê Hurmuz, kurê Bacil, kurê Xanî, kurê Dîze, kurê Padga û kurê Birsan yek li pey yekê li ser textê Zabilistanê fermanrewatî kirine. Di dirêjahiya dîrokê û serdema van serokên Kurdên Zengene ya serdema êrîş û pêlên Mîr Teymûr Gurganî de, di sala 785'ê k./1383'yê z. de ji nav çûne. Ji ber wê ye di vî warî de tu çavkanî û nivîsek li ber destê me tune ku em bikaribin di vî warî de bi dirêjî behsa rewşê bikin. Helbet em vî qasî diza-

nin ku di serdema dagirkirina Farsê de, Îskenderê Makedonî dema ku li cihê Dara digeriya û berê xwe da wilayetên rojavayê, Mîr Birsan mîrê welatê Zabilistanê bû û ji bili teslîmbûna bi desthilata Îskender re tu çareyeke wî ya din nema. Îskender jî ew bi diyariyên hêja û bi qîmet xelat kir û li ser fermanrewatiya Zabilistanê hişt û ew wek hevkarekî xwe hesêb kir. Dîrok-nivîsên Yûnanî navçeya Zabilistanê bi navê “Zerengîna” ku ji “Zereng” hatiye wergirtin, dane nasîn.

Îskender di sala 323’ye beriya zayînê de hat Babilê û her li wir jî koça dawiyê kir. Piştî mirina wî, di navbera serleşkerên wî de asteng, dijîtî û şerên giran li ser cihnişîniya wî berpa bû û di netîceyê de selteneta fireh û mezin di navbera xwe de parve kirin. Beşa rojhilatê seltenetê ku ji Madê û Parsê pêk hatibû, dan destê serleşker Sîlukus. Sîlukus û malbata wî, Mîr Birsan û neviyên wî li ser Mîrnîşîna Zabilistanê hiştin. Ji ber wê piştî Mîr Birsan, kurê wî Feyrûz, kurê İspîbûd, kurê Kureng û kurê Bûrgan Begê li pişt hev li ser textê Zabilistanê fermanrewatî kirin û ji ber kirinê xwe yên dadperweriyê nav û deng dan.

Piştre Mîr Eşkê desthilatdarê Belxê, ku Yûnaniyan jê re “Baxtirya” (Bactria) gotine, di sala 245’ye beriya zayînê de, bingeha fermanrewatiya xwe damezirand û malbata wî bi navê “Eşkanî” nav û deng da. Biraziyê Mîr Eşk, Tîrdadê Yekem paşvemayê navçeyên selteneta Madê û Parsê girtin û kirin bin rikêfa desthilata xwe. Bi vî awayî Zabilistan jî ket bin desthilata Eşkanîyan û dawî bi fermanrewaya Kurdên Zengene li Zabilistanê hat. Sebebê vê jî ew bû ku di serdema fermanrewatiya paşayê Eşkanî Mihirdadê Yekem de, hinek ji mîrên Alayı serhildan bilind kiribûn û dijîtî dikirin. Piştî şikestina van şorişan, rewşa fermanrewayê itaetkar û bindestan di gu-manê de bû û Mihirdadê Yekem fermanrewayê welatên dûr û desthilatdarên xwemalî ji ser kar hildan û di cihê wan de şehzadeyên Eşkanî bi cih kirin. Ji ber vê yekê, fermanrewatiya Bûrganê Kurdên Zengeneyê jî li Zabilistanê dawî lê hat û şehzadekî Eşkanî, Sinarbar hat ser textê wilayetê û zincîra

fermanrewatiya wî û bereya wî li Zabilistanê dest pê kir. Bi vî awayî, piştî koça dawiyê ya Sinarbar, kurê wî Gundus hat ser textê mîrnişinê. Piştî koça wî ya dawiyê jî, kurê Gûda desthilata mîrnişinê girt destê xwe. Bi vî awayî, piştî Gûda jî Erşem, Hoşeng, Sinarbarê Duyem û Gorşabê Yekem li pişt hev heta dema hatina Tirkên Koşanî li ser textê Mîrnişîna Zabilistanê fermanrewatî kirin.

### **Behsa Kurdên Biraxoyî**

Kurdên Biraxoyî yek ji wan tîreyên mezin ên Kurd e ku di seranserê dinyayê de bi awayê şer û welatgirtinê yê wekî tîreyên din ên Kurd bi nav û deng in û heta qelema Bonî ‘Enber jî di nivîsandin û pesnê karekterê çakiya wan de ji zîziya xwe daketiye. Kurdên Biraxoyî di der û dora sala 850’yê beriya zayînê de, piştî avabûna selteneta Kurdên Mad û Persê ku piştre bi navê selteneta Mad û Parsê nav û dengê wan derket, cara yekê bi piştevaniya Keyqubad paşayê Madî Kurdên Payanê anije ser erdê Beluçistanê û desthilatdariya wan erdan kiriye bin rîveberiya xwe. Piştî bicihbûna wan li wan navçeyan, ji aliyê wan xelkên ku beriya hatina wan li wan navçeyan niştecih bûn, bi navê “Kurdgal”ê hatin nasîn, ev jî tê maneya “yên bi Kurdî diaxivin”. Her ji ber wê di destpêkê de ev tîreya Kurd bi navê “Kurdgal” nav da.

### **Bingeha Kurdên Biraxoyî Bi Vî Awayê Xwarê ye**

Vegoterên dînî neqil dikin ku piştî tofana Nûh (silav lê bin), sê kurên wî: Ham, Sam û Yafes ji tofanê rizgar bûn û hemû însanên dinê neviyê van her sê kurên peyamber Nûh (silav lê bin) tên zanîn. Dibêjin nesla van sê kuran di dawiyê de ewqas zêde bû ku ji bo debara/îdareya jiyana xwe belavê hemû cih û goşeyên cîhanê bûn. Yekem car berê xwe dan navçeyê bakurê rojhilate Girdayê Zewî û li wir bi cih bûn û piştre hinekan jê ber bi xwarê ve koç kirin û li navçeya xwe ya niha

nişîngeha xwe damezirandin. Heşt kurên Hz. Yafes hebûn û navê yekî ji wan Kumer bû. Zincîra bingeha Kurdan ji Kumer bi vî awayî dest pê dike:

Yafes, Kumer, Xezer, Kardak, Buwaz, Mîtan, Arîn, Gîwer, Rûdîn, Sûr, Dexû, Bulgar, Pişder, Têrxan, Şûd, Xuran, Mada Mezin, Çerkeş, Rasin, Zengan, Dirac, Hekar, Xoşnaw, Zaran, Sasun, Sencar, Şikak, Şûhan, Gurek, Wan, Mîran, Sûbar, Pazû, Kad, Gawr, Mengur, Tagaz, Çîg û Mada Biçûk.

Heft kurên Mada Biçûk hebûne: Partasin, Estrûsat, Arîzant, Bûz, Maj, Bûd û Dîlman. Ji van heft kurên Mada Biçûk, heft tîreyên Kurd çêbûn û her yek bi navê bapîrên xwe yê mezin hatin naskirin. Ev tîreyên Kurd bi navê “Kurdên Rojhilat”ê tên nasîn. Ji ber wê ew ji aliyê rojhilatê ve hatine [Mad] û Farsê.

Kurdên Biraxoyî ji neviyên Bûd in û bingeha wan piştî Bûd bi vî awayî ye: Bûd, Biraxmê Mezin, Cagîn, Pûran, Xutan, Dusek, Arûk û Zûrak. Biraxmê Biçûk bapîrê mezin ê heşt tîreyên Biraxoyî ye. Di zimanê Kurdî de “Birahîm” wek “Biraxim” tê telafuzkirin, ji ber wê neviyên Biraxim wek “Biraxoyî” hatin naskirin. Heyşt kurên Biraximê Biçûk hebûn û navê wan ev bûn: Kîkan, Goran, Sarûn, Xuz, Mişkan, Ermîl, Bolan û Girîşkan. Bi rewşa serdemê re nijada kurên Biraximê Biçûk ewqas zêde bû ku heyşt tîreyên cihê ji Biraxo peyda bûn û her tîre bi navê bapîrê xwe hat nasîn û nav û deng dan. Bi vî awayî neviyên Kîkan wek Kîkanî, neviyên Goran wek Goranî, neviyên Sarûn wek Sarûnî, neviyên Xuz wek Xuzdarî, neviyên Mişkan wek Mişkanî, neviyên Ermîl wek Ermîlî, neviyên Bolan wek Bolanî û neviyên Girîşkan wek Girîşkanî hatin nasîn.

Kurdên Biraxoyî wek tîreyên din ên Kurd li Madê jiyanâ xwe derbas dikirin û destpêkê di serdemeke ne diyar de, yanî çend hezar sal beriya zayînê hatine wê navçeya ku ketiye başûrê Madê û wek Kurdistan tê nasîn. Kîkan kurê herî mezin ê Biraximê Biçûk bû, ji ber wê pileya serdarî û serokatiya Kurdên Biraxoyî di destê Kîkan de bû. Koka heyşt kurên Biraximê

Biçûk bi vî awayê xwarê bû:

A- Kîkan, Zûrak, Sengîn, Arîn, Pindran, Daxur, Zîbar, Umran,  
Sengîn, Xuman û Kîkan

B- Goran, Şîdan, Başman, Dilût, Zînil/Zeynil, Tekş, Kaş, Şî-  
dan, Kusad, Başman, Goran

C- Sarûn, Zîdek, Başûk, Kurtî, Lasîn, Mamiş, Dusek, Sarim,  
Basîr, Daxur, Zaxu

D- Xuz, Ewram, Rasin, Duxan, Katêن, Gîwer, Xuz, Gurus, Ma-  
hek, Rûçap, Mihran

E- Mişkan, Eyle, Nûkî, Mişk, Eyle, Başar, Mirdas, Gîlek, Tû-  
ran, Kuyan, Mişkan

F- Ermîl, Merzek, Zirwan, Kuyan, Mengur, Sabûl, Merzek,  
Zirwan, Kaş, Şawil, Ermîl

G- Bolan, Zînil/Zeynil, Bûzîk, Kazan, Melîl, Karçi, Şagan, Şû-  
han, Kirmac, Bûzîk, Bolan

H- Girişkan, Berûz, Basîr, Gîj, Bûlak, Berûz, Girişkan, Kireçk,  
Maxan, Çirmûk, Lerzîn



## **DEWLETA MADÊ**

Dema ku Girşasp, dawîn paşayê malbata Pîşdadiyan dinya ya fanî terk kir, welatê Mad û Parsê duçarî rewşeka tevlihev û bêhêziyê bû. Ev rewş bû sebebê sergêjî û tirsa serekê hozên Mad û Parsê. Di netîceyê de, hemû serek, serdar û rihsî di civînekê de berhev bûn û piştî rawêjkariya di navbera xwe de bi giştî biryar dan ku Keyqubadê kurê Mad ku serekê giştî yê hozên Madê bû, di cihê Girşasp de li ser textê fermanrewatiyê bidin rûniştandin.

Bi vî awayî, Keyqubad di sala 853'ye beriya zayînê de, hat ser textê Mad û Parsê. Wê wextê Kurdên Biraxoyî tîreke bi hêz û aza ya Kurd dihatin hesêbkirin, Mîr Kîkan wekî serekê tîreyên Kurd, serekê mezin ê hozê, yanî Kurdên Biraxoyî bû û bi van heft serekên din ên tîreyên Kurdên Biraxoyî re hemû wextan ji bo hevkariya Keyqubad paşayê Madê amade bûn û di kar û barên seltenetê de yarmetî didanê û alîkariya wî diki-rin: Mîr Goran Goranî, Mîr Zaxu Sarûnî, Mîr Mihran Xuzadî, Mîr Mişkan Mişkanî, Mîr Ermîl Ermîlî, Mîr Bolan Bolanî û Mîr Lerzîn Girîşkanî,

### **Şerê Di Navbera Mad û Tûranê De**

Efrasyabê paşayê Tûranê di warê mîratê de xwe mîrat-girê rewa yê selteneta Pîşdadiyan ku ji Mad û Parsê pêk hatibû dizanibû û zêde pê zor bû ku Keyqubadê Kurd ê Madî ji bo fermanrewatiya Mad û Parsê hatiye hilbijartin. Her ji ber vê, alaya dijîtîkirinê bilind kir, di netîceyê de şerê Tûranê bi Madê re dest pê kir. Keyqubad jî dema ku desthilata fermanrewatiyê

girt destê xwe, beriya hemû tiştî ji bo jinavbirina Efrasyab ket rê û di şerekî de karîbû wî bişikîne û Efrasyab daxwaza aştiyê bike. Piştî aştiyê, Keyqubad bi eskerên xwe re ji Belxa paytexta selteneta Tûranê vege riya Madê.

Di vî şerî de, hemû tîre û hozên Kurd yarmetî û hevaliya Keyqubad kirin. Dema ku Keyqubad vege riya Zerengê, ferman da serekên Kurdê Biraxoyî da ku êrîşî ser welatê Tûranê bikin. Serekên Kurd ên Edreganî, Mamilî û Kirmanî êrîşî ser welatê Mekranê kirin û bi zebra şûran ew girtin. Ev herdu wilayet ji wilayetên welatê Tûranê bûn.

Piştire ew serokên me behsa wan kir ew wilayet girtin, bi ser ketin û dilşadî bi dest xistin û Keyqubad Mîrnişîna Tûranê da mîrê Kîkan Biraxoyî û Mîrnişîna Mekranê da Mîr Eyle Edreganî. Kurdê Biraxoyî û Edreganî heta hilweşîna seltenetê desteya Madê li van wilayetan fermanrewatî dikirin.

Desteya Kurdê Madan heta şeş piştan li ser textê selteneta Mad û Parsê fermanrewatî kirin, ku navê wan bi vî awayî ye: Keyqubad, Keykawus, Tûs ku bi navê “Keyxusrew-Keyxes-ro” jî tê nasîn, Ferîbûrz, Keyaksar û Azdiyak.

### **Serekên Hevçerx ên Tîreyên Kurdê Biraxoyî û Paşayên Madê**

Keyqubad yekem paşayê malbata Madê bû û di serdema destpêkê ya fermanrewatiya xwe de, ev serekên tîreyên Kurd ên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Kîkan Kîkanî, Mîr Goran Goranî, Mîr Zaxu Sarûnî, Mîr Mihran Xuzdarî, Mîr Mişkan Mişkanî, Mîr Ermîl Ermîlî, Mîr Bolan Bolanî û Mîr Lerzîn Girîşkanî.

Li gor wê ku temenê Keyqubad dirêj bûye, serdema fermanrewatiya wî jî ji mideteke dûr û dirêj pêk hatiye. Ji ber wê di dawîn serdema fermanrewatiya wî de ev mîrên ji tîreyên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Zûrak Kîkanî, Mîr Kireck Goranî, Mîr Seldûz Sarûnî, Mîr Keytûn Xuzdarî, Mîr Mirdas Mişkanî,

Mîr Mişkan Ermîlî, Mîr Bacel Bolanî û Mîr Tadî Girişkanî.

Piştî Keyqubad koça dawiyê kir, kurê wî Keykawus derket ser textê seltenetê û ev serekên tîreyên Kurd ên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Üştab Kîkanî, Mîr Şadîn Goranî, Mîr Şagîn Sarûnî, Mîr Kaşik Xuzdarî, Mîr Kirec Mişkanî, Mîr Xu-man Ermîlî, Mîr Pûran Bolanî û Mîr Zîdan/Zeydan Girişkanî. Keykawus bi ocaxkorî koça dawiyê kir, ji ber wê hozên Kurdên Madê Tûsiyê kurê Ferîbûrz ji bo serekatiya giştî ya Madê hilbijartin. Ev serekên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Zîkrîn Kîkanî, Mîr Kaş Goranî, Mîr Sabûl Sarûnî, Mîr Kîçan Xuzdarî, Mîr Gilbag Mişkanî, Mîr Kileck Ermîlî, Mîr Xuman Bolanî û Mîr Birûş Girişkanî.

Piştî Tûs dinyaya fanî terk kir, kurê wî Ferîbûrz derket ser textê seltenetê. Ev serekên tîreyên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Zîbar Kîkanî, Mîr Ramîn Goranî, Mîr Sûrçin Sarûnî, Mîr Manûr Xuzdarî, Mîr Tûrab Mişkanî, Mîr Kirmac Ermîlî, Mîr Keytûn Bolanî û Mîr Pazû Girişkanî. Ferîbûrz di şerê Aşûriyan de hat kuştin. Piştre serekên Kurd Keyaksar anîn ser textê fer-manrewatiyê ku ew pêncemîn paşayê malbata Kurdên Madê bû li ser textê fer-manrewatiya Mad û Parsê paşatiyê bike. Ev serekên tîreyên Kurd ên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Bi-raxim Kîkanî, Mîr Buxaz Goranî, Mîr Manî Sarûnî, Mîr Gawr Xuzdarî, Mîr Manûr Mişkanî, Mîr Guren Ermîlî, Mîr Tirman Bolanî û Mîr Tapîn Girişkanî.

Piştî Keyaksar jî koça dawiyê kir, kurê wî Azdiyak hat ser textê selteneta Madê ku dawîn paşayê malbata Kurdên Madê bû û ji ber kîrnehatinê text ji destê xwe kir. Ev serekên tîreyên Kurd ên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Goran Kîkanî, Mîr Rasîn Goranî, Mîr Şûhan Sarûnî, Mîr Mihran Xuzdarî, Mîr Beyker Mişkanî, Mîr Kusad Ermîlî, Mîr Hekar Bolanî û Mîr Xîzan Girişkanî.

## Têkçûna Fermanrewatiya Malbata Kurdên Madê

Malbata Madê ya ji Mad û Parsê nêzikî 300 salan fermanrewatî kîrin. Keyqubad bingeha seltenetê damezirand û Keykawus, Tûs, Ferîbûrz û Keyaksar pile, paye û mezintiya welatê xwe gihandin kopa serî. Lê Azdiyak bû sebebê têkçûna desthilata malbatê. Ev jî ji ber wê bû ku ew kesekî kîrnehatî û bêhêz bû û nikaribû kar û barên seltenetê bimeşîne. Bi vê re stemkarî û eziyetkirina xelkê beşek ji idareya xwe dizanibû. Xelk ji destê wî dinaliya û hez jê nedikirin. Bi dîtina vê, mîr û serdarên Mad û Parsê bi hev şêwirîn û biryar dan ku Azdiyak ji ser kar rakin. Ji bo ku kurêن Azdiyak tune bûn, hewceyî Kurişê Hexamenî yê neviyê keçê yê Azdiyak bûn.

Bi vî awayî, dewleta Madê ku ji ber sebebê gavavêtin û kîrinêن Keyaksar gîhîştibû wê seviya bilind a pesnê û şikurmen-diyê, Azdiyakê cihnişînê wî şîyanê van hemû mal û darayıyê biselimîne, bû stemkar û hêdî hêdî ji radeyê derket. Dilê serrekên leşker jî jê sar bû. Di netîceyê de, ji bo ku kurêن Azdiyak tune bûn, Kurişê Hexamenî anîn ser textê Madê.

## Malbata Hexamenşîyan

Hexamenş yekem paşayê zincîra paşatiya malbata Hexamenşîyan bû û ji ber navê wî malbat bi navê Hexamenş hatîye naskirin. Di destpêkê de ev malbat li Parsê paşatî dikir û bacdarê dewleta Madê bûn. Di serdema paşatiya Azdiyak de, Kembûcê Hexamenş fermanrewayê Parsê bû ku Azdiyak ew kir zavayê xwe û di vê navê re kurekî wî çavê xwe li dinyayê vekir ku navê Kuriş(Kîros) lê kîrin.

Wê wextê, wezîrê Azdiyak, Erpak, dît ku kar û barên welat ber bi têkçûnê ve diçe û ji Azdiyak hêvî û lava kir ku kar û barên seltenetê bîne ser rewşa normal. Lê ew ne mirovekî têgihiştî bû, hemû wextî bi kêf û qeşmeriyan mijûl bû û hişê wî nedîgîhişt kar û barên welat. Dilê Erpak jî jê reş bûbû û xwe nêzikî kesên dijî Azdiyak kir. Di netîceyê de serek, mîr û

mezinên Kurdên Mad û Parsê di rûniştineke taybetî de bi îmzayên xwe nameyeke nehênî ji Kurişê kurê Kembûc û neviyê Azdiyak re nivîsandin û tê de bangî fermanrewayê Mad û Parsê kirin. Di nameyê de ji wan re ragihandin ku bi leşkerékî biçûk ve xwe bigihîne nêzikî Ekbatana paytexta Madê ku leşkerê Kurd bigihêن wî û piştre wî deynin ser textê paşatiyê.

Dema ku Azdiyak ev xeber seh kir, gelek aciz bû û ew bi leşkerekî giran ve ber bi paytexta Kuriş ve ket rê. Di navbera herdu aliyan de şerekî giran dest pê kir lê Azdiyak hê di destpêka şer de şikest û ew girtin. Bi vî awayî dewleta Madê têk çû û paşatiya Mad û Parsê ji Madan derbasî destê Hexamenşîyan bû û zincîra fermanrewatiya Hexamenş li ser welatê Mad û Parsê dest pê kir.

### **Şêla Hexamenşîyan Bi Kurdên Madê Re**

Piştî Kuriş desthilata selteneta Madê û Parsê girt destê xwe, li gor ku dayîka wî Kurd bû û peywendiyên wî bi Kurdan re hebûn, peywendiyên dostane û birayane bi Kurdên Madê re girêdan. Ji vê jî zêdetir, Kurd wek zend û baskên xwe yên bi hêz hesêb dikir. Pile û payeyên bilind ên şahaneyî da kesên ji malbata paşayên Madê û şahzadeyên Madê di nav artêşa xwe de di seviya serdariya bilind de ragirt. Her wiha, bi keça meta xwe yanî keça Ertîmayê zavayê Azdiyak re zewicî.

Ji bili vana, Kuriş hemû awa rêexistinên Madê wekî wan hişt, vê jî ji bo wê kir ku hest û bîra biyanî û cihêtiyê di navbera Kurdên Madê û Hexamenşîyan de peyda nebe. Her wiha, rêz û qedir li serek û serdarêن Madê girt û pileya piraniyan bilind kir. Di vê navê re fermanrewayê Kurdên Biraxoyî yên Tûranê û Kurdên Edreganiyê yên Mekranê nas kir. Bi vî awayî du-yem serdema fermanrewatiya Kurdên Biraxoyî Edreganiyan li Tûran û Mekranê dest pê kir û heta dema destbiserdegirtina Dara ji aliyê Îskender ve dewam kir.

## **Serekên Hevçerx ên Tîreyên Kurdên Biraxoyî û Paşayên Hexamenşî**

Kurîş bingeha selteneta Hexamenşî li Mad û Farsê danî. Wî ev seltenet di netîceya hevkariya Kurdên Madê de bi dest xistibû. Ji ber wê rêz û qedrê mîr û serekan girt. Ev serekê tîreyên Kurdên Biraxoyî yên hevçerxê Kurişê Mezin yekem paşayên Hexamenşîyan bûn: Mîr Zırşan Kîkanî, Mîr Nagan Goranî, Mîr Nêrman Sarûnî, Mîr Şîşar Xurdarî, Mîr Gurgîn Mişkanî, Mîr Bahûr Ermîlî, Mîr Buxa Bolanî û Mîr Semban Girîşkanî.

Piştî koça dawiyê ya Kuriş, kurê wî, Kembûcî derket ser text û di serdema fermanrewatiya wî de ev serekê tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Zırşan Kîkanî, Mîr Nakan Goranî, Mîr Nêrman Sarûnî, Mîr Şîşar Xurdarî, Mîr Gurgîn Mişkanî, Mîr Bahûr Ermîlî, Mîr Buxa Bolanî û Mîr Semban Girîşkanî.

Piştî mirina Kembûcî, Dara bû paşa û ev mîrên tîreyên Kurdê Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Zurat Kîkanî, Mîr Dûc Goranî, Mîr Hînar Sarûnî, Mîr Kaşk Xuzdarî, Mîr Bûlûr Mişkanî, Mîr Amaç Ermîlî, Mîr Dernil Bolanî û Mîr Zîdek Girîşkanî. Piştî mirina wî, kurê wî Xişayarşa bû cihnişînê wî û ev mîrên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Ercan Kîkanî, Mîr Çirmûk Goranî, Mîr Kabû Sarûnî, Mîr Deylem Xuzdarî, Mîr Tütik Mişkanî, Mîr Kembil Ermîlî, Mîr Xîzan Bolanî û Mîr Pîlar Girîşkanî.

Piştî kuştina wî, Xişayarşayê kurê Erdeşêrê Yekem hat ser textê fermanrewayê û ev serekê tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Şamûz Kîkanî, Mîr Kazan Goranî, Mîr Mirdas Sarûnî, Mîr Xerzan Xuzdarî, Mîr Duxan Mişkanî, Mîr Basîr Ermîlî, Mîr Mişkan Bolanî û Mîr Maxan Girîşkanî. Piştî ku Erdeşêrê Yekem dinyaya fanî terk kir, kurê wî Xişayarşayê Duyem hat ser textê fermanrewayê û ji bo ku birayê wî ew kuşt, tenê bi qasî 45 rojan paşatî kir. Bi vî awayî li cihê wî Darayê Duyem ê birayê wî hat ser text. Ev serekê tîreyên Kurdên

Biraxoyî hevçerxên wan herdu paşayê Hexamenşî bûn: Mîr Biraxim Kîkanî, Mîr Zeyrel Goranî, Mîr Rîgan Sarûnî, Mîr Kusad Xuzdarî, Mîr Katîn Mişkanî, Mîr Bûlak Ermîlî, Mîr Sîkran Bolanî û Mîr Sarim Girîşkanî.

Piştî Darayê Duyem koça dawiyê kir, kurê wî Erdeşêrê Duyem li ser textê Farsê rûnişt û ev mîrên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Sabûl Kîkanî, Mîr Goran Goranî, Mîr Keytûn Sarûnî, Mîr Mişkan Xuzdarî, Mîr Zurân Mişkanî, Mîr Ewram Ermîlî, Mîr Sasun Bolanî û Mîr Darûn Girîşkanî. Piştî mirina Erdeşêrê Duyem, kurê wî Erdeşêrê Sêyem hat ser text. Ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Nûrgan Kîkanî, Mîr Mihran Goranî, Mîr Başûk Sarûnî, Mîr Bîfil Xuzdarî, Mîr Bûzik Mişkanî, Mîr Ewkî Ermîlî, Mîr Kelxil Bolanî û Mîr Nûxî Girîşkanî. Ev mîrên din ên tîreyên Kurdên Biraxoyî di dawîn serdema fermanrewatiya Erdeşêrê Sêyem de hevçerxên wî bûn: Mîr Kiyanûş Kîkanî, Mîr Gîştar Goranî, Mîr Înax/Eynax Sarûnî, Mîr Zerrîn Ermîlî, Mîr Lakûr Bolanî, Mîr Bilbas Girîşkanî, Mîr Kirecîl Xuzdarî û Mîr Biraxim Mişkanî.

Bagwas ku kesekî xesandî bû, jehr da Erdeşêrê Sêyem û piştî kuştina wî malbatê Hexemenşîyan kesekî navê wî Kidman ê bi nasnavê “Darayê Sêyem” anîn ser textê fermanrewatiyê. Ev mîrên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Kîkan Kîkanî, Mîr Rûjî Goranî, Mîr Cakîn Sarûnî, Mîr Şadîn Xuzdarî, Mîr Rasîn Mişkanî, Mîr Nûrgan Ermîlî, Mîr Berûz Bolanî û Mîr Açık Girîşkanî.

### Têkçûna Fermanrewatiya Hexamenşîyan

Kurîşê Mezin textnişînê pêşîn ê wan e, malbata wî bi navê Hexamenşîyan nav û deng da. Ev malbata paşayî heta neh piştan fermanrewatî kir û navê paşayê wan bi vî awayî ne: Kurîşê Mezin, Kembûcî, Darayê Yekem, Xişayarşayê Yekem, Erdeşêrê Yekem, Xişayarşayê Duyem, Darayê Duyem, Erdeşêrê Duyem û Erdeşêrê Sêyem.

Paşayê Hexamenşî karîbûn selteneta xwe gelekî fireh bikin û gelekî bi nav û deng bin. Bi Yûnaniyan re her timî di nav şer de bûne. Filqusê (Philipos) fermanrewayê welatê Makedonyayê ku yek ji fermanrewayê xwemalî yê welatê Yûnanê bû, hevkar û hevserek bi xwe re hevdeng kir û yekîtî fireh kir û xwest bi Hexamenşîyan re dest bi şer bike. Lê ew di sala 337'ê beriya zayînê de di şerekî navxweyî yê Yûnanê de hat kuştin. Piştre kurê wî, Îskender li cihê wî hat ser textê Makedonyayê û bi welatê Parsê re dest bi şer kir û serkeftin û serbilindî bi dest xist.

Darayê Sêyem ê dawîn paşayê malbata Hexamenşîyan, piştî bi destê Îskender hat şikandin, ji bajarekî bazdida bajarekî din û Îskenderê Mezin jî her tim li pey bû. Di netîceyê de Dara mir; hevkarên wî jê bêzar û dilteng bûn û ji bo ku ji destê Îskender rizgar bibe xwe da kuştin. Bi vî awayî Îskender selteneta Farsê kir bin desthilata xwe û dawî li fermanrewatiya malbata Hexamenşîyan hat.

### Hatina Îskenderê Makedonî

Îskender piştî koça dawiyê ya Filqusê (Filîp) bavê wî, hat ser textê wilayeta Makedonyayê ku yek ji wilayetên Yûnanê bû. Di destpêkê de wilayetên der û dora xwe anî bin desthilata xwe û ew ji xwe re kirin hevpeyman û hevdeng. Piştre di sala 334'ê beriya zayînê de berê xwe da Farsê û dest bi dagirkirina navçeyên wê kir. Hêzên Darayê paşayê Hexamenşî yek li pey yekê şikandin û gîhîst welatê Hindê.

Piştî hatina nav Hindê, navçeya Pencaba<sup>8</sup> Hindê dagir kir û xwest ber bi pêş ve biçe û navçeyên din ên Hindê jî dagir

---

<sup>8</sup> Navê kevn Pencab e, tê bi maneya erdê pênc deryayan ku navê wan bi vî awayî ye: Deryaya Sindê, Biyas, Sutlec, Cêhlem, Çenab. Ev navçe di serdema kevn de bi navê cihê cihê yên wekî vana hatiye nasîn: Sepet Sindhu, Heft Sindhu, Pencined, Penc Abe û dawîn nav jî Pencab. İngilîzan di sala 1947'ê de ev navçe li ser welatê Hindê û Pakistanê parve kirin (Wergêr).

bike. Lê daxwaza wî bi cih nehat, ji ber ku eskerên wî ji ber meşa mideteke dirêj û şerê gav bi gav, aciz û bêzar bûbûn û di çûna pêş de asê bûn. Îskenderê Makedonî jî neçar bû ber bi niştimanê xwe ve vegere. Ji bo vê mebestê bi rêya Tûranê hat Farsê û ji wir jî çû nav Babîlê. Li Babîlê nexweş ket û di Hereta Lawêtê de dinyaya fanî terk kir û ew selteneta mezin û fireh ku bi xwe anîbû bin desthilata xwe, bê serek bi cih hişt.

### **Parçebûna Selteneta Îskender**

Mirina bê payîn a Îskender û nebûna mîratgirekî textê wî, bû sebebê problemeke dûr û dirêj di navbera leşkerên Îskender de. Ev problem heta demeke dirêj berdewam bû û serleşkeran di navbera xwe de çend şerên giran kirin û di netîceyê de gihiştin wê encamê ku selteneta mezin û fireh a Îskender di navbera xwe de parve bikin.

Beşa rojhilatê seltenetê ku ji navçeyên Mad, Pars, Tûran, Mekran, Zabilistan û Kabilistanê pêk hatibû, ji serleşker Sîlukus re hat dayîn. Serleşker Sîlukus di sala 310'ê beriya zayînê de desthilata van welatan girt destê xwe û heta mideteke dirêj li van navçeyan fermanrewatî kir.



## BEŞA DUYEM

### MÎRNIŞÎNA KURDÊN BIRAXOYÎ LI TÛRANÊ (Dewreya Yekem)

Keyqubad ê serekê Kurdên Madê di nêzikî sala 850'yê beriya zayînê de, dewleta Mad û Parsê damezirand.

Keyqubad ji ber vî welatî bi hêza zend û baskên şûrweşîna Kurdên xwe bi dest xistibû, hozên mîrxas û xwebextkerên Kurd guhest wan naçeyên dûr ku nêzikî sînorêñ welatêñ din bûn. Ev ji bo wê mebestê bû ku bi xatircemî parêzgeriya sînorêñ welatê xwe bikin û ji hemû milan ve bi lezgînî bergiriyê li hatina pêş a dijminêñ dewletê bikin û destdirêjiya dijmin binkol bikin û selteneta xwe ji van awa ziyanan biparêzêñ.

Keyqubad tîreyêñ Madî ber bi hemû milan û welatan ve belav kir. Tîreya Partasnî veguhest navçeya lêwarêñ Deryaya Hezerê û ew li wir bi cih kirin. Tîreya Bûzê bi fermana wî li navçeya Hemedanê bi cih bû. Tîreya Estrûşatê li navçeya Semerqendê û Xarezmê niştecih bû. Tîreya Arîzantê li Azerbaycanê nişîngeha xwe pêk anî. Tîreya Bûdiyê ku ji du tîreyêñ Biraxoyî û Zengeneyê pêk hatibû, ber bi aliyê xwarê rojavayê koç kirin û li navçeya Tûran û Mekranê ku bi navçeya Sindanê ve ye bi cih bûn. Sê tîreyêñ din ên Kurd ku bi navêñ Edreganî, Mamilî û Kirmanî dihatin nasîn, hatin Mekranê û li wir bi cih bûn.

Keyqubad piştî şikandina Efrasyabê paşayê Tûranê û têkbirina desthilata wî di welatê wî de, piraniya herêmêñ vî welatî kir bin desthilata xwe û Kurdî di wan cihan de ava kir. Li

ser vê Kurdên Biraxoyî li Tûranê, Kurdên Nedreganî, Mamilî û Kirmanî li Mekranê niştegeha xwe pêk anîn û bi timî bi cih bûn. Tîreya Kurdên Biraxoyî wê wextê ji bereya heşt kurên Biraxmê Biçûk pêk hatibûn: Kîkanî, Goranî, Sarûnî, Xuzdarî, Mişkanî, Ermîlî, Bolanî û Girîşkanî. Kîkan kurê mezin ê Biraxmê Biçûk bû, ji ber wê pileya serek û serdariya tîreya Kurdên Biraxoyî ji malbata Kîkan re hat dayîn. Her wiha dema ku dewleta Madê damezirî, rîveberiya Tûranê jî ji aliyê Keyqubad ve ji wan re hat dayîn, yanî ji Mîr Kîkan Kîkanî re ku wê wextê mîrê mezin ê Kurdên Biraxoyî bû.

## 1- Mîrêmîran Mîr Kîkan

### Dîwana Bulikê

Dema ku Kîkan desthilata Mîrnişîna Tûranê girt destê xwe, ji bo birêvebirina kar û barên dewletê, dîwana desthilatdariyê ya bi navê “Dîwana Bulik”ê damezirand. Di vê dîwanê de, serekên hemû tîreyên Biraxoyî, yanî Kîkanî, Goranî, Sarûzî, Xuzdarî, Mişkanî, Ermîlî, Bolanî û Girîşkanî endam bûn.

### Alîkariya Keyqubad Paşa

Piştî Keyqubad hat ser kar, xwest welatê xwe ji sîtem û karêne rewa yên paşayên Aşûrî rizgar bike. Ji bo vê mebestê, bi Bilazisê paşayê Kildanî re ku ew jî ji destê destdirêjiya Aşûriyan bêzar bûbû, yekgirtin pêk anî û herdu paşa bi niyaza jinavbirina desthilata Aşûriyan û talankirina paytexta Aşûriyan yanî Nînovayê, li hev kirin.

Beriya şer dest pê bike, xeber ji Mîr Kîkanê mîrê Tûranê re hat û leşkerekî ji serbazê Kurdên Biraxoyî ku ji serbazên tîreya Kîkanî û her wiha serbazên tîreyên Edreganî, Mamilî û Kirmanî pêk hatibû, ji bo alîkariya Keyqubad şand. Ev leşker li der û dora bajarê Nînovayê bi leşkerê Aşûrî re ketin himberî hev û sê caran şer hat kirin û her sê caran jî leşkerê Aşûriyan şikest. Keyqubad bi serkeftî û serbilindî vegeriya. Xelkê van

tîreyêñ Kurdêñ Biraxoyî venegeriyan Tûran û Mekranê, heta bi Keyqubad re çûn Madê û li wir bi cih bûn.

### **Çakkirina Keleha Kîkan û Misatinkê**

Di dema şerê navbera Tûranî û Madan de, Kelehêñ Kîkan, Xuzdar, Nixan, Misatink û Gilgalayê hatibûn xerakirin. Mîr Kîkan wêraniya van kelehan ava kir. Ji ber ku nehêniya parastin ûbihêziya bergirî di kelehêñ qahîm de ye. Piştre Mîr Kîkan esker tê de bi cih kirin.

Mîr Kîkan hevçerxê Keyqubadê Paşayê Madê bû, ev mîr û tîreyêñ din ên Kurdêñ Biraxoyî jî hevçerxên wî bûn: Mîr Goran Goranî, Mîr Zaxu Sarûnî, Mîr Mihran Xuzdarî, Mîr Mişkan Mişkanî, Mîr Ermîl Ermîlî, Mîr Bolan Bolanî û Mîr Lerzîn Girîşkanî.

### **2- Mîrêmîran Mîr Zûrak**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Kîkan, kurê mîr Zûrak derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Mîr Zûrak gelek zana û têgihiştî bû û di rêvberiya karê welat de bêemsal bû. Dema ku Mîrnişîna Tûranê ket bin desthilata wî, bi mebesta xizmeta xweşiktirîn a herêma Tûranê, tîreyêñ Kurdêñ Biraxoyî ji bo mijûlî ziraetê bibin û bibin sebebê aramiya rûniştiyêñ welat, li navçeyêñ awa awa yên Tûranê belav kir.

### **Parvekirina Herêmêñ Tûranê**

Mîr Zûrak navçeyêñ jorê yên Tûranê ku bi navê “Bincîr”ê dihatin nasîn da tîreya Kîkan û Goranê, piştî bicihbûna wan, navê navçeyê wek “Kîkanan” hat naskirin. Navçeya naverasta Tûranê ku bi navê “Kuhînar” dihat nasîn da tîreyêñ Xuzdarî, Sarûnî, Girîşkanî û Mişkanî. Piştî bicihbûna van tîreyan, navê bajêr wek “Xuzdar” hat naskirin. Navçeya xwarê Tûranê ku bi navê “Sinarbîl”ê dihat nasîn da tîreya Ermîlê û bi rewşa serdemê re û ji ber niştecihbûna wan, ev navçe bi navê “Ermabîl”ê hat naskirin. Her wiha Geliyê “Derengan”ê ku ketibû cihêñ çiyayî

yên Kîkananê da tîreya Bolanê û piştî bicihbûna wan, navê “Derengan” guherî û bû “Bolan”.

### **Koça Dawiyê ya Keyqubadê Paşayê Mad û Parsê**

Di serdema fermanrewatiya Mîr Zûrak de, Keyqubadê paşayê Mad û Parsê, di sala 759'ê beriya zayînê de koça dawiyê kir û pênc kur li pey xwe hiştin ku navê wan ev bûn: Keykawus, Kiyapû, Kiyaşhir, Kiyarmîn û Kiyabşîn. Mîr û mezinênen welat, kurênen mezin yanî Keykawus li ser text dan rûniştandin.

### **Êrîşen Fermanrewayê Sindanê Li**

#### **Ser Tûranê û Şikestina Wan**

Fermanrewayê Sindanê, Singhar bi bêhêvî ji Geliyê Derenganê êrîşî ser Kîkanan a navçeya jorê Tûranê kir. Leşkerên Kurdên Biraxoyî di nîvê rê de li Geliyê Derenganê rê li dijmin girtin. Piştî şerekî giran, ew şikandin, ji bilî yên bazdan û bi silametî derketin ên din hemû kuştin.

### **Behsa Rostemê Pehlewan**

Vegoter neqil dikan ku Rostemê Pehlewan hevçerxê Mîr Kîkan û Mîr Zûrak bûye. Zalê bavê wî û Samê bapîrê wî mîrên Zabilistanê bûne. Rostemê Pehlewan di destpêkê de bi Efrasyab Paşayê Tûranê re peywendiyênen dostane hebûye û di destpêka selteneta Mad û Parsê de piştevaniya Efrasyab kiriye û li dijî Keyqubad Paşayê Madê şer kiriye. Zalê bavê Rostem di serdema desthilatdariya xwe de bi destê Keyqubad Paşayê Madê hatiye şikandin û xwe avêtiye ba Efrasyab.

Zal bi Rostemê kurê xwe re midetekê li ba Efrasyab dimîne, lê dilmanî dikeve navbera Rostem û Efrasyab û Zal jî berê xwe dide ba Keyqubad. Keyqubad wî dike hevalê xwe û di dawîn şerê navbera Mad û Tûranê de, Zal alîkariya Keyqubad dike û li dijî leşkerê Tûraniyan şer dike. Welatê Tûranê di vî şerî de dişikê û Keyqubad ji Zal razî dibe û mîrnişîna mîrata Zabilistanê dide destan.

## **Êrişa Mîrê Sindanê ya Cara Duyem**

Singhar Mûmîdanê fermanrewayê Sindanê ji şikestina cara yekê ders wernegirtiye û careke din êriş anije ser erdê Tûranê. Vê carê di Gelîyê Calîranê re hatiye nav erdê Tûranê û li Gelîyê Calîranê di navbera Kurdên Biraxoyî û leşkerê Cidgariyan de şerekî giran rû dide. Piştî şerekî giran, şer dibe destpirçkî û Mîr Zûrakê fermanrewayê Sindanê, Mîr Singhar ji hespê davêje xwarê, serê wî jê dike û dike serê rima xwe bilind dike. Dema ku leşkerê dijmin mîrê xwe serbirî dibînin, ji şer sar dibin û bazdidin. Di vî şerî de piraniya leşkerên dijmin hatin kuştin û telef bûn.

## **Koça Dawiyê ya Mîr Zûrak**

Mîr Zûrak hevçerxê Keyqubadê kurê Mad û paşayê Madê bû û çend roj piştî koça dawiyê ya Keyqubad, wî jî dinyaya fanî li pişt xwe hişt. Ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên Mîr Zûrak Kîkanî û Keyqubad Paşa bûne: Mîr Kireck Goranî, Mîr Seldûz Sarûnî, Mîr Kitûn Xuzdarî, Mîr Mirdas Mişkanî, Mîr Mişkan Ermîlî, Mîr Bacel Bolanî û Mîr Tadî Girîşkanî.

## **3- Mîrêmîran Mîr Üstab**

Mîr Zûrak piştî 44 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir û kurê wî Mîr Üstab derket ser textê Tûranê. Üstab mirovekî xwediyyê exlaq û rabûn û rûnişteke baş bû, dadperwerî kiribû rîbaza xwe û gelek qencî bi xelkê dikir. Bi vî awayî, hemû temenê xwe ji bo xizmeta xelkê derbas kir û midetê 45 salan fermanrewatî kir.

Mîr Üstab hevçerxê Keykawusê fermanrewayê Mad û Persê bû û ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî yên hevnijad, hevpile, hevdem û hevçerxên wî bûn: Mîr Şadîn Goranî, Mîr Şakîn Sarûnî, Mîr Kaşik Xuzdarî, Mîr Kirecil Mişkanî, Mîr Xuman Ermîlî, Mîr Pûran Bolanî û Mîr Zîdan Girîşkanî.

#### **4- Mîrêmîran Mîr Zigrîn**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Üştab, serekên Kurdên Biraxoyî Mîr Zigrînê kurê Mîr Üştab ji bo mîrêmîraniyê hilbijartin. Di serdema fermanrewatiya wî de, Keykawus Paşayê Madê bi ocaxkorî koça dawiyê kir û di nav Kurdan de li ser hilbijartina paşayê Madê cihêtiya bîr û rayê û dijîtî peyda bû û tîreyên Kurd li hev ketin. Ev jî ji ber wê bû ku piştî mirina Keykawus du kesên berbiçav hebûn; Lihraspê zavayê Keykawus û Tûsiyê kurê Ferîbûrz sax bûn û Kurd di nav girê astengekê de bûn ku ji van herduyan kîjan ji bo serekatiya Madê hilbijêrin.

Ji van herdu kesan, Lihrasp her çend neviyê kurê Keyqubad û zavayê Keykawus bû, lê bi tecrûbe, karzan û lêhatî nebû û bi kar û rêveberiya seltenetê serî dernedixist. Ev jî bûbû sebebê wê ku di nav civatê de mirovekî qebûlkirî nebe. Dijberî wî, Tûsê kurê Ferîbûrz mirovekî zana, rewşenbîr û siyasetmedar bû û Kurdan ew ji bo serekê seltenetê hilbijartin. Lihrasp di warê mîratê de xwe bi heqtir û pêştir dizanibû û ji fermanrewatiya Tûs re îtaet nekir.

Di netîceyê de, Kurdan ev herdu bi awayekî bi hev re hevdeng kirin ku biryar dan fermanrewatiya herêma Baxter û Kabilistanê bidin Lihrasp. Piştî desthilata van herdu herêman spartin Lihrasp, dawî li girêk û astenga navbera Lihrasp û Tûsî hat. Dema ku Lihrasp jî koça dawiyê kir, paşatiya van herêman di warê mîratê de cardin ket bin desthilata Tûsî.

Kurdên Biraxoyî yên Tûran û Edreganê, Mamilî û Kirmaniyêñ Mekranê di vê girêk û astengê de piştevanî û layengiriya Tûs Paşa kirin û tu peywendiyêñ wan bi Lihrasp re tune bûn.

#### **Êrişa Dadpirsiya Sindan Li Ser Tûranê**

Nîv sedsal beriya textnişîna Zigrîn, Mîr Singhar Mûmîdan êrîş aniye ser Tûranê, di şer de şikestineke heyabirî xwariye û rîya bazdanê daye pêşîya xwe. Matan ku kurê neviyê wî bû, di serdema Mîr Zigrîn de dixwest wê peleya heyabirî ya bapîrê

xwe rake û toleya şikandina wî hilde. Ji bo vê mebestê jî, gelek bi nehênî xwe ji şer re amade dikir. Wê wextê, nûçegihanê Kurdên Biraxoyî ku li ser sînorê Tûranê hatibûn bicihkîrin, Mîr Zigrîn ji mebesta Matan agahdar kirin.

Mîr Zigrîn bi serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî şêwirî û serbazên Kurdên li der û dorê li hemû sînorêni Tûranê, ku bi sînorê Sindanê ve bûn, belav kir. Mîr Zigrîn ev guhestin û bicihkîrin nehênî pêk anî ku nizanibin Kurd bi mebesta şer li der û dora sînoran belav bûne. Serhengên leşker tîravêjîn bi tecrûbe li tengiyêni ser sînor bi cih kirin û ev plana şer danîn: Dema ku leşkerêni Sindan hatin nav erdê Tûranê, dê Kurd bazdin, ji bo ku dijmin bifikire Kurd şikestine û bi xatircemî û bêtirs bêñ nav welat û dorpêça wan hêsan be.

Di netîceyê de, di demsala germahiya sala 700'ê beriya zayînê de, Matan bi artêşekê êrîşî ser erdê Tûranê kir û leşkerêni Kurd paşve kişiyan. Ev fenda Kurdan bi ser ket û serbazêni dijmin pê nehisiya û bi pey Kurdan ketin heta ku hatin nav giran. Vêca Kurdên Biraxoyî li wan vege riyan, wekî mûrî û mûristanan rijiyan ser Cidgalan, li hemû cihî dora wan pêçan, Matan û hemû serbazêni wan kuştin. Dema ku kurê Matan, Bengan ku li dora Ermabîlê mijûlî şer bû ev xeber seh kir, di esnayê bêhnvedanê de meydana şer terk kir û ber bi Sindanê ve bazda. Her çend Mîr Kileck Ermîlî, Mîr Sabûl Sarûnî û Mîr Kiçan Xuzdarî rîya bazdanê dabûn ber xwe, lê di çarenivîsa wan de hêj jiyan mabû û karîbûn bi çend fedayiyêni xwe re bi birîndarî biçin û bi silametî bigihêñ welatê xwe.

Vî şerê giran bi awayekî tirsa dilêri, azayî, cesaret, mîrxasî û camêriya Kurdên Biraxoyî xist dilê fermanrewayêni Sindanê ku di serdema xwe ya dawiyê de dev ji adetê şer û qirênen bi Kurdan re berdin û peywendiyêni dostaniyê bi wan re girêbidin. Netîceya vê jî bû sebebê çûn û hatin û bazirganiya di navbera Kurdan û Cidgalan de.

## **Koça Dawiyê ya Mîr Zigrîn**

Mîr Zigrîn piştî derbaskirina 35 salên şer, mala xwe ji dinyaya fanî bar kir û çû. Mîr Zigrîn bi Tûsî, ku wek Keyxesro jî tê nasîn re hevçerx bûye. Ev serekên han ên tîreyên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Ka Goranî, Mîr Sabûl Sarûnî, Mîr Kîçan Xuzdarî, Mîr Gilbag Mişkanî, Mîr Kileck Ermîlî, Mîr Xuman Bolanî û Mîr Birûş Girîşkanî.

## **5- Mîrêmîran Mîr Zîbar**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Zigrîn, kurê wî Mîr Zîbar hate ser textê Mîrnişîna Tûranê. Mîr Zîbar mirovekî zana, zîrek, ziring û kara bû û di hunera şer de şarezahiyeke wî ya temam hebû. Mîr Zîbar nedixwest bûyerên wan şerên ku di serdemên pêşîn de di navbera Tûran û Sindanê de rû dabûn careke din rû bidin û neteweya Kurdên Tûranê ji bo hemû wextan bi vî awayî ji destdirêjkerî û êrîşhênerên biyanî selamet be. Ji bo vê mebestê jî, li ser sînorêن rojhilate Tûranê ku bi sînorêن Sindan ve bûn, çeper û senger çêkir û serbazêن Kurd tê de bi cih kir ku şev û roj pasevaniya navçeyê dikirin.

## **Koça Dawiyê ya Tûsê (Keyxusrew- Keyxesro) Paşayê Madê**

Di serdema fermanrewatiya Mîr Zîbar de, Tûs Paşayê Mad û Parsê cîhana fanî terk kir û Ferîbûrz hat ser textê seltenetê.

## **Çêkirina Perestgeha Zorak Li Kîkanê**

Dema ku Mîr Zîbar Mîrêmîranê Tûranê bû, Ferîbûrz Paşayê Mad û Parsê bû. Ferîbûrz dûrbîn, destvekirî û bi tedbîr bû. Peywendîyeke wî ya bi hêz bi dîn re hebû û navenda dînê Zerdeşti ku heta serdema fermanrewatiya wî li Belxê bû, veguhest Ekbatana paytexta Madê.

Mîr Zîbar bi bîrlêkirina veguhestina vê perestgeha Zerdeşti, ji bajarê Kîkanê yê paytexta Tûranê, yekem perestgeh

ava kir. Cihê avakirinê jî li ser bilindahiya kopa zincîra çiyayê Zawkê hilbijart ku ketiye pênc fersex xwarê bajarê Kîkanê. Perestgeh jî bi navê “Zorak” da nasîn ku bi Kurdî tê maneya şîyan û bi hêz.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Zîbar**

Mîr Zîbar ji bocejna Newrozê hatibû Xuzdarê û di vê cejnê de di esnayê pêşbirka rimavêtinê de ji hespê ket xwarê û mir. Piştî veşartina Mîr Zîbar destara mîrnişînê li ser Mîr Biraximê kurê wî geriya.

Ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên Mîr Zîbar bûn: Mîr Ramîn Goranî, Mîr Sûrcîn Sarûnî, Mîr Manûr Xuzdarî, Mîr Tûras Mişkanî, Mîr Kirmac Ermîlî, Mîr Keytûn Bolanî û Mîr Pazû Girîşkanî.

### **6- Mîrêmîran Mîr Biraxim**

Piştî mirina bavê xwe Mîr Biraxim hat ser textê Mîrnişîna Tûranê. Mîr Biraxim ji Kurdan hez dikir û dixwest hemû karên mîrnişînê di bin çavdêriya wî de bêñ meşandin. Ji bo vê mebestê jî, hemû wextan di ger û geştê de bû û li hemû goşe û kenarên herêma Tûranê digeriya. Xeberên tîreyên Kurd dipirsî û daxwaz û pêwîstiyêñ wan bi cih dikirin. Mirovekî dîndost û yezdanperest bû, ji ber wê propagandaya dîn dikir û hewl dida xelk ji rêya dîn dernekeve.

### **Avakirina Perestgeha Helwanê Li Xuzdarê**

Mîr Biraxim bi mebesta bihêzkirina dînperestiyê, li Xuzdarê li ser kopa çiyayekî ku 10 fersex ji rojhilatê bajêr dûr bû, perestgehek ava kir û navê wê kir “Helwan”. Di Kurdî de helwan tê maneya “hisçûyî û mest”ê. Ji ber vê perestgehê ew zincîra çiyayan jî bi navê Helwanê hatiye nasîn.

### **Kuştina Ferîbûrz Paşayê Madê Li Bajarê Aşûrê**

Ferîbûrz di sala 625’ê beriya zayînê de rêveberiya selteneta xwe li milekî heta rûbarê Ceyhûnê û li milekî din jî heta Hindê

fireh kir. Piştî vê bi leşkerekî mezin ve ku ji hozên awa awa pêk hatibû, ji bo şerê Aşûriyan ket rê.

Di neticeyê de, leşkerê wî şikest û ew bi xwe jî di şer de hat kuştin. Tirs ket nav Kurdan ku di van şert û mercên ne musâid de welatê Mad û Parsê bikeve bin desthilata Aşûriyan. Ji ber wê bi lez serekên tîreyên Kurd careke din berhev bûn û kurê Ferîbûrz Keyaksar anîn ser text.

### **Mafpêdana Beşdariya Kurdên Biraxoyî û Edreganiyan Di Şerê Neteweyî De**

Dema kuTûs hat ser textê Mad û Parsê, maf da Kurdên Biraxoyî yên Tûran û Edreganê û yên Mamilî û Kirmanî yên Mekranê di şerê neteweyî de beşdar nebin. Ev jî ji ber wê bû ku welatê wan ji paytextê gelekî dûr bû û berpirsê çavdêrîkirina sînorêñ rojhilate bûn. Eger ew li welatê xwe amade nebûna, tirs peyda dibû ku welatên biyanî destdirêjî û êrîşî ser welatê wan bikin. Ji ber vê maf ji wan re hat dayîn ku ew beşdarî şerên neteweyî nebin.

### **Paşabûna Keyaksar**

Piştî kuştina Ferîbûrz, Keyaksarê kurê wî hat ser textê Mad û Parsê. Keyaksar ew mîrata ku ji bavê wî jê re mabû delaletê wê dikir ku bi wî awayî toleyê ji Aşûriyan werbigire. Ji ber vê, Keyaksar dest bi rêkxistina eskerî û leşkersaziyê kir.

### **Tolewergirtina Keyaksar Ji Aşûriyan**

Piştî Keyaksar leşkerekî mezin amade kir, bi mebesta wergirtina toleya bavê xwe, êrîşî ser welatê Aşûrî kir. Aşûriyan bi xurtî bergirî kirin lê li gel wê jî Keyaksar ew şikandin û bajarê Nînovayê dorpêç kir. Dema ku Şarakuyê paşayê Aşûrî fam kir hêviya bergiriyê nemaye, agir bi koşka paşatiyê ve danî û xwe û malbata xwe tê de şewitand.

### **Êrîşa Sîtan Li Ser Erdê Madê**

Keyaksar di şerê Aşûriyan de li navçeya “Navbera Deryayan” (Beynul-Nehrîn) mijûlî şer bû û xeber gihîstê ku

Sîtan êrîşî ser erdê Madê kiriye û piştî derbasbûna ji çiyayêن Qefqasê, gihiştine navçeyêن bakurê Madê û şer û qirêneke nebirî berpa kirine. Keyaksar ji neçarî dev ji şerê Aşûriyan berda û ji bo parêzgariya welatê xwe vege riya. Li jorê rûbarê Urumyeyê şerekî giran bi Sîtiyan re rû da, lê şiyana bergiriya wan nema û bi wan re aştî kir. Ev jî bû sebebê ku Mad û Baqiyan û welatên derûdorê bibin bazara talan, birîn û ziyankariya Sîtiyan, heta wextê ku Keyaksar bi plan ji bo mîvandariyê bang serek û mîrên Sîtiyan kirin û ewqas mey da wan ku bi temamî serxweş bûn û di van şertan de ew yek bi yek kuştin. Bi vî awayî Baqiyan Sîtî jî ji welatê Madê avêtin derve.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Biraxim**

Mîr Biraxim piştî 44 salan fermanrewayî kir, koça dawiyê kir. Ev serekên Tîreyên Kurdêñ Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Buxaz Goranî, Mîr Manî Sarûnî, Mîr Gawr Xuzdarî, Mîr Manûr Mişkanî, Mîr Guren Ermîlî, Mîr Tirman Bolanî û Mîr Tapîn Girîşkanî

### **7- Mîrêmîran Mîr Goran**

Mîr Goran, piştî bavê wî koça dawiyê kir, derket ser textê Mîrnişîna Tûranê û bi dadperwerî sistêma mîrnişînê meşand. Ew mirovekî çakekar bû û li her kesî qencî dikir. Di serdema fermanrewatiya wî de Kiyaksarê paşayê Madê koça dawiyê kir.

### **Paşabûna Azdiyak**

Piştî mirina Keyaksar, Azdiyakê kurê wî derket ser textê Madê. Ev paşa mirovekî lêhatî nebû û nikaribû rîveberiya welatê xwe ya mezin û fireh bike ku wekî mîrat jê re mabû. Mebest û bingeha jiyana xwe li ser qeşmerî, derbaskirina wextê xweş û vexwarina meyê danîbû. Kêf û şadî bi ser desthilatdariya şer de bilind kiribû û eziyetkirina xelkê ji xwe re kiribû adet. Ji ber van sebeban dilê wan jê bi êş bû û xelkê jê hez nedikir.

## **Daxistina Azdiyak Ji Paşatiyê**

Dewleta Madê ku ji ber kirin û gavên Keyaksar gihiştibû wê seviya şikurdarî û hêziyê, di serdema Azdiyak de berê xwe da têkçûn û belengaziyê. Di serdema paşatiya Azdiyak de, kesekî ku bikaribe dewleta Madê bi rê ve bibe nemabû û heta mezin û giregirên dewleta Madê jî xwe dabûn kêfê û serserîtiyê. Li milekî din, xatircemî û asûdeyî ji radebideriya xelkê bûbû sebebê hêrsbûna paşa û vê jî paşa ji sitemkariyên xwe zêdetir germ kiribû.

Bi vî awayî, peywendiyên di navbera dewlet û xelkê de sartir bû û di van şertan de, wezîrê Azdiyak ku navê wî Erpak bû bi serek û mîrên Kurd re li hev kir û piştî wê di civîneke taybet de li ser daxistina Azdiyak pê re rawêjî kirin. Bi nehêni ji Kurişê kurê Çışpişê Duyem ê fermanrewayê Farsê û neviyê keçê yê Azdiyak re nameyek nivîsandin û bi rêya kesekî bawerpêkirî bi nehêni ji Parsagirda navenda welatê Parsê re şandin. Di nameyê de bang kirin Kuriş ku bi leşkerekî kêm ve xwe bigihîne nêzikî Ekbatanê, ji bo leşkerê Kurdên Madê bi serekên xwe ve pê re hevaheng bin. Kuriş jî bi dîtina vê nameyê bi serek û serdarên artêşa xwe re ber bi Ekbatanê ve bi rê ket.

## **Şerê Azdiyek Bi Kuriş Re**

Bi sehkirina vê xeberê re Azdiyak leşkerekî mezin di bin serekatiya Erpak de ji bo bindestkirina Kuriş şand. Erpak di êrişâ duyem de bi ser nakeve û bi leşkerê Madê û Kuriş re rû bi rû dibe. Azdiyak bi vê bûyera nedihat payîn hêrs dibe û vê carê bi xwe bi leşkerekî din ve ber bi Kuriş ve dimeşe. Azdiyak hê di destpêka şer de dişikê û vedigere Ekbatanê û li wir disitire. Di netîceyê de, leşkerên Kuriş dikevin nav Ekbatanê û Azdiyak digirin û selteneta Madê dawî lê tê.

## **Hereketê Kuriş Bi Kurdên Mayî Re**

Piştî Kuriş paytexta Madê Ekbatan kir bin desthilata xwe û textê paşatiyê girt destê xwe, miameleya mihibaniyê

hilbijart û rêz û newaz ji malbata Azdiyak re girt. Ji ber wan peywendiyên xwedîtiyê ku ji milê dayîka xwe ve bi Kurdan re hebû, di nav esker de pileya serdariyê da şahzadeyên Madê. Her wiha, bi Sepnewiya keça Arîtmarê zavayê Azdiyak û keça meta xwe re zewicî. Hemû rêkxistin û damezrayiyên selteneta Madê wekî wan hişt, ji bo hisa cihêtî û biyantiyê di navbera Kurdan û Parsiyan de çênebe. Serek û serdarêni Kurd li kîjan navçeyê bûna newaz kirin û pileya hê bilintir da wan.

Ji ber van sebeban, Kurdên Biraxoyî li ser Mîrnişîna Tûranê û Kurdên Edreganiyê li ser Mîrnişîna Mekranê man û berdewam bûn. Bi heman awayî, li çi cihê Kurdek pileya bilind di dest de bûya, li ser pileyên xwe man û heta Kuriş wî welatê ku bi dest xistibû bi navê “Mad” û “Pars”ê nasî û di pênameyê de tu guhertin nekir.

### Koça Dawiyê ya Mîr Goran

Di serdemâ fermanrewatiya Mîr Goran de, paşatiya Mad û Parsê bi malbata Madê ve ket destê malbata Hexamenşîyan û Kuriş bû desthilatdarê textê Mad û Farsê. Çend meh piştî hatina Kuriş a ser text, Mîr Goran koça dawiyê kir.

Ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Rasîn Goranî, Mîr Şûhan Sarûnî, Mîr Mihran Xuzdarî, Mîr Beyker Mişkanî, Mîr Kusad Ermîlî, Mîr Hekar Bolanî û Mîr Xîzan Girîşkanî.

### Tîreyên Parsê

Li gor vegotinan, navê tîreyên Parsê bi vî awayî ne: Parsagird, Marafîn (Marafî), Marspîn (Marspiyanî), Panşîyanî, Dirusyanî (Diruzî), Diropîkî, Sagartî, Girmanî (Jirminanî), Mardî (Mirdî) û Dayî (Daranî). Ji van Parsagird, Marafîn, Marspîn, Panşîyanî, Dirusyanî û Girmanî gundnişîn û bajarnîşîn bûne û tîreyên Diropîkî, Sagartî, Mardî û Dayî xêwetnişîn û koçer bûne.

Di nav tîreyên bajarnışinan de jî, Parsagird, Marafîn û Marspîn wêrektirîn û berçavtirîn hozên Parsiyan bûne û serek û serdarên wan bi ser tîreyên Parsê yên din ku me li jorê behsa wan kir, baladest bûne û fermanrewatiya xwe bi ser wan de girtine.

### **Desteya Hexamenşîyan**

Tîreyên Parsagird, Marafîn û Marspîn ji hozên fermanrewayî yên Parsiyan bûn û tîreya Hexamenşî şaxeke hoza Parsagird e. Kurişê mîrê vê tîreyê bingeha fermanrewatiya Hexamenşîyan li Mad û Parsê damezirand.

Hexamenşê bapîrê Kuriş serdarê hoza Parsagird bû û tîreyên Parsê di çarçoveya sistemekê de berhev kir û bingeha fermanrewatiya xwe li Parsê damezirand. Bajarekî bi navê Parsagirt ava kir û kir paytexta fermanrewatiya xwe. Piştî mirina wî kurên Çişpişê Duyem, yek li pey yekê fermanrewatiya Parsê kirin.

Di serdema Çişpişê Duyem de, welatê Eylemê ji ber sebebê êrîş û destdirêjiyên Aşûrbanîpalê paşayê Aşûrî ber bi têkçûnê ve çûbû û sistema welat bêhêz bûbû. Çişpiş ji vê rewşê istîfade kir û êrîş bir ser Enşana paytexta wî welatî, ew dagir kir û welatê Eylemê ('Eylam/'Elam) xist bin hukmê xwe. Du kurên Çişpiş ên navê wan Aryan û Kuriş hebûn û Kuriş ji keça Azdiyakê Mad û Parsê bû. Dema ku Çispiş tûşî nexweşiya Kuştari<sup>9</sup> hatibû, fermanrewatiya Parsê da destê Aryan û fermanrewaya Enşanê jî spart Kuriş. Ev herdu welat bacdêrê paşayê Madê bûn.

Azdiyakê Paşayê Mad û Parsê ji ber nebikêrhatinê, mîr û serekên Kurd ew ji ser kar hilda û li cihê wî neviyê keçê Kurişê Hexamenşî anî ser text. Bi vî awayî, fermanrewatiya malbata

---

<sup>9</sup> Di teksta Farisî de "Mewt we zeyset" hatiye nivîsandin.

Hexamenî li ser Mad û Parsê dest pê kir. Bingeha du kurên Çışpişê Duyem bi vî awayî ye: Kurişê Mezin ê kurê Çışpişê Duyem ê kurê Kurişê Yekem ê kurê Kambûcê Yekem ê kurê Çışpişê Yekem ê kurê Hexamenş. Aryanê kurê Çışpişê Duyem ê kurê Kurişê Yekem ê kurê Kambûcê Yekem ê kurê Çışpişê Yekem ê kurê Hexamenş.



## BEŞA SÊYEM

### MÎRNIŞÎNA KURDÊN BIRAXOYÎ LI TÛRANÊ (Dewreya Duyem)

Piştî têkçûna malbata Kurdên Mad, serek, serdar û mîrên tîreyên Mad û Parsê, neviyê keçê yê Azdiyakê paşayê Mad û Parsê ku bi navê Kurişê Hexamenşî dihat nasîn, anîn ser text. Kuriş, piştî hatina ser text, bi tu awayî guhertinek di dameziraweyê selteneta Madê de nekir û wekî berê hişt. Ji ber vê sebebê, mîrnişîna Kurdên Biraxoyî li Tûranê û Kurdên Edreganiyan li Mekranê wekî berê man û di bin siha sozê Hexamenşîyan de cara duyem bingeha fermanrewatiya xwe damezirandin.

#### 8- Mîrêmîran Mîr Zırşan

Dema ku Mîr Goran koça dawiyê kir, serekên Kurdên Biraxoyî Mîr Zırşanê kurê Ewyâ anîn ser textê mîrnişînê. Du kurên Mîr Goran hebûn: Mîr Zîn û Mîr Zırşan. Mîr Zîn kurê wî yê mezin bû, lê di serdema saxiya wî de koça dawiyê kiribû. Ji ber wê Mîr Zırşan bû cihnişîn ku meyla wî ya zêde li ser ziraetê hebû.

#### Çêkirina Bendê Avê

Mîr Zırşan xwezyar bû, ji bo aramî û xweşıya xelkê xwest ku erdêñ bejî avî bike û ji bo vê mebestê jî îstîfade ji avêñ hêsan werbigire. Loma li baniyêñ<sup>10</sup> bê av û cihêñ çiyayî gelek bendêñ avê ava kirin û bi rêya ava baranê bend çêkirin. Bi vî awayî ziraet li Tûranê fireh bû, rûniştiyêñ Tûranê ji sûda ziraetê para

<sup>10</sup> Banû/Banî: Erdê deşt û bilind, ban.

xwe wergirtin û darayî, mal û dewlemendiyek zêde bi dest xistin.

### **Êrîşen Fermanrewayê Sindanê**

Guhertina paşatiyê ji malbata Madê derbasbûna malbata Hexamenşî bû sebebê êrîşen dagirkerî yên Sindan li ser Tûranê. Bagarmê fermanrewayê Sindan gûman kiribû ku ji ber vê rewşa nû ya guhertina paşatiyê, rêveberî û karûbarên seltenatê hêj bi temamî bingeha wê nehatiye danîn, bi hêz nebûye û divê dest biserdegirtina erdê Tûranê hêsan be.

Bi vî awayê bêyî dûrbîniyê, di rêya Ermanbîlê re êrîşî ser xwarê Tûranê kir. Dîdevanên sengerên ser sînoran rêya hatina pêş ve li wan girtin û xebera êrîş û destdirêjiya dagirkerî ya Sindaniyan gihandin Mîr Zırşan ku ew bi serbazên hozan ên tîreyên Kîkanî, Xuzdarî, Ermîlî, Sarûnî û Mişkanî ve daket meydana şer û bi lez dest bi êrîşa ser serbazên dagirkerên Sindan kirin. Desteya tîravêjên Kurd bi awayekî tîr bi ser wan de barandin ku leşkerê Sindan di cihê pêşketinê de rêya bazdanê hilbijartın. Tîrbaranî ewqas tûj û giran bû ku dijmin nikaribû heta bi zexîreyên xwe jî bibin û bi vî awayî di vî şerî de Kurdan destkeftiyek zêde û bêendaze bi dest xistin.

### **Koça Dawiyê ya Kurişê Mezin**

Kuriş piştî hatina ser text, qîmeteke zêde da dagirkirina welatan û seltenata xwe gelek fireh kir û bi nasnavê Kurişê Mezin nav û deng da. Lê di şerekî wilayetên rojhilate de hat kuştin.

### **Paşabûna Kambûciyê Hexamenşî**

Piştî mirina Kurişê Mezin, kurê wî Kambûc hat ser text û wan welatên ku şoriş berpa kiribûn û serî hildabûn jî jê re itaat kirin. Kambûc tûşî nexweşiya “fê”/epilepsiye bû, ji ber wê hinek caran ta û êşeke giran digirt. Kambûc di dawiyê de ji bo dagirkirina Misrê bi rê ket û ew dagir kir.

## Xwekuştina Kambûc

Kambûc piştî dagirkirina Misrê, bi serfirazî û kameranî vege riya û çavê wî li Sûriyê bû. Xeber gihîştê ku perestgeheke Zerdeştî alaya şorişê bilind kiriye. Bi sehkirina vê xebera nexwêş gelekî xemgîn bû û ji bo ku nexwesiya sarayê/epîlepsiyê pê re hebû, hevsengiya mejiyê wî têk çû û xwe kuşt.

## Koça Dawiyê ya Mîr Zırşan

Mîr Zırşan piştî 31 sal fermanrewatiyê, koça dawiyê kir ku hevçerxê Kurişê Mezin û Kembûc bû. Ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Nagan Goranî, Mîr Nêrman Sarûnî, Mîr Şîşar Xuzdarî, Mîr Gurgîn Mişkanî, Mîr Bahûr Ermîlî, Mîr Buxa Bolanî û Mîr Semban Girîşkanî.

## 9- Mîrêmîran Mîr Zûrakê Duyem

Piştî koça dawiyê ya Mîr Zırşan, kurê wî Mîr Zûrakê Duyem hat ser textê Tûranê. Mîr Zûrakê Duyem jî wekî bavê xwe meyla wî li ser ziraetê hebû. Zincîra avakirina bendant domand û ew bendavêni di serdema bavê wî de nêvcî mabûn temam kirin û gihad netîceyê.

## Belavkirina Adetê “Heşer”ê

Zûrakê Duyem yekem mîrê Tûranê bû ku di serdema mîrnişîna xwe de adetê “heşer”ê pêş ve bir. Karêñ mezin û bi qîmet bi rîya vî adetî bi hêsanî gihad netîceyê, bendêñ zêde li seranserê navçeyên banî yên Tûranê ava kirin û ziraet ber bi pêş ve çû. Ev jî bû sebeb ku rûniştiyên Tûranê parêñ zêde bi dest bixin û rewşa wan xweş bibe.

## Şîroveya Adetê Heşerê

“Heşer” tê maneya desteyeke mezin, yanî karekî ku ji aliyê desteyeke mezin an hejmareke zêde mirovan ve bi kolektîvî bê kirin, jê re dibêjin ev kar bi rîya “heşer”ê ve hatiye kirin. Piştî belavbûna vî adetî, li hemû bajar, bajarok û gundêñ Mîrnişîna Tûranê mirov berhev dibûn û karêñ xwe pêk dianîn. Bi rewşa

serdemê re, ev awa karkirin bi navê “heşer”ê hat nasîn.

### **Paşabûna Darayê Yekem ê Hexamenşî**

Kembûc ocaxkor bû, ji ber wê wezîr û mîrên wî Darayê ku neviyê Aryamanê Hexamenşî bû, anîn ser text. Dara di warê zanebûn, hêz, bikêrhatin û dadperweriyê de nav û deng da. Di siyaset û rewşenbîriyê de bêemsal bû û bi wê bihêzî û mezintiyê fermanrewayî kir û karîbû welatê xwe bigihîne kopa mezintiyê.

Di vê navê re, ji bo bêdengkirina parêzgarê perestgehê<sup>11</sup> ku li hemû navçeyên welat alaya serhildan û şorişê bilind kiribûn ket rê ku di netîceyê de ew girtin û kuştin. Piştî vê dest bi dagirkirina welat kir.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Zûrak**

Mîr Zûrakê Duyem piştî 34 sal fermanrewatiyê, koça dawiyê kir. Hevçerxê Darayê Yekem bû û ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Dûc Goranî, Mîr Hînar Sarûnî, Mîr Kaşik Xuzdarî, Mîr Bûlûr Mişkanî, Mîr Amaç Ermîlî, Mîr Dernîl Bolanî û Mîr Zîdek Girîşkanî.

## **10- Mîrêmîran Mîr Ercan**

Mîr Ercan piştî koça dawiyê ya bavê xwe, derket ser textê Tûranê ku mirovekî bikêrhatî û xwediyê exlaqekî baş û bi dadperweriyê bi nav û deng bû. Siwarekî bêemsal bû û tê gotin di dema seferê de sê hespên zînkirî li pêşıya wî diçûn û hespek tenê şıyanê siwariya wî nebû. Her wiha mirovekî kirox û bi ferq bû. Çi karê dest pê bikira digihand netîceyê.

### **Damezirandina Leşkerê Dîdevaniyê**

Mîr Zırşan di serdema fermanrewatiya xwe de li ser sînorêñ hevbeş ên Tûran û Sindanê çendîn senger ava kirin û bi mebesta nobedariyê tê de esker bi cih kirin. Dema ku Mîr

---

<sup>11</sup> Di teksta Farisî de nivîsandiye “Gumat Me‘bed”.

Ercan hat ser text leşkerekî cihê yê dîdevaniyê ava kir ku bi berdewamî di nav sengeran de dîdevanî û çavdêriya sînoran dikirin.

### **Paşabûna Xişayarşayê Hexamenşî**

Dema ku Darayê Yekem tûşî nexweşiya kuştarî bû, Xişaryarşayê kurê wî ku ji Atusaya keça Kuriş bû, wek şahzadeyê wergirê text hat hilbijartin û piştî mirina wî derket ser text. Di destpêka desthilatdariyê de, rûniştiyên Parsê ji dil ew dixwestin û qebûlkiriyê civatê bû.

### **Dagirkirina Misrê û Babîlê**

Di serdema fermanrewatiya Xişayarşa de, welatê Misrê û Babîlê şoriş berpa kiribûn û xwe ji bin destê welatê Parsê rizgar kiribûn. Ji ber wê, Xişayarşa ber bi Misrê ve bi rê ket û piştî şerekî giran, Misrî şikandin û agirê serhildanê tefand.

Piştî wê, Xişayarşa berê xwe da Babîlê, bajar dorpêç kir û eskerên nav bajêr neçar man çekêن xwe bavêjin û teslîm bibin.

### **Êrişa [Xişayarşa] ya Ser Yûnanê**

Dema ku Xişayarşa ji dagirkirinê vala ma, bala êrîskirina ser Yûnanê rakêşa. Ji bo vê mebestê jî, leşkerê derya û reşahiyê berhev kir û bi leşkerekî mezin û pirçek û amadehiya şer êrîşî erdê Yûnanê kir.

Vî şerî dirêj kêsa û di dawiyê de di şerê “Silase”yê de neviyên Parsê şikestin. Piştî vê şikestinê Xişayarşa, serdariya leşker da destê Merdûnya û ew bi xwe ber bi Parsê ve vege riya.

### **Kuştina Pindranê Birayê Mîr Ercan**

Di serdema mîrnişîniya Mîr Ercan de, desteyek rîgir û tawanbarên Cidgaliyên Sindanê bi nehêni çûbûn nav çiyayê navbera bajarê Kîkan û Bilbilanê û li ser bilindtirîn kopa şaxêن çiyayê Mulkeyê bi cih bûbûn. Ev kemîngeh, nişîngeh û penageha wan bû û dema ku xelkê rîwî û karwanî diçûn seferê, rê li wan digirtin û talan dikirin.

Mîr Ercan birayê xwe Mîr Pindran ji bo bêdengkirina vê desteyê bijart ku wî jî bi şev bê payîn êrîşî ser wan kir. Lê di şer de birîndar bû û birîna wî ewqas xeter bû ku nikaribû xelas bibe û mir. Ji ber vê bûyerê, navê wî geliyî wek “Pindran” hat nasîn.

### Kuştina Xişayarşayı Hexamenşî

Dema ku Xişayarşa ji şerê Yûnanê vege riya û hat Parsê, divîbû heyfa şikestina Yûnanê hilaniya û xwe ji bo şer amade bikira.

Lê dijberî vê, jiyana xwe ji bo şahîkirin, wextê xweş û vexwarina meya zêde amade kir. Rûniştinên şahiya li ser amadekariya şer û şerkirinê li ser hakim bû û duçarî tirsonekî, bêdilî û tembeliyê bû.

Ji ber van sebeban, mîr û endamên dewletê û mîrên leşker lê zîz û bêzar bûn. Di wê navê re, Erdewanê mîrê serbazên amadesaz bi mezinên dewletê û dewlemendên koşka paşayî re li hev kir û Xişayarşa kuştin.

### Koça Dawiyê ya Mîr Ercan

Mîr Ercan 25 sal fermanrewatî kir û piştre tûşî nexweşiya zerdikê bû û koça dawiyê kir. Hevçerxê Xişayarşayê paşayê Hexamenşî bû û ev mîrên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Çirmûk Goranî, Mîr Kabû Sarûnî, Mîr Dewlem Xuzdarî, Mîr Tütik Mişkanî, Mîr Kembîl Ermîlî, Mîr Xîzan Bolanî û Mîr Pîlar Girişkanî.

## 11- Mîrêmîran Mîr Şamûz

Mîr Şamûz li cihê bavê xwe hat ser textê Tûranê û mirovekî zana û hişmend bû û bêyî ku bi serekên tîreyên Kurdan bişêwiriya tu kar nedikir. Serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî her wextê hevkarêن wî bûn û di dîwana wî de di amadehiyê de bûn. Mîr Şamûz di şûrbaziyê de bêemsal bû û di şer de du şûr dixist destê xwe û mertal bi kar nedianî.

## **Paşabûna Erdeşêrê Yekem ê Hexamenî**

Erdewan Xişyarşa di odaya raketinê de kuşt û xwest Erdeşêr ku şahzadekî temenê wî biçûk bû texnişîn bike û bi vê rîyê desthilata welat bigire destê xwe. Lê ji bo hebûna Darayê kurê mezin ê Xişyarşa ev ne mimkun bû. Ji ber wê Erdewan, wek ku Darayê birayê mezin bavê xwe kuştiye û gerek toleya bavê xwe hilîne Erdeşêr han da û wisan kir ku Dara bikuje.

Bi vî awayî Dara hat kuştin û piştî wê Erdewan bi rihetî li dijî Erdeşêrê paşayê nû serî hilda û dixebitiya wî jî bikuje. Lê Erdeşêr bi plana wî hesiya, serê wî birî û welatê xwe ji tevlihevî, kînperwerî û bednişîniyê rizgar kir.

## **Êrişa Mîrê Sindanê a Ser Tengava Mîlayê**

Kindabûc Mîrê Sindan bi serbazên peyade û siwarî yên Cidgalan ku hemû çekdar û zirxpoş bûn, ji Kindabîla paytexta Burhayê ketibû devê Tengava Mîlayê, ber bi erdê Tûranê ketin rê û hatin Tengava Mîlayê. Li wir sengerên pasewanê serbazên Kurdan dagir kirin, hemû dîdevanê wan kuştin û tenê yek jê sax nema ku xebera vê êrişa leşkerê Sindanê bigihîne mîrê Tûranê.

Piştî çend rojan, rêwiyên Kurd ên Biraxoyiyê Xuzdarê xebera vê bûyera diltezin gihadin Mîr Şamûz, ew jî bi sehkirina vê gelek dilteng û aciz bû. Leşkerên hozî yên Kurd bi lez berhev kirin û ji Kîkanê hat Xuzdarê. Li wir bi mîrên serbazî/eskerî şêwirî û leşker li ser sê qolan<sup>12</sup>, qolê rast, qolê çep û qolê navendê parve kir. Serekatiya qola yekem da Mîr Mirdas Sarûnî, ya duyem da Mîr Xerzan Xuzdarî û bi xwe jî serekatiya qola sêyem girt destê xwe û ber bi Tengava Mîlayê ket rê. Dema ku leşkerê Biraxoyî nêzikî leşkergeha Cidgalan bûn, desteya serekî ya artêsa Sindan bi awayê çargoşeyî xwe rêk xist. Ji Kurdan re hêj hejmar û hêza dijmin ronî nebûbû, ji ber wê di destpêkê de desteya pêşîn (pêşqerewîl) cihê xwe

---

<sup>12</sup> Bi me'naya ball yan beşa artêşê.

girt. Desteya serekî ya şervanê Biraxoyî ku hemû çek û cebirxaneyên xwe di bin kincên xwe de veşartibûn li navenda meydanê bûn û bi yek işareta mîr van eskerên siwarî kincên xwe avêtin û bi hawara sew‘î û dengê dehulan êrîşî ser sefên Cidgalan kirin. Kindabûcê mîrê Sindan beriya xwe ji vê tirs û ecêbmayînê xelas bike, xwe di nav dorpêça leşkerên Biraxoyî de dît. Tîravêjên Kurd leşkerên peyade yên Cidgalan ji hemû milan ve dorpêç kirin û ew dan ber tîrbarana mirinê. Di netîceyê de, şerê destpirçkî di navbera Cidgalan û Kurdan de dest pê kir, Kindabûcê mîrê Sindan birîndar bû û ber bi paşve kişiya. Hinek serbazên Cidgalan li girekî biçûk senger girtin û ji bo parastinê mertalên xwe li pêşıya xwe danîn û bergirî li xwe kirin heta hemû hatin kuştin. Mîr Şamûz serê Kindabûcî ji laşê wî cihê kir, bi şerê rima xwe bilind kir û bi yekcarî berê xwe da qola navendê ya leşkerê Cidgalan. Serbazên Cidgalan şikestin û dest bi bazdanê kirin. Lê ji aliyê Kurdên Biraxoyî ve hemû rê li wan hatibû girtin, berê xwe didan kîjan milî rastî şûrên Kurdan dihatin û dihatin kuştin.

Vî şerî di sala 454'ê beriya zayînê de rû da û nêzikî 15 hezar serbazên Cidgalan hatin kuştin. Kurdan ji bo yadê vê serkeftin û serbilindiyê navê cihê şerî kirin Mîr Şamûz. Ev tîreyên xwarê yên Cidgalan, di vî şerî de ji bo piştevaniya Kindabûcê mîrê Sindan beşdarî kiribûn: Luhanî, Sithunanî, Ebranî, Maçanî, Bembî, Çexawerî, Canî, Dendawer, Kilwarî, Mencuhrî, Nisurî, Puhurî, Runcahî, Gungu, Mangî, Engarî, Radî, Randanî, Camus, Dihur, Mundır, Bunarî, Sumarî, Bihatî, Kuhlî, Lake û Kihukihrî.

### Koça Dawiyê ya Erdeşêrê Yekem

Erdeşêr piştî 40 sal fermanrewatiyê, koça dawiyê kir. Di serdema fermanrewatiya wî de selteneta Hexamenî ber bi hilweşînê ve diçû û şela paşveçûnê di welat de tovê xwe çandibû. Li gel vê hemû bêhêzî, nerêkî, nerastî û nezanînê, serdema fermanrewatiya Erdeşêrê Yekem dirêj kêsa.

## **Koça Dawiyê ya Mîr Şamûz**

Piştî mirina Erdeşêrê Yekem, Mîr Şamûz jî koça dawiyê kir. Ev serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Kazan Goranî, Mîr Mirdas Sarûnî, Mîr Xerzan Xuzdarî, Mîr Duxan Mişkanî, Mîr Basîr Ermîlî, Mîr Mişkan Bolanî û Mîr Maxan Girîşkanî.

## **12- Mîrêmîran Mîr Biraxmê Duyem**

Piştî mirina Şamûz, kurê wî Mîr Biraxmê Duyem hat ser textê Mîrnişîna Tûranê. Mîr Biraxm mirovekî xwediye exlaqekî baş, qisexweş û boriya baş bû. Her wextê jiyanâ tijî aramî ji bo tîreyên Kurdên Biraxoyî temîn dikir û ji bo qencî û ewlekariya wan têdikoşıya. Her wiha, ji bo pêşvebirina ziraetê û alavên wê hêşankarî dikir.

### **Kolana Karêzan**

Mîr Biraxmê Duyem di serdema fermanrewatiya xwe de îstîfade ji çavkaniyêñ din ên avê wergirt ku jê re “karêz” dibêjin. Bi rêya vê çavkaniyê karibûn zexîreya ava binerd bînin ser erdê û ji bo kar û barêن ziraetê bi kar bînin. Ev awa, di serdema Mîr Biraxmê Duyem de adetê kolana karêzan bi awayekî berfireh pêşve çû û li her cihekî musâid bûya xelkê navçeyê karêz dikola û ava wê bi kar dianîn.

### **Parvekirina Destkeftiyêñ Şer**

Ew destkeftiyêñ di şerê Kindabûcê fermanrewayê Sindanê de bi dest Kurdan ketibûn, ewqas zêde bûn ku Mîr Şamûz di serdema fermanrewatiya xwe de nikaribû parve bike, ji ber ku çend roj piştî şer koça dawiyê kir. Piştre Mîr Biraxmê Duyem ê kurê wî ev destkeftî di navbera mafdaran de parve kir.

### **Paşabûn û Kuştina Xişyarşayê Duyem**

Piştî mirina Erdeşêrê Yekem, kurê wî Xişyarşayê Duyem derket ser textê seltenetê û tenê 45 rojan fermanrewayî kir. Ji ber ku Sifidyanûyê birayê wî ku ji cariyekê bû, çavnebarî lê

dikir. Di rûniştineke şevê de Xişyarşayê Duyem ewqas mey vexwar ku serxweş bû, bêhiş ket û ew di wî halê bêhişiyê de kuştin.

### **Paşabûna Darayê Duyem ê Hexamenşî**

Dema ku Sifidyanû Xişayarşa kuşt, Oxus fermanrewayê Belxê bû. Endamên dewletê ji ber vê kirina nebaş, ji Sifidyanû aciz bibûn. Ji ber wê bi Oxus re bûn yek û Sifidyanû girtin. Piştre ji ber toleya xwîna birayê wî kuştin.

Oxus nasnavê “Dara” hilbijart û derket ser textê seltenetê ku mirovekî bedkirdar, xweperest, tembel û bêhêz bû. Xwedyeyê îradeyeke bi hêz nebû û desthilata hikûmetê di bin destê şahjin û sê kesên xesandî de bû. Ji ber wê, li seranserê welat şoriş û serhildan berpa bû. Nearamî çêbû û li hemû cihan şer û qirênan dest pê kir. Ev rewş bû sebebê bêhêziya dewletê û malbata Hexamenşî. Lê Darayê Duyem li gel van hemû bedkarî û tawanbaryê heta 20 salan fermanrewayî kir û piştre koça dawiyê kir.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Biraxmê Duyem**

Mîr Biraxmê Duyem dozdemîn fermanrewayê Mîrnişîna Tûranê bû û 24 salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir. Ev serekên Kurdên Biraxoyî hevçerxên wî bûn: Mîr Zeynel Goran, Mîr Rîgan Sarûnî, Mîr Kusad Xuzdarî, Mîr Katîn Mişkanî, Mîr Bûlak Ermîlî, Mîr Sîkran Bolanî û Mîr Sarim Girîşkanî.

### **Koça Dawiyê ya Darayê Duyem**

Darayê Duyem nêzikî 20 salan fermanrewatî kir û piştî wê koça dawiyê kir. Beriya koça dawiyê bike Erşikê kurê wî bi şahzadeyî text wergirt û hat hilbijartin ku ew jî piştre bi navê Erdeşerê Duyem hat ser textê fermanrewatiyê.

## **13- Mîrêmîran Mîr Sabûl**

Piştî mirina Mîr Biraxmê Duyem, kurê wî Mîr Sabûl

hat ser textê Tûranê. Mîr Sabûl mirovekî dadperwer, dûrbîn û sexbêr bû. Di serdema fermanrewatiya wî de rewşa bêhêzî, aramî û netebayî li welatê Farsê fireh bûbû û mîrên dewletê li pey şer û qirênan digeriyan. Mîr Sabûl amade nebû rewşa netebayî û bêqanûnî di welatê wî de jî belav bibe. Ji ber wê, welatê Tûran û Mekranê ji şer, ziyankarî, bedxweyî û tevliheviyê parast.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Sabûl**

Mîr Sabûl Kîkanî piştî 31 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir ku hevçerxê Darayê Duyem ê Hexamenşî yê paşayê Pars û Madê bû. Ev serekên Kurdên Biraxoyî hevçerxê wî bûn: Mîr Goran Goranî, Mîr Keytûn Sarûnî, Mîr Mişkan Xuzdarî, Mîr Zurân Mişkanî, Mîr Eram Ermîlî, Mîr Sasun Bolanî û Darûn Girîşkanî.

### **Paşabûna Erdeşêrê Duyem**

Erdeşêrê Duyem, piştî mirina bavê xwe derket ser textê Parsê û 41 sal fermanrewatî kir. Erdeşêr mirovekî hêmin û mîhrîban bû û hemû wextan bi efûkirin û çavlêgirtina xelitiya kar dikir. Ev jî dibû sebeb ku mîr û berpirsên dewletê li dijî fermanên wî derkevin.

Di serdema desthilatdariya wî de serhildan û dijîtiyên zêde hebûn. Tê gotin hejmara jinêñ wî 360 bûne û 115 kur û keçen wî hebûne. Piraniya zarokên wî di serdema saxiya wî de mirine û çar kurên wî yên navêñ wan Dara, Aryasb, Ersam û Uks li pişt xwe bi cih hiştine û ji wan kurê xwe yê mezin wek şahzadeyê wergirê text hilbijartiye. Li gor hin gotinan Erdeşêrê Duyem 64 salan fermanrewatî kiriye.

### **14- Mîrêmîran Mîr Nûrgan**

Piştî Mîr Sabûl koça dawiyê kir, serekên Kurdên Biraxoyî, kurê wî yên navê wî Nûrgan anîn ser textê Mîrnîşîna Tûranê. Dema ku Mîr Nûrgan fermanrewatiya Mîrnîşîna Tûranê girt destê xwe, rewşa navçeyêñ der û dorê ne guncaw û ne sazgar

bû û bazara şer û tevliheviyê li hemû milên welatê Mad û Parsê germ bû. Mîrên dewletê bi hev re şer dikirin û her kesî dixwest li hemberî yê din bihêztir be û wilayetên zêdetir bîne bin desthilata xwe.

Mîr Nûrgan mîrovekî zîrek û têgihîstî bû, ji ber wê sîstema mîrnişîna xwe ji van tevlihevî û qelebalixiyâ parast û Kurd bi bergiriya Tûranê mijûl kirin.

### **Avakirina Keleha Nûrganê**

Piştî êrîşên mezin ên mîrê Sindanê yên ser Tengava Mîlayê yên di serdema Mîr Şamûz de, ev rastî ronî bû ku bergiriya gel jar bûye. Ji ber wê, Mîr Nûrgan li Geliyê Siwîndrûnê ji milê bakurê Tengava Mîlayê ve dest bi avakirina kelehek mezin û qahîm kir. Ji bo di dema pêwîstiyê de bi rehetî bergiriya gelî bê kirin. Ev keleh li nêzikî kaniyeke li ser kopa çiyê ava kir û serbazên Kurd ji bo dîdevaniyê tê de bi cih kir. Piştî avakirina vê kelehê, navçe bi navê “Nûrgan” hat nasîn.

### **Koça Dawiyê ya Erdeşêrê Duyem**

Erdeşêrê Duyem, piştî 64 sal fermanrewatîkirinê, koça dawiyê kir û çar kur jê man ku navê wan Dara, Eryasb, Ersam û Uks bûn. Hê di serdema fermanrewatiya xwe de Dara wek şahzadeyê wergirê text hilbijartibû. Mîr Sabûl, mîrêmîranê Tûranê yên hevçerxê wî bû.

### **Paşabûna Erdeşêrê Sêyem**

Piştî koça dawiyê ya Erdeşêrê Duyem, kurê wî yê biçûk Uks nasnavê Erdeşêrê Sêyem ji xwe re hilbijart û derket ser text. Lê mirovekî xwediyê kirinên xerab, bêexlaq û hundirê wî pîs bû û di nav mirovên xerab de hatibû perwerdekirin. Ji ber wê tebîet û exlaqê wan wergirtibû û ketibû nav rêza wan.

Darayê birayê wî yê mezin ku hê di serdema saxiya bavê xwe de şahzadeyê wergirê text bû, bi fêl û fendan kuşt. Eryaspê birayê wî jî ku mirovekî exlaqxweş, xwediyê peywendiyên baş, rûgeş, zimanşîrîn û pesendkiriyyê endamê dewletê bû, rabû ew

jî ji orteyê rakir. Her wiha hemû pismam, kes û nêzikên xwe jî kuştin, ku kesek ji daxwazkarê text û tacê seltenetê nemîne.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Nûrgan**

Mîr Nûrgan hevçerxê Erdeşêrê Sêyem bû û ev serekên Kurdên Biraxoyê jî hevçerxên wî bûn: Mîr Mihran Goranî, Mîr Başûk Sarûnî, Mîr Bîfil Xuzdarî, Mîr Bûzîk Mişkanî, Mîr Ükî Ermîlî, Mîr Kelfil Bolanî û Mîr Nûxê Girîşkanî.

### **15- Mîrêmîran Mîr Kiyanûş**

Piştî mirina Mîr Nûrgan, serekên Kurdên Biraxoyî Mîr Kiyanûşê kurê wî anîn ser textê Mîrnişîna Tûranê ku di serdema fermanrewatiya xwe de ji bo tebayî û yekîtiya rêsê tîreyêñ Kurd têkoşıya. Hewldana wî nehişt şîrazeya Kurdan têk biçe û ji hev cihê bibin û di navbera wan de problem çêbibe. Bi ekis yekgirtin û pêwîstbûnî zêdetir xurt kir. Ev jî gelekî pêwîst bû, ji ber ku li hemû navçeyêñ Mad û Parsê tevlihevî û serhildan belav bûbû. Dadgeriya welat di kûrahiya têkçûnê de bû û kar û barêñ sîstema welatê Mad û Parsê duçarî dijîtî û tevliheviyê hatibû.

### **Kuştina Erdeşêrê Sêyem**

Bagwasê xesandî pismamê bawerpêkirî yê Erdeşêr bû û hewesa paşatiyê di mejiyê wî de bi cih bûbû. Dilê wî bêyî wê av venedixwar ku desthilata hemû welat di destan de bû û birêvebirê reş û spî yê welat bû. Ji ber vê hêviyê jehr da Erdeşêr û ew kuşt.

### **Koça Dawiyê ya Kiyanûş**

Mîr Kiyanûş piştî 12 sal fermanrewatî kir, di salêñ xwe yên xortîniyê de tûşî nexweşiya xûrikê bû û koça dawiyê kir. Mîr Kiyanûş hevçerxê Erdeşêrê Sêyem bû û ev serekên tîreyêñ Kurdên Biraxoyî jî hevçerxê wî bûn: Mîr Gîştar Goranî, Mîr Înax Sarûnî, Mîr Zerîn Ermîlî, Mîr Lakûr Bolanî, Mîr Bilbas Girîşkanî, Mîr Kireçil Xuzdarî û Mîr Biraxim Mişkanî.

## **16- Mîrêmîran Mîr Kîkanê Duyem**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Kiyanûş, kurê wî Mîr Kîkanê Duyem hat ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di hatina serdemâ li ser text de rewşa nerêkî û tevliheviyê li Mad û Parsê gihabû kopa serî û tevlihevî li hemû cihî germ bû. Mîr Kîkan xwe di çarçoveya van probleman de di dorpêçê de dît. Ji ber wê xwe mijûlî birêkûpêkîkirina sîstema neteweyî û perwerdekirina leşkerê tîreyên Kurdan kir.

### **Paşabûna Darayê Sêyem**

Dema ku Bagwas jehr da Erdeşêrê Sêyem, kesekî ji malbata Hexamenî ku navê wî Kidman bû û jiyana goşenîşiyê derbas dikir û biraziyê Astinê birayê Erdeşêrê Sêyem bû, ji bo textê seltenetê hat hilbijartin. Dema ku Kidman derket ser text, nasnavê “Dara” ji xwe re hilbijart.

Dara mirovekî şıyanê paşatîyê bû û li sembol, kar û barên seltenetê şareza bû. Her wiha mirovekî bexşînde û mîrxas bû û ji pêşrewêن xwe gelekî bikêrhatâtir bû. Dema ku Bagwas vê hilbijartina miamele û exlaqbaşıya wî dît, tirs ket dilê wî û biryar da jehrê bide wî. Lê Dara ji plana wî agahdar bû û ew neçar kir bi xwe jehrê bixwe û bimire.

## BEŞA ÇAREM

### KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA YÛNANÎ Û HINDIYAN DE

#### Êrîşa Yûnaniyan a Ser Erdê Mad û Parsê

Welatê Yûnanê ji giravên awa awa yên mezin û biçük pêk hatiye û her giravek di bin desthilata fermanrewayekî de bûye. Ev fermanrewayî di nav xwe de yekgirtî û teba nebûne, heta hemû wextan êrîşen talankerî li ser hevdû kirine. Ji ber vê sebebê, paşayên Mad û Parsê bi ser wan de hakim bûne.

Makedonya wilayeteke mezin a Yûnanê bû ku navê paşayê wê Fîlqus [Philippos] bû û dixwest wilayetên Yûnanê bigihîne hev û êrîşî ser erdê Mad û Parsê bike. Ji wê jî agahdar bû ku heta dema çek û wasiteyên wî yên şer ji yên dijmin baştir û seviyebilindir nebin nikare li ser wan yanî Madan û Persan hakim bibe. Lê dema ku dest bi nûsaziya çekan û amadekariya şer kir, mirovekî navê wî Pausaniyas ji bo çaresiyeke qanûnî berê xwe da Fîlqus û biryara pirsê li gor berjewendiyên wî nehat dayîn, ji ber wê dilê wî ji Fîlqus eşiya û di firsetekê de ew kuşt. Piştî vê bûyera diltezîn, Îskenderê kurê Fîlqus derket ser textê Makedonyayê û kar û barên şer yên bavê wî dest pê kiribû girt destê xwe.

#### Destpêkirina Şer

Îskender di sala 334'ê beriya zayînê de, şer da destpêkirin û ji bo dagirkirina welatên Asyayê ket rê. Di destpêkê de

Sûriye û Misir dagir kir û piştre berê xwe da navçeyên Mad û Parsê û di yekem şerê bi welatê Mad û Parsê de şikest û bi paş ve vegeriya. Îskender bi pey Dara ket û bajar û bajarokên wî hêdî hêdî dagir kirin û heta gihîşt navçeya “Gagamîlan”ê û li vir piştî şerekî giran Dara şikand.

Di netîceya vê şikestinê de, Dara bêdil bû û navçe terk kir û ber bi rojavayê welat ve çû. Dawî, Bisûsê fermanrewayê Belxê û Birsanê mîrê Sîstanê li navçeya Dimxanê Dara hêsîr kirin. Îskender gelek bi lez xwe gihad navçeya wan. Dema ku Bisûs xebera hatina Îskender seh kir, bi hevkarên xwe re Dara kuşt û bi vî awayî xwe ji şerê Îskender rizgar kir û çiraya serdema Hexamenşîyan jî tefand.

### **Hatina Îskender a Hindê**

Îskenderê Makedonî, piştî dagirkirina wilayetên rojavayê Mad û Parsê, heta du salan geşta li ser van erdên dagirkirî domand, her çend hemû welatê Mad û Parsê kiribû bin desthilata xwe, karekterê bi zorî girtina welatan têhniya vê selteneta fireh û mezin neşikand û timaya dagirkirinê cardin xwe livand ku bi dagirkirina wan welatên ku ketibûn rojhilate Mad û Parsê rabe û bike bin desthilata fermanrewatiya xwe. Ji bo bicikhirina vê mebestê, zincîra çiyayê Hindûkûşê derbas kir û hat nav erdê Hindê û wilayeta Pencabê dagir kir. Bi niyet bû hêj pêş ve biçe û ew wilayetên ku ketibûn rojhilate Pencabê dagir bike. Lê serbazên Yûnanî li dij derketin û ber bi pêş ve neçûn.

### **Vegera Îskenderê Makedonî**

Dema ku Îskender his bi wê kir ku serbazên wî ji şer û êrîşkirina berdewamî bêzar û bêdil bûne, ji neçarî biryara vegerê da.

Di destpêkê de ber bi başûr ket rê û hat nav erdê Sindanê

û li qeraxê rûbarê Sindanê<sup>13</sup> leşgergeha xwe damezirand. Li wir artêşa xwe bi ser du beşan ve parve kir. Beşeke ku ji saman, barên giran û serbazên birîndar pêk hatibû di bin serekatiya serleşker Kirayturas de bi rêya Tûranê ber bi Zabilistanê ve şand û bi xwe jî bi artêşa li wir ve çû bendergeha Dîwlê. Li wir careke din artêşa xwe bi ser du beşan ve parve kir û beşek jê di bin serekatiya Niyarkusê mîrê deryayê de bi keştî û beleman bi rêya ava Deryaya Umanê ber bi Parsê ve şand. Beşa din jî di bin serekatiya wî de bi rêya reşayîyê ber bi Parsê ve bi rê ket. Di destpêkê de hat navçeya Ermabîlê ya xwarê Tûranê û piştî derbasbûna ji çend navçeyan gihîşt wilayeta Mekranê. Ji Mekranê çû Parsê û ji wir jî hat Babilê. Li Babîlê nexweş ket û di serdema xortîniyê ya temenê 32 salî de koça dawiyê kir.

### **Şerê Kurdên Tûran û Mekranê Bi Leşkerê Îskender Re**

Dema ku xeber gihîşt Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê ku Îskenderê Makedonî bi leşkerê xwe ve ji xwarê Tûran û Mekranê ve vedigere Parsê, serekê Kurdên Tûran û Mekranê bi hev şêwirîn û biryar dan bi liberçavgirtina adetê camêrî yê Kurdên Beluçî bi dijmin re şer bikin. Ji bo ku ji dijmin re ew gûman çênebe ku rûniştiyên erdê Tûran û Mekranê bê berxwedanî û xwînrêtinê erdê xwe didin destê dijmin.

### **Danîna Nexşeya Şer**

Îskender hêj li erdê Sindanê di rê de bû ku serekên Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê li navçeya Mengurê berhev bûn û plana şer danîn û awayê berxwedana navçeyan bi rêk xistin.

---

<sup>13</sup> Divê mebest rûbarê “Sind”ê be ku çavkaniya herî mezin a ava Pakistanê ye û çavkaniya ‘wê li Hindistanê ye. Ji nav herêmên Pakistanê derbas dibe û di dawiyê de dirije nav Okyanusê. Li gor peymana “Sindtas”ê ku di bin çavdêriya Banka Navneteweyî di sala 1960’ê de encam da, Pakistan ava wî rûbarî bi kar tîne.

Tîreyêñ Bolanî û Goranî bi serdarêñ xwe Mîr Berûz Bolanî û Mîr Rûşî Goranî re bergiriya Tengava Bolaniyê girtin ser xwe. Bergiriya Tengava Mîlayê spartin Mîr Şadîn Xuzdarî û Mîr Rasîn Mişkanî û tîreyêñ wan. Mîr Kîkan bi tîreyêñ Kîkanî, Sarûnî, Ermîlî û Girîşkanî û her wiha Mîr Ebûsan bi desteyêñ tîreyêñ Edreganî, Mamilî û Kirmanî ve hatin Ermabîlê û li ser rêya derbasbûna Îskender senger çêkirin û çaverêya hatina wî bûn.

### **Şer û Derketina Kurdêñ Beluçî Ji Tengava Mîlayê**

Dema ku Kiraytursê serleskerê Yûnanî di qeraxêñ Rûbarê Sindanê re gihişt deşta Bedhanê û ji wir hat Tengava Mîlayê, tîreyêñ Kurdêñ Beluçî şerê lêdan û bazdanê dan destpêkirin. Bi şev êrişî ser leşkergeha wan dikirin û serbazên dijmin dikuştin. Kirayturs gelek bi zehmetî û dijwarî ji Tengava Mîlayê derbas bû û hat Geliyê Kuhîranê. Li ber devê vî geliyî li navçeya Ziydanê şerekî giran di navbera Kurdêñ Beluçî û Yûnaniyan de rû da. Mîr Rasîn Mişkanî hat kuştin û Mîr Şadîn bi birîndarî xwe rizgar kir û ber bi Ermabîlê ji bo alîkariya Kurdêñ Beluçî ket rê.

### **Hatina Îskender a Nav Erdê Tûranê û Dagirkirina Ermabîlê**

Dema ku Îskenderê Makedonî ji welatê Sindanê hat navçeya Ermabîla Tûranê, li Geliyê Erkîlanê leşkergeha xwe damezirand. Li vir Kurdêñ Beluçî û Yûnanî rû bi rûyê hev bûn û Kurdêñ Beluçî şerê lêdan û bazdanê dan destpêkirin. Piştî şerekî giran, leşkerên Kurdêñ Beluçî ber bi paş ve vekişîyan. Mîr Cagîn Sarûnî û Mîr Nûrgan Ermîlî bi desteserbazên xwe ve hatin nav Keleha Ermabîlê û senger girêdan. Îskender bi lez li pey wan gihişt wir, bajar dorpêç kir û eskerên wî ji her çar milan ve êrişî ser kelehê kirin û ew girtin. Di van kuştin û kuştariyan de gelek lawên şervan ên Kurdêñ Beluçî telef bûn.

## **Şer Li Tengava Hullînê**

Piştî dagirkirina bajarê Ermîlanê, tîreyên Kurdên Sarûnî û Ermîlî bazdan Tengava Hulînê ku li vir tîreyên Kurdên Tûran û Mekranê ji bo bi Yûnaniyan re şer bikin berhev bûbûn. Îskender bi eskerê xwe ve zû li pey wan gihîst wir. Şerekî xwînavî di navbera wan de rû da û Yûnanî bi ser Kurdan de hakim bûn. Di netîceyê de Kurd paşve kişiyan û belavî nav çiyayan bûn. Piştî vê, hemû tîreyên Kurdên Beluçî di Geliyê Galgalê de berhev bûn û xwe ji şerekî mezin re amade kirin.

## **Şerê Galgalanê Li Navçeya Raskîcanê**

Îskender bi eskerê xwe re gelek bi zehmetî Tengava Hulînê derbas kir û li Geliyê Galgalanê leşkergeha xwe damezirand. Ev gelî ketiye navbera Rûbarê Puralê û zincîra Çiyayê Hulînê ku meydañeke pehn û fireh e. Îskender li vir ma û çaverê dikir ku leşkerê deryayî bigihê qeraxên Raskîcanê ku bi geliyê Galgalê ve bû û lenger bavêje, piştre leşkerê reşayî û deryayî bi hev re şêwrê bikin ku piştî berhevkirina agahdariyên li ser rê, bi rê bikevin.

Kurdên Beluçî ku li çiyayê Geliyê Galgalê berhev bûbûn, dest bi êrîşa ser leşkerê Îskender kirin. Şerê lêdan û bazdanê pênc şev û pênc rojan domand. Sê şevan li ser hev êrîşî ser leşkergeha Îskenderê Makedonî dikirin û berê beyanê vedigeriyan kemînên xwe û di nav gelî û çiyayan de xwe vedîşartin. Ev jî ji bo wê bû ku eskerên Yûnanî nerihet bikin û bêxew bihêlin û di rewşa bêxewiyê de bimînin û bergiriya wan têk biçe. Roja pêncan serleşkerê Kurdên Beluçî berê beyanê bi 25 hezar eskerên siwarî ji sê milan ve pêlên êrîşê birin ser leşkergeha Îskenderê Makedonî û bi awayê rêzbendê şer dest pê kir. Destpêkê rêza yekem êrîşî ser dijmin kir, piştre rêza duyem hereket kir û rêza sêyem jî li pey rêza duyem bi rê ket. Hemûyan bi hev re êrîşî ser dijmin kirin û rojeke gelek giran bi eskerên Yûnanî dan jiyandin. Êvarê şer temam bû û 10 hezar

pehlewan û lawên Kurdên Beluçî ku şerker, aza, bi tecrûbe, rêsikên û xwebextker bûn, ji bo bergirî û parastina niştimanê xwe wekî cengawer daketin meydanê û giyanê xwe ji dest dan. Di vî şerê xwînrîj, tirsnak, dilbirîn û dilaza de, serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî Mîr Cagîn Sarûnî û Mîr Açak Girîşkanî giyanê xwe ji dest dan û di dîroka fedakariyê de navê xwe dan qeydkirin.

### **Karbidestê İskenderê Makedonî Li Tûran û Mekranê**

Dema ku İskenderê Makedonî navçeyên xwarê yên Tûranê, yanî Ermabîl dagir kirin, yek ji serdarên leşkerî ku navê wî Hîfisun bû, ew navçe terk kir, ku sistema rêveberiya vê navçeya nûdagirkirî li gor adet û awayê Yûnanî bê meşandin. İskender piştre hat nav erdê Mekranê û serleşker Epalifanîs wek fermanrewayê vî welatî tayîn kir.

### **Destbikarkirina Kisandus Wekî Fermanrewayê Tûran û Mekranê**

Piştî İskenderê Makedonî koça dawiyê kir, serleşkerekî navê wî Sîlukus derket ser textê desthilata Mad û Parsê. Wî jî ji aliyê xwe ve piledarekî leşkerî, Kisandus wek rêveberê Tûran û Mekranê hilbijart. Piştî vê Kisandus hat Mekranê û desthilata van herdu hikûmetan girt destê xwe.

### **Şert û Mercên Neguncayî yên Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê**

Piştî têkçûna paşatiya Hexamenşîyan, fermanrewayên Yûnanî li seranserê welatê wan hatin ser kar, guherîn di awayê rêkxistina Hexamenşîyan de kirin û di cihê wê de awa û adetê rêkxistina Yûnaniyan bi zorê bi ser Mad û Parsê de bi cih kirin. Ci teref û milekî ku dijîtî bikira, desthilat û karbidestê Yûnaniyan êrîşî ser wan dikirin. Ji ber vê, bi giştî di welatê Mad û Parsê de ewlekarî û aştî nedihat dîtin û bazara şer û

qirênan, kuştin û birînan berdewam dikir.

Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê jî di peyrewkirina awayê rêveberiya Yûnaniyan de bêdil û bi êş bûn û amade nebûn teslîm bibin. Ev jî bûbû sebebê wê ku Yûnanî ji wan dilreş û bi kîn bin û di rewşeke nelibar û bêçare de bijîn.

### **Êrişa Sîlukus (Selefkos) a Ser Welatê Hindê**

Sîlukusê serleşkerê Yûnanî hêj midetekî dirêj li ser fermanrewatiya Mad û Parsê derbas nekiribû pozbilindî dikir û nazî bibihêzî û xurtiya xwe dikir û ji ber firehiya wasite û melzemeyê ji selteneta fireh û mezin xwe ji welatê Hindê jîrtir dizanibû. Vê jî wisan kir ku bêyî tu tehqîq û bîrweriyê bi lez êrîş bike ser Hindê. Lê Çenderan Gubtan Moryan ew şikand û dema ku zanî şiyana wî ya li hember sekinandinê nemaye û his bi şâşî û rewşa nerastiya xwe kir, daxwaza aştiyê kir û herêmên rojhilate selteneta Mad û Parsê ku bi welatê Hindê ve bûn, wekî cirma şer (tezmînat) da paşayê Hindê. Bi vî awayî welatê Tûran û Mekranê ji bin desthilat û fermanrewatiya welatê Mad û Parsê derket û ket bin desthilata welatê Hindê.

### **Kurdên Beluçî Di Bin Desthilata Welatê Hindê de**

Ev guhertina siyasi, fermanrewatiya Kurdên Beluçî rû bi rûyî asteng, dijîti û giraniyêna awa awa kir. Ji ber ku di serdemên kevn de welatên serkeftî ew adet bi kar anîne ku dema wenatekî nû bihata bin desthilata wê, ew rûniştiyê eslî yên wê navçeyê vediguhestin welatê wan û li cihê wan ên ji neteweya xwe li wir bi cih dikirin. Di vê rewşê de, du rê li pêsiya Kurdên Beluçî hebûn: Yekem, xwe bidin destê desthilatdarê Hindê û stûxwariyê ji desthilata hozê Hindê re bikin. Duyem, dijberî wê, bi xurtî serxwebûna xwe biparêzin û wê ji dest nedin û ji bo berdewambûna wê bixebitin. Kurdên Beluçî rêya duyem hilbijartin û ji bo mayîn û berdewambûna serbestiya xwe, dest bi têkoşîn û peydakirina rêçareyekê kirin.

## **Hatina Tîreyên Hindî ya Navçeya Tûran û Mekranê**

Dema ku berpirsiyarên Hindê desthilatdariya rêveberiya Mîrnişîna Tûran û Mekranê girtin destê xwe, hatina tîreyên Hindê li navçeya Tûran û Mekranê dest pê kir. Kurdên Beluçî di serdemên kevn de ji wan tîreyan re “Sindan” an “Cidgal” digotin. Van tîreyan wekî mûriyan êrîşî ser erdê Tûran û Mekranê kirin û Kurdên Beluçî bi temamî ji Mekranê derxistin. Herêmên navend û xwarê Tûranê jî ku bi navê “Xuzdar” û “Ermabîl” dihatin nasîn, dagir kirin û Kurdên Beluçî ji wir jî derxistin. Lê nikaribûn herêmên bakurê Tûranê ku bi navê Kîkanê dihatin nasîn dagir bikin. Ji ber wê hemû ew tîreyên Kurdên Beluçê ku şikestibûn, di vê herêmê de berhev bûn û tîreyên Kurdên Zabilistanê jî, yanî Sebahî, Sincawî, Sifarî û Zengene, ji bo alîkarî û hatina hawara birayên xwe yên Beluçî hatibûn navçeya Kîkanê. Ev jî bû sebebê wê ku hêza wan a bergiriyê zêdetir bibe û Cidgalî ne xwediyyê wê himetê bûn êrîşî ser Kurdên Beluçî bikin.

## **Sebebê Alîkariya Kurdên Zabilistanê**

Ji rojhilat û başûr ve sînorê Zabilistanê bi Tûran û Mekranê ve bû û fermanrewayê Zabilistanê Mîr Birsan bi eslê xwe Kurd bû û dema ev rewşa neguncaw a Kurdên Tûran û Mekranê dît, dilê wî şewitî û têkçûna wan wek bêhêziya nijada Kurd zanîbû. Her wiha, ji wê jî agahdar bû ku bi têkçûna temamê Kurdên Tûran û Mekranê, morala Cidgalan bilind dibe û wan han dide êrîşê bînin ser Zabilistanê jî. Ji ber van sebeban, xwe ji bo hevaltiya Kurdên Beluçî amade kir û bi rê ket.

## **Şerê Giran ê Suhrabadanê**

Piştî dagirkirina welatê Mekranê û navçeya başûr û navenda welatê Tûranê, Cidgalî li Suhrabadê berhev bûn û serekê wan Mîr Egmaran li keleha Nixanê bi tîreyên Binyan, Miwîdan û Tagîn ên niştecihê Bûbû û bi karbidestên xwe re

di nav tevgerê de bûn ku çawa êrîşê bibin ser Kîkanê paytexta Tûranê. Xebera vê planê gihîst Kurdên Beluçî û gelek bi lez êrîşî ser Sûhrabadanê kirin û li hemberî leşkergeha Cidgalan leşkerê xwe ji bo şer rêzbend kirin. Berê beyanê hemûyan bi hev re êrîş birin ser leşkergeha dijmin û şer dest pê kir. Mîrê Zabilistanê Mîr Birsan bi tîreyên Kurdên Sebahî, Sincawî, Sifarî û Zengene êrîşî ser şaxê rastê yê dijmin kir, mîrê Tûranê Mîr Kîkan bi tîreyên Kurdên Biraxoyî êrîş bir ser şaxê milê navenda leşkerê dijmin û mîrê Mekran Mîr Kiba bi tîreyên Edreganî, Mamilî û Kirmanî pêlên êrîşê birin ser şaxê çepê yê leşkerê Cidgalan.

Vî şerî sê rojan dewam kir, Cidgalî şikestin û paşve kişiyan. Piştî mîrê Cidgalan hêza berxwedanê bi xwe re nedît û daxwaza aştiyê kir û li gor peymana aştiyê Geliyê Suhrabadanê kirin sînorê navbera navçeya Kurdên Beluçî û Cidgalan. Tê gotin ev şer di sala 290'ê beriya zayînê de rû daye.

### **Girêdana Navçeya Kîkanê Bi Mîrnîşîna Zabilistanê Ve**

Piştî hatina Yûnaniyan û tîreyên Cidgalanê Sindanê, şîrazeya hozîtî/bulkî ya Kurdên Beluçî li Mekran û Tûranê têk çûbû û ji bingeha xwe derketibû. Serek û serdarên Kurdên Beluçî ku dinyadîtî, bi tecrûbe, karzan û têgihiştî bûn, di şerên Yûnanê û Cidgalan de giyanê xwe bexşî bûn. Mîr Rasin Mişkanî di şerê bi Kiraytursê serleşkerê Yûnanî re li Tengava Milanê hatibû kuştin, li milekî din Mîr Cagîn Sarûnî, Mîr Ačak Girîşkanî, Mîr Bolan Mamilî û Mîr Tûran Kirmanî di şerê İskender Paşayê Yûnanî de şehîd ketibûn û her wiha Mîr Şadîn Xuzdarî, Mîr Nûrgan Ermîlî û Mîr Berûz Bolanî di şerê xwînavî yê Suhrabadê de hatibûn kuştin. Di nav serekên Kurdên Beluçî de tenê Mîr Kîkan Kîkanî û Mîr Rûşî Goranî di van lêdan, kuştin û kuştariyan de sax mabûn û nehatibûn şehîdkirin. Ji ber wê awayê rêkxistina hozîfî ya Kurdên Beluçî

têk çûbû, nikaribûn siyaset û rêveberiya xwe bêyî alîkariya milekî din bimeşînin. Ji ber wê wan tu çareyeke din peyda nekirin, ku navçeya Kîkanan bi Mîrnişîna Zabilistanê ve girêbidin.

## BEŞA PÊNCEM

### ŞARISTANIYETA KURDÊN BELUÇÎ

#### Dînê Kurdên Beluçî

Dînê Kurdan beriya koçkirina wan a navçeya Madê, gelek tarî û nediyar e. Lê piştî hatina wan a navçeya Madê, li şûnewar û nîşanên wan derdikeve ku Ahûraperest yanî ronahîperest bûne, ji ronahiyê hez kirine û ji tarîtiyê tirsiyane û pê dilteng bûne.

Bêjeya ahûra ji “a” û “hûr”ayê pêk hatiye. Hûr tê maneya agir û “a” jî tê maneya “hatî”, yanî rastiyekê ku ji agir hatibe. Ev rastî çi ye? “Ronahî” ye. Kurdan agir hêmayê wê rastiyê zanîne. Yanî ronahî pîroz zanîne û perestine. Roj jî her ji ber vê ku nîşana rastiya ronahiyê ye pîroz zanîne û perestine.

Dema ku Kurdên Beluçî jî li Tûran û Mekranê bi cih bûn, dînê xwe pêşve birin û dînê pûtperestiyê yê Tûranan jî ku beriya hatina Kurdan li van wilayetan belav bû, terk kirin.

Adetê dînî yê Kurdan gelek sade û hêsan bûye. Di rojekê de sê caran, di wextê rojhilate û rojavayê û nîvroyê de, agir diperestin. Navê perestgeha wan “Arîn”a ji “ar”ê hatiye bûye. Ji pasevanên agirdanga perestgehê re digotin “Arîwan”. Bi giştî di her bajêr û gundî de agirdangek hebûye.

Li wilayeta Tûranê du perestgehê mezin ên bi navê “Arîn Zawk” û “Tarîn Helwan” hebûne ku fermanrewayêñ Kurdên Beluçî li bajarê Kîkan û Xuzdarê ava kiribûn. Ev herdu perestgeh li serê kopa çiyayê Zawk û Helwanê ava kiribûn. Kurdên Beluçî ev herdu perestgeh gelek pîroz dizanîn

û di salekê de du caran, di demsala bihar û payîzê de, ji hemû milên Tûran û Mekranê ji bo ziyareta vê perestgehê dihatin. Bi hatina xwe re jî, diyarî û xwarinên zêde dianîn û çendîn roj di vê perestgeha pîroz de dua dikirin û mijûlî perestina Yezdan dibûn.

### **Awayê Avakirina Avahiya Arînê (Perestgehê)**

Ji ber urf û adetên dînê Kurdên Beluçî gelek sade bûye, awayê duristkirina perestgehan jî di warê xemilandin û neqişkirina hindûr de pak bûye.

Kurdên Beluçî di dîndariyê de texsîrî nekirine. Her ji ber wê avahiyêne perestgehêne wan fireh û bilind bûne, bi awayê cargoşeya çik a kenardirêj hatine avakirin, tê de bi şev û roj agir kirine û xelk ji bo perestina Yezdan ku ronahiyê ji nûra Wî dizanin, diketin hundirê perestgehê. Di navenda hundirê perestgehê de bazinek hebû ku tê de sê agirdan hebûn, hemû wextan agir tê de vêdiket. Xelkê perestgehê jî li dora vî bazinî rûdiniştin û nûra Yezdan diperestin.

### **Ûrf û Adetên Kurdên Beluçî**

- A- Kurdên Beluçî baweriya wan bi jiyana piştî mirinê tune bûye û mirin ji ber qetandina peywendiyên berdewamî ji Ehrîmen zanîne. Di destpêkê de laşê miriyan neşûştine, danîne ser kevirekî yan li cihekî bilind ku teyr û ajel bixwin û careke din bibin beşek ji laşê jîndaran. Lê piştre, ev adet terk kirine û mirî kirine nav kûpek mezin û di nav çiyayan de veşartine.
- B- Adetê mehrbirînê di nav wan de ne belav bûye. Ji bo dawetê, tenê rizamendiya herdu aliyan yanî jin û mîr û bav an serrekê malbatê pêwîst bûye.
- C- Zêde jinanîn di nav Kurdan de ne qedexe bûye, lê çêbûna neşer‘iyê (zina) bi giranî qedexe bûye.
- D- Bi dê, xweh û keça xwe re nezewicîne û zewac bi wan re

heram bûye.

- E- Adetê sinetkirinê di nav wan de belav nebûye.
- F- Keçan heta dema balixbûnê şalvar li xwe nekirine.
- G- Kuran heta temenê balixbûnê piştînî li pişta xwe girênedâne û di şer de kuştina wan qedexe bûye.
- H- Kurdên Belucî di warê pîşeyê de koçer û xwediyyê kerîyan bûne. Gelek zêde pez û dewarên wan hebûye û bi erebeyên du teker geriyane.
- J- Kurdên Beluçi niştecihê yek cihî nebûne, ji ber wê jî çûne zozan û germiyanan.
- K- Piştre ku derbasî jiyanâ bajêr bûne, dest bi jiyanâ ziraetê, baxvanî û darçandinê kirine. Lê li gel wê jî ji bo zexîrekrina avê, bendavêni avê ava kirine ku bi dîtina wan mirov ecêbmayî dimîne.
- L- Desthilata malbatê di destê bav û mezinê malbatê de bûye. Piştre serekên hozan jî di çareseriya problemên girîng de xwedî biryar bûne. Di hemû problemên hundirîn ên din de, desthilata çaresirkirinê bi temamî di destê serekên hoz û rihspiyan de bûye.
- M- Dema ku di bin desthilata siltanekî de bûna, tenê serekên hozan li milê peywendîdar li gel sultan bûye. Ev milê peywendîdar jî peywendî bi kar û barêni siyasi û mîri yên wekî şer, aştî, bac, leşker û nimûneyên vê bûne.
- N- Bi pere re ewqas zêde nasîna wan tune bûye. Pêdawistiyêni xwe bi rîya guhertina kelûpelan bi dest xistine.
- O- Cilûberg û pêlavêni wan sade ji hirî û postêni heywanêni xwemalî û kûvî çêkirine.
- P- Jinêni wan di karûbarêni rojane de mil bi milê mîran kar kirine.
- R- Çekêni Kurdên Beluçi ji tîr û kevan, gurz, şûr, xencer, şîrîten nêçîrê û berqenîk pêk hatine.

- S- Adetê halgirtinê<sup>14</sup>: Adetê halgirtinê di nav Kurdên Beluçî de belav bûye. Dema ku kesekî xerîb hatiye nav bajarekî yan gundekî û çûye mala kesekî, xwediyê malê piştî bixêr-hatinê, xebera sefera wî jê pirsîye. Bi vê rîyê xwediyê malê sebebê hatina wî zaniye.
- Ş- Adetê Hulê: Kurdên Beluçî xwediyê leşkerê her dem amade nebûne. Ji ber wê, di esnayê şer de bi rîya delalan xebera şer di nav welat de belav kirine û serbazên Kurdên Beluçî agahdar kirine. Bi vî awayî ji yê xeber gihadî re “hul” gotine. Hul bêjeyeke Kurdî ye ku tê maneya eşkerekirinê. Di esnayê adetê hulê de, cihê berhevbûna serbazan jî hatiye diyarkirin. Bi vî awayî, serbazên leşkerî yênden Kurdên Beluçî jî li wî cihî berhev dibûn.

### Ziraeta Kurdên Beluçî

Di destpêkê de dema ku Kurdên Beluçî ji naverasta Asyaya Biçûk koç kirin û hatin Madê, wekî pîşe koçer û şivan bûne, mal, serwet û dewlemendiya wan ji pez û dewaran pêk hatiye. Bi ziraetê re mijûl nebûne û bi erebeyên duteker sefer kirine.

Lê dema ku di sala 850'ye beriya zayînê de mîrê mezin ê Kurdan Keyqubad bingeha selteneta Madê danî û êrişî ser welatê Tûranê kir û karîbû ji ortê rake û welatê wan dagir bike, guhertin bi ser de hat. Ew welat ev bûn: Suxdistan, Kalibistan, Zabilistan, Tûran û Mekran. Keyqubad piştre tîreyên Kurdên Beluçî yênden Biraxoyî, Edreganî, Mamilî û Kirmanî li wilayetên Tûran û Mekranê belav kir. Ev tîreyên hanê li Tûran û Mekranê bi cih bûn û piştre dest bi karê ziraetê kirin. Ji bo vê mebestê jî karêz kolan, bendê avê girêdan û istîfadeyeke zêde ji berhemên ziraetê bi dest xistin.

---

<sup>14</sup> Nivîskar vî adetî wek “xall girtin” daye nasîn ku di Kurdiya vê serdemê de jî wek “hall girtin” yan “hewall/xeber pirsîn” tê gotin.

## Zimanê Kurdên Beluçî

Kurdên rojhilatê yanî Kurdên Madê bi eynî zimanî axivîne ku Avesta pê hatiye nivîsandin. Dema ku Kurdên Biraxoyî, Edreganî, Kirmanî û Mamilî hatin nav erdê Tûran û Mekranê, her bi wî zimanî diaxivîn. Ji ber vê, xelkê xwemalî navê wan kirin “Kurdgal”, yanî ew xelkên ku bi Kurdî diaxivin.

Vegoter neqil dikan ku dema Keyqubadê paşayê Madê welatê Tûranê dagir kir û Kurdan desthilata wilayeta Tûran, Mekran û Zabilistanê girtin destê xwe, hinek ji hozên Tûranî, Tûran terk nekirin û neçûn Suxdistanê ku niştimanê eslî yê bapîrên wan bû û fermanrewatiya Kurdan qebûl kirin. Ew hozên Tirkan ên koç nekirin, navê wan bi vî awayê xwarê ye:

Girgawî, Gindarçî, Hengasartî, Mucark, Rezendak, Semîxan, Sûrxan, Mendxan, Dahîmak, Retgasartî, Mîmûcandik, Cûgman, Hûnak, Cesfak, Bezincek, Elyatûn, Kawkan, Erzeng, Sarxûn û Kaldaş.

Van hozên Tûranî bi Tirkî diaxivîn û piştre teslîmî desthilata Kurdan bûn, tevliheviya bi civata Kurdî re pêk anîn û hewceyê hevdû bûn. Vê jî mebesta peywendiya biratiya navbera wan xurtir kir.

Ev tevliheviya Kurdên Biraxoyî bi hozên Tûraniyan re bûye sebebê guherîna zimanê wan. Van herdu zimanan yanî Tirkî û Kurdî tesîr li ser hevdû dikirin û bi rewşa serdemê re, Kurdên Biraxoyî peyvên Kurdî û Tirkî pêşve birin.

## Sîstema Leşkerî ya Kurdên Beluçî

Di desthilata Madî de parêzgerî, bergirî û ewlekariya hundirê welat, li hemû wilayetan awayê leşkerî yê Kurdan wekî hev û yeksan bûye. Artêş ji mîran pêk hatiye û xortê hozên Kurd ji bo eskeriyê dihatin wergirtin û serek û serdarê bi sal de çûyi, dinyadîti, rêkxer û xwedîyê tecrûbeya şer dibûn rîveber.

Ew desteyên hozên Kurd ku pîr û rihsî bûn û ji ber

bêhêziyê xwediyyê şiyana beşdariya şer nebûn, di dema şer de çavdêriya jin û zarokan û jinên şahan dikirin. Her wiha erka pasewanîkirina tersê, dewarêن bar, kêlgeh/çiflik û zeviyan li ser milê wan bû.

### Nûnertiya Artêşa Kurdên Beluçî

Artêşa Kurdên Tûran û Mekranê bi ser çend beşan ve hatibû parvekirin. Ji her beşa leşker re “bulik” gotine ku navê wan bi vî awayî bûye: Kîkan Bulik, Goran Bulik, Sarûn Bulik, Xuzdar Bulik, Mişkan Bulik, Ermîl Bulik, Bolan Bulik, Girîşkan Bulik, Edregan Bulik, Mamil Bulik û Kirman Bulik. Li ser alaya wan wêneyê serê piling hebûye.

Bulik ji çendîn tîre/tayfe, tîre ji çendîn berebab/eşîret, berebab jî ji çedîn “şalwar”an pêk hatiye. Ji xêzanê bavekî re ku çendîn zarokên wî hebûne, şalwar gotine. Bi vî awayî, şalwar ji xortêن çend yek bavî pêk hatiye. Ji eskerêن çend şalwarêن tîre û berebabe “parîn” pêk anîne. Ji eskerêن çend parînê tîreyê “cuk” pêk hatiye û ji cukêن hozê jî “bulik” pêk anîne.

Leşkerêن Kurdên Tûran û Mekranê bi ser du beşan ve parve bûne: Serbazên peyade û siwarî. Ji van du beşan re gotine “payî” û “siwares”ê leşker. Leşkerêن siwarî wek tîravêj, şûrweşen û berqenîavêj ji sê desteyan pêk hatiye. Di şer de şûrweşen li pişt tîravêjan disekinîn û hevkariya wan dikirin. Li pişt wan jî berqenîavêj di kemînan de disekekinîn. Berqenîavêj ew desteya leşker bûne ku bi berqenî dijmin berbaran kirine. Leşkerêن vê desteyê ewqas bi lezgînî berbaran kirine ku dijmin nikaribûye xwe li ber ragire û şikestiye.

Leşkerêن siwarî wek siwariyêن barsivik û siwariyêن bargiran ji du desteyan pêk hatiye. Siwariyêن bargiran hemû awa çek hilgirtine û siwariyêن barsivik jî tenê tîr û kevan an rim hilgirtine.

Kurdên Beluçî tu leşkerekî wan ê timî tune bûye, helbet hêzeke biçûk a serbazî hebûye ku bi navê Pasevanê Sindan

dihat nasîn û ji tîreyên Kurdên Beluçî pêk hatibû. Ev hêz li ser sînorê hevbeş ê Tûran û Sindanê hatibû bicihkîrin û erka wan dîdevaniya wan sînoran bûye, ku di dema êrîşa dijmin de îmkana bergiriyê hêsan bikin.

Navê piledarêne/rutbeyê leşkerê Kurdan bi vî awayî bûye:  
Seranmîran,  
Seranbulik,  
Serancuk,  
Seranparîn û  
Seransalwar

### **Sîstema Medenî/Sîvîl a Kurdên Beluçî**

Sîstema leşkerî û medenî ya Kurdên Mekran û Tûranê hevawa bûye. Cihêtiya wan tenê ew bûye ku peywendiya sîstema leşkerî bi bergirîkirina welat ji êrîşîn dijmin û peywendiya medenî jî bi rêveberiya medenî ve hebûye.

Sîstema medenî/sîvîl a Kurdan li ser bingeha peywendiya biratiya navbera hozan hatiye avakirin. Hoz ji tîre, tîre ji çend berebab û berebab jî ji çend malbatan an “xelek” an pêk hatiye. Ji hozan re gotine “timin/tumen” an “bulik”, ji tîreyan re gotine cuk, ji berebaban re gotine parîn. Her parînek jî ji çend şalwar an helekan pêk hatiye.

Di sîstema medenî de, hoz di bin desthilata serekekî mezin de bûne ku bi nasnavê/leqebê “mîrmîran/mîrêmîran” hatiye nasîn. Her hoz, tîre, berebab û şalwarek jî xwediyyê serekê xwe yê taybet bûye ku Kurdan jê re gotine mîran, sergul, kimaş û wace. Her bi vî awayî sîstema medenî ya Kurdên Beluçî hatiye birêvebirin.

### **Mezra, Gund û Bajarêne Kurdan**

Di serdema kevn de, di dema desthilatdariya Madê de,

wilayetên Tûran, Mekran û Zabilistanê gelek hêşîn, terr û bi bereket bûne, xelkê wan asûde û xweşhal bûne. Li hemû milên vî erdî, mezra, gund û bajar avadan û bi rewneq bûne.

Ji bajarêñ kevn her çend navêñ wan hatine gunertin, hinek jê hê jî ava ne. Lê piraniya mezra, gund û bajaran bi rewşa serdemê re wêran û kavil bûne û ji nav çûne û niha tenê şûnewarêñ wan mane û ji wan re “tepe” tê gotin.

## BEŞA ŞESEM

### ESLÊ KURDÊN BELUÇÎ


#### Eslê Kurdên Biraxoyî yên Beluçî


Li gor çavkanî û belgeyên dîrokî, Kurd li du besan parve dibin. Beşa yekem ew Kurd in ku ji aliyê Araratê û zincîra Çiyayê Cûdî ve hatine û di dirêjahiya navçeyê Dicle û Firatê de ji rojavayê heta Sûriyeyê û qeraxê Deryaya Romayê û ji rojhilat heta qeraxê Farsê û rexê Deryaya Umanê belav bûne. Tîreyê eslî yên vê beşê ji Lolo, Gûtî, Kasû û Sûbarî pêk hatine. Ev tîreyê Kurd ji bo ku ji aliyê rojavayê Deryaya Hezarê ve hatine bi navê Kurdên rojavayê tên nasîn.

Beşa duyem ew Kurd in ku ji naverasta Asyayê ve ber bi rojhilatê Îrana wê serdemê ve hatine û ji wir ji rojhilatê Deryaya Hezarê derbas bûne û di başûrê vê deryayê re li navçeya Etropanê belav bûne û bi cih bûne. Tîreyê eslî yên vê beşê jî ji Mad, Nahîrî û Kardoxiyan pêk hatine. Ev welatê mezin û fireh jî ku tê de bi cih bûn ji ber navê Madê wek Madayî yan Mêdyâ hatin nasîn. Ev heft tîre, tîreyê eslî yên Kurd in û di dawiyê de tîreyê şaxê din jê cihê bûne û her yek ji wan şaxan guherîne bûne tîre yan hozek. Ji vê beşa duyem a Kurdan re Kurdên rojhilatê jî tê gotin.

Kurdên Biraxoyî, Edreganî, Mamilî û Kirmanî ji hoza Madê cihê bûne. Ji ber vê em li vir behsa eslê tîreyê din ên Kurdan dirêj nakin û em ê bêñ ser behsa eslê hoza Madê.

Di behsa eslê de, em ê ji Hz. Nuh, silav lê bin, dest pê bikin ku piştî tofanê bavê Ademê Duyem ê însaniyetê bûye.





Heşt kurên Mîr Biraxmê Biçûk hebûne: Kîkan, Goran, Sarûn, Xuz, Mişkan, Ermîl, Bolan û Girîşkan. Ji ber zêdebûna nesla van heşt kurên Biraxmê Biçûk, heşt tîreyên Kurd ên Biraxoyî yên bi navê: Kîkanî, Goranî, Sarûnî, Xuzdarî, Mişkanî, Ermîlî, Bolanî û Girîşkanî hatine nasîn çêbûne. Eslê van heşt tîreyên hoza Biraxoyî bi vî awayê xwarê ye:

- A- Kîkan, Zorak Sengîn, Arîn, Pindran, Raxur, Zîbar, Umran, Sengîn, Xuman, Kîkan
- B- Goran, Şîdan, Başman, Delût, Zînel/Zeynel, Tekş, Kaş, Şîdan, Kusad, Başman, Gidran
- C- Sarûn, Zîrek, Başûk, Kurtî, Lasîn, Mamiş, Dusek, Sarim, Basîr, Daxur, Zaxu
- D- Xuz, Ewram, Lasîn, Duxan, Katîn, Gîwer, Xuz, Gurus, Ma-hek, Zûçap, Mihran
- E- Mişkan, Eyle, Ükî, Mişkan, Eyle, Başar, Mirdas, Gîlek, Tû-rab, Kuyan, Mişkan
- F- Ermîl, Merzek, Zirwan, Kuyan, Mengur, Sabûl, Merzek, Zirwan, Kaş, Şawil, Ermîl
- G- Bolan, Zînel/Zeynel, Bûzik, Kazan, Melîl, Karçî, Şagan, Şûhan, Kirmac, Bûzik, Bolan
- H- Girîşkan, Berûz, Basîr, Kîj, Bolan, Berûz, Girîşkan, Kireck, Maxan, Çirmûk, Lerzin

### **Paşatiya Malbata Pîşdadiyan**

Dema Madî ber bi navçeya Etropana xwarê Deryaya Hezarê ve koç kirin û li wir bi cih bûn, ji ber bicihbûna wan navçe bi navê Madê hat nasîn û nav û deng da. Ev navçe ketiye der û dora bakur û başûrê Esbehan (Esfahan) û Ekbetanê (Hemedan).

Ev desteya Kurdan di destpêkê de beş bi beş bûne û her beşek xwediyyê serekê xwe yê taybet bûye. Pîşeya wan

xwedîkirina heywanan bûye û xwe gelek bi çalakiya siyasi ve mijûl nekirine û di bin desthilat û fermanrewatiya Kilde, Asûrî, Babil û Elamê de jiyana xwe derbas kirine. Lê piştî têkçûna fermanrewatiya van malbatan, welatê Mad û Parsê ji bin destê wan rizgar bûne û cara yekê malbata xwemalî ya Mad û Parsê ya bi navê “Pîşdadî” hatiye nasîn, paşatiya xwe li Mad û Parsê damezirandiye û heta şes piştan fermanrewayî kiriye.

Cemşîd damezirînerê dewleta Pîşdadiyan bû û navê padîşahên vê malbatê bi vî awayî ne: Cemşîd, Epîtan, Ferîdûn, Menûcehr, Tehmasb, Üştab û Girşasp. Girşasp dawîn paşayê zincîra fermanrewatiya binemala Pîşdadî bûye. Piştî mirina wî, welatê Mad û Parsê duçarî bêhêzî û valahiya desthilatê bûye. Sebebê vê jî ew bûye ku kesek ji malbata Pîşdadiyan tune bûye layîqê textê seltenetê be.

Wê wextê, Efrasyab li Tûranê paşa bûye û xelkê hozên Kurd û hozên din ên Mad û Fersê rêveberî û desthilatdariya wan pesend nebûye. Ji ber ku Efrasyab paşayekî bedkirdar, bedxwe û xwedî karekterê xerab bûye. Hemû mîr, serek û serdarên Mad û Farsê jî xwestiyarê wê bûne ku welatê Mad û Parsê ji êrîş û miameleyên xerab û ji radeyê der a Aşûr rizgar bibe. Her ji ber vê Keyqubad serekê mezin ê Madên Kurd ku bi zanayî û dadperwerî bi nav û deng bûye, danîn ser textê selteneta Madê. Di netîceya vê berxwedanê de, paşatiya selteneta Mad û Parsê ji malbata Pîşdadiyan ketiye destê Madan.

Dîroknivîsan navçeya Madiyan bi navê “Kiyan/Keyan” û malbata Madiyan jî bi navê “Kiyanî/Keyanî” dane nasîn. Piştî têkçûna desthilata Pîşdadiyan, bi giştî serek û serdarên hozên Kurd ên Madiyan û serekên hozên Pars, Gîl, Deylem û Hezerê piştî pirs û rawêjkariya dûr û dirêj gihîsttin wê netîceyê ku serekê mezin ê Madê Kurd Keyqubad ku bi dadperwerî û karzaniyê bi nav û deng bû, ji bo desthilatdariya textê seltenetê hilbijêrin. Wê wextê, Kurdên Biraxoyî tîreyeke xwedî şîyan

û mezin a neteweya Kurd bûye û li gel rewşa dîrokê heşt berebabêñ mezin jê hatine dîtin ku navê wan bi vî awayî ye: Kîkanî, Goranî, Sarûnî, Xuzdarî, Mişkanî, Ermîlî, Bolanî û Girîşkanî.

Mîrê mezin ê van tîreyan Mîr Kîkan bûye ku ji tîreya Kîkaniyan bûye. Her yek ji tîreyêñ din hozêñ Biraxoyî xwediyê serekêkî taybet bûye ku navêñ wan bi vî awayî bûne: Mîr Goran, serekê tîreya Goranî, Mîr Zaxu serekê tîreya Sarûkî, Mîr Mihran serekê tîreya Xuzdarî, Mîr Mişkan serekê tîreya Mişkanî, Mîr Ermîl serekê tîreya Ermîlî, Mîr Bolan serekê tîreya Bolanî û Mîr Lerzîn serekê tîreya Girîşkanî.

Ev tîre wekî hozêñ din ên tîreyêñ Kurd li navçeya Madê bi cih bûne. Dema ku Keyqubad wekî mîrê mezin ê Madêñ Kurd hat ser textê selteneta Madê û malbata wî heta şeş piştan paşatî kir, di serdema van paşayêñ malbata Madê de ku hinek dîroknivîsêñ kevn wek malbata Kiyanîyan jî nivîsandine, yanî Keyqubad, Keykawus, Tûs, Ferîbûrz, Keyaksar û Azdiyak, eslê mîrêñ tîreyêñ Kurdêñ Biraxoyî bi vî awayê xwarê ye:

- A- Tîreya Kîkanî: Kîkan, Zûrak, Üştab, Zigrîn, Zîbar, Biraxm, Goran
- B- Tîreya Goranî: Goran, Kireck, Şadîn, Kaş, Ramîn, Buxaz, Rasin
- C- Tîreya Sarûnî: Zaxu, Seldûz, Şagîn, Sabûl, Sûrcîn, Manî, Şûhan
- D- Tîreya Xuzdarî: Mihran, Keytûn, Kaşk, Kîçan, Manûr, Gawr, Mihran
- E- Tîreya Mişkanî: Mişkan, Mirdas, Kirecil, Gilbag, Tûrab, Manûr, Beyker
- F- Tîreya Ermîlî: Ermîl, Mişkan, Xuman, Kilecik, Kirmac, Gu-ren, Kusad
- G- Tîreya Bolanî: Bolan, Bacel, Pûran, Xuman, Keytûn, Tir-man, Hekar

## H- Tîreya Girîşkanî: Lerzîn, Tadî, Zîdan, Berûş, Pazû, Tapîn, Xîzan

Piştî 300 salan, paşatiya malbata Madê dawî lê hat û fermanrewatiya malbata Hexamenşî dest pê kir û Kurîşê Mezin ê mîrê tîreya Hexamenşî hat ser textê selteneta Mad û Farsê. Paşatiya vê malbatê 230 salan fermanrewatî kir û di serdema fermanrewatiya wan de jî eslê serekên tîreyên Kurdên Biraxoyî bi vî awayî bûye:

- A- Tîreya Kîkanî: Zırşan, Zuran, Ercan, Şamûz, Biraxm, Sabûl, Nûrgan, Kiyanûş, Kîkan
- B- Tîreya Goranî: Nagan, Dûc, Çirmûk, Kazan, Zeynel, Goran, Mihran, Gîşan
- C- Tîreya Sarûnî: Nêrman, Hînar, Kabû, Mirdas, Rîgan, Keytûn, Başûk, Înax, Cagîn
- D- Tîreya Xuzdarî: Şîşar, Kaşk, Deylim, Xerzan, Kusad, Mişkan, Beyfil, Kirecl, Şadîn
- E- Tîreya Mişkanî: Gurgîn, Bûlûr, Tûtik, Duxan, Katîn, Zirwan, Bûzîk, Biraxm, Rasin
- F- Tîreya Ermîlî: Bahûr, Amaç, Kembîl, Basîr, Bûlak, Ewram, Ukî/Ewkî, Zerîn
- G- Tîreya Bolanî: Buxa, Dernîl, Xîzan, Mişkan, Sîkran, Sasun, Kelxel, Lakûr, Berûz
- H- Tîreya Girîşkanî: Semban, Zîdek, Pîlar, Maxan, Sarim, Darûn, Nuxê, Bilbas, Ačak

Dema ku Îskenderê Makedonî yê paşayê Yûnanî êrîşî ser selteneta Mad û Parsê kir û dawî bi fermanrewatiya malbata Hexamenşî anî, ev mîrên tîreyên Kurdên Biraxoyî li dijî artêşa Yûnaniyan li Mekran û Tûranê şer kîrin:

Mîrê mezin Mîr Kîkan Kîkanî, Mîr Rûş Goranî, Mîr Cagîn Sarûnî, Mîr Şadîn Xuzdarî, Mîr Rasin Mişkanî, Mîr Nûrgan Ermîlî, Mîr Berûz Bolanî û Mîr Ačak Girîşkanî.

## Eslê Kurdên Beluçiyê Edreganî, Mamilî û Kirmanî

Piştî behsa esil û nijada Kurdên Zengene yên Zabilistanê û kurên Biraxoyî yên Tûranê em ê bêñ ser behsa eslê Kurdên Edreganî, Mamilî û Kirmaniyêñ Mekranê. Ev tîre jî ji desteya Kurdên rojhilate ne û bapîrêñ wan ên mezin jî wekî tîreyêñ Biraxoyî û Zengene Mada Biçûk e.

Heft kurên Mada Biçûk hebûne ku navêñ wan Partasin, Estirûşat, Arîzant, Bûz, Maj, Bûd û Dîlman bûne. Bi rewşa zeman re nesla van heft kuran ewqas zêde bû ku heft tîreyêñ mezin ên Kurdên Madê jê peyda bûn û bi navê Partasinî, Estirûşatî, Arîzantî, Bûzî, Majî, Bûdî û Dîlmî nav û deng dan.

Bapîrê mezin ê hoza Biraxoyî, Biraxm li gel bapîrê mezin ê hoza Zengene, Zengan bira bûne û kurê Bûdê Mada Biçûk bûne. Her bi vî awayî, bapîrê mezin ê tîreya Edreganî, Edregan û bapîrê mezin ê tîreya Mamilî, Mamil û bapîrê mezin ê tîreya Kirmanî, Kirman bira bûne û yek ji heft kurên Mada Biçûk Estirûşat in. Madem wiha ye di warê vê ronîkirinê de ji me re derdikeve ku Kurdên hoza Biraxoyî û Zengene wek Kurdên hoza Edreganî, Mamilî û Kirmanî neviyêñ du birayêñ Bûd û Estirûşat in ku ew jî du kurên Mada Biçûk in.

Destpêka eslê tîreyêñ Edreganî, Mamilî û Kirmanî ji Hz. Nûh dest pê dike:

Bi navê Edregan, Mamil û Kirman sê kurên Estirûşat hebûn ku bi rewşa zeman re nesla wan zêde bû û sê tîreyêñ bi navê Edreganî, Mamilî û Kirmanî ji wan çêbûn. Eslê van her sê tîreyan bi vî awayê xwarê ye:

A- Edregan, Xesan, Kilçar, Parkan, Cagîn, Semek, Daxur, Şahêk, Bahû, Nûdû, Metek, Sabûl, Çûng, Şîkurd, Mindgar, Sindwan, Rûmber, Darûn, Eyle

B- Mamil, Cilabîn, Semek, Çûmber, Hûtan, Zûrak, Üşab, Zînel/Zeynel, Murrak, Katîn, Bembekan, Kazan, Nidaman, Hûtkar, Sarûn, Hîcwar, Makul, Unkar, Zûng

C- Kirman, Kudan, Şembed, Çilkan, Duşek, Pindran, Der-

abil, Gamûn, Lasîn, Burk, Nûtan, Merzek, Lewza, Kilzan,  
Goran, Pirûkir, Rax, Kesetk, Huşar

Dema ku serek û mezinê hozên Kurd mîrê mezin ê Madên Kurd Keyqubad li ser textê Madê dan rûniştandin, Mîr Eyle serekê tîreya Edreganê, Mîr Zûng serekê tîreya Mamilê û Mîr Huşar serekê tîreya Kirmanê bûne. Di şerê navbera paşayê Madê Keyqubad û paşayê Tûranê Efrasyab de hevkarê paşayê Madê bûne. Keyqubad di vî şerî de Efrasyab şikand û selteneta Tûranê parve kir.

Di vî şerî de, wilayeta Mekranê ji aliyê mîrên tîreyên Edreganê, Mamilê û Kirmanê ve hatibûn azadkiran. Her ji ber vê Keyqubad desthilatdariya vî welatî da destê mîrê mezin ê Edreganê.


Di serdema fermanrewatiya malbata Madê de, eslê serekên tîreyên Kurdên Edreganê, Mamilê û Kirmanê bi vî awayê xwarê ye:


A- Eyle, Şîtab, Bûsa, Munhan, Eda, Mubrikan, Semek

B- Zûng, Sûl, Pijgan, Şahûl, Şexel, Tûhû, Nûkef

C- Huşar, Tigran, Sûran, Ladî, Ewram, Kindaf, Satik

Di serdema Mîr Semek Edreganî, Mîr Nûkef Mamilî û Mîr Satik Kirmanî de desthilata malbata Kurdên Madê dawî pê hat û malbata Hexamenşî cihê wan girt û Kurîşê Mezin li Mad û Parsê bingeha fermanrewatiya Hexamenşî danî. Peywendiyê Kuriş ên nijadî bi Kurdên Madê re hebû, dayîka wî ji malbata paşayên Kurd ên Madê bû. Ji ber vê sebebê, wî Kurdên şûrweşîn hevalên xwe yên nêzik dizanî û awayê rêveberiya sîistema dewletê ya malbata Madê wekî berê hişt. Ev jî ji ber wê bûye ku hestê biyantî û cihêtî di navbera Kurdish û malbata Hexamenşîyan de çenebe. Ji bo vê yekê, fermanrewatiya mîrên tîreyên Kurdên Edreganî, Mamilî û Kirmanî li wilayeta Mekranê hevçerxê mîrên din ên Kurd mane. Di vê serdemê de, eslê serekên tîreyên Kurdên Edreganî, Mamilî û Kirmanî bi vî awayî ye:





- A- Semek, Cadî, Hûnran, Cîsan, Sûsin, Pirtûs, Tîbar, Nûtan
- B- Nûkef, Tigê, Hîrend, Mundan, Girsan, Tûfan, Melman, Bitû
- C- Satik, Mekal, Şahûl, Bûjîr, Helîkan, Cîsan, Serengan, Şirban, Adman, Tûran

### **Peywendiyên Di Navbera Kurdên Tûran û Mekranê De**

Kurdên Biraxoyî yên Tûran û Kurdên Edreganê, Mamilê û Kirmanê Mekranê hevnijad bûn. Ji ber vê, di serdema fermanrewatiya wan de, peywendî û danûstendinê navbera wan gelekî nêzik û birayane û hevrêyane bûne. Ev pênc tîre neviyêن yek bapîrî bûne ku ew jî Mada Biçûk e. Yanî ev neviyêن du kurêن Mada Biçûk: Bûd û Estirûşat in. Tîreyêن Biraxoyî û Zengene neviyêن du kurêن Bûd; Biraxm û Zengan in. Tîreyêن Edreganî, Mamilî û Kirmanî ji ji berê sê kurêن Estirûşat; Edregan, Mamil û Kirman in.

Ev tîreyêن Kurd, nêzikî pêncsed salan li Mekran û Tûranê di du serdemêن paşayêن malbata Madê û Hexamenşiyê de fermanrewatî kirine, di vê serdema dûr û dirêj de dûçarî hevraz û nişovêن zeman, şoriş û bûyerêن awa awa yên rojgarê bûne. Li gel vê jî, bêhnfirehî, dilêrî, wêrekî, şehamet û camêrî ji dest nedane û berengarê van asêtî û neheziyan bûne. Karîbûne tevlihevî û şer bidin sekinandin û bi hev re yekgirtî bin. Bi vî awayî, bi hevbeşî fermanrewatiya Tûran û Mekranê kirine û tu wextê rê nedane ku di navbera wan de dijîtî, durûyî û biyantî pêk bê.


Nijad, ziman, dîn û urf û adetêن van Kurdan wekî hev bûne û xwediyyê civateke hevawa bûne. Di esnayê tengî, bela, nehezî û eziyetê de, ji bo jêderbasbûnê yek ji yê din re bûye destgir û hevkar.

## BEŞA HEFTEM

### KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA PAŞAYÊN SILUKIYÊ (SELEFKOS) YÛNANÎ DE

#### Pîşdadî

Tê neqilkirin ku Kîwmers bingeha fermanrewatiya Pîşdadiyan li Mad, Pars û Aryana Turkistanê danî û piştî wî neviyê wî yê kurî, Hoşangê kurê Siyamek derket ser textê welêt. Piştî wî Tehmûrs derket ser text. Piştre Tehmûrs koça dawiyê kir, Cemşîd birêvebiriya hikûmetê girt destê xwe. Piştî wî, Aptiyan hat ser textê fermanrewatiyê û piştre wî jî koça dawiyê kir û kurê wî Ferîdûn derket ser text ku karibû Zuhakê Tazî<sup>15</sup> bişikîne û di zindanê de bend bike û xelkê ji sitem û destdirêjiya wî rizgar bike.



15. Tazî bi Farisî tê maneya ‘Ereb an Tancî.

Du kurên Ferîdûn ên navê wan Tûr û Îrec hebûn û wî seltenet di navbera wan de parve kir. Di vê parvekirinê de Turkistan û Xizran da Tûr û Mad, Pars û Aryan jî da Îrec. Zincîra bingeha Pîşdadiyan bi vî awayî ye:

### Tîreyê Sindanê

Tê ravekirin ku çendîn kurên Hamê kurê Nûh hebûne. Navê yek ji wan kuran Sindan bûye û bi mebesta peydakirina cih û warekî hatiye erdê Sindanê û tê de bi cih bûye. Navçe ji ber bicibûna wî li wir bi navê Sindan hatiye nasîn. Bi rewşa serdemê re, hejmara neviyên Sindanê kurê Ham ewqas zêde bûye ku bi ser sê tîreyên mezin ve parve bûne û bi navê Binyan, Takîn û Mûmîdan nav û dengê wan belav bûye û li navçeyên cihê yên Sindanê belav bûne.

Navçeya Tûran û Sindanê hevsînor in û ji demên kevn ve peywendiyên xelkê van herdu wilayetan bi hev re hebûye. Ji ber wê pêwîst e em behsa wê jî bikin. Di serdema Keyqubadê Kurdê Madê de ku Kurdê Biraxoyî wilayeta Tûranê dagir kirin û tê de bi cih bûn, ev tîreyên Sindanê bûn ku navê “Kurdgal” li Kurdan kirin û Kurdan jî navê “Cidgal” li wan kirin ku di netîceyê de di navbera wan de dostanî û peywendiyê dest pê kir.

Li welatê Sindanê serekên van tîreyan fermanrewayî kiri- ne û bingeha van tîreyan bi vî awayê xwarê ye:

**Bingeha Binyan:** Nûh silav lê bin, Ham, Sindan, Binyan, Langan, Maçan, Nahir, Dahir, Mahir, Diharî, Sihtan, Ebran, Cûkan, Sûdan, Enran, Cûna, Samra, Ebra, Bimban, Cuxaran, Hinbî, Bûrra, Hirçender, Singhar, Siyakir, Matan, Bîngan, Üsayû, Esyar, Bûlra, Bagarm, Cûbin, Bicra, Kindabûc, Kiksû, Gûpî, Pirmîl, Ceşel, Cibîn, Agmaran.

**Bingeha Takîn:** Nûh silav lê bin, Ham, Sindan, Takîn, Bûngan, Singar, Ratûr, Damaç, Dekya, Cisûdan, Maç, Sûmir, Mestûn, Kilwar, Etar, Dirig, Mayîn, Bûtnî, Siyala, Erîn,

Cuya, Awan, Xerel, Kitper, Benger, Kirpal, Tûnyan, Min-cûn, Çaçir, Îrî, Kiran, Samit, Derpal, Subran, Cettan, Men-sen, Ûtran, Siyanc, Mîsrû.

**Bingeħa Mûmîdan:** Nûh silav lē bin, Ham, Sindan, Mûmîdan, Engaran, Mûmidra, Gûnga, Bûrdî, Şahûk, Sexan, Rûncan, Wuçan, Duda, Bexra, Bûrra, Camatî, Şapt, Mûtik, Gidûra, Mûna, Wahû, Çetta, Engîr, Eçra, Pela, Kurk, Üçanî, Gur-dan, Dindu, Dikhîr, Geccer, Herîpal, Kurîpal, Üdana, Hudkir, Waçir, Sumer, Sebibra, Mûndir, Gidran.

### Serkeftina Cidgalan Li Ser Tûran û Mekranê

Dema ku Îskenderê Makedonî selteneta Mad û Parsê dagir kir û dawî li fermanrewatiya malbata Hexamenşî anî, di vegera xwe ya ber bi Yûnanê de li Babîlê koça dawiyê kir û ji ber nebûna cihgirekî wî, serleskerên selteneta mezin û fireh ew seltenet di navbera xwe de parve kirin. Di vê parvekirinê de, Sîlukus bû paşayê beşa rojhilate seltenetê ku welatê Mad, Pars, Tûran, Mekran, Kabilistan û Zabilistanê diketin ber. Lê heziya dagirkirina welatan çavê Sîlukus tarî kiribû û çavgirtî êrîşî ser Hindistanê kir û şikest. Di netîceya vê şikestinê de Sîlukus wilayetê Tûran, Mekran û Kabilistanê wekî tawanê şer da paşayê welatê Hindê Çenderan Guptan Morê.

Ev guherîna fermanrewatiyê, Cidgalan, tîreyên Sindanê han da ku birijin nav erdê Tûran û Mekranê. Bi êrîşanîna ser van welatan bi Kurdan re ketin şer. Kurdan gelek bi camêrî û xweragirî parêzgerî li erdê xwe kirin û ji herdu milan gelek kes birîndar bûn û hatin kuştin. Hejmara Cidgalan bi awayekî wisan zêde bû ku Kurdan nikaribûn bi ser bikevin û Cidgalan hemû wilayeta Mekranê û xwarê naverasta Tûranê heta mel-benda Geliyê Suhrabadanê dagir kirin û Kurd ji van navçeyan derxistin.

Kurdên Beluçiyyêñ Mekran û Tûranê li navçeya bakurê Tûranê û Kîkanê berhev bûn. Wê wextê Kurdên Zabilistanê ji

bo piştgiriî û destgiriya birayên xwe yên Kurd hatin Kîkanê û bi hev re êrîş birin ser leşgergeha Cidgalanê ya li Suhrabadê û piştî şerekî giran karîbûn wan bişikênin. Di netîceyê de tu çareyeke Cidgalan nema û daxwaza haşîtiyê kirin û Geliyê Suhrabadê bû xeta sînorê navbera navçeyên Cidgalê û Kurdan.

Di serdema fermanrewatiya malbata Kurdên Madê de, ev fermanrewayên Sindanê hevçerxê paşayên Madê bûne: Mîr Hircender, Mîr Singhar, Mîr Siyakir, Mîr Matan, Mîr Bingan, Mîr Ûsayû, Mîr Esyar, Mîr Bûlra. Piştî desthilatdariya Kurdên Madê, di serdema Hexamenşîyan de ev serekên Cidgalan li Sindanê fermanrewayî kirine: Mîr Bagarim, Mîr Cubin, Mîr Bicra, Mîr Kindabûc, Mîr Kikisû, Mîr Gûpî, Mîr Pirmîl, Mîr Ceşel, Mîr Cibîn, Mîr Agmaran.

### **Fermanrewatiya Paşayên Silukiyê Yûnanî Li Mad û Parsê**

Îskenderê Makedonî, piştî dagirkirina welatên rojhilate, di vegera xwe ya ber bi Yûnanê de, li Babîlê koça dawiyê kir. Bi nebûna mîratgirekî piştî wî, selteneta mezin û fireh ket ber destê serleskerên wî û wan jî ew seltenet di navbera xwe de parve kirin.

Ev çarenivîs di berjewendiya sistema Mîr Sîlukus de bû û rojhilate seltenetê ku ji Mad, Pars, Tûran, Mekran, Kabilistan û Zabilistanê pêk dihat, para wî ket. Sîlukus seltenet firehtir kir û karîbû deştên der û dorê bike bin rikêfa xwe û heta 30 salan bi şikurdarî fermanrewatiyê bike. Her çend piştî wî, neviyên wî nikaribûn vî welatê fireh bi rê ve bibin.

Sîlukus di dawîn saetên jiyana xwe de dixwaze biçe Makedonyaya niştimanê bav û kalên xwe. Lê di rê de bi destê mirovekî navê wî Kîranos hat kuştin. Piştî vê bûyerê Antîyakûs hat ser textê bavê xwe û 18 salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir. Li cihê wî kurê wî Antîyakûsê Duyem bû paşa û di dema fermanrewatiya wî de Diyudtûsê dadgerê Baxterê

serî hilda û nasnavê “şah”iyê li xwe kir. Dema ku Mîrên parsê serkeftina dadgerê<sup>16</sup> Baxterê dîtin, liva azayetyî di laşê wan de hat û alaya şoriş û serhildanê hildan. Di netîceyê de ev bûyer bû sebebê wê ku welatê Eşkanî serî hilde û bê damezirandin.

Piştî koçkirina Antîyakûsê Duyem, fermanrewatiya malbata Sîlukî li Mad û Parsê bêhêz bû û şeq û qelş lê ketin. Di netîceyê de Mîr Eşk, mîrê mezin ê Parsê bingeha fermanrewatiya malbata Eşkanî li Mad û Parsê danî.

Cihê balkêsiyê ye ku fermanrewayê malbata Sîlukiyê Yûnanî şêl û helwesta dostaniyê bi xelkê Mad û Parsê re domandin û bi dewlemendan re xizmatî pêk anîn. Her wiha, mîrên Madiyan li ser pileya bilind danîn û di nav artêşa xwe de xelkê Mad û Parsê kirin serbaz. Lê li gel van tevan jî, xelkê Mad û Parsê xwe ji bin destê wan rizgar kirin.

### Mîrê Wilayeta Zabilistanê Mîr Birsan Zengene

Mîr Birsan, mîrê mezin ê tîreya Kurdên Zengeneyan bû û di serdema fermanrewatiya Hexamenşîyan de wekî mîrên din ên Kurd xwediyyê pile û payeyê bû û li welatê Zabilistanê desthilatdarî kir. Dema ku Îskenderê Makedonî selteneta Mad û Parsê anî bin desthilata xwe û li hember malbata Hexamenşîyan bi ser ket, Darayê Sêyem yê dawîn paşayê malbata Hexamenşî bû, hevkarî û hevdestêñ wî ji tirsa paşdevegera Îskenderê Makedonî ew kuştin.

Bi vî awayî desthilata Mîr Birsan jî li Zabilistanê leqiya û duçarî asteng û nexweşiyêñ awa awa hat. Lê ji ber ku miro-vekî zana û zîrek bû, îstîfade ji vî halê xwe wergirt û xwe da destê Îskenderê Makedonî yê Yûnanî û Îskender jî ew li ser pile, paye û desthilatdariya wî hişt.

---

<sup>16</sup> Nivîskar bêjeya “sitirab”ê bi kar anije ku tê bi maneya dadger “hakim” an fermanrewa.

Piştî Îskender koça dawiyê kir û Sîlukusê serleşkerê wî hat ser textê selteneta Mad û Parsê, Mîr Birsan jê re îtaet kir. Ji ber wê Sîlukus ew wek layengirê xwe hesêb kir û mîrnişîna wî li Zabilistanê îtaetî wî dikir. Piştî koça dawiyê ya Mîr Birsan, kurê wî Mîr Feyrûz erka desthilatdariya Mîrnişîna Zabilistanê, bi dilsozane xizmeta Antîyakûsê Duyem ê paşayê malbata Sîlukus kir. Antîyakûs bi nûnertîkirina wî ya spehî şad bû û xelatên giranbuha pêşkêşî wî kir.

Piştî koça dawiyê Mîr Îspiybûdîş, kurê wî Mîr Kuring rêveberiya Mîrnişîna Zabilistanê girt destê xwe. Di serdema mîrnişîna wî de, fermanrewatiya malbata Sîlukî li Mad û Parsê duçarî tevlihevî û keşmekêsiyê bû û ew di qonaxa têkçûnê de bû. Ev serhildan û şoriş li Mad û Parsê bû sebebê derketina mîrên Eşkaniyê Parsê û bi awayê ku bikaribin hêzê pêk bînin û li ser fermanrewatiya Yûnaniyan hakim bibin û ji welatê xwe derbixin.

### **Şorişa Hakimên Bi Nijad Yûnanî Li Mad û Parsê**

Di serdema fermanrewatiya Antîyakûsê Duyem de, kurê wî Silukîs, hakimên Yûnanî ku li wilayetên Mad û Parsê li ser kar bûn, li serekên xwe vege riyan û zincîra serhildêran dest pê kir. Destpêka vê serkêşî û serhilderiyê, hakimê Baxterê Dîw-ditûs da destpêkirin.

Dema Antîyakûs ji vê şorişê hatiye agahdarkirin, bi lez berê xwe daye Mad û Parsê ku agirê vê şorişê bitefîne. Lê nikaribûye li hember Diwditû bi ser bikeve û di netîceyê de karîbû di hewlê damezirandina welitekî serbixwe de bi ser bikeve. Kirinê Diwditûs tesîreke dijkarî li ser selteneta malbata Sîlukê hişt û bûyerê agirê liva serxwebûnê di dilê xelkên Mad û Parsê de hil kir. Di vê çarçoveyê de, yekem car rûniştiyê Xorasanê dest bi xebat û têkoşînê kirin.

## **Sîstema Nû ya Tîreyên Kurdêñ Beluçî yên Tûran û Mekranê**

Piştî girêdana navçeya bakurê Tûranê yanî Kîkanan bi Mîrnişîna Zabilistanê ve, Kurdêñ Tûran û Mekranê li Kîkanan berhev bûn û ji ber sebebê êrîşên Îskenderê Makedonî sîstema hozatiyê ya van Kurdêñ Beluçî tevlihev bûbû û zebûnhalî û bê ser û ber bûbûn. Lê xwesbextane xwe kirin bin alaya fermanrewatiya Kurdêñ Zengene û ji sitem û zordariya zêde ya Cidgalên bêwijdan, bedkar û nehez ên Sindan rizgar bûn.

Kurd di esnayê mana xwe ya li Zabilistanê de qîmeteke zêde bi rêexistina sîstema xwe ya medenî, hozayetî û leskerî dan ku ji ber êrîşên Yûnaniyan û Cidgalên Sindanê di halekî şeperze de bû. Tîreyên Kurd bi belavbûn û niştecîbûna wan li navçeyêñ awa awa yên Zabilistanê, desteyek bi hêz û bi şiyâni ya Kurdan damezirandin ku di serdemên dawiyê de jî tu guhertinê hundirîn a welat nikaribû ziyanê lê bike. Fermanrewatiya nûhatî jî bi dîtina yekîtî û tebayiya wan bi dilxwazî hevalti û piştevaniya wan dikirin.

Bi vî awayî, ev rêveberiya nû ya Kurdêñ Beluçî, ev tîreyên xwarê xwe li ser bingeha yekgirtinê rêk xistin û geşe bi biratiya navbera xwe dan: Edreganî, Biraxoyî, Îskene, Zengene, Mamilî, Kirmanî, Dirmenî, Sebahî, Sincawî Seffarî, Xanî Xelî, Başarî, Şamarî, Sencanî, Şîrkibarî, Mûtlisanî, Bazîcanî, Sûranî, Siryanî, Babînî, Makkî, Tûkanî, Askanî, Selahî, Şînwanî, Gurcîn, Celabûk, Hûtkarî, Kukanî, Şekkanî, Nidamanî, Şûn, Mûcaranî, Mûrrayî, Qencanî, Kîşanî, Şembed, Cadî, Xawerî, Kidek, Cemmak, Sûhatî, Dînûrî, Cesfanî, Sûyanî, Hesranî, Dîganî, Gucarî, Şahûlî, Etwanî, Şembiyanî, Salmanî, Ünîzî, Şahhekî, Bîwanî, Sarûlî, Semedînî, Îlzarı û Kirma.

Ev tîreyên Kurdêñ Beluçî di bin sayeya liva mîr Birsanê Kurdêñ Zengene de li Mîrnişîna Zabilistanê jiyana xwe derbas dikirin û Mîr Birsan mîrên xwe çavkaniya hêz û şiyana xwe dizanî.

Rêkxistina leşkerî ya Kurdên Beluçî bi vî awayî bû: Leşkerê Kurd bi ser pênc beşan ve parve bûye. Ji her beşeke leşker re gotine “Yesel”. Navê wan pênc besên leşker bi vî awayî bûye: Biraxîn Yesel, Zengîn Yesel, Edregîn Yesel, Mamilîn Yesel û Kirmîn Yesel. Maneya van navan bi vî awayî ye: Beşa Leşkerê Tîreyên Biraxoyî, Beşa Leşkerê Tîreyên Zengene, Beşa Leşkerê Tîreyên Edreganî, Beşa Leşkerê Tîreyên Mamilî û Beşa Leşkerê Tîreyên Kirmanî. Ji temamê leşkerê tîreyên Kurdan re gotine: “Bulika Tîreyan”. Mîrên van tîreyên girîng ên Kurdan yanî Mîr Kîkan Biraxoyî, Mîr Birsan Zengene, Mîr Libûsan Edreganî, Mîr Kîşan Mamilî û Mîr Ennû Kirmanî serleşkerê vê beşa leşkerê xwe bûne. Mîrê Zabilistanê jî serleşkerê hêza bulika tîreyan bûye. Ev pênc mîrên tîreyên Kurdên Beluçî bi navê “Mîrê Tîreyên Pêncînî” hatibûn nasîn.

Mîr Birsan Zengene, Mîr Kîkan Biraxoyî, Mîr Libûsan Edreganî, Mîr Kîşan Mamilî û Mîr Ennû Kirmanî hevçerxê Sîlukus, yekem paşayê malbata Sîlukiyê Yûnanî bûne. Mîr Feyrûz Zengene, Mîr Mihrab Biraxoyî, Mîr Mingîp Edreganî, Mîr Gincan Mamilî û Mahdad Kirmanî di serdema Antîyakûsê Yekem de serekê tîreyên xwe bûne. Her wiha, Mîr Îspîbûd Zengene, Mîr Mihrab Biraxoyî, Mîr Mingîp Edreganî, Mîr Besran Mamilî û Mîr Makek Kirmanî hevçerxê Antîyakûsê Duyem bûne.

Di serdema fermanrewatiya Sîlukusê Duyem de Mîr Ku-ring Zengene mîrê Zabilistanê bûye û Mîr Sam Biraxoyî, Mîr Bextiyar Edreganî, Mîr Besran Mamilî û Mîr Makek Kirmanî serekên tîreyên xwe bûn.

## **BEŞA HEŞTEM**

### **KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA EŞKANIYAN DE**

#### **Eşkanî**

Dema ku Diwditûsê hakimê Baxterê li dijî Antîyakûsê Duyem ê paşayê malbata Sîlukî şoriş berpa kir, Antîyakûsê Duyem her çend bêdeng kir, lê nikaribû serkeftinê bi dest bixe û bi ser de jî koça dawiyê kir. Piştre kurê wî, Sîlukusê Duyem bû cihnişînê wî û derket ser textê Mad û Parsê. Di vê serdemê de, hakimê Partiya, Andiraguras şâsiyeke mezin kir û birayê mîrê Parsê, Tîrdadî li koşka xwe li ser xizmeta mîrî lome lê kirin û sivikayî pê re kir.

Mîr Eşk li vê kirina hakimê Partiyayî sivikayî û şerefbirina malbata xwe temaşe kir û biryar da ku toleya wê veke û ji bo vê mebestê jî xwe amade kir. Ev herdu bira di netîceyê de bi nehêni bi pênc kesên hevalên xwe re li hev kirin û hakimê Parsê Andraguras dan kuştin û xelkê Parsê ji bo şoriş û serhildanê amade kirin.

Diwditûsê hakimê Baxterê bi vê desteyê re bû yek û fermanrewaya Eşkê pesend kirin. Mîr Eşk li bajarekî navê wî Esak ku nêzikî Koçanê bû û ketiye Geliyê Deryaya Etrekê, taca paşatiyê danî serê xwe.

Di warê pênameya awayê nijada Eşkaniyan de ji dîroknivîsên kevn zanyarî bi destê me dikeve ku ew mirovên deştan ên gerok û nîvkoçer bûne û di deştên mezin û fireh de zêde bûne.

Dîroknivîs di eynî wextê de dibêjin ku Partî beşek ji

desteya Parnî ne ku ew jî beşek ji hozêne bedewî ne û bi navê Daha ew dane nasîn.

Ev xelk di serdema gera di deştan de wek Parsî nehatine nasîn, heta dema ku ber bi başûr ve hatin û li Parsê li herêma Parsawayê pêgeh peyda kirin bi navê Parsî hatin nasîn. Bi şertên zeman re, serekeşîrên wan li Parsê sermiyan, pile û paye bi dest xistin.

Di netîceyê de, Eşkê mîrê mezin ê Parsan, bingeha selteneta Eşkanî danî. Eşk ji bo xurtkirina selteneta xwe di salên destpêkê de, hemû wextan bi şer re mijûl bû û di esnayê van şer û qirênan de giyanê xwe ji dest da. Piştî wî, birayê wî Tîrdad bû paşa û êrîş bir ser navçeya Herkanê û ew kir bin destê xwe.

Tîrdad piştre xwe ji bo xurtkirina fermanrewatiya xwe mijûl kir û ji bo vê mebestê jî hejmara eskerên xwe zêde kir û çend keleh ava kirin. Li gel vê jî, bajar xurt kirin û bajarekî bi navê Dara li Gelyê Gizkiwe Apurtiwanê ava kir ku bijarteke stratejîk a gelek bi hêz û negirî bû.

Tîrdad piştî 23 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir û textê xwe ji kurê xwe Erdewan re hişt. Di serdema Erdewanê Yekem de, Antiyakûsê Sêyem ku şeşem paşayê malbata Sîlukî bûye, biryar daye welatên rojhilatê ku ji destê bapîrên wî derketibûn careke din bîne bin desthilata xwe. Ji bo vê mebestê jî dest bi amadekariya şer kir.

### **Peywendiyê Di Navbera Kurdêñ Beluçî û Paşayê Eşkanî de**

Eşk bingeha dewleta Eşkanî danî û ji bo bihêzkirina seltenetê bi berdewamî têkoşıye û bi dijminan re di nav dijîtiyan de bûye û di vê navê re giyanê xwe ji dest daye. Piştre birayê wî Tîrdad li cihê wî dibe cihnişînê textê fermanrewatiya Eşkanê.

Mîr Kuringê Kurdê Zengene û mîrêmîran dema ku vê rewşê dibîne, bi mebesta rawêjkariyê mîrên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî Mîr Sam Biraxoyî, Mîr Bextiyar Edreganî, Mîr Besran Mamilî û Mîr Makek Kirmanî bangî ba xwe kir. Di neticeyê de, mîrên Kurd bi hev re li ser wê rêk ketin ku piştevaniya malbata Eşkanê bikin. Ev jî ji ber wê bû ku ew hevnijad û hevniştimanê Kurdan bûn.

Her ji bo vê, dema ku Tîrdad derket ser text mîrên Pêncînî yên Kurdên Beluçî belênî û peymana dostaniyê pê re girêdan û piştevaniya Kurdan jê re ragihandin. Tîrdad jî di miqabilî vê hevkarî û peywendiya dostaniyê de, mafê desthilatdariya Mîrnişîna Zabilistanê da Mîr Kuring.

### **Êrîşên Antîyakûsê Sêyem ên Ser Selteneta Eşkanî**

Piştî koça dawiyê ya Tîrdadê Yekem, Erdewanê Yekem ê kurê wî derket ser text û di serdema fermanrewatiya wî de Antîyakûsê Sêyem ku şeşem paşayê malbata Sîlukus bû û li Sûriyê fermanrewatî dikir, ket nav wê tamahiyê ku navçeyên selteneta rojhilatê Mad û Parsê careke din bîne bin desthilata xwe. Ji bo vê mebestê, ji rojhilatê ket rê heta gihîst perestgeha Anahîtayê û ew talan kir û dest danî ser zexîreya mal û darayıya perestgehê.

Piştî vê, bi leşkerekî mezin ber bi Ferkanyayê ve çû û piştî dagirkirina navçeyê hat dora Demxanê. Serbazên Eşkaniyan û hevkareñ leşkerê Kurdên Beluçî li bilindahiyên çiyayên Demxanê bi cih bûbûn û bê payîn êrîşî ser dijmin dikirin.

Di neticeyê de Antîyakûs çiyayên Demxanê ji çar milan ve kir bin dorpêçê. Ji ber wê baş dît ku bi Erdewanê paşayê Eşkaniyan re aştiyê çêke û peymana yekîtiyê pê re îmze kir.

### **Kurdên Beluçî û Alîkariya Paşayê Eşkanî**

Kurdên Beluçî di şerê Antîyakûsê Sîlukî de piştevaniya

Erdewanê Yekem ê paşayê Eşkaniyan kirin û li dijî Yûnaniyan şer kirin. Mîrên Kurd ji wan Mîr Kuring Zengene, Mîr Sam Biraxoyî, Mîr Bisûl Edreganî, Mîr Ercan Mamilî û Mîr Goran Kirmanî bi 40 hezar serbazên şerker ên Kurdên Beluçiyan ve di şergehê de mil bi milê Eşkaniyan bi dijmin re şer dikirin.

### **Koça Dawiyê ya Erdeğanê Yekem**

Erdeğanê Yekem piştî 19 sal fermanrewatiyê kirinên vê dinyaya fanî terk kir û desthilatdarên seltenetê Pirpatyûsê kurê wî li cihê wî kirin paşa.

### **Paşabûna Pirpatyûsê Eşkanî**

Piştî Pirpatyûs hat ser textê bavê xwe, midetê 16 salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir. Pirpatyûs du kur li pey xwe hiştin: Ferhad û Mihirdad. Ferhad kurê mezin bû û li gor urf û adetên Parsan derket ser textê bavê xwe.

### **Paşabûna Ferhadê Yekem ê Eşkanî**

Dema ku Ferhadê Yekem derket ser textê paşatiyê, çiyanışînên Alburzê li hemberî wî seri hildan, şoriş berpa kirin û ji xwarê Deryaya Hezarê ve dest bi şer kirin. Ferhad komek ji wan ku bi navê Merewiyan dihatin nasîn û gelek asî bûn guhest navçeya “Çerx”ê ya lêwarekî Deryaya Hezarê û ew li wir bi cih kirin. Midetekê piştî van serkeftinan koça dawiyê kir û li cihê wî, birayê wî Mihirdad ku gelek hez jê dikir derket ser text.

### **Paşabûna Mihirdadê Yekem ê Eşkanî**

Piştî koça dawiyê ya Ferhad, Mihirdadê Yekem ê birayê wî derket ser textê Eşkanî. Bi destpêkirina desthilata Mihirdad re mezintirîn serdema dîroka Eşkaniyan dest pê kir.

Li derdora 175 sal beriya zayînê, Yukratîdis dest bi

vêxistina agirê şer û tevliheviyan kir. Dema ku Mihirdad bi tevlihevî û jariya kar û barên welatê Baxterê hisiya, êrîş bir ser wî erdî û Tapûrya û Maweraunehîr dagir kir.

Piştî van serkeftinan, Mihirdad dagirên xwe domandin û ji xwarê Zabilistanê heta der û dora Pûralîn û navçeyên Aryan, Tûran û Mekranişê anî bin desthilata xwe. Mihirdad şeşem sultanê malbata Eşkanî bûye.

### **Hatina Kurdên Beluçî ya Nav Erdê Tûran û Mekranê**

Piştî Mihirdad welatê Maweraunehîrê dagir kir, berê xwe da ser erdê xwarê Zabilistanê yanî Tûran û Mekranê ku di serdema fermanrewatiya Yûnaniyan de, Sîlukus Paşa ji ber tawanê şer ve dabû paşayê Hindê Çendran Guptan Moryan. Ev wilayetên hanê, niştimanê bav û bapîrên Kurdên Beluçî bûn. Kurdên Beluçî çaverêya firseteke wiha bûn ku bikaribin careke din niştimanê bav û bapîrên xwe werbigirin. Ji ber wê Kurdên Beluçî bi dil û giyan hevkarî û hevaltiya Mihirdad Paşayê Eşkanî kirin.

Dema ku Mihirdad Paşayê Eşkanî êrîş bir ser Tûran û Mekranê, Mîr Bürganê mîrêmîranê Zabilistanê bi serekên Tîreya Pêncînî yên Kurd, yanî Mîr Behram Biraxoyî, Mîr Ginzan Edreganî, Mîr Kalanç Mamîlî û Mîr Estal Kirmanî re di vî şerî de besdarî Mihirdad Paşayê Eşkanî bûn.

### **Şer Li Suhrabadanê**

Kurdên Beluçî bi hemû tîreyên xwe ve êrîşî ser xêwetgeha Cidgalan a li Suhrabadê kirin. Ji ber ku êrîşeke nepayîn bû, Cidgalan nikaribûn bi çelengî berxwedanê bikin.

Serleşkerê Cidgalan Pûran tê de bi çend serhengên xwe yên navê wan Balra, Mûndra û Giya di meydana şer de hatin kuştin û leşkerê Kurdên Beluçî û Eşkanî gihîsttin der û dora Kuhyara paytexta Tûranê.

## **Şer Li Kuhyarê**

Xebera êrîşa Eşkaniyan gihîstibû mîrê artêşa Cidgalan, ku wan eskerekî giran li Kuhyarê berhev kiribûn û di bin serekatiya serleşkerê xwe Radhan de rû bi rûyê Eşkanî û Kurdên Beluçî bûbûn.

Di esnayê şer de, rêxistina leşkerê Eşkanî û Kurdên Beluçî bi vî awayî bûye: Rêveberiya beşa navenda leşker Mîr Soranê mîrê Qişûnî yê Eşkanî dikir, serekatiya milê rastê artêşa Mîr Behramê Biraxoyî kiriye û serekatiya milê çepê jî Mîr Ginzanê Edreganî kiriye.

Dema ku dengê dehula şer bilind bûye, şerekî dirêjkêşayî dest pê kiriye. Di netîceyê de Cidgalan dîtin ku dişikên dest bi bazdanê kîrin. Artêşa Eşkaniyan û Kurdên Beluçî heta der û dora Gola Pûralînê û Deryaya Umanê rizgar kîrin.

Di vê navê re, Mîr Bürganê mîrêmîranê Zabilistanê navçeya Mekranê rizgar kir û serleşkerê Cidgalan Birhimabisîn kuşt. Hemû leşkerên Birhimabisîn jî di nav tevlihevî û perişaniyê de ji nav çûn.

Piştî vê serkeftin û serbilindiyê, Mihirdad Kurdên Beluçî ku hevnijadê wî bûn careke din li wilayetên bav û bapîrên wan yanî Tûran û Mekranê bi cih kîrin. Her wiha careke din desthilatdariya Tûran û Mekranê giha wan Kurdên Beluçî ku di serdema paşatiya Madan û Hexamenşîyan de desthilatdariya van navçeyan dikirin.

Bi vî awayî, Mîr Behramê Biraxoyî li ser textê Mîrnişîna Tûranê û Mîr Ginzanê Edreganî li ser textê Mîrnişîna Mekranê dan rûniştandin û itîraf bi fermanrewatiya wan hat kîrin.

## **Eslê Tîreyêñ Kurdên Beluçî yên Ji Welat Dûr**

Eslê Tîreyêñ Kurdên Beluçî yên ji welat dûr bi vî awayî bûye:

A- Kurdên Biraxoyî: Mîr Kîkanê Duyem, Mîr Bextiyar, Mîr

- Mihrab, Mîr Sam, Mîr Şahek, Mîr Behram
- B- Kurdêñ Zengene: Mîr Birsan, Mîr Feyrûz, Mîr Îspîbûd, Mîr Kuring, Mîr Bûrgan, Mîr Mihran
- C- Kurdêñ Edreganî: Mîr Libûsan, Mîr Şaheng, Mîr Mingîb, Mîr Bextiyar, Mîr Bisûl, Mîr Ginzan
- D- Kurdêñ Mamilî: Mîr Bolan, Mîr Kîşan, Mîr Kincan, Mîr Besran, Mîr Ercan, Mîr Kalanç
- E- Kurdêñ Kirmanî: Mîr Tûran, Mîr Ennû, Mîr Mahdad, Mîr Makek, Mîr Goran, Mîr Estal



## **FERMANREWAYÊN KURDÊN BELUÇÎ LI TÛRAN Û MEKRANÊ (Dewreya Sêyem)**

Dema ku malbata Eşkanî dawî bi desthilatdariya malbata Sîlukî ya bi nijad Yûnanî li Mad û Parsê anî û Yûnanî ji welat kirin der û fermanrewatiya xwe ragihandin, serekên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî Mîr Behram Biraxoyî, Mîr Ginzan Edreganî, Mîr Kalanç Mamilî û Mîr Estal Kirmanî li dûrê welat bûn û li wilayeta Zabilistanê jiyana xwe derbas dikirin. Van serekan bi Eşkeniyan re peywendiyên biratiyê pêk anîbûn û cara sêyem xwe gihadin kopa desthilatdariyê.

Bi vî awayî, Mîr Berhem Biraxoyî li ser textê Mîrnişîna Tûranê rûnişt û Mîr Ginzan Edreganî desthilata Mîrnişîna Mekranê girt destê xwe. Bi vî awayî cara sêyem fermanrewatiya Kurdên Biraxoyî li Tûranê û Kurdên Edreganî li Mekranê dest pê kir.

### **Mîrêmîran Mîr Behram Biraxoyî**

Piştî Mîr Behram hat ser textê Mîrnişîna Tûranê, xwe mijûlî bihêzkirina pêgeha desthilatdariya xwe kir. Di vê qahîmkirinê de, hejmara artêşa tîreyan di van bajaran de zêde kir: Tifanê, Deşta Suhrabadanê, Kîkanê, Xuzdarê û Ermabîlê çend kelehên asê û bi hêz ava kirin.

Mîr Behram dixwest Xuzdarê bike paytexta Mîrnişîna Tûranê, lê ev daxwaza wî bi ser neket. Ev jî ji ber wê bû ku di serdemên pêşîn de, paytexta mîrên Kurdên Biraxoyî li navçeya bakurê Tûranê li bajarê Kîkanê bûye. Pozîsyona/cihê vî bajarî gelek bi hêz û negir bûye.

## **Koça Dawiyê ya Mihirdadê Yekem**

Mihirdadê Yekem 33 salan fermanrewatî kir. Di serdema xwe de selteneta Mad û Parsê fireh kir û fermanrewatiya xwe gihad asta hêz û şikuya cîhanê û nav û dengê ronahiya heta hetayî pê da. Piştre dinyaya fanî terk kir û koça dawiyê kir.

## **Êrîşa Hozên Sakayê ya Ser Kewşenê Madê**

Mihirdadê Yekem di serdema fermanrewatiya xwe de dema ku mijûlî dagirkirina wilayetên Tûran û Mekranê bû, xebera hatina Sakayıyan gihiştê ku ji navçeya xwe hatine Turkistanê û ji wê jî berê xwe dane başûr û gihiştine nêzikî sî-norêñ Parsê.

Mihirdad piştî destdanîna ser wilayetên Tûran û Mekranê, bi lez ber bi Herkanê bi rê ket û êrîş bir ser rêya êrîşa Sakayıyan ku ji bajarê mezin Merro û Hatimpîlweseyê ber bi Ekbatanê ve anîbûn. Mihirdad bi vî awayî bi wan re mijûlî şer bû. Dema ku Sakayı rû bi rûyî berhelistî û xweragiriyê bûn, ber bi aliyê xwarê ve çûn û bi rêya Merro, Hîrat û Zalibistanê rêya Hindê dan pêşıya xwe.

## **Paşabûna Ferhadê Duyem**

Ferhad piştî koça dawîn a bavê xwe derket ser textê Eş-kanê. Paşayê Silukê Dîmtirdis di bin destê bavê wî de girtî bû. Dema ku Ferhad bû paşa wekî bavê xwe exlaqekî mîhrîbanî bi vî paşayê dîl re bi kar anî.

Wî wextî, Antîyakûsê birayê Dîmtirdis li ser neheziya Tirîfûn bi ser ket û paşatiya artêşê kir bin desthilata xwe. Piştî vê serkeftinê, bi mebesta azadkirina Dîmtirdisê birayê xwe ji bendîtiya Eşkanan, bi leşkerekî giran ve ber bi Madê ve êrîş anî. Piştî sê şeran, Antîyakûs artêşa Eşkanî şikand. Zivistan hat û Antîyakûs diviyabû vegere Sûriyê, lê wî ev nekir û li der û dora Madê ma. Ferhad jî dest bi paşvekêşiyê kir.

Antîyakûsê paşayê Sîlukê xwediye eskerekî zêde bû, ji ber wê neçar ma wan bi ser bajarên cihê cihê ve parve bike. Ev jî bêguman bû sebebê bargiraniyê li ser milê xelkê bajarnışinê ehlê cih, kerb û kîna wan roj bi roj zêde dibû. Her wiha serbazên Sîlukî jî ji ber sebebê çend mehan mayîna bêkariyê, bê hêz û giran bûn. Ev ji bilî wê ji ber belavbûna wan li dora bajarên cihê cihê baladestiya xwe li hember hêzên Eşkanî ji dest dan.

Antîyakûs di vê rewşê de xwest şer dest pê bike û ji bo vê mebestê bi lez çû ku nêziktirîn desteya hêza xwe amade bike. Lê dema ku gihîst cihê dixwest, pê hisiya ku Ferhad ji wî zûtir dest bi amadekariyê kiriye. Serdarên wî nesîhet û pêşniyar kîrin ku bi artêşa dijmin re ya ku hejmara wan ji ya wî zêdetir e nekeve şer û dev ji paşayê Eşkanî ku ji bo lazimiyê çiyayê der û dorê senger girtibû berde.

Antîyakûs jê re ar bû li hemberî dijminekî ku pêştir wî ew şikandibû dest bi revê bike û êrîşî ser artêşa Eşkanî kir. Serbazê Sîlukî ku di warê çek û hecmê de bêhêz û jartir bûn, li hemberî siwariyê Eşkanî şikestin û bazdan. Antîyakûs bi tik û tenê ma, Eşkaniyan ew kuştin û bi temamî zora artêşa wî jî birin.

### Kuştina Ferhed Bi Destê Sakayan

Di şerê pêşîn ê Antîyakûs de, Ferhad serbazên ji hozên Sakayan bi kirê girtibû, lê serbaz negihîsttin dema şer û her ji bo vê jî Antîyakûs Ferhad şikandibû. Lê vê carê piştî ku Ferhad dijmin şikand daxwaza kirêyê ji Sakayan kir.

Sakayan di bersivê de gotin serbazên me ji bo şer amade ne. Lê ji bo ku wextê şer derbas bûbû, Ferhad serekê Sakayıyan qebûl nekir. Ji ber vê jî Sakayıyan dest bi serhildan, talan û birîna navçeyê parastî yên Eşkaniyan kir. Di vê şoriş û serhildanê de, beşek ji hozên Sakayî ku bi navê Uka dihatin nasîn, bi temahiya zexeliyê bûn û dagirkirina navçeyan di hisê wan de bû.

Ferhad li hemberî Sakayiyan leşkerek pêk anî û hinek serbazên Yûnanî jî ku di şerê Antîyakûs de dîl girtibûn kir rexê artêşa xwe, wisan li hev xistin ku ji ser erdê xwe gelek dûr bûn û ji bo parastina giyanê xwe bi wefadarî dibin dijî dijmin, ji bo wî şer dikan. Lê di meydana şer de, dema ku Yûnanî his bi zebûniya Ferhad kîrin, pişta wî berdan û çûn nav artêşa Sakayiyan. Di netîceya vê xwînrêjî, kuştin û birînê de Ferhad giyanê xwe ji dest da.

### **Paşabûna Erdewanê Duyem**

Piştî ku Ferhad di şerê Sakayiyan de giyanê xwe ji dest da, Erdewanê mamê wî bû cihnişînê wî û astenga êrîşen dijwar ên Sakayiyan bi awayê ku bacê bide wan çareser kir. Lê ji ber Sakayiyan navçeya bi bereket a Eşkaniyan dagir kiribûn, di netîceyê de kar gihîşt şer.

Erdewan ji milê Baxteriyê ve êrîşî ser Sakayiyan kir, di esnayê şer de birîneke kuştarî ji baskê xwe xwar û ji bo ku çek bi jehr bû, mir.

### **Koça Dawiyê ya Mîr Behramê Biraxoyî**

Mîr Behram 42 sal fermanrewatî kir û di serdema xwe ya kalitiyê de koça dawiyê kir. Erdewanê Duyem ê paşayê Eşkan hevçerxê wî bû û her wiha ev mîrên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî jî hevçerxên wî bûn: Mîr Mihrab Zengene, Mîr Ginzan Edreganî, Mîr Kalanç Mamîlî û Mîr Estal Kirmanî.

### **Mîrêmîran Mîr Şahdad Biraxoyî**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Behram, kurê Mîr Şahdad derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema fermanrewatiya wî de, hozên Sakayî ji navçeya Baxterê êrîş anîn ser rojhilate Xorasanê û beşek bi bereket a welatê Eşkaniyan dagir kîrin. Erdewan jî êrîşî ser wan kir û di şer de hat kuştin.

Piştî, Mihirdadê Duyem ê kurê wî derket ser text û desthilatdariya selteneta Eşkanî girt destê xwe û ji bo bêdengkirina hozên Sakayî têkoşıya.

### **Paşabûna Mihirdadê Duyem**

Piştî ku Erdewanê Duyem di şerê Sakayıyan de hat kuştin, berpirsiyarên seltenetê Mihirdadê kurê wî anîn ser text. Mihirdadê Duyem wekî Mihirdadê Yekem, hevnavê mezintiya xwe, serdema paşatiya xwe bi bûyerên girîng derbas kir, gelek nav û deng da û bi nasnavê Mihirdadê Mezin hat nasîn.

Mihirdadê Duyem di serdema fermanrewatiya xwe de rî li pêşveçûna Sakayıyan ku hêzên biyanî bûn girt û beşa serekî ya van hozan ber bi xwarê ve ber bi welatê Hindê ve raqewi-rand û selteneta xwe ji şer, tevlihevî û problemên wan bi temamî rizgar kir û piştî 26 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Şerê Kurdên Beluçî Bi Sakayıyan Re**

Piştî kuştina paşayê Eşkanî Erdewanê Duyem di şerê Sakayıyan de, hozên Sakayî morala wan bilind bû û êrîş anîn ser navçeya Tûran û Sîstanê. Beşeke Sakayıyan di bin fermaña Mîr Tuxas de ber bi Tûranê ve êrîş anîn. Serekên Tîreyêndî Kurdêñ Beluçî Mîr Şahdan Biraxoyî, Mîr Nûcan Zengene, Mîr Dilgîn Edreganî, Mîr Dirwar Mamilî û Mîr Zirenk Kirmanî li navçeya Zîxawî ya Geliyê Nişkînê rî li ber êrîşen wan girtin.

Dema ku ev herdu hêz rû bi rûyî hev bûn, şer û qirêneke giran rû da, Tuxasê mîrê Sakayıyan şikest û rêya bazdanê da pêşîya xwe û vegeriya Baxterê.

### **Mîrêmîran Mîr Feyrûz Biraxoyî**

Piştî Mîr Şahdad 31 sal fermanrewatî kir, cîhana fanî terk kir û kurê wî Mîr Feyrûz derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Wê wextê Sakayıyan careke din êrîş anîn Tûran û Mekranê û dest bi dagirkirinê kirin.

## **Li Geliyê Misatnicê Bi Sakayîyan Re Şer**

Mîrên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî bi sehkirina hatina Sakayîyan, ji bo şêwrê berhev bûn. Ew mijûlî şêwrê bûn ku Mîr Moxo Saka bi eskerên xwe ve hat navçeya Kîkanê û li Geliyê Misatnicê li nêzikî bajarê Sampûranê baregeha xwe veda. Mîrên Kurdên Beluçî Mîr Feyrûz Biraxoyî, Mîr Siyamek Zengene, Mîr Behram Edreganî, Mîr Sam Mamilî û Mîr Mihrab Kirmanî bi lez bi mebesta rîgirtina hatina pêşve bi leşkerên tîreyan ve êrîş birin ser cihê dijmin û li dora bajarê Sampûranê bi dijmin re rû bi rû bûn. Mîr Moxo Saka şikest û daxwaza aştiyê kir û ji serekên Kurd rica kir ku rê bidin wî û tîreyên wî ji Tengava Bolanê derbas bibin.

Kurdan daxwaza wî qebûl kirin û bi vî awayî ew bi tîreyên xwe ve çû nav erdê rojavayê Hindê.

## **Paşabûn û Kuştina Guhderzê Yekem**

Du kurên Mihirdadê Duyem hebûn: Guhderz û Ewrûd. Guhderz kurê wî yê mezin bû û li gor destûra Eşkaniyan derket ser textê bavê xwe û heft salan fermanrewatî kir. Lê ji bo ku bi birayê xwe re problemên wî hebûn, birayê wî Ewrûd ew kuşt û bi xwe derket ser textê fermanrewatiyê.

## **Paşabûn û Kuştina Ewrûdê Yekem**

Piştî Ewrûd bi fen birayê xwe Guhderz kuşt û li cihê wî derket ser text, mideteke dirêj desthilatdarî nekir û paşatiya wî şes salan kêşa. Terefdar û piştivanên Guhderz ji ber toleya Guhderz ve, Ewrûd kuştin û cezayê kirinên wî danê.

## **Paşabûna Sena Turk**

Piştî kuştina Ewrûdê Yekem, ji malbata Eşkaniyan kesek tunebû ji bilî kalemêrekî navê wî Sena Turk ku hêj sax bû û di dema kuştina Ewrûdê Yekem de di mîvanseraya seltenetê de

jiyana goşegêriyê derbas dikir û temenê wî 80 sal bû, loma ew anîn ser textê seltenetê.

Hozên Sakayîyan ew mîratgirê selteneta Eşkanî hesêb kirin. Bi vî awayî wan hozên koçer piştgirî û hevkariya wî kirin û bang jî lê kirin ku hefsarê desthilatdariyê bigire destê xwe û dawî bi rewşa tevlihevî û nerêkî ya li welat bîne. Dema ku ew jî derket ser text, hêminî û astî vegerand nav welat û piştî şes sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### Mîrêmîran Mîr Mihirdadê Biraxoyî

Piştî koça dawiyê ya Mîr Feyrûz, kurê wî Mîr Mihirdad Biraxoyî derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Mîr Mihirdad ew mîrên tîreyên Kurd ku di şerê Sakayîyan de çûbûn Geliyê Misatnicê û di rîya parastina axa xwe de di şer de hatibûn kuştin, kurên wan bi rawêjiya endamên Dîwana Bulikê li ser pileya serektîretiya wan danî û destdarî li ser kir. Di wan şeran de, Mîr Siyamek Zengene û Mîr Sam Mamilî giyanê xwe ji dest dabûn û kurên wan Mîr Bîdar Zengene û Mîr Bilfan Mamilî li gor biryara endamên Dîwana Bulikê bi lez li ser pileya serektîratiyê hatin danîn ku jarî di sîstema hozatiyê de peyda nebe.

Di serdema fermanrewatiya Mîr Mihirdad de, mîrê Sakayîyan Musun ku jê re “Mayus” û “Maka” jî digotin, li Baxter, Erasûşa û Zerengiyanê bingeha welatê xwe danî û bi Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê re peywendiyên dostaniyê bi hêz kir.

Mîr Mihirdad Biraxoyî 14 salan fermanrewatî kir û ev mîrên tîreyên bi eslê xwe Kurdên Beluçî bûn hevçerxên wî bûn: Mîr Bîdar Zengene, Mîr Feyrûk Edreganî, Mîr Bilfan Mamilî û Mîr Ecban Kirmanî.

## **Paşabûna Ferhadê Sêyem**

Piştî koça dawiyê ya Sena Turk, kurê wî Ferhadê Sêyem derket ser textê Eşkaniyan û di dema fermanrewatiya wî de, hozên Sakayê li Eraxusya û Zabilistanê mîrnişîna xwe damezirandin û li gel wê jî serweriya fermanrewatiya Eşkaniyan qebûl kirin. Ferhadê Sêyem 11 sal fermanrewatî kir.

## **Kuştina Ferhadê Sêyem**

Du kurên Ferhadê Sêyem ên navê wan Mihirdad û Ewrûd hebûn. Van herdu kuran destê xwe dan hev û jehr dan bavê xwe û ew kuştin. Vê yekê di nav malbata Eşkaniyan de destpêka awayê urf û adetê bavkujî û birakujiyê anî.

## **Hozên Saka**

Yûçîn tîreke hoza Tûxarê bû û niştecihê navçeya Kansînê bûn û bi tîreyên din ên Tûxarê re dijmintiya wan hebû û her wextê di nav şer û qirênan de bûn. Di netîceyê de tîreyên ber-helistkêr bi ser tîreya Yûçînê de hakim bûn û ew ber bi başûr ve çûn. Tîreya Yûçînê ji neçarî nişîngeha bav û bapîrên xwe terk kir û bi serekatiya xwe re ku xwedyiyê nasnavê “Ersk” bûn, Ersk Muxan, Ersk Musas û Ersk Tuxir hatin navçeya rûbarê Seyhûnê. Ev navçe nişîngeha bav û bapîrên Sakayıyan bû. Ji ber wê di vê navçeyê de bi hoza Sîtekanê yanî Sakayıyan re tûşî şer û qirênan bûn.

Tîreya Yûçîn ji ber hejmara xwe bi ser Sakayıyan de hakim bûn û navçeya wan kirin bin desthilata xwe û tîreyên Sakayıyan ber bi rojavayê navçeyên Baxterê yanî rojhilatê Xorasanê ve çûn.

Sakayı êleke mezin bû û ji du tîreyan pêk hatibûn: Sakara û Masakara. Wan ji neçarî êrîşî Baxterê kirin û li Tûrîwayê li navçeya Maweraunehîrê Mihirdadê Yekem ê paşayê Eşkaniyan rû bi rûyî van êrîşên Sakayıyan bû û hat pêşıya wan ew

dan sekinandin û ew şikandin.

Piştî koça dawiyê ya Mihirdadê Yekem, di serdema fermanrewatiya Ferhadê Duyem ê kurê wî de, Sakayiyên êrîşker careke din êrîş anîn ser sînorêن rojhilata Parsê. Vê hoza mezin a erîşker a Sakayî paşvemayê Mîrnişîna Baxteriyan bi temamî ji nav birin. Lê paşayê Eşkaniyan bi hemû hêza xwe ya şer ve berhelistkarî û berxwedanî kir. Giranî û dijwariya van şeran bi awayekî bû ku du kes ji şahêن Eşkanî Ferhadê Duyem û kurê wî Erdewanê Duyem di şerê Sakayiyan de hatin kuştin û xwîna wan bertelef çû.

### **Damezirandina Mîrnişîna Sakayiyan**

Sakayî beriya koça xwe ya bi giştî, zanyariya wan li ser erdê rojhilatê welatê Mad û Parsê hebûye. Ji ber ku di serdema fermanrewatiya Yûnaniyan de çûn û hatina wan li Baxterê hebûye. Ji bili vê Yûnaniyan artêşa xwe ji serbazan wergirtine û hinek ji serdaran jî li ser pileya meziniya serbazên wan dane damezirandin.

Ji ber wê dema ku Sakayiyan dest bi koça xwe ya mezin kirin, ji Baxterê ber bi jêr bûn û li navçeyên Zereng û Kendarayê perş û belav bûn û li ser wan erdan bi cih bûn. Bi rewşa zeman re bingeha hozatiya xwe zexim kirin û ketin damezirandina mîrnişîna xwe û bûn xwediyyê wenatekî bi hêz û fireh.

Kewşenê welatê wan ji rojhilatê ve gihîstibû navçeyên Sindanê û Tengeya Bolanê. Wan Tengeya Bolanê bi navê “Bêlan”ê dan nasîn û navê welatê Zerengê jî ji ber niştecihbûna wan a li wir bi navê “Sekistan”ê dan nasîn û niha jî her bi wî navî tê nasîn.

### **Mayîsesê Mîrê Sakayiyan**

Mayîses ku hinek dîroknivîsan jê re “Mayus” jî gotine, serdarê hozên Sakayiyan bûye û di sala 75’ê beriya zayînê

de wilayeta “Erasûşa”yê dagir kiriye û li wir mîrnişîna xwe pêk anije û serweriya fermanrewatiya Eşkanî ya Mad û Parsê qebûl kiriye û welatê xwe serbixwe kiriye.

Paşayên Eşkanî kesîne bûn ku bikaranîna rewşê têgihiştin û sûd û qazanca zêde ji dema aştiyê wergirtin. Xwediyyê karekterekî bûne ku bi awayekî peyman îmze kirine ku ji bo berjewendiyên xwe jê îstîfade wergirtine. Her wiha, li gor urf û adetên Parsan hemû wextê di peymanan de rêya îmzekirinê dane ku di nav welatê xwe de serbest bin. Paşayên Eşkanî bi mîrên Sakayıyan re jî eynî urf û adet peyrew kirine.

Mayîses, piştî hatina ser textê mîrnişînê, karîbû mîrnişînê xurt bike û kewşenê wê fireh bike. Di vî warî de, ji rojhilat gelek navçe kirine bin desthilata xwe ku sînorên wê heta Tiksûlanê û rûbarê Sindanê çûye.

Mayîses 25 sal fermanrewatî kir. Ew bi navê “Musus” jî dihat nasîn û hevçerxê Sena Turkê Paşayê Eşkanî bû.

### **Yekgirtina Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê Bi Sakayıyên Zabilistanê Re**

Di serdemâ paşatiya Sena Turkê Eşkanî de hozên Sakayî li Erasûşa, Kendara, Zabilistan û Baxterê mîrnişîna xwe damezirandin û serweriya fermanrewatiya Eşkaniyan qebûl kirin. Sakanî bi xelkê xwecih ê van herêman re tevlihev bûn ku ferq û cihêtî di navbera wan de nemîne.

Li ser bingeha vê destûrê, peywendiyên xwe bi zanayî bi kurên Beluçî yên Tûran û Mekranê re qahîm kirin û ev yekgirtina navbera wan bû sebebê zexmî ûbihêzbûna herdu milan. Mîr Mayîses Saka di destbikarbûna desthilatdariyê de hişê xwe da yekgirtîkirina Kurdên Beluçî û Sakayıyan.

### **Mîr Îzses Saka**

Mîr Mayîses Saka yekem paşayê Mîrnişîna Sakayıyan bû

ku midetê 25 salan fermanrewatî kir. Dema ku koça dawiyê kir, du kurên navê wan Îzses û Azûnses li pey man. Îzses derket ser textê bavê xwe rûnişt û navçeya Penc Abeyê dagir kir û bi welatê xwe ve girêda. Azûnsesê birayê xwe jî kir hakimê vî wilayeti.

Îzses nêzikî 28 salan fermanrewatî kir. Di dema fermanrewatiya wî de, Mîr Ferhadê Kurdê Zengene bi hoza xwe ve nişîngeha xwe guhast Tûranê û du tîreyên Sakayî Selgur û Sagdî jî bi xwe re anîbûn.

### **Paşabûn û Kuştina Mihirdadê Sêyem**

Mihirdadê Sêyem, piştî kuştina bavê xwe, derket ser textê paşatîyê û piştî midetekê êrîş bir ser Ermenistanê. Di dema nebûna wî li wir de, Ûrûdê birayê wî textê desthilatdariyê dagir kir. Dema ku ev xeber gîhîst Mihirdad bi lez hat paytextê û ew şikand û hejmareke zêde ji piştivanê wî jî kuştin.

Mihirdad sitem û zordarî ji xwe re kir adet û endamên dewletê bi vê dilgiran bûn û ew ji ser text dûr xistin û Ewrûdê birayê wî anîn ser text. Mihirdad jî çû û xwe avêt Ereban û bi alîkariya wan bi yek carî êrîş anî ser selteneta Parsê. Lê Sûrinê serekerkanê Ewrûd şikest û hat kuştin.

### **Mîrêmîran Mîr Behmen Biraxoyî**

Piştî Mîr Mihirdad koça dawiyê kir, Mîr Behmenê kurê wî derket ser textê Tûranê. Di serdema desthilatdariya Mîr Behmen de, Mîr Ferhad Zengene bi xwe û hoza xwe ve bi du tîreyên Sakayî yên navê wan Selgur û Sagdî re ji navçeya Zabilistanê nişîngeha xwe veguhest Tûranê. Mîr Behmen Biraxoyî yê mîrêmîranê Tûranê, Mîr Ferhad û hoza wî li Geliyê Goranê bi cih kir û du tîreyên Sakayî jî şandin navçeya Xuzdarê û Mîr Sakîn serdarê tîreya Sagdiyê bi tîreya xwe re di Geliyê Girîşkanê de bi cih kir û Mîr Kudirê serekê tîreya Selgurê jî bi tîreya wî re li Geliyê Pîlarê bi cih kir.

Ev serekên tîreyêñ Kurdêñ Beluçî hevçerxêñ Mîr Behmen bûn: Mîr Ferhad Zengene, Mîr Bûbik Edreganî, Mîr Mîwan Mameli û Mîr Sinhan Kirmanî. Mîr Behmen 29 salan li wilayeta Tûranê paşatî kir.

### **Îzsesê Duyem ê Mîrê Sakayiyan**

Dema ku Îzsesê Yekem koça dawiyê kir, Îsalê Sesê kurê wî bi nasnavê Îzsesê Duyem derket ser textê Mîrnişîna Zabilistanê. Wunsan birayê wî yê biçük bû. Îzsesê Duyem dagira xwe ya Penc Abê domand û birayê xwe Wunsan ji bo wilayeta dagirkirî ya welatê Hindê şand ku desthilatdariya dewletê ya li wir bigire destê xwe û fermanrewatiyê bike. Ew yekem Sakayı bû ku destpêka fermanrewatiya xwe li welatê Hindê da destpêkirin. Îzsesê Duyem li Zabilistanê 22 salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir.

### **Mîrêmîran Mîr Besam Biraxoyî**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Behmen, Besamê kurê wî derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema mîrnişîniya Besam de “Dîwana Milûka Tûran û Mekranê” hat damezirandin. Mebest ji damezirandina vê saziyê ew bû ku rêveberiya wilayeta Tûran û Mekranê bi karê hevbeş Dîwana Milûkê bigihînin netîceyekê.

Piştî damezirandina Dîwana Milûkê kar û barêñ serbazî yên Tûran û Mekranê di bin çavdêriya vê dîwanê de dihatin meşandin. Ev serekên Kurdêñ Beluçî, Mîr Besam Biraxoyî yê mîrêmîranê Tûranê, Mîr Mihirdad Edreganî yê Mîrêmîranê Mekranê, Mîr Siyawuş Zengene, Mîr Semban Mamilî û Mîr Mîhar Kirmanî endamên Dîwana Milûkê bûn.

### **Paşabûn û Goşenişîniya Ewrûdê Duyem**

Piştî Mihradê Sêyem, Ewrûdê Duyem ê birayê wî derket ser textê Eşkanê û şerekî nevegêr bi Roman re rû da. Ev jî ji ber

wê bû ku selteneta Eşkanî bi Roman re di nav şer de bû.

Piştî di navbera van herdu welatan de şer rû da, Eşkaniyan di şerê Hurranê de Romayî şikandin û Ewrûd rabû ji bo dagirkirina Sûriyê Feyrûzê kurê xwe bi leşkerekî mezin ve şand ser. Li Sûriyê Eşkanî paşve vekişyan û Feyrûz jî di şer de hat kuştin. Ewrûd bi vê ziyanê xemgîn bû û jiyana goşenîşînî hilbijart û desthilata textê Eşkanî da destê Ferhadê kurê xwe yê duyem.

### **Gundus Fasanê Mîrê Sakanê**

Dema ku Îzsesê Duyem koça dawiyê kir, kurê wî Gundus Fasan derket ser textê Mîrnişîna Zabilistanê û ji birayê xwe Gûda re meqamê wezaretê da. Piştî wê, Gundus desthilatdariya herêmên Hindê girt destê xwe û Mîrnişîna Zabilistan Erasûşyayê da Gûdayê birayê xwe.

Gundus Fasan li Hindê nav û deng da û li wir bi navûdengtirîn şahê malbata Sakaiyan bû. Çarçoveya desthilatdariya welat a Sakaiyan li Hindê berfireh kir û bi dadperwerî fermanrewayî kir.

### **Paşabûna Ferhadê Çarem**

Ferhadê Çarem, piştî goşenîşîniya bavê xwe derket ser textê Eşkanê ku mirovekî sitemkar û zordar bû. Wî çewisandin û sitem ji xwe re kiribû kar û ji bo wê hinek ji endamên dewletê welat terk kiran.

Ferhadê Çarem bi selteneta Romayê re şer û qirên da destpêkirin. Di netîceyê de kesekî ji malbata Eşkanî yê navê wî Tîrdad alaya şoriş û serhildanê bilind kir û karîbû Ferhadê Çarem ji ser text hilde. Ferhad piştire xwe avêt ba Sakaiyan.

### **Paşabûna Tîrdadê Duyem**

Tîrdadê Duyem derket ser text û midetekê fermanrewatî

kir. Piştre, Ferhad bi alîkariya Sakayiyan êrîşî ser Parsê kir. Tîrdad şiyana bergiriyê bi xwe re nedît û bazda. Bi xwe re kurê xwe yê biçûk ê navê wî Ferhad bû bir û xwe avêt ba Qeyserê Romê.

### **Kuştina Ferhadê Çarem**

Ferhadê Çarem ku careke din derket ser text, midetekê fermanrewatî kir. Di netîceyê de Ferhadê kurê Ferhad bi handana dayîka xwe jehr da bavê xwe. Bi vî awayî bavê xwe kuşt û bi xwe derket ser text.

### **Mîr Gûdayê Mîrê Sakayiyan**

Dema ku Gundus Fasan desthilata paşatiya Hindê girt destê xwe, paşatiya Mîrnişînên Kindara û Zabilistanê da destê Gûdayê birayê xwe. Gûdaş jî kurê xwe Ebdîn Gases da ser desthilatdariya Mîrnişîna Zabilistanê û bi xwe jî hinek ji wilayeta Kirmanê ji paşayê Eşkanî stend û kir bin desthilata xwe û mîrnişîna xwe fireh kir.

### **Hatina Dinyayê ya Peyamber Îsa (Silav Lê Bin)**

Di navbera salên çar û şeşê beriya zayînê de, Hz. Îsa (silav lê bin), di yek ji wan gundên Beytulmuqedesê yê navê wî Beyt Lehem de hat dinyayê. Di wê serdemê de du seltenetên bi hêz û gelek bi şiko di dinê de hebûn: Selteneta Parsê û selteneta Romayê.

Agistas(Agûstûs) paşayê Romayê û Tîrdad jî paşayê Parsê bû. Paşayê Parsê ji bo piştrastkirina stêrnasan ku Mesîh hatiye dinyayê, komek ji nûçegihanên xwe şandin Beytulmuqedesê ku eger mizgînî rast be biçin cihê hatina dinyayê ya Hz. Mesîh û xêrhatina Wî bikin. Ev deste piştî piştrastkirina hatina dinyayê ya Mesîh vege riya Parsê û nûçe gihad Tîrdadê paşayê Eşkanî û behsa hemû rewşê jê re kirin.

## **Mîr Feyrûzê Mîrê Sakayîyan û Têkçûna Mîrnişîna wî**

Piştî ku Gundus Fasan li Hindê koça dawiyê kir, kurê wî Feyrûz derket ser textê welatê Hindê û Mîrnişîna Erasûşyayê. Sinarbarê kurê Gûda jî ku kurmamê wî bû, kir desthilatdarê Mîrnişîna Zabilistanê.

Di serdema fermanrewatiya Mîr Feyrûz de, desthilatdariya Sakayîyan li Zabilistan, Baxter û Hindê, hêdî hêdî ber bi têkçûnê ve diçû. Cihnişînên mîrên Sakayî bi hêz bûn û hoza Koşaniyan bi ser de hakim bû û desthilat kirin destê xwe.

## **Mîrêmîran Xefî Biraxoyî**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Besam, kurê wî Mîr Xefî derket ser textê paşatiya Tûranê û di serdema mîrnişîniya wî de Ferhadê Pêncem, paşayê selteneta Eşkanê bû. Her di vê serdemê de, desthilat û hakimiyeta mîrên Sakayîyan li Baxterê, Zabilistanê û Erasûşyayê dest bi jariyê kir. Li der û dora sed salên hêminî û ewlekariyê piştî êrîşên Sakayîyan, li herêma Baxterê yek ji serekên hozên Koşanê ku ew jî bi eslê xwe ji tîreyên Yûçînê ye, bi ser Sakayîyan de hakim bû û desthilat kir destê xwe û bingeha dewletê damezirand ku bi navê Koşan hat naskirin.

Mîr Xefî 34 salan fermanrewatî kir û ev serekên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Wundan Zengene, Mîr Kîkan Edreganî, Mîr Botan Mamilî û Mîr Mengur Kirmanî.

## **Xweyîkirina Selgur û Sagdî**

Mîr Xefî di serdema fermanrewatiya xwe de urf û adetê xweyîkirina tîreyên Selgur û Sagdiyê meşand ku bi Mîr Ferhad Zengene re ji Zabilistanê hatibûn Tûranê û li wir bi cih bûbûn. Ev adet ji bo wê çêbûbû, ji ber ku ev herdu tîre ji nijadê Kurdên Beluçî nebûn û pêwîst bû bêñ xweyîkirin, ku tu cihêtî di navbera wan û Kurdên Beluçî de nemîne û piştî bi cihkirina

adetê ew tîreyên Kurd bêñ hesêbkirin.

Urf û adeteke Kurdan hebûye ku bi wê rîyê tîreyên biyanî bi civata xwe re girê didan û ji vê urf û adetê re digotin “hêskşikandin”. Ev adet bi vî awayî hatiye meşandin ku mîrêmîranê tîreyan ku serekê Dîwana Milûkê bûye, bang serekêne tîreyên din dikir, di civîna Dîwana Milûkê de behsa xweyîkirina wan tîreyên biyanî dikir û gotûbêj li ser dikirin. Piştî wê, serekê Dîwana Milûkê mêzer yan destara bi bira hesêbkirina li ser mîrê wê tîreyê girêdida û serekê tîreyê jî piştî destargirêdanê peymana wefadariyê bi wî xelkî re girêdida ku tevlî nav wan bûbûn. Piştî wê bi serekê Dîwana Milûkê re xwarin dixwarin û pîrozbahî li serekê wê dikirin û diçûn. Bi vî awayî, piştî bicihkirina vê urf û adetê tîreya biyanî yek ji tîreyên Kurdêñ Beluçî dihat hesêbkirin.

### **Paşabûn û Kuştina Ferhadê Pêncem**

Ferhadê Pêncem jehr da bavê xwe û kuşt. Ji ber vê kirinê endam û desthilatdarên seltenetê jê bêzar û tore bûn. Qeyserê Romê jî ew dagirker dizanibû û qîmet nedida daxwaz û xwestekên wî. Li gel wê jî, Ferhad kesekî gelek tirsonek bû û fermanrewatî lê nedihat. Di netîceyê de mezin û desthilatdarên seltenetê ew ji ser text hildan û kuştin.

### **Hoza Koşaniyan**

Koşanî hozek bû ku ew û Sakayî ji yek esil û nijadê bûn û wek xelkê Çîn û Yûçînê hatine naskirin. Wan li dora 160 sal beriya zayînê konêñ xwe yên nişîngeh ku li rojhilate Çînê bûye terk kirine û hatine geliyê ser deryayê, bakurê Amoyê. Sakayî li vir bi cih bûbûn, ji ber xwediyê şiyana berxwedana li hemberî êrîşen wan nebûn bazdan û berê xwe dan rojhilate Baxterê û başûrê zincîrên çiyayêñ Hindukuşê.

Wê wextê, Împaratoriya Çînê ji ber êşandinêñ hozên Hwang Nwanê ketibû tengiyê û sefirê xwe şand ba Yûçînan û

ji bo bêdengkirina Hwang Nwan daxwaza alîkariyê ji wan kir. Lê Yûçin bi dengê wan ve neçûn û împaratorê Çinê ji vê aciz bû û êrîşî ser wan kir. Yûçinî paşve vekişîyan û ji jorê Deryaya Amoyê ve ber bi jêr bûn û hatin xwarê wilayeta Baxterê ku nişîngeha Tiraxiyan bû û bi alîkariya wan Mîrnişîna Baxteriyan kîrin bin desthilata xwe.

Hoza Koşî yek ji pênc hozên Koşangê bûye. Li gor nivîsandina dîroknivîsên Çinê mîrê wan Kucule Kedfîzs çar tîreyên din ên Koşangê bi xwe re kir yek û mîrnişîna xwe li Baxterê damezirand û xwe wek şahê Koşangê da nasîn. Ji ber vê di behsa dîroka wan de bêjeya Koşanê cihê Yûçinê girt.

Piştî wê, Kucule Kedfîzs Pars, Kendaran û Zabilistan dagir kir, selteneta xwe fireh kir û Kurdên Tûran û Mekranê jî kir bin destê xwe.

### **Paşabûn û Kuştina Ewrûdê Sêyem**

Piştî kuştina Ferhadê Pêncem, endamên dewleta Parsê kesekî ji malbata Eşkanê ku navê wî Ewrûd bû û ji tirsa Ferhad di goşeyekî veşartî de jiyana xwe derbas dikir, anîn ser textê fermanrewatiyê. Lê wî jî sitem û şîdet kir awayê xwe. Piştî sê sal fermanrewatiyê, desthilatdar û mezinên dewletê ew bi fêl û fend ji text dûr xistin û kuştin û xwe ji sitemkariya wî rizgar kîrin.

### **Paşabûna Enuşê Yekem û Dûrxistina Wî Ji Text**

Piştî kuştina Ewrûdê Sêyem, di nav malbata Eşkaniyan de kesekî wiha nemabû ku layîqî pile û payeya paşatiyê be. Ji ber wê, desthilatdarên dewletê sefir şandin ba paşayê Romayê û daxwaz jê kîrin ku Enuşê kurê Ferhadê Çarem ku li ba wan bû, bişînin Parsê ji bo wî deynin ser textê Eşkanê.

Enuş ji Romayê hat û derket ser textê fermanrewatiyê. Piştî midetekê, desthilatdarên seltenetê ji wî jî nerihet û neşad

bûn. Ji ber ku wî li gor urf û adetê Romayê hereket dikir û rikê wî ji adetê Parsê vedibû. Van sebeban wisan kir ku şahzadekî malbata Eşkanî yê bi navê Erdewan li hember serî hilde. Desthilatdarên seltenetê piştgiriya wî kirin û karîbû Enuş bişikêne, wî ji welatê Parsê derxe û desthilatdariya welat bigire destê xwe.

### **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Erdewanê Sêyem**

Erdewanê Sêyem ku derket ser text careke din artêşek amade kir, êrîşî ser Enuş kir û ew şikand. Enuş ji bilî bazdanê tu çareyeke din jê re nema û çû bajarê Silûsiyê. Erdewan bi pey ket û gelek terefdarên wî ji orteyê rakir. Piştre Enuş Silûsî jî terk kir, berê xwe da Ermenistanê û bû paşayê wir. Lê ji ber zorlêkirina Erdewanê paşayê Eşkanî, ji neçarî dev ji fermanrewatiya wir jî berda û xwe da destê fermanrewayê Romên Şamê. Xwest ji Şamê jî derkeve, lê Roman ew destgîr kirin û kuştin.

Erdewanê Eşkanî xwe mijûlî xurtkirina pêgeha desthilata xwe kir û bi Roman re aşitî danî û piştî 26 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Kucele Kile Kedfîzsê Mîrê Koşanê**

Kucule Kile Kedfîzs mîrê hoza Koşanê bû û mirovekî zana, bi cesaret û mîrxas bû. Karibû çar tîreyên Koşanê li gel xwe rîk bixe û li Baxterê mîrnîşînê damezirîne. Di mideteke dirêj de bi hewl û têkoşînê, selteneta xwe berfireh kir û wilayetên der û dora selteneta Parsê bi desthilatdariya xwe ve girêda û pêgeha xwe li temamê wan cihan bi hêz kir ku ew ji wilayetên Kendara, Kabilistan, Zabilistan û Xorasana Rojhilate pêk dihatin.

Kucul piştî 38 sal desthilatê koça dawiyê kir. Navê wî Kucele bû û piştre nasnavê Kile Kedfîzs jî lê hat kirin, ku dihat maneya dîndar û kurê şahê ji asman hatiye.

## Mîrêmîran Şawiş Biraxoyî

Piştî koça dawiyê ya Mîr Xefî, kurê wî Mîr Şawiş derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema desthilatdariya wî de, mîrê mezin ê Koşaniyan Kucele Kile Kedfîzs, piştî dameziradina desthilatdariya xwe li Baxterê, wilayetên Parsê ku ji Kendara, Zabilistan, Kabilistan û Xorasana Rojhilate pêk dihatin, dagir kir û bingeha selteneta Koşanê damezirand.

Mîrên Tîreyêne Pêncîne yên Kurdêne Beluçiyêne Tûran û Mekranê xwe nedan dest û serî li ber mîrên Koşanê dananîn. Ji bilî vê, hevahengiya tîreyêne Kurdêne Beluçî ewqas bi hêz û xurt bû ku mîrê Koşanê nedixwest dijmintiyê bi wan re çêke. Her wekî gotine: “Rizgarî di aştî û hêminiyê de ye.” Ji ber wê, mîrê Koşanê li ser rêya aştiyê bi Kurdêne Beluçî re meşıya.

Mîrê Koşanê mirovekî hişmend bû û dizanîbû bi zeman û serdemê re hereket bike û sûd û qazancê ji serdema aştiyê bi dest bixîne û hemû wextê peymanên wisan girêdida ku bi wê rêya îmzekirina wan di çarçoveya desthilatdariya xwe de serbest bike. Kucule Kile Kedfîzs li ser bingeha vê nêrînê peyman bi Kurdêne Beluçî yên Tûran û Mekranê re girêda û itîraf bi fermanrewayêne li Tûran û Mekranê kir. Bi vî awayî, belêni û peyman bi wan re girêda û ew kirin hevpeymanê welatê xwe.

Mîr Şawiş piştî 25 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir û ev serekên Kurdêne Beluçî, Mîr Kimbîc Mîrêmîranê Mekranê, Mîr Şîno Mamilî, Mîr Xefî Kirmanî û Mîr Nûzer Zengene hevçerxên wî bûn.

## Paşabûna Guhderzê Duyem û Rakirina Wî Ji Ser Text

Piştî Erdewanê Sêyem, kesekî ji malbata Eşkaniyan ê bi navê Guhderz derket ser textê fermanrewatiya desthilata Eşkanê. Du birayêne Guhderz ên navê wan Erdewan û Wardan hebûn, ji wan bi gûman bû û baweriya wî bi wan tunebû. Ji ber wê yek ji wan bi jin û zarokên wî ve kuşt û yê duyem bazda.

Hêj midetek di ser desthilatdariya Guhderz re derbas nebûbû ku mezin û karbidestên welat bangî Wardan kirin ku ji bo bidestxistina paşatiyê şorişê bike. Wardan piştî du rojan xwe gihad Parsê ku bikaribe ji nişka ve bi ser Guhderz de bigire. Guhderz ji neçarî ji Parsê bazda û çû ba hozên Dahayê û mijûlî plandanîn û handana hereketa dijî Wardanê birayê xwe bû. Guhderz ji bo vê mebestê alîkarî ji hozên Dahayê wergirt û ji bo bidestxistina text û tacê ket rê.

Wardan bi xwe û bi hêzekê ve berê xwe da Deşta Baxtir-yayê. Ji nişka ve xeber ji Guhderz re hat ku mezin û desthilatdar bûne hevdest û li hev kirine ku text û tacê ji herdu birayan bistînin. Vê tirsa hevbeş herdu bira ji neçarî li hev nêz kir, li hev kirin ku taca selteneta Parsê di destê Wardan de be û Guhderz jî bi desthilatdariya Herkaniyê razî be.

### **Paşabûn û Kuştina Wardanê Yekem**

Dema ku Wardanê Yekem derket ser text, bajarê Silûsi-yeşeyê hê jî di nav şorêş û serhildanê de bû. Wardan bi alîkarî û pêşengiya çîna mezin a wî bajarî ku terefdarê wî bûn, êrîşî ser bajêr kir û wan jî ji neçarî xwe dan dest û ew şoreşa ku heft sal bû berdewam dîkir dawî lê hat.

Piştî vê serkeftinê, Wardan serkeftineke din jî bi dest xist û selteneta xwe gelekî fireh kir. Piştî mideteke dirêj, careke din di navbera wan herdu birayan Wardan û Guhderz de şer û qirênen dest pê kir û heta du salan kêşa; di netîceyê de bi mirina Wardan dawî lê hat. Ev jî bi wî awayî ku mezin û desthilatdar dest dabûn hev û ji nişka ve Wardan dabûn kuştin.

### **Paşabûna Cara Duyem a Guhderz û Koça Wî ya Dawiyê**

Piştî kuştina Wardanê Yekem, di navbera mezinên Parsê de li ser mîrata text û taca paşatiya Eşkanê dijîtî û gîrûgiriftan rû dan. Piranî terefdarên Guhderz bûn û komek jî Mihirdadê

kurê Enuş û neviyê Ferhadê Çarem ji bo paşatiyê dan nîşan. Ev şahzade li Romayê mezin bûbû û xelkê Parsê bi gelempêri rika wan ji wî şahzadeyî dihat û ruhê wan jê diçû ji ber ku li Romayê mezin bûbû. Îhtîmal e ji ber van sebeban û bi taybetî ji ber ku Guhderz jî di nav welat de amade bû, di netîceyê de hemûyan li ser selteneta Guhderz li hev kirin û Guhderz anîn ser textê paşatiyê.

Hê midetek di ser paşatiya Guhderz re derbas nebûbû ku netîceya bêmerhemetî, dilhişkî û kirinên wî yên neşayısteyî hatin dîtin, ji hemû milan ve hawara gilî û gazina bilind bû û di netîceyê de berhelistkaran gilî û gazind birin ba Qeyserê Romê û jê daxwaz kirin ku şahzade Mihirdad bişîne Parsê. Qeyserê Romê ferman da ku şahzadeyê dawakarê text û tacê bişînin heta qeraxêni Firatê.

Mihirdad hat Parsê û di şerê li dijî Guhderz de netîceyeke helkirinê bi dest nexist. Dema ku temaşe kir eskerên wî bi temamî seperze û ji hevdu ketine, xwe avêt ba serdarekî pileya xwarê ku bavê wî tayîn kiribû û navê wî Paran Ses bû. Lê wî bi nemerdî ew girt û zincîrkirî şand ba Guhderz. Guhderz jî her çend ew efû kir lê ferman da ku herdu guhêñ wî bibirin ji bo careke din fikira bidestxistina seltenetê neke. Piştî midetekê Guhderz koça dawiyê kir.

### **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Enuşê Duyem**

Piştî koça dawiyê ya Guhderzê Duyem, Enuşê Duyem ku paşayê Madê bû derket ser textê selteneta Eşkanî û piştî neh sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Di serdema fermanrewatiya wî de tu bûyereke girîng rû neda.

### **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Yekem**

Piştî Enuşê Duyem koça dawiyê kir, Bilaşê Yekem derket ser text. Du birayênil Bilaş hebûn: Feyrûz û Tîrdad. Ew bi temen ji herduyan mezintir bû, lê li gel wê jî wan serî li ber paşatiya

wî dananîn. Bilaş selteneta Madê da şahzade Feyrûzê birayê xwe. Ji ber wê pêwîst bû ji birayê xwe Tîrdad re jî cihekî şiyayî temîn bike.

Partan berdewamî xwe xwedîyê Ermenistanê dizanibûn, wê wextê dagirkirina wî welatî ji bo Bilaş zêde ne asê bû. Ji ber wê Bilaş ji bo bihêzkirina desthilatadariya xwe û bidestxistina desthilatdariyekê ji birayê xwe yê biçûk re ku wî welatî bîne bin rikêfa xwe, firseteke guncaw dît. Ev di wê demê de bû ku hozên deştî yên bakurî bi navê Alanî êrîş anîn ser erdê welatê Parsê û ber bi Madê ve berjêr bûn. Feyrûzê fermanrewayê Madê li hemberî êrîşen wan xwedîyê mecalâ berxwedanê nebû, ji ber wê paşve kişiya û li cihekî dûr bi cih bû.

Piştre van hozan êrîşî aliyê rojavayê kirin û rû bi rûyê leşkerê Tîrdad ê paşayê Ermenistanê bûn û di netîceyê de ew gelekî bi giranî şikandin û bi destkeftiyeke gelek giranbuha ber bi rojhilatê ve vegeriyan.

Bilaşê Yekem piştî 20 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir û di serdema wî de bûyera têkçûnê di selteneta Eşkaniyan de didomiya.

### Mîrêmîran Mîr Miradan Biraxoyî

Piştî koça dawiyê ya Mîr Şahêş, kurê wî Mîr Miradan hat ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema wî de, fermanrewayê mezin ê Koşaniyan Kucel Kile Kedfîzs koça dawiyê kir, kurê wî Wîma Kile Kedfîzs bû cihnişînê wî. Dema ku Wîma Kile Kedfîzs êrîşî ser Împaratoriya Çinê kir, mîrê Sindanê ev wek fersend dît û êrîşî ser Tûranê kir.

### Êrîşa Mîrê Sindanê ya Ser Tûranê

Mîr Manya mîrê mezin ê Sindanê bû û bi du serleşkerên xwe Mîr Gingû û Mîr Bindan û serbazên Sindanê re ji zincîra Çiyayê Katereyê ve êrîşî ser erdê Tûranê kir. Dema ku ev xeber gîhişt serekên Kurdan, ji bo bergirîkirina wan a hatina

pêş bi lez ji gerdenên zincîra Çiyayê Katêrê ve ber bi jêr bûn û bajarên Sindan talan kirin. Dema ku mîrê Sindanê ev rewş dît, têgihîst ku ji du milan ve şerkirin ji bo serbazên wî ne şiya ye. Ev jî dihat wê maneyê ku li milekî êrîşa li ser Tûranê bidomîne û li milekî din jî bergiriyê li çûna pêş a Kurdan li nav deşt û bajarên Sindanê bike. Ji ber wê serleşkerên Sindanê neçar man ji erdê Tûranê paşve bikişin û bergiriya welatê xwe bikin. Yanî Kurdên Beluçî ku rijiyabûn nav deşt û bajarên Sindanê derxin. Kurdên Beluçî bi serkeftî bi destkeft û dewlemendiyek zêde ji erdê Sindanê derketin û vege riyan Tûranê.

Mîr Miradan piştî 17 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir û ev serekên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Nûzer Zengene, Mîr Şîran Edreganî mîrêmîranê Mekranê, Mîr Pindik Mamilî û Mîr Şûlan Kirmanî.

### **Wîman Kile Kedfîzsê Mîrê Koşanê**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Kucule Kile Kedfîzs mîrê mezin ê Koşanê, Wîman Kile Kedfîzs derket ser textê bavê xwe, nêzikî nîv sedsalê yanî 50 salan fermanrewatî kir û di midetê desthilatdariyê de kewşenê welatê xwe ewqas fireh kir ku sînorê rojhilate yê welatê wî digihîst nêzikî rûbarê Kingê.

Wîman bi rêya sefirân daxwaz ji paşayê Çînê kir ku wî bike zavayê xwe û keça xwe bidê. Lê împaratorê Çînê daxwaza wî qebûl nekir. Wîman Kile Kedfîzs aciz bû û leşkerekî mezin ku ji 70 hezar siwariyan pêk hatibû di bin serekatiya sererkan Sîan de ji bo dagirkirina Çînê şand. Sîan bi rêya Pamîrê êrîş bir ser rojavayê Çînê û ew rû bi rûyê leşkerê Çînê bû. Di netîceyê de, sererkanê leşkerê Çînê Pançe ew şikand û Sîanê serleşkerê Wîman Kile Kedfîzs daxwaza aştiyê kir û li ser ku mîrê Koşanê di dahatî de bacê bide împaratorê Çînê li hev kirin.

Wîman Kile Kedfîzs ji bo xurtkirina welatê xwe dostanî bi paşayê Eşkanî re bi hêz kir û di temenê 100 salî de koça dawiyê kir.

## Mîrêmîran Mîr Şahbûz Biraxoyî

Piştî koça dawiyê ya Mîr Miradan, Mîr Şahbûzê kurê wî derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di dema desthilatdariya wî de, Wîman Kile Kedfîzs êrîşî ser selteneta Çinê kir û bi giranî şikest û paşve kişiya. Ev jî bû sebebê wê ku welatê Koşanê ji seviyabihêziyê derkeve û dûçarı jariyê bibe. Lê li gel wê jî, Wîman Kile Kedfîzs paşayekî bi tedbîr bû û bi dîtina vê rewşê ferma ji bo xurtkirina neteweyî da ku mîrnişînên hevpeymanên xwe bi awayê eskerî ji nû ve birêk bike. Di vî warî de Kurdên Beluçî jî guherîn di ser awayê rêkxistina xwe ya eskerî de kirin û ji nû ve leşkerekî wêrek ji bo parêzgarîkirina welatê Tûran û Mekranê rêk xistin.

Ev artêş ji du awa eskeran pêk hatibû: Eskerên hilgirê çekêن sivik û eskerên hilgirê çekêن giran. Eskerên hilgirê çekêن sivik tenê zirx û xeftan li xwe kirine û mertal û kapek/benek li ser wan bûye û tîrdanga wan tijî tîr bûye. Eskerên çekêن giran jî zirx û xeftanê hesinî li ber kirine û endamên siwar û hespê wan seranser bi hesin hatine pêçan. Çeka wan a şer rimeke dirêj bûye ku ji bo êrîşbirina ser rêzên dijmin bi kar anîne.

Mîr Şahbûz Paşa, piştî 30 sal fermanrewatiyê dinyaya fanî terk kir. Ev serekên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûne: Mîr Bîsût Zengene, Mîr Şadan Edreganî mîrêmîranê Mekranê, Mîr Zûngan Mamilî û Mîr Cûg Kirmanî.

## Paşabûn û Koça Dawiyê ya Feyrûzê Duyem

Piştî koça dawiyê ya Bilaşê Yekem, Feyrûzê kurê wî derket ser textê paşatiyê û di serdema paşatiya wî de cardin pêla êrîşên tîreyên Alanî li ser Parsê dest pê kir. Feyrûz hemû hişê xwe ji bo bergirîkirina wan amade kir û ji bo demeke dirêj li dijî tîreyên Alanî li sînorêñ rojhilate mijûlî şer û qirênan bû.

Di serdema fermanrewatiya Feyrûzê Duyem de, tevlihevî û sistî di selteneta Eşkaniyan de peyda bû. Şahzadeyên

Eşkanî takevanî kar dikirin û li çi wilayetê bûna bi serbestî fermanrewayî dikirin. Feyrûz 29 sal fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir.

### **Paşabûna Erdewanê Çarem û Rakirina Wî Ji Ser Text**

Piştî Feyrûz, Erdewanê Çarem derket ser textê Eşkanê. Hêj salek bi ser fermanrewatiya wî re derbas nebûbû ku desthilatdarê dewletê ew ji text anîn xwarê û Xesro li cihê wî danîn.

### **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Xesro**

Piştî Erdewanê Çarem, Xesro derket ser textê Eşkanê. Xesro zavayê Feyrûz bû, dema ku bû paşa, kesekî bi navê Bilaş li ser seltenetê dest bi dijîtiya Xesro kir û piştî wê şer û qirênan dest pê kir. Di dawiyê de Xesro agirê şorişa Bilaş tefand. Piştî wê, di navbera selteneta Parsê û Roman de li ser desthilatdariya wilayetên li ser sînor şer dest pê kir. Romayıyan Beynulnehreyn û Babîl dagir kirin. Piştire qeyserê Romê hat bajarê Tîsfûnê û Xesro ji wê bazda, lê keça wî bi textê zérîn ê şahane ve wekî destkeftî ket destê qeyser. Ji bilî vê, baceke zêde ji navçeyên dagirkirî ket destê qeyser. Xesro jî bi bêdengî û bêhnfirehî li pêşkeftina Romayıyan dinêriya.

Dema ku fermanrewayê Romayıyan ber bi niştimanê xwe ve vegeriyan, Xesro dest bi karê dijîti û berhelistkariyê kir û rûniştiyên herêmên dagirkirî ji bo berpakirina şorişê han da. Bi vî awayî, xelk li hemû cihê şorişê berpa kir û karbidestên Romayıyan ji welatê xwe derxistin. Dema ku qeyserê Romayê ev rewş dît, peymana aştiyê bi paşayê Eşkanî re îmze kir. Xesro Paşa piştî 20 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Mîrêmîran Mîr Sergêj Biraxoyî**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Şahburz, Mîr Sergêjê kurê

wî derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema Sergêj de, Sûrnsanê mîrê artêşa Xesro yê paşayê Eşkanê dixwest wilayetên Mekran û Tûranê bîne bin desthilata welatê Eşkanê. Ji bo vê mebestê, bi leşkerekî mezin ve êrîşî ser Finazbûrana paytexta Mekranê kir. Kurdên Beluçî di bin serekatiya mîrê xwe Mîr Sergêjê Mîrêmîranê Tûranê, Mîr Balgit Mamilî û Mîr Bîfar Kirmanî de ji bo pêşîlégirtina dijmin daketin ser rêya wan û li Geliyê Piryamanê bi wan re dest bi şerekî giran kirin. Piştî şer û qirênê, Sûrinsanê serleşkerê artêşa Eşkanê birîndar bû û paşve kişiya û vege riya niştimanê xwe û nikaribû wan herdu wilayetan bigire.

Di vî şerî de, Mîr Mihranê mîrê tîreya Zengene û Mîr Bîfarê mîrê tîreya Kirmanî hatin kuştin. Mîr Sergêj piştî 20 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Ev serekên Tîreyên Pêncîne yên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Mihran Zengene, Mîr Şawiş Edreganî Mîrêmîranê Mekranê, Mîr Baligt Mamilî û Mîr Bîfar Kirmanî.

### **Kenşikînê/Kenişkîn Mîrê Koşanê**

Wîman Kile Kedfîzs bi ocaxkorî koça dawiyê kir, ji ber wê Kenşikîn ku ji malbata Eşkanî û xizmê Wîman Kile Kedfîzs bû, text wek mîrat wergirt. Yêbûyeran neqil dikin, dibêjin ku ew neviyê mamê mîrê mezin ê Kucele Kile Kedfîzs bûye.

Kenşikîn bi nav û dengtirîn paşayê zincîra malbata Koşaniyan bûye û selteneta Koşanê gelek fireh kiriye. Li rojhilat sînorê selteneta xwe bi bajarê Bûnarsê Hindê û li rojava jî bi selteneta Parsê ve girêdaye.

Kenşikîn di serdema fermanrewatiya xwe de wilayeta Suxdistanê dagir kiriye û toleya şikestina kurê mamê xwe Wîman Kile Kedfîzs ji împaratorê Çinê wergirtiye û li gor peymana aştiyê jê bac wergirtiye.

Kenşikîn dînê Bawadayî qebûl kir û ji bo belavkirin û propagandeya dînê xwe di nav xebatê de bû. Ji ber propagan-

deya vî dînî, rûniştiyêñ welatêñ der û dorê dînê Bawadayî qe-bûl kirin û li ser vê rîbazê meşyan.

### Mîrêmîran Mîr Şahmîr Biraxoyî

Piştî Mîr Sergêj, Şahmîrê kurê wî derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema fermanrewatiya Mîr Şahmîr de, Mîrê Koşaniyan Kenşikîn ku mîrekî bikêrhatî û navdar bû, dinyaya fanî terk kir. Piştre kurê wî Mîr Huşyan Wuşka derket ser textê Koşaniyan.

Mîr Şahmîr, piştî derketina ser textê Mîrnişîna Tûranê, xwe mijûlî xizmeta Kurdên Beluçî kir. Karekî girîng ku encam daye, peymana di navbera mîrê Tûranê û mîrê Sindanê de ya di warê mafê çêrandina terşê şivanan û zozanêñ Kurdên Beluçî de bûye ku li navçeyêñ Sindanê zivistanêñ xwe derbas kirine.

Xwediyê keriyan û koçerên Kurdên Beluçî ji bo derbas-kirina zivistanan ber bi jêr dibûn û terş û keriyêñ xwe dibirin deştêñ Sindanê. Lê desthilatdarêñ wan cihan bi miameleyêñ sitemkarane bi wan re hereket dikirin. Di netîceyê de, di navbera Kurdan û xelkêñ Sindanê de problem, şer û qirênan rû dan. Mîr Şahmîr dawî li vê nexweşiyê anî. Wî jî bi vî awayî ku kesekî ji Kurdên Biraxoyî yê navê wî Mîr Cigasûran bi komek ji xelkê tîreya xwe ve di serdema selteneta Madê de li navçeya Diwadanê welatê Sindanê ku ketiye dawiya zincîra Çiyayê Pamîrê û zivistanan Kurdan ew dikirin cih û çêringeh, bi temamî bi cih bûbûn. Mîr Şahmîr bangî vî mîrî kir li ba xwe û wekî sefîr şand ba Kunyal Kimaçeyê mîrê welatê Sindanê û jê daxwaz kir ku di warê vî xelkê Kurd de ku li Mîrnişîna Sindanê zivistanêñ xwe derbas dikir, guftûgo bikin. Mîrê Sindanê ev daxwaz qebûl kir.

Mîrê Tûranê û yê Sindanê bi serdarêñ xwe re li navçeya Celarîn Kilxayê yê li sînorê erdê Tûranê di rûniştineke mîrî de li ser zivistangehêñ Kurdan peymanek girêdan û tê de mercen çêrandinê diyar kirin. Piştî rûniştinê, mîrê Welatê Sindanê ber bi welatê xwe ve vegeriya.

Mîr Şahmîr piştî 33 sal fermanrewatiyê, koça dawiyê kir û ev mîrên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Bidîs Zengene, Mîr Şacîl Edreganî Mîrêmîranê Tûranê, Mîr Behmen Mamilî û Mîr Xûfû Kirmanî.

### **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Duyem**

Piştî koça dawiyê ya Xesro, Bilaşê Duyem derket ser textê Eşkanê. Wî xwe mîratgirê text û xwediyê mafê paşatiyê dizanibû. Ji ber wê, di serdema fermanrewatiya Xusro de, li ser fermanrewayî û serekatiya welat bi Xusro re dest bi şer kir. Di netîceyê de, di şer û qirinên di navbera wan herdu şahan de, bi gotineke din van herdu dawakarêن seltenetê de, Bilaş li ser yê li hemberî xwe hakim bû û piştî mirina wî jî desthilat girt destê xwe.

Dema ku Bilaşê Duyem derket ser text, hozên Alanî bi han- dan û paldana fermanrewayêن der û dorê, ji bakurê rojhilatê ve hereket kîrin û êrîş anîn ser herêmên Parsê û wilayetên selteneta Eşkanî û ew talan kîrin. Bilaş hêza şer bi xwe re nedît û bi zora diyarî û rişweta darayî rêya pêşkeftina wan girt û welatê xwe kîrî.

Bilaşê Duyem di temenê 70 salî de derketibû ser text û temenê wî pê re wefa nekir û piştî 30 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Mihirdadê Çarem**

Piştî mirina Bilaşê Duyem, ji malbata Eşkanî kesekî bi navê Mihirdadê Çarem ku xizmatiya wî ya nêzik bi Xusro re hebû, desthilata text girt destê xwe û bû paşa. Di serdema vê fermanrewatiya Eşkanî de, qeyserê Romayê Hadrun (Hadrianus) koça dawiyê kir û li cihê wî Entas Payus bû qeyserê Romayê. Peywendiyêن wî bi paşayê Eşkanî re dostane bûne. Ji ber wê, di serdama Mihirdadê Çarem de, di navbera van herdu welatan de tu awayê dijîtiyê rû neda û li ser sînorêن wan hîç bûyerek çênebû.

## **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Sêyem**

Piştî koça dawiyê ya Mihirdadê Çarem, Bilaşê Sêyem ê kurê Bilaşê Duyem bêyî tu asteng û problemekê derket ser text. Bilaşê Sêyem di serdema fermanrewatiya xwe de bi selteneta Romayê re li ser du sebeban şer berpa kir. Yekem, paşayê Ermenistanê ji nijada Eşkanî nebû û duyem jî qeyserê Romayê di serdema Qeyser Tirucan (Trajan) de textê zêrînî yê Xesro wekî destkeftiyê şer biribû û di şandina wî de poşman bûbû.

Şer di navbera dewleta Eşkanî û Romayiyan de dest pê kir û Romayiyan ji hemû milan ve Eşkanî şikandin û perestgehên hemû welatê wan wek talan birin. Wê wextê nexweşîyeke epîdemî/grîp a werzî ku li ber çav di nav hemû leşker de belav bûye û di netîceyê de gelek kes jê kuştiye. Rewşa heyî ya Romayiyan bi awayekî wisan xerab bûye ku neçar bûne beşeke serekî ya destkeftiyên xwe yên zêde di cih de bihêlin û paşve bikişin. Di rê de ji ber vê nexweşiyê gelek esker mirin, qir bûn û yên bi saxî gihîştin welatê xwe, ev ziyan û aciziya xwe li seranserê erdê welatê Romayê belav kirin û nexweşiyê piraniya navçeyên Romayê da ber xwe.

Bi vî awayî, şikestina Eşkaniyan bi serkeftî dawî lê hat û Bilaşê Sêyem piştî 40 sal fermanrewatî koça dawiyê kir.

## **Paşabûn û Koça Dawiyê ya Bilaşê Çarem**

Piştî koça dawiyê ya Bilaşê Sêyem, Bilaşê Çarem hat ser textê Parsê. Di serdema wî de sê kes xwestiyarê paşatî û daxwazkarên text û taca qeyseriya Romayê bûn. Di demekê de ku Romayî mijûlî lêkdan û şerê hundirîn bûn ku di netîceyê de bûye sebebê wê xelkê xwemalî yê Beynelnehreynê alaya serhildan û şorişê bilind bikin û hemû eskerên Romayê ji nav bibin.

Şer û qirinên çendîn salan ên qeyserê Romayê bi Parsan re, ci ji goşenîgara welat û ci di warê takekesî de ji bo wan ne

netîcyeke baş bû. Di van şeran de ziyan û xesareke berfireh li Parsiyan jî ket, bajarêن mezin û textên rojavayê careke din bû cihê lehiya êrîşên artêşa Romayê. Ev wêrankarî û kuştin di têkçûn û hilweşandina hêzên Parsê û erdê wê de, têkçûn û hejandina bingeha seltenetê ku dikir di netîcye de zûtir saz bike, zêdetir bûn yarmetîder. Bilaşê Çarem piştî 16 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### Hûşan Üşka Mîrê Koşanê

Piştî koça dawiyê ya Kenişkîn, Hûşan Üşka derket ser textê Mîrnişîna Koşanê. Rewşa welat di serdema fermanrewatiya wî de gelek rihet û bi ewlekarî bûye û xelk xwediyyê jiyanekê asûde bûye. Hûşan Üşka her wextê mijûlî belavkirina dînê Bawadayî bûye. Nêzikî 30 salan fermanrewatî kiriye û piştre koça dawiyê kiriye.

### Mîrêmîran Mîr Beyx Biraxoyî

Piştî koça dawiyê ya Mîr Şahmîr, kurê wî Mîr Beyx derket ser textê Mîrnişîna Tûranê. Di serdema Mîr Beyx de, mîrê mezin ê Koşaniyan Hûşan Üşka koça dawiyê kir û li cihê wî kurê wî Wasan Üşka ku jê re “Wasa Dîwan” dihat gotin, derket ser textê fermanrewatiya Koşanê.

Di serdema Mîr Beyx de çend propagandîstên dînê Bawadayî ji bo propagandayê û nesîheta ji bo dînê xwe hatin Tûran û Mekranê û hinek ji xelkê rûniştiyên Ermabîlê yê navçeya xwarê Tûran û navçeya bakurê rojhilate Tûranê ku bi navê Bidhan dihatin nasîn ev dîn qebûl kirin. Lê Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê li ser dînê xwe yanî Zerdeştiyê man û propagandaya dînê Bawadayî tu tesîrek li ser wan nekir. Ev rûniştiyên Erma-bîlê û Bidhan jî ku dînê Bawayî qebûl kirin, ji nijada Kurdên Beluçî nebûn, hevnijadê Cidgalê Sindanê bûn. Mîr Beyx 22 salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir. Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Merdan Zengene, Mîr KiluŞ Ed-

reganî Mîrêmîranê Mekranê, Mîr Şimîn Mamilî û Mîr Behker Kirmanî.

### **Paşabûna Erdewanê Pêncem Li Parsê û Bilaşê Pêncem Li Babîlê**

Dema ku Mîr Bilaşê Çarem koça dawiyê kir, du kur jê man: Bilaş û Erdewan. Bilaşê Pêncem bû cihnişînê bavê xwe. Lê Erdewan paşatiya wî qebûl nekir û dest bi dijîtiyê kir û xwe wek dawakarê text nîşan da.

Di netîceyê de di navbera van herdu birayan de şer dest pê kir û endamên dewleta Parsê di navbera wan de aştî pêk anîn, ku welatê Babîlê dan Bilaş û selteneta Parsê jî dan Erdewan. Di vî warî de herduran li welatên xwe bingeha fermanrewatiya xwe damezirandin.

### **Mîrêmîran Mîr Şahrûz Biraxoyî**

Piştî koça dawiyê ya Mîr Beyx, kurê wî Şahrûz derket ser textê Mîrnîşîna Tûranê. Di serdema Şahrûz de li hemû goşe û penayê selteneta Eşkanî şoriş û serhildan berpa bû û rewşa tevlihevi û keşmekeşiyê bi lez geşe kir û belav bû.

Mîrên Kurdên Beluçî piştî hûrbûna li ser rewşê, ji bo rawêjkariyê berhev bûn û bi bîr û raya giştî li ser bîr, nêrîn û berjewendiyekê li hev kirin ku xwe ji tevliheviya wê serdemê dûr bixin û beşdarî şer û qirinên fermanrewatiya xwemalî ne-bin. Xwe ji ziyan û xesarê dûr bikin. Helbet di destpêkê de gerek serekên Kurdên Beluçî li dijî Erdeşêrê Sasanî, bi mebes-ta welatê xwe ji ziyan û xesarên giştî û pêwîstîyê gelempêri ya yarmetî û hevkariya Mîr Wasan Üşka yê paşayê Koşaniyan biparêzin. Lê ev helwest û kirinên Kurdan negihîştin aranca xwe, ji ber wê kar û barêن dewleta Koşaniyan bi radeyeke tevlihev û şeperze bûn ku îmkana başbûn û liveke nû nemabû. Kurdên Beluçî jî dev ji hevkarî û piştevaniya wan berdan.

Li vir ev cihê balkêşiyê bû ku ruhiyeta nêrîna rêbaza dînê

Bawadayî bi rewşa serbazî ya Koşaniyan re nedigunca û ew hêza ku ji bo bihêziya leşker û serkeftinê pêwîst bû nedihat dîtin. Ev jî bûn sebebê şikestina Koşaniyan li hemberî hêzên Sasanî.

Mîr Şahrûz 30 salan fermanrewatî kir û ev serekên Tî-reyên Pêncîne yên Kurdên Beluçî hevçerên wî bûn: Mîr Riwanşêr Zengene, Mîr Ünkan Edreganî, Mîr Nûtar Mamilî û Mîr Behend Kirmanî.

### Kuştina Erdewanê Pêncem ê Dawîn Paşayê Eşkanî

Piştî serdema Erdewanê Pêncem ê paşayê malbata Eşkanî, zincîrek şoriş û serhildan li welatê Mad û Parsê dest pê kir û dawî bi Împaratoriya Eşkanî anî. Ev şoriş di destpêkê de bi awayê şer û tevliheviyên biçûk ên xwemalî di navbera mîran û fermanrewayên wilayetan de li sînorê herêmên Parsê ku wê wextê di rastiya xwe de serxwebûna wan hebû tevlihev bû. Erdeşêrê kurê Papikê kurê Sasan rêveberiya welatê xwe fireh kiribû û navçeyên der û dorê yek bi yek dagir kiribûn. Her wiha bavê xwe han dida ku li dijî fermanrewatiya berê şoriş û serhildanê dest pê bike. Papik daxwaz ji paşayê Eşkanî kir ku kurê wî Şahpûr li cihê fermanrewayê berê ku hatibû kuştin deyne ser seltenetê. Ev daxwaz ji aliyê şah ve nehat qebûlki-rin. Papik di wê navê re koça dawiyê kir û Şahpûrê kurê wî bû cihnişînê wî û ew jî gelek di ser re derbas nebû dîwarek bi ser de hilweşıya û mir. Piştî vê bûyerê, Erdeşêrê birayê Xêyra xwe gihad bajarê Estexrê û li cihê wî derket ser textê paşatiya welatê Parsê. Fermanrewayên Madê, Kurdistanê û Kerkûkê bi Erdeşêr re yekîtî çekirin li dijî malbata Eşkanî dest bi şer kirin.

Di seranserê salekê de paşayê van welatan êrîşî ser çen-dîn bajarên mezin kirin û ew dagir kirin. Di netîceyê de, Erdewanê Pêncem li Ehwazê bi giranî şikest û hat kuştin. Bi vî awayî, seranserê welatê wî ket bin desthilata Erdeşêrê Papikan û serdema paşatiya Eşkaniyên Parsê temam bû.

## **BEŞA NEHEM**

### **KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA SASANIYAN DE**

#### **Sasanî**

Tê neqilkirin ku dema Behmen Hexamenşî yê paşayê Mad û Farsê, li gor dînê Zerdeştî bi xweha xwe Humayê re zewicî û kurek jê çêbû, navê wî danî Dara. Hatina dinyayê ya Dara bû sebeb ku Sasanê birayê Behmen ji mîrata text û tacê bêpar be. Sasan di rewşekê perişanî de çû çiyayên Kurdistanê û jiyana li goşeyekî rûniştinê hilbijart û xwe bi xwedîkirina pez mijûl kir.

Paşayê Eşkanî Papikê kurê Sasanî bi pileya fermanrewatiya Parsê hat hilbijartin û di vî warî de ew yek fermanrewayê navçeyekê yê paşayê Eşkanî bûye. Piştî Papik koça dawiyê kir, Şahpûrê kurê wî li cihê wî derket ser textê Farsê. Lê fermanrewatiya wî gelek nekêşa û dîwarek bi ser de hilweşiya û mir. Erdeşerê birayê wî derket ser textê paşatiya wilayeta Parsê.

#### **Paşabûna Erdeşêr**

Piştî koça dawiyê ya Şahpûr, Erdeşer ku birayê wî û neviyê Sasan bû derket ser textê wilayeta Farsê û bingeha selteneteke bi hêz û xurt li Farsê damezirand. Dema ku hat ser wilayeta Farsê, selteneta Mad û Parsê bi ser 140 wilayetan ve parve kiribû û her yek ji wan wilayetan jî xwediyyê fermanrewatiya xwe bi xwe bû ku di bin desthilata paşayê Eşkanî Erdewanê Pêncem de bû. Dema ku Erdeşer paşatî ji Erdewanê Pêncem

wergirt û dawî li selteneta Eşkanî hat, hinek ji fermanrewayê wilayetên Mad û Parsê paşatiya Erdeşêr qebûl nekirin. Ji ber wê biryar da ku wan bîne bin desthilata xwe. Di vê navê re, fermanrewayê wilayetên bakurê rojhilat li dijî wî rabûbûn û Erdeşêr ber bi navçeyêن Xorasan, Merro, Belx û Xîwayê ket rê. Dema ku Erdeşêr mijûlî dagirkirina wilayetên van navçeyan bû, sefirêن fermanrewayê Koşan, Tûran û Mekranê ji bo paşatiya wî hatin û peyama îtaeta fermanrewatiya xwe jê re ragihandin. Erdeşêr jî piştî qebûlkirina îtaetê nûnerên wan bi diyarî û xelatan ve şandin û ew jî ber bi welatê xwe ve vegeriyan.

### Mîrêmîran Mîr Bûrak Biraxoyî

Piştî koça dawiyê ya Mîr Şahzûr, Mîr Bûrakê kurê wî derket ser textê Mîrnişîna Tûranê û di serdema wî de, Erdeşêrê Papik desthilatdarî li ser hemû selteneta Eşkanî bi dest xist. Erdeşêrê Papik piştî şer Erdewanê Pêncem li Deşta Hurmuzê li rojhilate Ehwazê bi giranî şikand. Erdewanê Pêncem di meydana şer de hat kuştin û Erdeşêr jî cardin paşatiya xwe ilan kir û derket ser textê Mad û Parsê.

Bi dîtina guherînên vê rewşa welat, Kurdên Beluçî û serekên wan bi mebesta rawêjkariyê li hev kom bûn û biryar dan ku ji Erdeşêrê Papikî re îtaet bikin. Di netîceya vê biryarê de, Mîr Bûrak Biraxoyî yê mîrêmîranê Tûranê, Mîr Sargan Edreganî yê mîrêmîranê Mekranê, Mîr Îzbûk Zengene û Mîr Silxan Mamilî nûner û peyamnîrên hoz û tîreyêن Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê şandin ba Erdeşêr ku îtaeta wan mîran pê rabigihîne. Van mîran piştî gihadina peyama îtaetê ber bi Tûranê ve vegeriyan.

Mîr Bûrak 35 sal fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir. Ev mîrên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Îzbûk Zengene, Mîr Sargan Edreganî yê Mîrêmîranê Mekranê, Mîr Silxan Mamilî û Mîr Laskan Kirmanî.

## Êrişa Erdeşêr Li Ser Erdê Hindê

Erdeşêr Paşa ji bindestkirina fermanrewayêن serhilder ên Xorasan, Merro, Belx û Xîwayê vala bû û bîra dagirkirina Hindê ket serî, di wilayetên Kabilistan û Kindaranê re derbas bû û bajarê Pûşanpûranê dagir kir. Erdeşêr bi şer bi ser Qışûnê Hindê ket. Paşayê Hindê Cunan zêr, zîv, xezîne û serwetên mezin dan Erdeşêr. Erdeşêr jî piştî dagirkirinê bi vê baca bêemsal ve ber bi Mad û Parsê vege riya.

Erdeşêr 13 salan fermanrewatî kir û piştî koça wî ya dawiyê, Şahpûrê kurê wî derket ser text.

## Paşabûna Şahpûrê Yekem

Piştî koça dawiyê ya Erdeşêr, kurê Şahpûrê Yekem derket ser textê selteneta Sasaniyan. Şahpûr ji aliyê dayîkê ve neviyê Erdewanê Pêncem ê paşayê Eşkanî bû.

Fermanrewayêن Ermenistan û Hitrayê li ser mirina Erdeşêr amadeyî serhildanê bûn û ketin wê tamahiyê ku careke din dest bi ser wan herêmên beriya wê di destê wan de bûn bigirin. Dema ku Şahpûr bi vê hesiya, tedbîreke zanayî girt ku pêşiyê serhilderê fermanrewayê Ermenistanê bi hêsayî berteref kir û piştire paytexta Hitrayê dorpêç kir. Lê çi heye fermanrewayê Hitrayê ji Şahpûr re xeber şand ku eger ew bi jin bixwaze dê li hev bikin û alîkariya wî bike.<sup>17</sup> Piştire peyam qebûl kir û Hitra dagir kir.

Şahpûrê Yekem 31 salan fermanrewatî kir û piştire koça dawiyê kir.

---

<sup>17</sup> Ev hevok baş nehat fehmkirin, gelo mebest ji gotina "...ew bi jin bixwaze..." danîna xizmatiya pê re ye? Yan wergirê soranî hevok temam nekiriye? Ez nizamim? -Z. Avci.

## **Manî û Dînê Wî**

Ew kes navê wî Manî û rûniştiyê Hemedanê bû. Navê bavê wî Patka û navê dayîka wî Ewtaxim bû. Wan ji Hemedanê bar kirin û çûn li Babîlê bi cih bûn. Manî li Babîlê hat dinê û di temenê 13 salî de Siruş/Cebraîl jê re hat xwarê. Lê rîbaza dînê xwe di dema hatina ser text a Şahpûr de îlan kir. Şahpûr bi îlankirinê re bawerî bi dînê wî anî, dînê wî qebûl kir û bû yek ji perestiyarên wî. Ev guherîna Şahpûr ji dînê bav û bapîrêñ xwe bû sebebê aciziyê û acizkirina perestgehan û endamên dewletê. Wan ewqas acizî çêkirin ku neçar bû ji vê bêdînîyê (ateîzmê) tobe bike û cardin bête nav çarçoveya dînê Zerdeşti ku dînê bav û bapîrêñ wî bû. Her wiha ji bo dilsozî û rastbêjiya xwe li hemberî dînê bav û bapîrêñ xwe îsbat bike Manî ji bajêr derxist.

Manî di dema derxistina ji bajêr de geşta Hindê û Çînê kir û piştî koça dawiyê ya Şahpûr vege riya Parsê. Peyrewkerên Manî li gel wan hemû sitem, tundî, tûjî û çewisandinên ku ji her aliyê welat ve bi ser de dihatin, bi bêhnfirehî tehamulî wan hemû kirin û nedadperweriyan dikir û bi bêdengî û nehêni dînê xwe belav dikir.

Dînê Manî di miqabilî dînê Zerdeşti de gelek sade û hêsan bû. Ji ber wê bi rihetî nav û deng da. Her wiha cihê işaretê ye ku adetê peyrewkerên dînê Zerdeşti gelek bi eziyet û giran nebûye.

## **Mîrêmîran Mîr Mihran Biraxoyî**

Mîr Bûrak di serdema fermanrewatiya Şahpûrê Yekem de koça dawiyê kir û piştî wî Mîr Mihranê kurê wî derket ser textê Mîrnîşîna Tûranê. Di serdema Mîr Mihran de, hemû balkêşî û hişê welatê Sasanî û fermanrewayêñ hevpeymanên wê ji bo dagirkirina wan navçeyêñ Mad û Parsê hatibûn amadekirin ku di dawîn serdema Eşkaniyan de welatê Romayê dest bi ser de girtibû. Sebebê vê jî ew bû ku Romayiyan dest danîbûn ser

beşeke serekî ya welatên rojavayê selteneta Mad û Parsê.

Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncîne jî bi çavdêrî û parastina sînorêن rojhilatê ku gihîstibû welatê Sindanê mijûl bûn. Mîr Mihran piştî 25 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Ev mîrêن Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Behram Zengene, Mîr Ewnîz Edreganî Mîrêmîranê Mekranê, Mîr Mîrdad Mamilî û Mîr Şahar Kirmanî.

### **Paşabûna Hurmuzê Yekem**

Piştî koça dawiyê ya Şahpûrê Yekem, kurê Hurmuzê Yekem derket ser text. Du kurêن Şahpûr hebûn: Hurmuz û Behram. Hurmuz kurê mezin bû, ji ber wê endamên dewletê li gor destûr û adetê Sasaniyan ew danîn ser textê bavê wî.

Hurmuz, beriya derketina ser text, dadgerê welatê Xorasanê bû. Hurmuz wekî bav û bapîrêن xwe bi dadperwerî fermanrewatî kir. Di serdema desthilatdariya xwe de bangî Manî kir ku cardin bê Mad û Parsê û di koşka xwe de jê re mazûvanî kir. Temen bi Hurmêz re ne yar bû û piştî salekê koça dawiyê kir.

### **Hatina Şîretkerêن Manî Li Sikistan, Tûran û Mekranê**

Dema ku Hurmuzê Yekem Manî bangî Parsê kir, hat û li koşka paşa bi cih bû û peyrewkerên wî careke din bi eşkere dest bi belavkirina dînê xwe kirin. Kesekî navê wî Kisûn ku rastbêj û bawerîpêkiriyyê dînê Manî bû hat Sikistanê û ji wir jî çû Tûran û Mekranê û xelkê van welatan anî ser rîbaza dînê xwe.

Kisûn ji zanayê bijarte yê Manî bû û bi awayekî wisan zimanşêrîn û qisexweş bû ku biçûya çi cihî, piştî sehkirina nesîhetên wî yên efsûnî xelkê deste bi este dînê Manî qebûl kirine. Kurdên Beluçî jî bi serekên xwe ve dînê Manî qebûl kirine.

Rêbaza dînê Manî gelek sade bûye û dînê wî li ser van her sê bingehan jiyaye: Bîra baş, kirina baş û soz/peymana baş telqîn daye û adetê xwedûrkirina ji adetên bêcih û tijî eziyet, daye.

### **Mîrêmîran Mîr Şadan Biraxoyî**

Mîr Mihran piştî ku malavayî xwest, Mîr Şadanê kurê wî derket ser texê selteneta Mîrnişîniya Tûranê. Di serdema Mîr Şadan de, Hurmuzê Yekem koça dawiyê kir û Behramê birayê wî li cihê wî derket textê Sasanê. Peywendiyê Behram bi hevpeymanên xwe re gelek bi dostane û dilsozane bûne.

Ev mîrên Tîreyê Pêncînî yên Kurdên Beluçî hevçerxê Mîr Şadan Biraxoyî bûne: Mîr Şerbûz Zengene, Mîr Bazîç Edreganî Mîrêmîranê Megranê, Mîr Mihirdad Mamilî û Mîr Nûkaf Kirmanî.

### **Paşabûna Behramê Yekem**

Hurmuzê Yekem piştî salek fermanrewatiyê li Gencê koça dawiyê kir û endamên dewletê Behramê birayê wî anîn ser text. Behram kesekî bi weswese bû û di karêن xwe de sist bû. Ji ber van sebeban di welatê wî de tevlihevî û neasûdeyiye serî hildaye.

### **Kuştina Manî**

Di serdema fermanrewatiya Behremê Yekem de Manî hat kuştin. Hurmuzê birayê Behram hevdeng û piştevanê Manî bû. Di serdema fermanrewatiya xwe de izin dabû ku Manî propagandaya dînê xwe bike. Ji ber vê gelek rik û kîna Berhem ji Manî vedibû. Ji ber vê çawan derket ser text bi perestgehêن Zerdeşti re yekîti pêk anî û bi awayekî ev izin gihandiye netîceyê ku Manî ji orteyê rakin.

Behram ji bo vê mebestê ji bo guftgoyê bangî Manî

kir û di vê gotûbêjê de pêşewayê Zerdeştî Manî bê dîn û xwedênenas hesêb kirin û kuştin.

Li gel wê jî, sitem û zordariya li hemberî peyrewker û bawermendên Manî rewa dîtin. Kurdên Beluçî yên Sikistan, Tûran û Mekranê jî bawermendên dînê Manî bûn. Ji ber vê sebebê, ew jî ketin ber gilî, acizî û tund û tûjiya Behram.

Ev rîbaz guhertin heta bûye sebebê têkçûna mîrnişînên Kurdên Beluçî li Tûran û Mekranê. Bi vî awayî Kurdên Beluçî careke din bi jiyana xwe ya hozatiyê mijûl bûne.

Behramê Yekem piştî sê sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Paşabûna Behramê Duyem**

Piştî koça dawiyê ya Behramê Yekem, kurê wî Behramê Duyem derket ser textê bavê xwe. Behramê Duyem xemxwarê wê rewşa tevlihev û keşmekeşiyê bû ku di serdema desthilatdariya bavê wî de di nav welat de belav bûbû û dixwest bi lez van ziyankariyan çareser bike. Ew wisan difikirî ku bi zebr û zengê dikare xerabkeran ji karê welat dûr bixe. Di bikaranîna vî awayê tekayî de, hereketê wî ewqas giran bû ku mezinan û endamên seltenetê û xelkê welat jê bêzar bûn û nikaribûn tiştekî bikin. Mezinên seltenetê ji bo kuştina wî bi nehêni peymanek girêdan. Lê yek ji pêşewayê Zerdeştî ku dilsozê Behram bû bi vê planê hesiya û di navbera Behram, endam û desthilatdarê welat de aştî pêk anî.

Behram ji vê bûyerê ders wergirt û dev ji zordarî û sitemê berda û destpêka fermanrewatiya xwe bi dadperwerî û dilsozî meşand. Bi vî awayî, xelk ji van hereketê wî şad bûn û Behram careke din bû evîndarê xelkê welatê xwe.

Behramê Duyem piştî heft salên fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

## **Îtaetkirina Hozên Sakayî û Kurdên Beluçî**

Hozên Sakayî yên Zabilistanê û Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê dînê Manî qebûl kiribûn û ji bawermendên wê bûn. Piştî mirina Hurmuzê Yekem, birayê wî Behramê Duyem derket ser text ku li hemberî Manî gelek bi rik û kîn bû û ew xwedênenas û bêdîn dizanî. Piştî kuştina Manî, Behram dest-dirêjî li ser bawermend û şopdarên Manî kir. Ji ber ku Kurdên Beluçî û Sakayî jî hevbawerê Manî bûn. Duçarî xeyd û tund û tûjiya Behram bûn û ji sitem û zordariya wî rizgar nebûn. Di netîceyê de mîran hevdu girtin û şoriş û serhildan berpa kirin û êrîş ber bi Kirmanê ve birin û ew welat talan kirin.

Behremê Duyem bi hemû hêzên şer ve li hemberî Sakiyyê Zabilistanê û Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê ber-girî kir û êrîş bir ser Zabilistanê. Piştî şerekî giran, serhildêr şikandin.

Di vî şer û qirênenê de, mîrê Sakayıyan Mîr Eşkin Serû, mîrê Kurdên Beluçî Mîr Şerbûz Zengene û Mîr Mihirdad Mamilî hatin kuştin. Di netîceya vî şerî de, Behramê Duyem mîrên Sikistan, Tûran û Mekranê ji ser kar daxistin û li cihê wan li van welatan dadgerê xwe bi cih kirin.

## **Hatina Zawik a Ser Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Behramê Duyem ku agirê şoriş û serhildanên Sikistan, Tûran û Mekranê tefand û bawermendên Manî qetil kirin û bi ser wan de hakim bû, baweriya wî bi mîrên van welatan tune bû. Ji ber vê ew ji ser pile û meqamên wan hildan û li cihê wan Mîr Zawik li ser pileya dadgeriyê Tûran û Mekranê bi cih kir.

## **Paşabûna Behramê Sêyem**

Behramê Sêyem piştî koça dawiyê ya bavê xwe derket ser text. Wî tenê çar mehan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir.

## **Paşabûna Narses**

Piştî koça dawiyê ya Behramê Sêyem, ji malbata Sasanî du kurên Şahpûr, Hurmuz û Narses di jiyanê de bûn. Hurmuz xwe xwediyyê mafê paşatiyê dizanibû û dema ku Narses derket ser textê selteneta Sasaniyan, wî dest bi şoriş û tevliheviyan kir. Lê bi ser neket, şikest û şorişa wî pûç bû.

## **Şer Bi Romayiyan Re**

Dema ku Narses derket ser text, wilayeta Ermenistanê di bin desthilata Romayiyan de bû. Narses ev destbisergirtin rewa nedidît û êrişî ser Ermenistanê kir û mîrê Ermenistanê Tîrdad bi giranî şikand.

Tîrdad xwe avêt ba qeyserê Romayê û Qeyser alîkariya wî kir û ferman da serlekerekî ku êrişî ser selteneta Parsê bike. Romayiyan bajarê ‘Ekasanê ku Narses tê de bû dorpêç kîrin û di navbera van herdu welatan de şerekî giran rû da. Di netîceyê de, Narses şikest û Romayiyan hemû dewlemendiyêن bajêr û mencenîqêن kelehsikêن, kelûpel û wasiteyêن Sasaniyan bi temamî ji orteyê rakirin.

Narses di şer de birîndar bû û bazda. Piştire, ji dax û kula şikestinê dev ji seltenetê berda û jiyana goşenîniyê hilbijart.

Behramê Sêyem 19 salan fermanrewatî kir.

## **Paşabûna Hurmuzê Duyem**

Piştî goşenîniya Narses, bi wasîtiya wî Hurmuz anîn ser text. Hurmuz di serdema zaroktiya xwe de li gor Romayiyan hatibû perwerdekirin û urf û adetên Romayiyan li balê gelek qebûlbar/pesendbar bûn. Ji ber vê, endamên dewleta Parsê qebûl nedikir.

Piştî derbasbûna heşt salan bi ser fermanrewatiya wî de, mezin û karbidestên seltenetê ew ji ser text hildan û li cihê wî Şahpûrê kurê wî ku hêj zarok bû anîn ser text. Bi mebesta perwerdekirina wî jî civateke endaman damezirandin.

## **Hatina Erşem Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Hurmuzê Duyem ku bû paşa, zewqa dagirkirina Tûran û Mekranê ji nav karê xwe derxist û di cihê wê de Mîr Erîm ji bo dadgeriya van herdu welatan şand.

Ev serekên Tîreyên Pêncînî yên Kurdên Beluçî hevçerxên Hurmuzê Duyem bûn û li Tûran û Mekranê jiyana xwe derbas dikirin: Mîr Rostem Biraxoyî, Mîr Bûrak Zengene, Mîr Gibîl Edreganî, Mîr Îfdad Mamilî û Mîr Cadî Kirmanî.

## **Bingeha Eslê Sakayiyêن Sikistanê**

Mîr Mayîses ku bi navê “Musun” jî dihat nasîn, yekem mîrê Sakayıyan bû ku bi tîreyên xwe ve hat Zabilistanê û li wir bi cih bû. Ji ber sebebê bicihbûna wan, wilayeta Zabilistanê bi navê Sikistanê hat nasîn. Eslê wî bi vî awayî xwarê ye:

Mabîses, kurê Îzsesê kurê Îsalîsesê kurê Gûdayê kurê Ebdîn Gases yek li pey yekî li ser Mîrnişîna Zabilistanê fermanrewatî kirine.

Piştî ku Mîrnişîna Sakayıyan duçarî bêhêzî û jariyan bû, Sakayıyan wekî hozake mezin li Zabilistanê jiyana xwe derbas kirin. Eslê serekên hozên Sakayıyan ku ji neviyên Ebdîn Gases bûne, bi vî awayî ye:

Ebdîn Gases, kurê Kîdarsesê kurê Pîrûsanê kurê Taxirtûyê kurê Mûxantûyê kurê Keydikê kurê Mûsnasesê kurê Tikantûyê kurê Timandûsê kurê Eşkinsar e û piştî Eşkinsar jî ku di şerê Behramê Duyem de hatiye kuştin, kurê wî Ewsitwan û piştî wî jî kurê wî Exirtû serekê hozên Sakayıyan bûne.

## **Paşabûna Şahpûrê Duyem**

Desthilatdar û mezinên selteneta Parsê, Şahpûr di temenê zaroktiyê de danîn ser textê paşatiya bavê wî. Heta temenê biloxê, dayîka wî fermanrewatî bi rawêjkariya endamên dewletê dimeşand. Lê dema ku gihîst temenê biloxê, bi xwe

kar û barêن fermanrewatiya welat girt destê xwe û heta demeke dirêj ku ji 70 salan pêk hatibû fermanrewatî kir.

Serdema fermanrewatiya Şahpûr bi ser sê qonaxan ve parve dibe. Qonaxa yekem ji 28 salan pêk tê. Di vê serdemê de Şahpûr kar û barêن welat ên hundir rêk xistiye û welatê xwe bi hêz kiriye. Qonaxa duyem, bi şer û qirênen bi Romayiyan re dest pê dike û heta 15 salan dom dike. Di vê serdemê de li hemû cihan selteneta Romê şikandiye, tirs û sawa artêşa xwe bi awayekî wisan kiriye dilê wan ku ji tirsa Şahpûr di nav lerzê de bûne.

Piştî hakimiyeta xwe li ser welatê Romayê, qonaxa sêyem a Şahpûr dest pê dike. Şahpûr di vê serdemê de hişê xwe daye karûbarêن wilayetên rojhilate û agirê şoriş û serhildanên wan tefandiye û çendîn bajarêن mezin dagir kirine. Ji bo bibiranîna serkeftinên xwe sike lê daye û piştî 70 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kiriye.

Şahpûr di qonaxa yekê de ev serekên Kurd ên Beluçî hevçerxên wî bûne: Mîr Selem Biraxoyî, Mîr Mihirdad Zengene, Mîr Mihrab Edreganî, Mîr Birmiban Mamilî û Mîr Rostem Kirmanî.

Ji bo ku serdema fermanrewatiya Şahpûrê Duyem dûr û dirêj bûye, di dawîn serdema desthilatdariya wî de ev serekên Kurd ên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên wî bûn: Mîr Tîrdad Biraxoyî, Mîr Rostem Zengene, Mîr Peyx Edreganî, Mîr Pişkîn Mamilî û Mîr Bûrzmîhir Kirmanî.

### **Hatina Menûçehr Ji Bo Dagirkirina Tûran û Mekranê**

Dema ku Şahpûr desthilata fermanrewatiyê girt destê xwe, Mîr Menûçehr tayînî dadgeriya Tûran û Mekranê kir ku heta mideteke dirêj li ser pileya dadgeriyê ma. Lê piştire Şahpûr ew derxist û Mîr Kawyan şand cihê wî.

### **Paşabûna Erdeşêrê Duyem**

Piştî koça dawiyê ya Şahpûrê Duyem, kurê wî Erdeşêr derket ser text. Temen wefa pê re nekir û rastî nexweşiyekê hat û piştî çar salan koça dawiyê kir.

### **Hatina Erbed Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Erdeşêrê Duyem di serdema fermanrewatiya xwe de, Mîr Erbed ji bo dadgeriya Tûran û Mekranê şand.

### **Paşabûna Şahpûr (Sêyem)**

Erdeşêrê Duyem di salên xwe yên xortaniyê de koça dawiyê kir û tu zarokên wî tune bûn. Ji ber wê, endamên dewletê kurê birayê wî Erdeşêrê Sêyem anîn ser text. Vî fermanrewayî jî mideteke dirêj fermanrewatî nekir û piştî derketina ser text pênc salan sax ma û piştre koça dawiyê kir.

### **Paşabûna Behramê Çarem**

Piştî koça dawiyê ya Şahpûrê Sêyem, endam û karbidestên seltenetê fermanrewatiya Parsê dan Behram ku beriya derketina ser text fermanrewayê Kirmanê bû. Behram 11 salan fermanrewatî kir û di serdema paşatiya wî de eskeran dest bi şoriş û serhildanê kirin. Behram ji bo bêdengkirina wan rabû û di wextê tefahdina şorişê de hat kuştin.

Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên wî bûn: Mîr Siyamek Biraxoyî, Mîr Tîrdad Zengene, Mîr Şasir Edreganî, Mîr Mipirdad Mamilî û Mîr Gulbehar Kirmanî.

### **Paşabûna Yezgurdê Yekem**

Piştî kuştina Behramê Çarem, Yezdgurdê Yekem derket ser textê Sasaniyan. Ev paşa gelek aştîxwaz bû û bi selteneta dijber re yanî selteneta Romayê re peywendiyê dostane bi hêz kirin. Her wiha bi çavekî gunehpêhatî li gawiran nihêriye

û bi wan qencî kirine. Piştî 21 sal fermanrewatiyê baregeha xwe li dinê da hev.

### **Hatina Mîr Keysûn Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Dema ku Yezdgurdê Yekem desthilata fermanrewatiyê girt destê xwe, Erbedê dadgerê Tûran û Mekranê koça dawiyê kir. Li ser vê Yezdgurd Mîr Keysûn danî ser pileya dadgeriya Tûran û Mekranê.

Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxê Yezdgurdê Yekem bûn: Mîr Mingîb Biraxoyî, Mîr Guhderz Zengene, Mîr Behar Edreganî, Mîr Kudan Mamilî û Mîr Zeng Kirmanî.

### **Paşabûna Behramê Pêncem**

Dema ku Yezdgurdê Yekem koça dawiyê kir, du kur li pey man: Behram û Şahpûr. Desthilatdar û endamên selteneta Parsê herdu layîqî fermanrewatiyê nedidîtin. Ji ber wê Behram di salêن xwe yên zaroktiyê de di nav Ereban de perwerde bûbû. Şahpûr jî dema ku xebera mirina [Yezdgurdê Yekem] gihiştê, paytexta Ermenistanê terk kir, ji bo bidestxistina text bi lez xwe gihad Parsê. Di netîceya vê lezê de, fermanrewayê Romayê dest danî ser Ermenistanê. Ji ber van sebeban, karbidest û endamê dewletê kesekî navê wî Xesro yê ji malbata Sasanî anîn ser text.

Dema ku Behramê Pêncem ku jê re “Behramgur/Behram Gur” jî gotine, vê rewşê dibîne, bi alîkariya Ereban êrîşî ser selteneta Parsê dike, Xesro dişikêne û bi xwe derdikeve ser textê fermanrewatiyê. Behram piştî bicihbûnê, rewşa neşayîste ya li hemberî gawiran ku rûniştiyên welatê wî bûn, bi kar anî. Ew jî li ber sitem û zordariya wî rabûn û xwe avêtin ba Qeyserê Romayê. Behram daxwaza vegera rûniştiyên welatê xwe ji qeyserê Romayê kir û welatê Romayê jî daxwaza wî bi cih nekir û di netîceyê de di navbera wan herdu welatan de şer dest pê kir.

## **Şer Bi Selteneta Romayê Re**

Behram êrîşî ser welatê Romayê kir û piştî çend şer û qirênên giran şikest. Behram daxwaza aştiyê kir û li ser wê li hev kirin ku Behram bi dadperwerî bi rûniştiyêngawir re hereket bike.

## **Hatina Mîr Xeyzûn Ji Bo Dagirkirina Tûran û Mekranê**

Behram ku derket ser text, mîrekî xwe yê bawerpêkirî yê navê wî Xeyzûn bi pileya dadgeriyê tayînî Tûran û Mekranê kir. Keysûn jî ji ser vê pileyê rakir.

## **Hatina Xwarê ya Hoza Hîtalî**

Di serdema fermanrewatiya Behramê Pêncem de hozên rengê spî ku di zimanê Kurdi de jê re Hîtal, Hîtil û Hiftal hatiye gotin, ji ser erdênyâ Asyaya Navîn û Deryaya Amoyê ve ber bi dewletên bakurê Tixar û Baxterê ve çûn û ji wir jî ber bi xwarê ve berjêr bûn. Koşanî ku his ji tirsa êrîşen wan kirin, ji fermanrewayê Sasanî daxwaza alîkariyê kirin. Lê kar gihîşt wê qonaxê ku şiyana bergirîkirina wan nema û paşve kişiyan.

Hîtalî ber bi xwarê û rojhilatê ve ketin rê û pêşve hatin, geliyênen Kabilistan, Kendara û Zabilistanê dagir kirin û li wan cihan mîrnîşîna xwe damezirandin. Ev hozên han wekî Koşanî û Sakayıyan bi xelkê xwecih ên ser van erdan re tevlihev bûn.

## **Şerê Hîtalan Bi Behramê Pêncem Re**

Zordana hatina pêş a hozên Hîtal ewqas zêde bû ku dikir selteneta Behram ji orteyê rake. Mîrê Hîtalan bi 250 hezar eskeran ve berê xwe da geliyê Mirxabê û rûbarê Meroyê û şer bi leşkerê Behram re dest pê kir. Lê çarenivîsê hevaltiya Behram kir, paşayê Hîtalan şikest û di meydana şer de hat kuştin. Behram Hereme girt û mal û destkeftiyeke gelek mezin

ket destan. Bi vê hatina pêş a Hîtalan sekinandin.

Kurdên Beluçî di şerê Hîtaleyan de piştevaniya Behremê Pêncem kirin û li dijî Hîtalan şer kirin. Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên Behramê Pêncem bûn: Mîr Candar Biraxoyî, Mîr Resan Zengene, Mîr Kêsak Edreganî, Mîr Siyamek Mamîlî û Mîr Sarûn Kirmanî. Behram 20 salan fermanrewatî kir.

### **Paşabûna Yezdgurdê Duyem**

Piştî koça dawiyê ya Behramê Pêncem ê bi navê “Behramgur” hatiye nasîn, Yezdgurdê kurê wî yê biçûk derket ser text û çendîn caran bi Hîtaleyan re ku li ser erdê vala, bakurê Gurgan û Talqanê jiyana xwe derbas dikirin, şer kir. Lê di dawiyê de Hîtalan Yezdgurd şikandin û bi hemû wan kîmasiyan re, Yezdgurd karîbû sînorê welatê xwe ku gihiştibû navçeyên Hîtaleyan bi hêz bike û amadekariya êrişan bike.

Di serdema Yezgurd de propagandîstên gawiran zêde propaganda kirin û nesîhetên dînê xwe ji Ermenistanê dest pê kirin û ev jî bû sebebê perişanbûna pêşewayê Zerdeştiyên Parsê. Yezdgurd jî di bersiva vê de, bi propagandayê zêde xelk ji çûna nav rîbaza mesîhîtiyê dûr xistin.

Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxê Yezdgurdê Duyem bûn: Mîr Şabûz Biraxoyî, Mîr Kubad Zengene, Mîr Selem Edreganî, Mîr Risan Mamîlî û Mîr Şadîn Kirmanî. Yezdgurd 17 salan paşatî kir.

### **Hatina Mîr Kirahûn Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Yezdgurdê Duyem di serdema fermanrewatiya xwe de dadgerê Tûran û Mekranê Mîr Xêyzun rakir û Mîr Kirahûn li ser pileya dadgeriyê tayînî cihê wî kir.

## **Paşabûna Feyrûz**

Piştî Yezdgurdê Duyem, Feyrûzê kurê wî bû paşa. Wê wextê serekatiya Hîtaleyan jî gihîstibû seviya paşatiyê û navê paşayê wan Nexşunewaz bû. Bi vî awayî, dewleta Hîtalî û Sasanî li bakurê Xorasanê li hev ketin û di netîceya vê lihevketinê de Feyrûz şikest û erdê Talqanê ji bo talanê şer dane wî. Her wiha, bi Nexşunewaz re peyman imza kir ku li hêla sînorê Xorasanê dewleta Parsê ji sînor derbas nebe û heta du salan baceke mezin bide Hîtaleyan. Lê Feyrûz peyman şikand û piştî demekê leşker kişiya ser wan û Hemîsan artêşa Parsê li deşta bakurê Xorasanê belav û welav bû û Feyrûz bi xwe hat kuştin û selteneta Parsê bû bacderê Hîtaliyan.

Dema ku şahên Hîtaleyan li Suxdus, Kabilistan û Sikistanê bi cih bû, hoza wan Zabilistan kir melbenda xwe. Her ji ber vê jî ji xwe re gotin “Cabule” yanî “Zabilî”.

Feyrûz piştî 26 salên fermanrewatiyê di şerê Hîtaleyan de hat kuştin. Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Kûşan Biraxoyî, Mîr Girşasp Zengene, Mîr Caf Edreganî, Mîr Beyx Mamilî û Mîr Tîrdad Kirmanî.

## **Hatina Kirkûyî Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Dema ku Feyrûz derket ser text pileya dadgeriya Tûran û Mekranê da mîrê artêşê ku navê wî Kirkûyî bû.

## **Paşabûna Bilaş**

Piştî kuşina Feyrûz di şerê Hîtaleyan de, birayê wî Bilaş ku bi navê “Bilas” jî hatiye nasîn, derket ser textê Sasanê. Bilaş mirovekî neşayiste û bêfeyde bû û nikaribû şan û şohreta selteneta Sasanî bilind rabigire û wezîrê wî ku navê wî Zirmihr bû ew ji ser text rakir û çavên wî derxistin.

## **Hatina Mîr Kiyarş Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Zirmihrê ku Feyrûz ew anîbû ser text, mîrekî bawerpêkiriye xwe ku navê wî Kiyarş bû bi pileya dadgeriyê li Tûran û Mekranê bi cih kir.

Ev mîrên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên Bilaş bûne: Mîr Resan Biraxoyî, Mîr Selem Zengene, Mîr Eyle Edreganî, Mîr Rostem Mamili û Mîr Şahdad Kirmanî.

## **Paşabûna Kubadê Yekem**

Di serdema paşatiya Bilaş de Kubadê kurê Feyrûz hewl da textê paşatiyê ji Bilaş bistîne, lê bi ser neket û neçar ma xwe avêt ba sultanê Hîtalan. Dema ku Zirmihr, Bilaş ji ser text hilda, Kubad bi alîkariya Hîtalan textê Parsê dagir kir û keça sultanê Hîtalan ku ji kemera Nexşunewaz û ji zikê keça Feyrûz bû, pê re zewicî û fermanrewatiya wî dest pê kir.

## **Bêdengkirina Hozêñ Hezerê**

Di destpêka paşatiya Kubad de, hozêñ Hezerê ajotin ser selteneta Parsê û êrîşî ser geliyê Kurê kirin. Kubad li ber xwe da û di şerekî giran de ew şikandin, piraniya wan kuştin û destkeftiyeke bêpîvan ket destan.

## **Hatina Îmam Mezdek**

Mezdek li bajarê Mawayê ku ketiye qeraxên Dîcleyê, hat dinê. Navê bavê wî Bamdad bû, ji çîna xelkê navendî bû. Mezdek di serdema fermanrewatiya Kubad de peyamberiya xwe ragihand û dixwest dînê Manî zindî bike. Piştî dused salan ew alaya rîbaza baş bilind kir û bang li xelkê kir ku di bin vê alayê de berhev bibin.

Mezdek mirovekî çê, zimanşêrîn, xwegir û hêmin bû. Ji ber wê li her cihî pêşwazî li banga wî kirin. Nesîhetên wî heta tesîr li Kubad Paşayê Sasanî jî kir. Lê guhertina dîn ji aliyê

Kubad ve bû sebeb ku endam û karbidestên dewletê jê aciz bibin. Bi vî awayî, endam û karbidest bi pêşewayên Zerdeştî re bûn yek û alaya serhildanê bilind kirin. Di neticeyê de, Kubad ji ser text dûr xistin û bend kirin.

Kubad piştî midetekê di girtîgehê de bi alîkariya piştevanên xwe bazda û çû ba paşayên Hîtalayan û piştre ji karbidest û pêşewayên Zerdeştî re name şand ku bi mercê wî careke din bikin paşa, ew ji dînê Mezdekî tobe dike. Bi vî awayî, di navbera wî, karbidest û pêşewayên Zerdeştiyan de aştî çêbû û Kubad hat Parsê û careke din derket ser text û dev ji dînê Mezdekî berda.

### **Guftûgoyê Mezdek Bi Pêşewayên Zerdeştiyan Re**

Her wekî destûra şahêن berê, Kubad civateke guftûgoyê pêk anî û bang kirin pêşewayên Zerdeştî ku bi Mezdek re li ser problema dîn guftûgoyê bikin. Dema ku civat berhev bû, pêşewayên Zerdeştî piştî guftûgoyê Mezdek ne li rê dîtin û ew ji dîn derketî hesêb kirin û qebehêtê belavkirina vê bêdîniyê kirin stûyê wî û ew avêtin zindanê.

Piştî midetekê Mezdek bi rêya bawermendên xwe bi dadwerên zindanê re li hev kir û ji zindanê azad bû û bazda.

### **Paşabûna Tehmasp**

Piştî rakirina Kubad ji ser text, desthilatdarên dewletê Tehmaspê birayê wî kirin paşa û wî sê salan fermanrewatî kir. Di wê navê re, Kubad name û peyam ji endam û karbidestên Zerdeştiyan re şand û soz da ku ji dînê Mezdekî tobe dike û dînê bav û bapîrên xwe ku rîbaza Zerdeştî ye qebûl dike.

Piştî vê soz û peyman dayînê, karbidest û endamên dewletê bangî Kubad kirin û careke din danîn ser text.

## **Paşabûna Kubad Cara Duyem**

Dema ku Kubad cara duyem derket ser text, li gor wan soz û peyamên ku dabû, bi rawêjkariya karbidest û pêşewayên dînê Zerdeştî, civateke guftûgoyê pêk anî û Îmam Mezdek û pêşewayên dînê Zerdeştî tê de berhev kirin, ku di navbera xwe de guftûgoyê bikin û bizanibin kîjan mil li ser rêya rast e.

Guftûgoyê dest pê kir û pêşewayên Zerdeştî, Mezdek bêdîn hesêb kirin û ew avêtin zindanê. Kubad careke din bi midetê sê salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir.

## **Hatina Mîr Gistim Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Di serdema yekem a paşatiya Kubad de, Mîr Kiyarş dadgerê Tûran û Mekranê bû. Lê di serdema duyem de, Kubad Mîr Kiyarş ji ser karê dadgeriya Tûran û Mekranê hilda û di cihê wî de Mîr Gistim li ser pileya dadgeriya Tûran û Mekranê danî.

Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên Kubad bûn: Mîr Kiyasir Biraxoyî, Mîr Seran Zengene, Mîr Ercan Edreganî, Mîr Siyamek Mamîlî û Mîr Murra Kirmanî.

## **Paşabûna Enuşêrwan**

Piştî koça dawiyê ya Kubad, kurê wî yê mezin Enuşêrwan derket ser text. Zamîsê birayê biçûk ê Enuşêrwan desteyek ji mîrên seltenetê bi xwe re hevdeng kirin û plan darişt ku desthilata text ji Enuşêrwan bistîne. Lê Enuşêrwan bi vê planê hesiya û bi giranî gazind ji wan kir û bi vê jî nema û hemû birayên xwe bi kurên wan ve kuştin. Ev jî ji bo wê kir ku careke din kesek li dijî wî şorişê berpa neke. Li gel wê jî kurê Zamiş ku navê wî Kubad bû di van kuştinan de ji bo ku bazdabû rizgar bû.

## **Qetlîama Mezdek û Mezdekiyan**

Dema ku Enuşêrwan derket ser text, bang kir ku çi kesê Mezdekiyekî bêdîn bigire dê bê xelatkirin. Piştî vê bangê Mezdek hat girtin û ew kuştin û kuştina bawermendên wî jî texsîr nekirin. Nêzikî 100 hezar kes ji bawermendên Mezdekî hatin kuştin.

Kurdên Beluçî jî ku dînê Mezdekî qebûl kiribûn, ji wan jî nêzikî 200 hezar kes ketin ber pêlên vê qetlîamê. Serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî Mîr Behram Biraxoyî, Mîr Şagan Zengene, Mîr Zerîn Edreganî, Mîr Riswan Mamîlî û Mîr Şember Kirmanî paşvemayê xelkên tîreyan ku ji vê qetlîamê rizgar bûbûn di gerdenên çiyayên Tûranê de xwe veşartin. Hinek jî ji zincîra çiyayên Tûranê ber bi jêr bûn û li deştên welatê Sindanê stirîn.

## **Hatina Mîr Yezen Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Dema ku Enuşêrwan derket ser text, Mîr Gestem der kir û şand Kirmanê. Li cihê wî Mîr Yezen li ser pileya dadgeriya Tûran û Mekranê bi cih kir.

### **Şahiya Zêde ya Ji Bo Hatina Dinyayê ya Hz. Mihemed Mistefa (Silav Lê Bin)**

Di serdema fermanrewatiya Enuşêrwan Paşayê Sasanî de, Mihemed Mistefa ji aîleya Ebdulayê kurê Ebdulmutelib ê serdarê Qureyşîyan hat dinyayê. Ebdula çend meh beriya hatina dinyayê ya Hz. Mihemed Mistefa koça dawiyê kir. Dema Hz. Mihemed hat dinyayê û mizgîniya hatina wî ya dinyayê gihadîn Ebdulmutelibê bapîrê wî, ew şad û xweşhal bû û çû mala Ebdula û yê nû hatibû dinyayê hilgirt û bir mala Kabeyê û li wir ji Xwedayê mezin hêvî û lava kir. Roja heftan adetê “eqîqe”ya Hz. Mihemed Mistefa hebû û navê “Mihemed” lê kirin. Navê dayîka Mihemed Mistefa Amîneya Keça Weheb bû. Li gor destûra Qureyşîyan bi mebesta perwerdekirinê Hz.

Mihemed spartin Helîmeya ku ew ji hoza Benî Se‘d bû. Helîme ew girt û bir Benî Se‘dê. Piştî çend salan Ebdulmutelib çû balê û dema gihîst wir Mihemed dît. Mihemed derket pêş û gotê, tu kî yî? Wî jî jê re got, ez bapîrê te me. Piştre Ebdulmutelib hat xwarê ew hembêz kir û maçî kir. Piştre rûnişt û ew danî ser zîn û bi xwe re anî Mekkeyê.

Di temenê şeşsaliya wî de dayîka Hz. Mihemed Mistefa koça dawiyê kir û Ebdulmutelibê bapîrê wî û Ebu Talibê mamê wî ew perwerde kirin. Di temenê 12 saliyê de Mihemed Mistefa sefera Şamê û Besrayê kir û di temenê 25 saliyê de jineke çakekarî ya navê wê Xedîceya keça Xweylid re zewicî.

Yezdanê mezin ew pak ragirt û tu wextê pûtperestî nekir û tenê Xwedayê mezin diperest. Dema ku temenê wî gihîst 40 saliyê, ji aliyê Xwedê ve ferman jê re hat ku bang xelkê bike ji bo yeqîniya yek Xwedayî û ji wan re bibêje “Laîlahe îlellah Mihemed Resûlillah”. Yekem kesê bawerî kir Ebûbekir bû û ji ber wê jê re gotiye “Sidîq” [rast]. Yezdanê mezin dînê wî bi ser xist û geşkerên wî zêde bûn. Di destpêkê de Medîne û piştre Benî Nezîr, Xeyber, Fidik, Geliyê Qurayê, Têyma, Mekke, Tayif, Cerş, Dumtel-Cendel, Behran, Yemen, ‘Uman, Behreyn û Yemame hatin bin desthilata İslamiyetê. Piştî van serkeftinan, peyamber çûye Medîneyê û roja duşemba 12‘ê rebîulewela sala 11‘ê koçî dinya terk kir.

Navên maliyên wî yên pakîze ev in: Xedîce, Sewde, ‘Aîşe, Hefse, Zînet, Umulmesakin, Um Seleme, Zeyneb, Curiye, Um Hebîbe, Meymûne, Sefye û Marye Qubtî.

### **Paşabûna Hurmuzê Çarem**

Piştî koça dawiyê ya Enuşêrwan, kurê wî Hurmuz ku ji dayîka keça paşayê Tirk bû derket ser textê paşatiya Sasanî. Di destpêkê de bi awayê bavê xwe fermanrewayî kir, lê piştre dadparwerî û wijdan da milekî û sitem û zordarî kir awayê rêveberiya xwe. Xelk jê êşiya û aciz bû. Di wê navê re Tirkân

êrîşî ser welatê wî kir û di şer de kuştin. Hurmuz 11 salan fermanrewatî kir.

### **Hatina Mîr Erşib Ji Bo Dadgeriya Tûran û Mekranê**

Piştî koça dawiyê ya dadger Mîr Yezen, Hurmuz Mîr Erşib tayînî dadgeriya Tûran û Mekranê kir. Di serdema dadgeriya wî de, mîrê welatê Sindanê wilayetên Tûran û Mekranê dagir kirin û Erşib ji dadgeriyê dûr xistin.

### **Rizgakirina Wilayetên Tûran û Mekranê Ji Waliyê Sindanê**

Dema ku Rayi Siharisê fermanrewayê Sindanê, selteneta Sasanî di nav tevlihevî û paşveçûnê de dît, ji vê rewşê istîfade kir û êrîşî ser wilayetên Tûran û Mekranê kir. Dadgerê Kura û Mekranê Erşib şikand û ew wilayet dagir kirin û bi wilayetên xwe ve girêdan û Erşib jî ji welat der kir.

Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxê Hurmuz Paşayê Sasanî û Rayi Siharisê waliyê Sindanê bûn: Mîr Bîdar Biraxoyî, Mîr Beyker Zengene, Mîr Yusif Edreganî, Mîr Baban Mamilî û Mîr Takul Kirmanî.

### **Paşabûna Xesro Perwîz**

Piştî kuştina Hurmuzê Çarem di şerê Tirkan de, Xesro Perwîzê kurê wî derket ser text. Xesro daxwaz kir Behram Çûpîn ku kurmamê wî bû pê re aştiyê çêke. Lê Behram ji bo aştiyê amade nebû û xwe ji şer re amade kir û piştî şerekî giran, wî Xesro Perwîz şikand. Xesro Perwîz bazda û çû ba qeyserê Romayê. Qeyserê Romayê, pêşwazî lê kir û piştre alîkariya wî kir û di neticeya vê alîkariyê de Xesro Perwîz careke din êrîşî ser Parsê kir û seltenet kir bin desthilata xwe.

## **Şerê Xesro Perwîz Bi Romayîyan Re**

Dema ku Xesro Perwîz careke din derket ser text, Marsan qeyserê Romaya Rojhilatê ku hevkarê Xesro bû û li ser text şewq vedabû, bi destê berhelistkeran hat kuştin. Hesro Perwîz bi sehkirina vê karesatê gelek êşîya û xemgîn bû û bi îradeyeke bi hêz biryar da ku toleya xwîna Marsan ji nehezên wî bistîne. Bi vî awayî, êrîşî ser selteneta Romayê kir û şer dom kir. Serleskerên Xesro Perwîz terefdarên vî şerî nebûn û ew girtin û kuştin ku ji çengê van şer û qirênen bêfeyde û bêşûd rizgar bibin.

Xesro Perwîz 38 sal fermanrewatî kir. Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên wî bûn: Mîr Bissim Biraxoyî, Mîr Tîrdad Zengene, Mîr Tarab Edreganî, Mîr Mancan Mamilî û Mîr Sakûr Kirmanî.

## **Nameya Hz. Mihemed Mistefa Ji Xesro Perwîz Re**

Di serdema Xesro Perwîz de girîngtirîn bûyer ku rû dabe, ragihandina peyambertiya Hz. Mihemed Mistefa bû. Di netîceyê de Hz. Peyamber ji Xesro Perwîz re nameyek şand û bang lê kir ku İslamiyetê qebûl bike.

## **Paşabûna Kubadê Duyem**

Piştî kuştina Xesro Perwîz, kurê wî Kubad derket ser text. Wî bi qeyserê Romayê re aştî çekir û girtî azad kirin. Her wiha qencî bi xelkê kir û baca li ser wan kêm kir ku xweşhal bin û li welat ewlekarî berdewam be. Hêj salek di ser fermanrewatiya wî re derbas nebûbû, tûşî nexweşîya webayê bû û giyanê xwe ji dest da.

## **Misilmanbûna Xelkê Yemenê**

Di serdema Kubad de, xelkê Yemenê û paşayê welat serî li ber Hz. Mihemed Mistefa tewandin û İslamiyet qebûl kirin.

Paşayê Yemenê eynî paşa bû ku Xesro Perwîz ê paşayê Sasanî di serdema desthilatdariya xwe de jê re name şandibû ku êrîşî ser Medîneyê bike, Mihemed bigire û bişîne Parsê ba wî.

### **Li Ser Erdê Sindanê**

Hinek dîroknivîs bi vî awayî behsa sebebê pênameya erdê Sindanê dikin ku Hind û Sind du kurên Hamê kurê peyamber Nûh bûne û dema ku hatine vê navçeyê û tê de bi cih bûne navê xwe li navçeyan kirine. Yanî navçe bi navê wan hatine nasîn.

Neviyê Sind li geliyê Sindanê bi cih bûne û xwe bi navê Binyan, Takîn û Mûmîdan dane nasîn. Neviyê wan yek li pey yekê li ser erdê Sindanê fermanrewatî kirine. Di serdema fermanrewatiya malbata Sasaniyê Parsê de, malbata Raslan li ser erdê Sindanê fermanrewatî kiriye û midetê fermanrewatiya wan heta 200 salan domandiye. Tê gotin yekem fermanrewayê vê malbatê Risal Dîwanç bûye.

### **Risal Dîwanç**

Tê neqilkirin ku Risal Dîwanç yekem fermanrewayê malbata Risalan bûye û li bajarê Elurdinê yê paytexta Sindanê rûniştiye. Saheya welatê wî gelek fireh bûye: Sînorê rojhilate gihîştiye kewşenê Qinûcanê, sînorê rojava heta Mekranê û deryaya Umanê çûye, sînorê bakur gihîştiye sînorên Kendara, Zereng, Tûran û çiyayên Kurdan û sînorê başûr jî gihîştiye erdê Sûrtînê. Rasil Dîwanç ev welatê mezin û fireh bi ser çar wilayetan ve parve kiriye: Burehmen Abadan, Sêwsitan, Êskalendûn û Multate.

Rasil Dîwanç piştî pêkanîna welatê xwe 15 salan fermanrewatî kir û piştre koça dawiyê kir. Ew hevçerxê Enuşêrwanê paşayê Parsê bûye. Di wê serdemê de, ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî serekhozên tîreyên Kurdên Beluçî bûne û li Tûran û Mekranê jiyanâ xwe derbas

kirine: Mîr Behram Biraxoyî, Mîr Şagan Zengene, Mîr Zerrîn Edreganî, Mîr Riswan Mamilî û Mîr Şembed Kirmanî.

### **Parastina Teqlîdkerên Mezdek**

Di serdema fermanrewatiya Rasil Dîwançê mîrê Sindanê de, Enuşêrwanê fermanrewayê Parsê fermaña qetlîama şopdar û bawermendêñ Mezdek da. Yêñ ji vê qetlîamê rizgar bûbûn berê xwe dan welatê Sindanê û xwe avêtin welatê Rasil. Rasil Dîwanç bi dilfirehî bi wan re hereket kir û bi wan re hevderdî nîşan da. Piraniya parastinxwazan ji tîreyêñ Kurdêñ Beluçî bûn.

### **Rasil Siharis**

Piştî koça dawiyê ya Rasil Dîwanç kurê wî Rasil Siharis derket ser textê fermanrewatiya Sindanê. Rasil Siharis cara yekem bingeha adet û karê ziraetê li welatê Sindanê damezirand, qencî bi cotkaran kir û ci pêdawistiyêñ jê bixwestina ji wan re bi cih dikir û dida wan.

### **Dagirkirina Wilayetên Tûran û Mekranê**

Dema ku Rasil Siharis derket ser textê Mîrnişîna Sindanê, Hurmuzê Sasanî fermanrewayê welatê Parsê bû û di serdema wî de şoriş û serhildan li hemû cihêñ welat belav bûbûn û tevlihevî di kar û barêñ welatê Parsê de diyar bûn. Rasil Siharis ji vê jarî û tevliheviyê îstîfade kir û êrîşî ser Tûran û Mekranê kir û li hember leşkerê Parsiyan bi ser ket. Di netîceya vê serkeftinê de, wilayetên Tûran û Mekranê bi wilayeta Sindanê ve girêda. Li gel vê jî, Mîr Erşib ê dadgerê Parsê ji welat derxist û desthilata rêveberiya welat da destê mîrê xwe.

### **Tayîna Mîr Li Tûran û Mekranê**

Dema ku Rasil Siharis wilayetên Tûran û Mekranê kir bin

desthilata xwe, mîrê tîreya Cunayî ya hoza Binyan ku navê wî Semera û nasnavê wî “Sîwa” bû, li ser fermanrewatiya Tûran û Mekranê hat bicikirin.

Rasil Siharis piştî 20 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên Hurmuz Paşayê Sasanî û Rasil Siharis bûn: Mîr Bîdar Biraxoyî, Mîr Beyker Zengene, Mîr Yûsif Edreganî, Mîr Baban Mamilî û Mîr Takul Kirmanî.

### **Sîwa Semerayê Mîrê Tûran û Mekranê**

Sîwa Semera bi fermaña Rasil Siharisê fermanrewayê Sindanê ji bo fermanrewatiya wilayetên Tûran û Mekranê hat Tûranê û desthilata fermanrewatiyê girt destê xwe. Ew yekem Sîwayê wan welatan bû û dema ku hat bajarê Kîkanê yê paytexta Tûranê, Kurdan serî hildan. Semera bi leşkerê xwe ve rû bi rûyî wan bû û şerekî giran qewimî û ji herdu milan gelek kes hatin kuştin. Ji Sîwa Semera re ji derveyî aştiyê tu çareyeke din nema. Rasil Siharisê fermanrewayê Sindanê bi agahdarbûna ji vê xeberê tûşî sergêjiyê bû. Lê ji bo ku ew kesekî dûrbîn û karzan bû his kir bi du dijminan re yanî Kurdên Beluçî û paşayên Sasanî re şerkirin karekî neşiya ye. Ji ber wê pêwîst bû bi rûniştiyê Tûran û Mekranê re ku Kurdên Beluçî bûn aştiyê çêke û paşayên Sasanî li xwe nêzik bike û bike piştivanê xwe. Ji ber vê, bi wan re peyman îmze kir ku ew li wilayetên Tûran û Mekranê bi hevbeşiya Kurdan fermanrewatiyê bike.

Sîwa Semera piştî 25 salên li Tûran û Mekranê fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Wî di serdema xwe de Tûmanê birayê xwe kir waliyê Mekranê. Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxên Sîwa Semera bûn: Mîr Bîdar Biraxoyî, Mîr Beyker Zengene, Mîr Yûsif Edreganî, Mîr Baban Mamilî û Mîr Takul Kirmanî.

## **Beşdariya Kurdên Beluçî ya Nav Hêzên Eskerî**

Bi girêdana vê peymanê Risal Siharis fermanrewatiya Sindanê bi mebestabihêzkinin û berdewamiya desthiltdziya xwe ya li Tûran û Mekranê pêwîst zanibû. Ji aliyê din ve dixwest rûniştiyê van wilayetan ku di hevahengiyeke bi hêz û pêwîstdar de yekgirtî bûn, ji bo pûçkirina eger û metirsiyê êrîşanîna welatê Sasanî li gel xwe hevdeng bike. Ji bo vê mebestê jî, leşkerekî xurt û xwedî şîyan ji Kurdên Beluçî pêk anî.

### **Rasil Sihas**

Piştî koça dawiyê ya Rasil Siharis, kurê wî Rasil Sihas derket ser textê welatê Sindanê û adetê ziraetê ku bavê wî danîbû di dirêjahî û pehniya welatê xwe de rewac pê da. Her dem li dijî niyetxeraban û xerabkerên şaristanî û dijminên gundnişîn ên cotkaran şer kiriye. Rasil Sihas piştî 21 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Sîwa Cunîn Mîrê Tûran û Mekranê**

Piştî Sîwa Semera, kurê wî Sîwa Cunîn derket ser textê Mîrnişîna Tûran û Mekranê û adetê zîraetê li Tûran û Mekranê pêş ve bir. Qencî bi Kurdên Beluçî kir û di azayetî û mîrxasiyê de bêemsal bû.

Sîwa Cunîn piştî 20 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxên wî bûn: Mîr Besam Biraxoyî, Mîr Şîrdad Zengene, Mîr Tarab Edreganî, Mîr Mancan Mamîlî û Mîr Sakur Kirmanî.

### **Rasil Siharisê Duyem**

Piştî malavahiya Rasil Sihas, kurê Rasil Siharisê Duyem derket ser textê welatê Sindanê. Hê gelek di ser re derbas nebûbû, Paşayê Nîmrûzê êrîşî ser wilayeta Mekranê kir.

Siharisê Duyem bi leşkerekî mezin ve çû Mekranê, şerekî giran di navbera wan de dest pê kir û gelek kes ji herdu aliyan hatin kuştin. Cidgalan nikaribûn şer bidomînin û ji hêz û şiyana wan tirsîyan û bazdan. Herdu Sîwa Cunîn ê mîrê Tûran û Mekranê û Rasil Siharisê Duyem ê fermanrewayê Sindanê hatin kuştin.

Paşayê Nîmrûzê destkeftiyeke mezin bi dest xist û bi serkeftî bi kole, çek û gelek hespan ve vegeriya Nîmrûzê. Paşvemayê leşkerên wî yên Kurdên Beluçî ji Mekranê derketin û welatê wan jî hat dagirkirin. Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxê Rasil Siharisê Duyem, Sîwa Cunîn û Hz. Mihemed Mistefa bûn: Mîr Cad Biraxoyî, Mîr Ewram Zengene, Mîr Mûsa Edreganî, Mîr Sînan Mamilî û Mîr Şiban Kirmanî.

### **Paşabûna Pûran Duxt**

Piştî serdema selteneta Sasaniyan hevawayê dawîn serdemên selteneta Hexamensî û Eşkaniyan, zincîrek şoris û serhildan li welatê Parsê serî hildabû ku netîceya wê bûye sebebê têkçûna paşatiya Sasaniyan.

Piştî Kubadê Duyem, desthilatdar û karbidestên seltenetê Pûran Duxta keça Xesro Perwîzî anîn ser text û piştî du salan ji ser text hildan.

### **Koça Hz. Mihemed Mistefayê Peyamberê Îslamê û Malavahiya Wî**

Di serdema fermanrewatiya Rasil Siharisê Duyem de, peyamberê Îslamê Mihemed Mistefa (silav lê bin) di roja duşemba yekê rebî'ulewelê de ji Mekkeyê koçî Medîneyê kir. Sebebê koçkirina wî ew bû ku sitem û zordariya kafiran li ser Misilmanan li Mekkeyê gelek giran bûbû û ew kiribûn tengiyê. Hz. Peyamber (silav lê bin) ji bilî koçkirinê tu rêya çareyekê nedît. Bi vî awayî koç kir, li Medîneyê bi cih bû û 10 salan propagandaya Îslamiyetê domand. Di netîceya vê de

jî, Nîvgirava Ereb bi tîşka Îslamê rohnî bû û Hz. Mihemed Mistefa di 12'ê meha Rebî'ulewela sala 11'ê koçî de malawahî ji dinyaya fanî xwest.

### **Paşabûna Arzim Duxt**

Piştî derkirina Pûran Duxt, endam û karbidestên selteneta Parsê xweha wê ya bi navê Arzim Duxt danîn ser text. Bi textnişîniya Arzim Duxt, şoriş û serhildan li cihêن din ên welatê Parsê nehatin birîn, heta zêde firehtir jî bûn. Endam û karbidestên malbata Sasanî ji bo bidestxistina text û desthilatê her yekî ji wan ji aliyê xwe ve kar dikirin û di nav xwe de ketin lêkdana hevdu.

Di serdema Arzim Duxtê de roja Îslamê ji Nîvgirava Ereb hilatibû û xelkê li wir Îslam qebûl kiribû.

### **Rasil Sihasê Duyem**

Rasil Sihasê Duyem di şerê Paşayê Nîmrûz de hat kuştin. Ew ocaxkor bû, ji ber wê karbidest û desthilatdarên welatê Sindanê birayekî wî yê ku navê wî Rasil Sihasê Duyem bû danîn ser text.

Rasil Sihasê Duyem xwedîyê exlaqekî baş bû û ji xelkê re başî kir û baca li ser wan kêm kir. Çaksaziya ziraetê encam da û piştî 10 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.

### **Sîwa Esyarê Mîrê Tûran û Mekranê**

Dema ku Sîwa Cunîn bi Rasil Siharisê Duyem re di şerê Paşayê Nîmrûzê de giyanê xwe ji dest da, kurê wî Sîwa Esyar derket ser textê Mîrnişîna Tûran û Mekranê. Di serdema Sîwa Esyar de, paşayê Sindanê Rasil Sihasiyê Duyem bi ocaxkorî koça dawiyê kir û wezîrê wî Çeçê kurê Sîlayîç ku mirovekî zîrek, zana û hişmend bû, desthilata fermanewatiyê girt destê xwe û endam û karbidestên dewletê han da ku îtaetê ji

desthilata wî re bikin.

Sîwa Eşyar piştî 15 sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir.  
Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxên Rasil Sihasê Duyem û  
Sîwa Eşyar bûn: Mîr Canbeg Biraxoyî, Mîr Siwîd Zengene,  
Mîr Ladîn Edreganî, Mîr Kuyan Mamilî û Mîr Wan Kirmanî.  
Ev serekên Kurd hevçerxê mîrê Misilmanan Ebûbekir jî bûn.

## **BEŞA DEHEM**

### **KURDÊN BELUÇÎ DI SERDEMA ÎSLAMIYETÊ DE**

#### **Xilafeta Mîrê Misilmanan Ebûbekir**

Dema ku Hz. Mihemed Mistefa malawahî kir, roja sêşembê mîrê Misilmanan Ebûbekir derket ser seqîfeya Benî Sa‘dê.<sup>18</sup> Beriya hemû kesî Omerê kurê Xetab îtaetî xelîfetiyê kir. Vêca Ensariyan beriya veşartina Resûl îtaetî xelîfetiyê kirin.

Ebûbekir li ser kirin û isûla peyamber Mihemed (silav lê bin) meşîya û fermanê xilafetê li ser esasê Qur'an û şerî'etê derdixistin. Li dijî dînderketiyan şer kir û careke din vegrand ser dînê Islamê û dînê Islamê li ser bingehêke bi hêz da rûniştandin.

Dema nêzikî nefesên dawîn yê jiyanê bû, Omerê kurê Xetab ji bo cihnişîniya xwe hilbijart. Îtîraf bi xelîfetiya wî kir û nûsxeyeke vê fermanê ji hemû cihî re şand. Bi vî awayî, piştî du sal û du mehan di temenê 62 saliyê de koça dawiyê kir. Omerê kurê Xetab, Osmanê kurê ‘Efan, Telheyê kurê ‘Ubeydullah û Ebdurehmanê kurê ebî Bekir naaşê wî li ba gora Mistefa veşartin.

#### **Xilafeta Mîrê Misilmanan Omerê Kurê Xetab**

Piştî koça dawiyê ya Mîrê Misilmanan Ebûbekir, pena-ber û ensaran îtaetî desthilata Omer kirin. Omer Îslam li ser

---

<sup>18</sup> Mîmbera Dîwana Benî Sa‘d e.

bingeha şerî'etê, isûl û exlaqê peyamber Mihemed (silav lê bin) peyrew kir û Yezdanê mezin gelek bajar bi destê wî dan dagirkirin û mal û darayiya fireh di beytulmala Misilmanan de berhev bû. Derketina wê cirûska li rêya derçûyan tefiya û dawî bi paşvemayînê hat.

Yekem car Ceser dagir kir û piştre artêş şand Şamê ku dagir bikin. Îslam bi hêz bû, bi ser ket û kafir têk çûn. ‘Etbeyê kurê Xezwan şand Uble ku Firatê dagir bike, Se'dê kurê ebî Weqas şand Qadîsiyeyê. Rostemê serekerkanê Yezdgurdê şahê Ecem bi artêseke mezin ve hat. Lê şikest û Se'd Ecemîstan dagir kir.

Piştî wê, ferman da Kufe û Besrayê dagir bikin. Destî hilatdarên Qensirîn, Reha, Simîsat, Himis, Cendê Şapûr, Sûs, Ramhurmuz, Ester, Supahan, Qûm û Qaşanê ci bi name û aştî û ci bi şer dagir kirin. Vêca Mu'awiyyeyê kurê ebû Sufyan şand Qeysariyeyê ku Remelâhê dagir bike, name ji Omerê kurê 'Asî re şand ku İskenderûnê dagir bike û Nu'manê kurê Meqrûn şand ku Nehawendê dagir bike. Piştre 'Emrê kurê 'Asî şand Berqeyê ku ew Berqe û Etrablûsê dagir bike û Muxeyre Şe'bey şand ku Azerbaycanê dagir bike.

Piştî vê kar giha cihekî ku beyana roja çarsembê ya meha zilheceyê li ser nimêjê ku xwest tekbîrê bêje, Luluyê xizmet-karê Muxîreyê kurê Şe'be sê xencer lê dan, janeke giran Omer girt û Ebdurehman 'Ewfî bi destê wî girt heta ku nimêja xwe temam kir. Vêca Osman, Elî, Telhe, Zubeyr, Se'd û Ebdurehman bang kir û ji wan re got, di nav xwe de çend kesan pêşni-yaz bikin û yê raya hevalan bi dest xist bikin xelîfe.

Omer piştî wê koça dawiyê kir. Temenê wî 65 sal bû û serdema xilafetiya wî jî 10 sal û 6 mehan kişandibû. Su'eyb li ser nimêj kir û Osmanê kurê 'Efan û Ebdulayê kurê wî ew li Seraya 'Aşîşeyê li ba gora Ebûbekir veşartin.

Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên mîrê Misilmanan Hz. Omer bûn: Mîr Mihirdad Biraxoyî, Mîr

Sewîd Zengene, Mîr Patak Edreganî, Mîr Berzinc Mamilî û Mîr Cûdik Kirmanî.

### **Paşabûna Yezdgurdê Sêyem**

Piştî derkirina Arzimê Duxt, endam û karbidestên sel-teneta Sasanî Yezgurd kirin paşa. Hêj çarîk sedsal di ser der-ketina Îslamê re derbas nebûbû ku mîrê Misilmanan Xelîfe Ebûbekirê Sidiq koça dawiyê kir û mîrê Misilmanan Hz. Omer hat ser textê xilafetê û leşkerê cîhangîr û dilêr ê Ereb şahînşahê kevnare yê Sasaniyên Persê ji orteyê rakirin.

Yezdgurdê Sêyem ê dawîn paşayê Sasaniyan, piştî şerên Qadîsiye, Medayin, Celewla û Nehawendê hat Xorasanê û daxwaza alîkariyê ji paşayê Maweraunehîrê kir. Lê tu alîkarî jê nehat dîtin. Ehnefê kurê Qeys bi ferma Xelîfe Omer li pey çû û erdê Xorasanê dagir kir. Yezdgurd ji neçarî ji ber ketina Ehnef a pey wî çû Merroyê û xwe avêt ba Mahwa Surî. Mahwa Surî desthilatdarê Xorasanê bû û jibihêzbûna peywendiyêن Yezdgurd bi desthilatdarên pişta wî ditirsiya. Ji ber wê ew li Merroyê bi destê aşvanekî da kuştin û rîveberiya desthilatda-riya xwe heta Belx, Hîra û Buxarayê fireh kir. Buxara bi destê Kirêysûnê serekirkanê Mahwa Surî dagir kir.

Li milê din Ehnef Mahwa Surî li Xorasan û Merroyê û heta milê din ê Ceyhûnê bi pişt xwe ve kêşa. Di wê navê re li milê başûr leşkerên Ereb di bin serekatiya Ebdulayê kurê Bedeyal Xeza'î de heta Germiyanê pêşve hatibûn. Desteyeke din a leşkerên Ereb di bin serekatiya Ebdulayê kurê 'Amir de piştî dagirkirina Kirmanê, êrîşî ser Secistanê kir. Dadwerê Secis-tanê li bajarê Zerengê ku navenda Secistanê bû xwe sitirand. Lê ji bo ku leşkerên Îslamê heta Qendehar, Hind, Sind, Tû-ran û Mekranê pêşve hatibûn, ji neçarî aştî kirin û Zereng ket destê Misilmanan.

'Asimê kurê Omer cihgirê sererkanê Ebdulayê kurê 'Amir Secistan dagir kir. Mîrekî din ê artêşa Ereb ê ku navê wî He-

kemê kurê Omer Se'lebî bû êrişî ser Mekranê kir, bi Rasilê fermanrewayê Sindan, Tûran û Mekranê re li Geliyê Hilmendê rû bi rûyi hev bû û wî karîbû wî bikuje û Mekranê dagir bike.

### Rasil Çeçê Kurê Sîlayîç

Rasil Sihasê Duyem bi ocaxkorî koça dawiyê kir. Ji ber wê, Çeçê kurê Sîlayîç ku wezîrê Rasil Sihasê Duyem bû, xelk han da ku îtaetî desthilata wî bikin. Dema ku di vê hewldanê de bi ser ket, jina Sihasê Duyem Suhindiyana xwest û paşatiya xwe ïlan kir û derket ser text.

### Şer Bi Ranûn Mihirtûn Re

Welatê Çitûr Pûran cîranê welatê Sindanê bû. Fermanrewayê vî welatî Ranûn Mihirtûn xizmatiya wî bi Rasil Sihasê Duyem re hebû û xwe mafdarê welatê Sindanê dizanibû. Ji ber vê çû şerê Sindan. Çeçê kurê Sîlayîç beşdarî şer bû. Ew mirovekî wisan bû ku kesî nikaribû li hemberî wî bisekine û gelek kuştin û heta bi rimekê li Ranûn Mihirtûn jî da. Lêdana wî bi awayekî wisan xurt bû ku Ranûn ji ser pişta hespê xwe ket xwarê û ji ber Çeç bazda. Bi vî awayî şikest, di eynî wextê de nûnerê xwe şand û astî kir.

Piştî 40 sal fermanrewatiyê Çeç koça dawiyê kir û du kurên navê wan Dahro û Hersîne li pey xwe hiştin.

### Sîwa Mayînê Mîrê Tûran û Mekranê

Sîwa Espar bi ocaxkorî koça dawiyê kir û birayê wî, Sîwa Mayîn derket ser Textê Mîrnişîna Tûran û Mekranê. Di serdema Mayin de Sihasê Duyem koça dawiyê kir û wezîrê wî Çeçê kurê Sîlayîç bû paşayê Sindanê. Çeç Suhindiyana jina Sihasê Duyem ji xwe re xwest û fermanrewatiya Sîwa Mayîn li Tûran û Mekranê dom kir.

Sîwa Mayîn di Geliyê Hilmendê de di şerê leşkerê Îslamê

de hat kuştin û li cihê wî Sîwa Zûrak derket ser text.

### **Êrîşa Leşkerê Îslamê Li Ser Secistan û Mekranê**

Di dawîn serdema mîrê Misilmanan Omerê kurê Xetab de, desteyek eskerên Ereb di bin serekatiya Hekem kurê Omer Se'lebî de, piştî dagirkirina Secistanê êrîşî ser Mekranê kir. Fermanrewayê Mekranê Sîwa Mayîn bi leşkerê xwe û leşkerê Rasil Çeçê kurê Sîlaiyîc ê fermanrewayê Sindanê re li Geliyê Hilmendê rû bi rûyê leşkerê Îslamê bûn. Di vî şerê xwînavî de, serleşkerê Rasil Çeçê kurê Sîlaiyîc ku navê wî Muna bû û waliyê Tûran û Mekranê Sîwan Mayîn şikand û kuşt.

Leşkerê Îslamê, leşkerên pêşîn ji nav birin û welatê Mekriyan dagir kirin û bingeha sîstema Îslamê damezirandin. Piştî wê leşkerên Îslamê erdê Mekranê kirin melbenda artêşa Îslamê.

Ev serekên Kurdên Beluçî hevçerxên Çeçê kurê Sîlaiyîcê fermanrewayê Sindan û Mîr Sîwa Mayînê waliyê Tûran û Mekranê û mîrê Misilmanan Xelîfe Omerê kurê Xetab bûn: Mîr Tîrdad Biraxoyî, Mîr Sewîd Zengene, Mîr Tapik Edreganî, Mîr Berzinc Mamilî û Mîr Cûdik Kirmanî.

### **Îtaeta Kurdên Beluçî a ji Mîrê Misilmanan**

#### **Hz. Omerê Kurê Xetab Re**

Di serdema xilafeta mîrê Misilmanan Hz. Omerê kurê Xetab de, serleşkerê Îslamê Hekemê kurê Omer Se'lebî, Mekran dagir kir û hê li Mekranê bû ku mîrên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî Mîr Mihirdad Biraxoyî, Mîr Sewîd Zengene, Mîr Patak Edreganî, Mîr Berzinc Mamilî û Mîr Cûdik Kirmanî rabûn û Mîr Siyawusê birayê Mîr Mihirdad Biraxoyî wekî nûnerê xwe şandin ba Hekemê kurê Se'leb û wî jî mercên Kurdên Beluçî ji bo îtaetê raxist ber çavêن wan.

Mercên Kurdên Beluçî ev bûn: Eger Kurdên Beluçî dînê

Îslamê qebûl bikin û hevkariya Ereban bikin, di miqabilî vê alîkariyê de divê Ereb jî wan ji wan geliyên ku tê de niştecih bûne dernexin û ber bi deştên din ve neşinin. Hekemê kurê Omer Se'lebî ev merc di nameyekê de nivîsand û bi yek ji wan Teteran re şand Medîneyê ba xelîfeyê Îslamê Omerê kurê Xetab. Mîrê Misilmanan Omerê kurê Xetab peymanname qebûl kir û Kurdên Beluçî li geliyê Tûran, Mekran û Secistanê ku cih û warê bav û bapîrêwan bûn man û dînê Îslamê qebûl kirin.

### Xilafeta Mîrê Misilmanan Osmanê kurê 'Efan

Piştî veşartina Omer, Eliyê kurê ebî Talib, Zubeyrê kurê 'Ewam, Telheyê kurê Ebdula, Ebdurehmanê kurê 'Ewf, Se'dê kurê ebî Weqas û Osmanê kurê 'Efan li ser xilafetê şêwirîn. Osman ji Ebdurrehman re got tu desthilata xilafetê bigire destê xwe. Lê Ebdurrehman gotê ez nikarim. Piştre Ebdurrehman pêşniyaz kir ku ji bo destnîşankirina kesekî çak sê roj muhlet bê dayîn. Piştî wê ji hevkaran pirsîn û midetek di ser re derbas bû, li ser wê li hev kirin ku Osman hilbijêrin.

Osman di dîn, dadperwerî, dadvanî û parvekirinê de li ser şopa xelîfeyên beriya xwe meşîya. Yekem navçeya ku di serdema xilafeta Osman de hat dagirkirin Hemedan bû. Her çend Hemedan di serdema Omer de hatibû dagirkirin, lê cardin veguherîbû. Ji ber wê Osman di roja mirina Omer de, Muxeyre Şe'be şand ku wê dagir bike. Piştre Mûsa Eş'erî şand ku Reyê dagir bike. Osman piştre Mûsa Eş'erî ji desthilatdariya Besreyê û Osmanê kurê ebî El'as jî ji desthilatdariya Farsê rakir û desthilatdariya Besreyê û Farsê da destê Ebdulayê kurê Omerê kurê Kirîz.

Temenê Ebdula 25 sal bû, di destpêkê de hat Besrayê û çend rojan li wir ma û piştre çû Parsê. Ziyadê kurê Ebye li wir hişt, ku beriya wî cihgir bû û Ebdulayê kurê Mu'emer temîmê serekerkanê bû.

Piştî derbasbûna 30 sal bi ser koça Mihemed Mistefa re

(silav lê bin), Ebdulayê kurê ‘Emrê kurê Kirîz “Muçaşî” şandin Sîstanê û şer kir û gelek Misilman kuştin û piştre Muçaşî’ vege riya.

Hz. Osmanê kurê ‘Efan 11 salan li ser textê xilafetê ma û piştre berhelistkeran ew şehîd kirin. Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên wî bûn: Mîr Merwan Biraxoyî, Mîr Xelef Zengene, Mîr Alak Edreganî, Mîr Takul Mamilî û Mîr Akul Kirmanî.

### **Şorişa Xelkê Kabilistan û Zabilistanê**

Di serdema xilafeta Osmanê kurê ‘Efan de, xelkê Zabilistanê şoriş û serhildan berpa kir. Mîrê Zabilistanê Ebdullayê kurê ‘Omer şorişa wan ji nav bir, ew şikandin û cardin Kabûl dagir kir.

Micaşî’ê kurê Mes’ûd ê desthilatdarê Kirmanê, bi hêzên Çiyayên Qefesê re ku Kurdên Beluçî bûn û bi navê tîreyên Kuc û Beluç dihatin naskirin, li hev ket û piştî çendin şerên giran wan itaetî wî kirin. Kurdên Beluçî yên Tûran û Mekranê li gel ku bûbûn Misilman jî, di şerê Çiyayên Qefesê de alîkariya Kurdên xwe kirin lê bi ser neketin.

### **Hatina Ebdurehmanê Kurê Semere a Mekranê**

Dema ku mîrê Misilmanan Hz. Osmanê kurê ‘Efan derket ser textê xilafetê, Ebdurrehmanê kurê Sekere şand Mekranê. Ebdurrehman midetekê li vir maye û bi xelkê re baş hereket kiriye. Wê wextê, fermanrewayê Sindanê Çeçê kurê Sîlayîç leşkerê xwe anîbû ser sînorê Mekranê û tehdîda êrîşa li ser Mekranê dikir.

Ebdurrehmanê kurê Semere, dema ku agahdarî vê xeberê bû, êrîşî ser dijmin kir û di şerekî giran de ew şikand û ji sînorê Mekranê dûr kir. Piştre ji bo wê şorişa ku li wir berpa bûbû ji orteyê rake çû Kabilê.

## **Hatina Ubeydullayê Kurê Mu'emer a Mekranê**

Piştî Ebdurrehmanê kurê Semere, mîrê Misilmanan Ubeydullayê kurê Mu'emer şand Mekranê. Ew hat Mekranê û fermanrewatî kir. Bi azayî û camêriya xwe çendîn navçe dagir kir û heta sînorê welatê Hindê pêşve çû.

## **Xilafeta Mîrê Misilmanan Eliyê Kurê Ebî Talib**

Piştî kuştina Hz. Osmanê kurê 'Efan, Eliyê kurê ebî Talib derket ser textê xilafetê. Wî hemû karbidestên Osmanê kurê 'Efan ji selteneta Îslamê derxistin û li cihê wan karbidestên xwe şandin.

Dema ku xebera Osman gihîst Ubeydullayê kurê Mu'emer, bi hevalên xwe şêwirî û ji wan re got, ew neçar e biçe ba Ebdullayê kurê 'Amir. Dema ku gihîst Besrayê, şerê Cemilyanê dikir û Elî mijûlî wî şerî bû. Dema ku Ubeydulla ev dît, xwe veşart heta Elî ji wî şerî vala bû. Piştre bi wê mal û darayıya ku pê re bû çû Şamê ba Muawiye û hemû ew diyarı dan Muawiye û li wir ma. Dema ku mîrê Misilmanan Eliyê kurê ebî Talib seh kir ku ew hatiye û çûye ba Muawiye, Saxirê kurê Ze'er şand Mekranê. Piştî wê, mîrê Misilmanan Elî bi destê Ebdurrehmanê kurê Melcem hat kuştin. Temenê wî 62 sal bû û midetê xilafeta wî 4 sal û 9 mehan kêşa.

## **Sîwa Zûrakê Mîrê Tûranê**

Piştî kuştina Sîwa Mayîn di şerê Gelyê Helmendê de, kurê wî Sîwa Zûrak derket ser textê Mîrnîşîna Tûranê. Di serdema fermanrewatiya Zûrak de, karbidestên Îslamê yên welatê Mekranê anîbûn bin desthilata xwe, ji ber wê Mîr Zûrak tenê mîrê Tûranê bûye.

Di serdema Mîr Zûrak de, Saxirê kurê Ze'er êrîşî ser Kîkanan kir. Mîr Zûrak karîbû wan bişikîne û ber bi paşve vegerîne.

## Hatina Saxirê Kurê Ze'er a Mekranê

Mîrê Misilmanan Eliyê kurê ebî Talib, Saxirê kurê Ze'er şand Mekranê. Saxir midetekê li wir ma û karûbarên li wir baş kirin û piştre ji zincîra çiyayêñ Kurdish êrîşî ser erdê Tûranê kir û hat nav bajarê Kîkanê. Sîwa Zûrak bi leşkerekî 20 hezar kesî ve hat pêş û bi wan re şerekî dijwar kir. Gelek ji Misilmanan hatin kuştin û dîl hatin girtin û hinek jî rizgar bûn.

Di wê navê re, Saxirê kurê Ze'er hat agahdarkirin ku mîrê Misilmanan Eliyê kurê ebî Talib bi destê Ebdurehmanê kurê Melcem hatiye birîndarkirin û piştre miriye. Ji ber vê ew ji meydana şer paşve kişiya û çû Mekranê.

Ev mîrên Kurdên Beluçî hevçerxên Sîwa Zûrak û mîrê Misilmanan Eliyê kurê ebî Talib bûne: Mîr Şîrak Biraxoyî, Mîr Bekir Zengene, Mîr Bazûk Edreganî, Mîr Curkan Mamilî û Mîr Huse Kirmanî.

## Benî Umeye

Benî Haşim û Benî Umeye ji nesla du birayan bûne û bapîrên wan ên mezin Haşim û Ebdulşemsê kurê Ebdulmenaf bûne. Umeyeyê kurê Ebdulşems û Ebdulmutelibê kurê Haşim hevtemen û hevçerxên hev bûne.

Benî Umeye wekî Benî Haşim ji tîreya pêş û aktîv a Qureyşî bûye. Beriya wê mideteke dirêj di navbera van herdu tîreyan de li ser serperiştiya malê Ke'be û Mekeyê problem derketine. Lê ji ber navberiya serdar û rihsipyan tîreyêñ din ên Qureyşî di navbeyna wan de aştî pêk anîne. Ev jî di neticeya lihevhatina li ser parvebûna erka rêvebirina malê Ke'beyê û Mekkeyê bi awayekî ku serekatiya eskerî yanî serekerkaniya Qureyşîyan dane mîrê tîreya Benî Umeye û erkê serperiştîkirina malê Ke'beyê jî dane mîrê Benî Haşim.

Umeyê kurê Ebdulşems û Ebdulmutelibê kurê Haşim hevriyêñ hev bûne û bi eynî awayî peyamberê Islamê Hz.

Mihemed Mistefa (silav lê bin) û ebû Sufyanê neviyê kurê Umeye jî hevçerxên hevbûne. Ew şerên di navbera Misilmanan û Qureşiyênen Mekkeyê de rû dane di serdema destpêka Îslamê de, ebû Sufyan mîrê sîstema leşkerî ya Qureşî bûye û Qureşîyan di bin rêveberiya ebû Sufyan de li dijî Misilmanan şer kirine. Lê piştî Misilmanan Mekke dagir kirin, ebû Sufyan bû Misilman û Mihemed Mistefa Mu'awiyeyê kurê ebû Sufyan kir nivîskarê wehyan.

Di serdema xilafeta raşîdiyîn de, mîr, serdar û mezinê Benî Umeye ji bo serfirazî û serkeftina Îslamê xizmetên hêjayî pesnê kirine. Omerê kurê Xetab di serdema xilafeta xwe de Yezîdê kurê ebû Sufyan kir nûnerê Şamê û piştî koça wî ya dawiyê, Mu'awiye li ser vê pileyê rûniştiye. Piştî kuştina Osmanê kurê 'Efan, Mîr Mu'awiye serbixwe bû û bi Eliyê kurê ebî Talib re dest bi şer kir û di navbera wan de problem derketin. Piştî kuştina Elî bingeha fermanrewatiya malbata Benî Umeye hat damezirandin.

### Rûniştina Mu'awiye ya Li Ser Textê Xelîfetiye

Piştî kuştina mîrê Misilmanan Elî, xelkê Kufeyê îtaetî desthilatdariya Hesenê kurê Eliyê kurê ebî Talib dike. Dema ku xebera kuştina Elî gihîşt Şamê îtaetî desthilatdariya Mu'awiye kirin. Mu'awiye ji Babîlê hat Şamê û ji wir jî hat Kufeyê. Hesenê kurê Elî ji Kufeyê derket derve û li Enbarê ew û Mu'awiye gihîştin hev û li ser çend mercan aştî çekirin. Hesen dest ji desthilatdariyê kêşa û paşatî tenê ji Mu'awiye re ma û piştre çû Medîneyê.

### Hatina Ebdula Siwar El'ebedî ya Mekranê

Dema ku Mu'awiye desthilat girt dest, Ebdulayê kurê Siwar El'ebedî bi çar hezar siwaran ve li wilayeta Mekranê da bicikirin û jê re got; li navçeya Tûranê çiyayekî navê wî Kîkan heye, li wir hespên xweşik û spehî hene, hin ji wan hespan

bışîne vir. Her wiha, ew agahdar kir ku xelkê vê navçeyê ji ber siruştâ navçeyên çiyayî serhildêrî û serhişkiyê dikan.

Ebdullayê kurê Siwar El'ebdî bi 4 hezar eskerên siwarî ve hat Mekranê û midetekê li wir ma. Piştre Mu'awiye Omerê kurê Ebdullayê kurê Omer ji bo dagirkirina Ermabîlê şand û ew jî hat Mekranê.

### Êrîşa Ser Tûranê

Ebdullayê kurê Siwar El'ebdî bi hevaltiya Omerê kurê Ebdullayê kurê Omer berê xwe da Tûranê û di esnayê seferê de nehiştin di nav leşker de tu kesek agir bike. Ji ber ku xwarina çekirî û amadekirî li ser wan bû. Şevekê di nav leşker de cirîskên agir hatin dîtin. Di netîceya lêgerînê de derket ku jineke ducanî/hamile hemla xwe daniye û pêwîstî agir bûye û Ebdulla jî izin dayê.

Dema ku gihîştine navçeya Kîkanê, Sîwa Zûrak bi leşkerekî 3 hezar neferan ve ji bo bergiriyê hatiye pêş. Leşkerê Îslamê bi ser wan de hakim bûye û ew şikandiye û gelek destkeftî bi dest xistine. Leşkerê Zûrak berhev bûne û devê çiyayan girtine û dest bi şerê tîr tîriyê kirine û Kîkaniyan dest bi şerê lêde û bazde kirine.

Ebdullayê kurê Siwar El'ebdî bi komek eskerên çekdar û taybet ve rawestiya û kir hawar "Ey lawêن Îslamê! Ji ber gawiran paşve venegerin, ji bo ku ziyan negihê baweriya we, şehîd bibin". Leşkerê Îslamê li dora sancax û alaya Ebdulayê kurê Siwar berhev bûn û mirovekî navê wî benî Ebdulqeys ji nav artêşê derket derive û daxwaza şerkerekî ji dijmin kir. Serekê dijmin li hemberî wî rawestiya. Yasirê kurê Siwar jî bi benî Ebdulqeys re çû û êrîşî ser wî serek û pehlewanî kir. Hemû leşkerên Zûrak derketin û leşkerê Îslamê şikest û hemû çiya tijî kuştiyên artêşê bûn.

Ebdullayê kurê Siwar rû bi rûyî xortekî bû. Her çend eshabeyan êrîş kirin û gelek ji dijmin kuştin, lê Ebdulla piştî janeke zêde mir. Piştî mirina wî Misilman vege riyan Mekranê.

Sîwa Zûrak piştî serkeftinê bi daburqelêdanê hat Keleha Kîkanê û destkeftiyên şer bi leşker re parve kirin.

### **Hatina Senanê kurê Seleme ya Tûranê**

Piştî Ebdullayê kurê Siwar El'ebdî hat kuştin, Mu'awiye ji Ziyad re name şand û daxwaz jê kir ku mirovekî hilbijêre ku hêjayî sînorê Hindê be. Ziyad di bersiva xwe de jê re nivîsand ku pesendkiriyyê min û hêjayî wî sînorî du kes in, Ehnefê kurê Qeys û Senanê kurê Seleme el-Hezlî. Mu'awiye Senanê kurê Seleme el-Hezlî pesend kir û wî jî kurê Seleme el-Hezlî da nîşan. Senan çû Mekranê û midetê du salan li wir ma û piştire ew der kirin.

### **Hatina Raşidê Kurê Omer a Mekranê**

Piştî Ziyad rabû, bi derkirina [Senan] kurê Seleme, Mu'şwiye Raşidê kurê Omer ji bo desthilatdariya welatê Mekranê şand û ew kir nûner. Raşid kiranen baş pêk anîn û piraniya xelkê hînî zanista Quranê û tefsîra wê kir. Dadperwerî xurt kir û ji ber exlaqê baş piraniya Gebriyan<sup>19</sup> bûn Misilman.

Dema ku Raşidê kurê Omer hat Mekranê, mal û darayıya çiyayê Kurdan bi dest xist. Piştire çû Kîkanê û Sîwa Zûrak pê re şer kir û şikest û vege riya welatê Sindanê. Raşid li Kîkanê ma û mal û darayıya berê û ya nû bi dest xist. Destkeftî û "kole"yên dijmin ku bi talan biribûn bi dest xistin û piştî salekê ji wê vege riya. Ji Sîstanê derbas bû heta gihişt Çiyayê Menzerê û Behricê. Xelkên van navçeyan berhev bûn û nêzikî 50 hezar kes kom bûn, rê lê girtin û ji beyanê heta nimêja esrê şer kirin û di neticeyê de Raşid hat kuştin.

### **Careke Din Hatina Senanê kurê Seleme ya Mekranê**

Dema ku Raşidê kurê Omer hat kuştin, Ziyad careke

---

<sup>19</sup> Agirperest.

din Senanê kurê Seleme kir nûner û şand Mekranê. Ferman dayê ku dema gihişt wir Tûranê dagir bike û hemû pûtxane û perestgehên agirî yên agirperestan wêran bike. Ji ber ku peyamberê me (silav lê bin) tiştek jê nehiştine û hemû kufr û dînekî ji bilî dînê İslâmî rahê wan derxistiye û yên rahê wan nekêşabe bi wan re bi serane aştî çêkiriye.

Senanê kurê Seleme midetekê li Mekranê ma û hinek ji wan wilayetan bi hêz kir heta gihişt wilayeta Kîkanê û bi Sîwa re şer berpa kir. Sîwa Zûrak bi leşkerekî fireh ve hat pêş û şerekî giran pê re kir û Yezdanê mezin Misilman bi ser xistin. Sîwa Zûrak xwe kuşt, kurê wî jî ku navê wî Sîwa Sengîn bû bazda û xwe li çiyayê Nûrgan û Bilbilanê veşart. Senan bi pey ket û Keleha Nûrganê dorpêç kir. Artêşa Sengîn pêşve hat û şerekî giran kirin. Senan wê rojê bi xwe bi awayekî wisan şer kir ku Rostem di wextê xwe de kiribû, heta Sîwa Sengîn jî kuşt.

Senan ew erdên biçûyayê, adet û exlaqê baş dihiştin, heta gihişt navçeya Bûdhayê û xelkê Bûdhayê xedrî lê kir û ew kuştin.

### Rasil Çenderê Birayê Çeç

Piştî koça dawiyê ya Çeç, ji bo ku kurê wî Dahir hê biçûk bû, Rasil Çenderê birayê wî derket ser textê welatê Sindanê.

Rasil Çender kesekî dîndar bû û bawermendê dînê Bawadayî bûye. Di serdema Çender de, Misilmanan Tûran û Mekran dagir kirin û ew wilayet bi selteneta İslâmî ve girêdan. Dawîn fermanrewayê Tûran û Mekranê Sîwa Zûrak û kurê wî Sîwa Sengîn bûn ku bi Senanê kurê Seleme yê waliyê Mekranê re şerên giran kirin û hatin kuştin.

Senanê kurê Seleme wilayeta Tûranê dagir kir û bi rêveberiya İslâmî ve girêda. Rasil Çender ji ber jidestdana wilayetên Tûran û Mekranê gelek xemgîn bû û piştî heft sal fermanrewatiyê koça dawiyê kir. Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên Rasil Çender û Mîr Mu'awiyyeyê

xelîfeyê Benî Umeye bûne: Mîr Şîrak Biraxoyî, Mîr Beker Zengene, Mîr Bazûk Edreganî, Mîr Curkan Mamilî û Mîr Huse Kirmanî.

### **Hatina Menzerê kurê Carûd Bişir a Mekranê**

Piştî mirina Senanê kurê Seleme, Mu'awiye welatê Mekranê spart Menzerê kurê Carûdê kurê Bişir. Ew jî hat Mekranê çend rojan li wir ma, desthilata mîrnişinê girt destê xwe û piştî ji bo şer bi rê ket. Ev jî wekî wê bû ku kincên xwe bi dar ve bialiqîne û bidirîne yanî Ubeydullayê kurê Ziyad xemgîn bû û gotê ev gava Menzer ne baş e û xatir jê xwest û bi girîn got, Menzer ji vê seferê venagere û tê kuştin.

Piştî vê, Menzer ji wir bi rê ket û gihîşt wilayeta dijminan û li ser sînorê Tûranê nexweş ket û giyanê xwe ji dest da. Wê wextê kurê wî, Hekemê kurê Menzer li Kirmanê bû û Menzer ew ji nexweşîna xwe agahdar kiribû. Birayê Menzer jî dema bi mirina wî hesiya, daxwaz ji Ebdulezîz kir ku desthilatdariya wî welatî bide wî. Hucac gihîşt ber derî û dengê banga nimêjê bilind bû. Hucac berê xwe da Ebdulezîz û gotê; eger dengê bangê nehatiya guhê min, min birayekî xwe ceza dikir, ji ber wê yek ji mezin û maqûlekî me canê xwe di rêya Xwedayê mezin de feda kiriye û kurê wî di cihê wî de ye û tu jî daxwaza wilayetê dikî.

### **Hatina Hekemê Kurê Menzer a Mekranê**

Dema ku Hekemê kurê Menzer gihîşt wir û Ubeydullayê kurê Ziyad ew agahdar kir, Ubeydulla giriya û xemgîn bû û ew wekî kurê xwe hesêb kir û 300 hezar dirhem dayê. Ew kesekî aza û dilêr bû û piştî vê rîzleğirtinê çû Mekranê û midetê şes mehan Mekran di bin desthilata wî de bû.

### **Hatina Ebdulmulikê Kurê Merwan a Ser Textê Xelîfetiyê**

Piştî Merwanê kurê Hekem, dora xelîfetiyê hat ser

Ebdulmulikê kurê Merwan. Wî Îraq, Sindan û Hindanê da Hucacê kurê Yûsif û piştre Hucac Seîdê kurê Eslem Kulab şand Mekranê.

### **Hatina Seîdê Kurê Eslem Kulab a Mekranê**

Seîdê kurê Eslem Kulab gihîst Mekranê û midetekê li Mekranê ma. Rojekê Sefhewê kurê Lam Elhemamî ku ji hoza Ezedê bû hat ba Seîd. Seîd jê re got; ez ê herim aliyê xwarê, hevaltiya min bike û bi min re were. Wî di bersiva xwe de got, kes û karên min tune û jê re got “Ez ji dîwana xilafetê emir werdigirim”. Jê re got: “Bi Xwedê! Ez nikarim di bin xizmeta te de bim, ez şerm dikim.” Seîd ew girt û kuşt û ew ji kevil kir û serê wî jî ji Hucac re şand. Piştre li Mekranê ji bo berhevkirina mal û darayî bawerpêkiriyyêن xwe tayîn kir û bi bikaranîna awayê nerm û mihrîban mal û darayiya zêdetir ji Mekran û Tûranê bi dest xist.

### **Mixalefeta [Seîd] Bi ‘Elafiyen Re**

Rojekê Kelbê kurê Xelef Elmuxenî, Ebdullayê kurê Ebdurrehîm El’elafî û Mihemedê kurê Me’awiye El’elafî bi hev şêwirîn û gotin ku Sefhewê kurê Lam ji wilayeta me û rûniştiyê Ummanê ye û navçeya me û wî bi hev ve ye û Seîd kî ye ku pismamê me bikuje. Di vê navê re, Seîd ji bo wergirtina bacê hatiye. Ew rastî hevdu hatine û dest bi guftûgoyê kirine û kar gihîstiye şer. ‘Elafî hakim bûn, Seîd kuştin û li Mekranê rûniştin.

### **Hatina Meca‘eyê Kurê Si‘erê Kurê Yezîdê Kurê Hezîfe ya Mekranê**

Der û dora Seîd çû ba Hucac. Hucac ji wan aciz bû û pirsî, mîrê we li ku ye? Ji bo ji kesekî deng derneket, serê çend kesan birî û vêca îtîraf kirin ku ‘Elafiyen xiyanet lê kirine û kuştine.

Piştre Hucac ferman da kesekî ji Benî Kilaban û Suleyman 'Elafî da kuştin û serê wî şand mala pismamên wî û der û dora Seîd, dilxwesi da wan û dilê pismamên wî xweş kir.

Hucac piştre Meca'ê kurê Se'erê kurê Yezid şand Mekranê. Dema ku Meca'ê hat Mekranê, 'Elafiyen bazdan. Meca'ê ew xwestin û ew jî çûn ba Dahirê kurê Çeç ê paşayê Sindê. Meca'ê salekê li Mekranê ma û mir.

### **Xelîfebûna Welîdê Kurê Ebdulmelikê Kurê Merwan**

Dema ku Welîdê kurê Ebdulmelik derket ser textê xilafetê, desthilatdariya wilayeta Mekranê da Mihemedê kurê Harûn. Her wiha, desthilatdariya herdu Îraqan da destê Hucac û Hucac jî desthilatdariya Xorasanê û Sîstanê da destê Quteybeyê kurê Muslim.

### **Hatina Mihemedê Kurê Harûn a Mekranê**

Hucacê kurê Yusif rabû Mihemedê kurê Harûn wekî walî tayînî Mekranê kir û wekî xwe di desthilatdariyê de serbest kir û di wergirtina mal û darayıyê de jê re ragihand ku daxwaza 'Elafiyen bike, bi ci awayî be wan bi dest bixe û ji ber toleya Seîd wan bikuje.

Piştre Mihemedê kurê Harûn kesekî ji 'Elafiyen peyda kir û li ser ferмана xelife ew kuşt serê wî ji Hucac re şand û nameyek di vî warî de ji Hucac re nivîsand ku serê yek ji wan 'Elafiyen biriye û eger temenê min hevaltiya min bike û bext bi min re be, ez ê yê din jî bigirim û bişînim.

Mihemedê kurê Harûn tîreyên Kurdên Beluçî girtine nav eskerên xwe. Ev serekên Kurdên Beluçî yên Tîreyên Pêncînî hevçerxên Mihemedê kurê Harûn bûne: Mîr Esed Biraxoyî, Mîr Beker Zengene, Mîr Bişir Edreganî, Mîr Xîzan Mamilî û Mîr Mudan Kirmanî.

## **HIN WÊNE**

**Wêneyê Mîrên Mîrnişîna Kurdê Beluçi  
yê Beluçîstanê Û Wêneyê Kulturî**





*Mîrê Biraxoyî - Kurdê Beluçî - Tûranê*



*Mîrê Edreganî - Kurdê Beluçî- Mekranê*



*Mîr Ehmedê Sêyem - yê bi navê Ehmedê Mezin Kemberanî  
Beluç hatiye nasîn- Mîrê Beluçistanê 1666-1695*



*Mîr Mihrabê Yekem - Ehmed Zeyî Beluç*  
- Mîrê Beluçistanê 1695 - 1697



*Mîr Semender Ehmed Seyî Beluç -nasnavê Sexî  
Semender - Mîrê Beluçistanê 1697 - 1714*



*Mîr Ehmedê Çarem Ehmed Zebî Beluç -  
Nasnavê Ehmed Parsa. 1714 - 1716*



*E'la Hezret Mîr Ebdula Xan -nasnavê Heloyê  
Şaxî. Mîrê Beluçistanê. 1716 - 1731*



*Mîr Muhebet Xan Ehmed Zeyî Beluç Mîrê Beluçistanê:  
Cara yekem 1731 - 1733 Cara duyem: 1736 - 1749*



*Mîr Eltaz Xanê Sêyem - Mîrê Beluçîstanê. 1736 - 1738*



Xazî Mîr Nesîrxan Ehmed Zeyî Beluç  
-Mîrê Beluçistanê 1749 - 1794



*Mîr Mehmûd Xanê Yekem -Mîrê Beluçistanê 1794-1817*



*Mîr Mihrab Xanê Duyem Ehmed Zeyî Beluç*  
(Şehîd) Mîrê Beluçistanê 1817-1839



*Mîr Şanewaz Xan Ehmed Zeyî Beluç -  
Mîrê Beluçistanê 1839 - 1841*



*E'la Hezret Mîr Nesîrxanê Duyem Ehmed Zeyî  
Beluç -Mîrê Beluçistanê. 1841-1857*



*E'la Hezret Mîr Xudadadxan Ehmed Zeyî Beluç -Mîrê  
Beluçistanê. Cara yekem: 1857-1863 Cara duyem: 1864-1893*



*Mîr Şêrdal Xan Ehmed Zeyî Beluç -Mîrê  
Beluçistanê. 1863 - 1864*



*Mîr Mehmûd Xanê Duyem Ehmed Zeyî*  
*Beluç -Mîrê Beluçistanê- 1893-1931*



*Dema tacdanîna serî Mîr Mihemed E'zem Xan  
- dema li Kiwêtê tacdanîna serî -1932  
E'la Hezret Mîr Mihemed E'zem Xan –Mîrê wilayeta  
Beluçistanê -dema li Kiwêtê tacdanîna serî - 1932.*




*Mîr Dawid Xan Ehmed Zeyî Beluç -Mîrê wilayeta Beluçistanê.  
Cara yekem: 1958-1962 Cara duyem: 1977-1998*



*Peyamber Zerdeş*



*Agirdan - Perestgeha Zerdeşî*



*Keleha Mîr Çakerxan li nêzikî bajarê Sîbî yê Beluçistanê*